.

•

# *Li ser pêşketin û pêşveçûna zarokê*

•

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.

*Li ser pêşketin û pêşveçûna zarokê*
Weşanên SORAN e
.
puşpera 2016
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-945956-03-8

..

**Li ser pêşketin û pêşveçûna zarokê,**

**Bûyîna** zarokê ji dayikekê re wê, weke rewşeka xwezayî ya hertimî bibe bê. Zarok, bûyîna wê ya ji dayikê re wê bi wê re gelek rewşên nû jî bi xwe re bi dayikê re werênê li holê. Her wusa dayik, pêşî, wê bi gûharînên bixwe re wê wan pêşketinên bi destpêka zarokê û bûyîna wê re wê bibê. Di destpêkê de wê bi dayikê re wê hormomên wê xwe pêşbikevin. Di rewşeka weke ya adranaliyê de wê bi dayikê re afirîn di mejî û laşê de wê xwe bide dîyarkirin. Dayik, wê bi hemû aliyên xwe ve wê zîz û ankû xesas bibê. Wê hêstên wê derkevina li pêş. Hêstîyarî, wê pirr zêde bi wê afirîna wê ya bi laşê re wê di ahengekê de wê bibê û pêşbikeve. Bi wê re jî, ew pêşketin, wê bi demê re xwe bide dîyarkirin.

Piştî bûyîna zarokê û pê de, wê bi dayikê re di jîyane wê de wê pêvajoyek nû dest pê bike. Ev rewş û pêvajoya nû, wê dayik, wê zêdetirî wê hîs bike. Wê di destpêkê de bi hîskirina bûyîn zarokê re wê ew gûharîn li ser hêst û hîskirinê re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, dayik, vê yekê bi xwe re wê bi demê re di hundûrê demek kort de derxê têgihiştinê. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku dayik, wê bi destpêka bûyîna zarokê di zikê wê de re wê êdî wê hîs bike û bi wê re bijî. Hertimî di mejiyê wê de ew heya ku di zikê wê de zindiyek heya. Di derbarê wê de mereq û hizirkirin bi hevdû re û di nava hevdû de hena. Lê piştî destpêka bûyînê û pê de ku dem çû bi ser çar û ankû pênc heyvan re wê êdî zarok, wê bidest tevgeran bike. Hêst û hîsa herî zêde ku ji dayikê re xarîb tê jî, wê ew bê ku di zikê wê de zindiyek xwe dilabitênê. Bi wê re dema ku hinekî din dem tê ve diçê û zarok tê şêş û ankû heft heyvîya xwe di zikê dayikê de, dema ku dayikê destê xwe da zikê xwe, wê zarok wê hîs bike û bidest labitandinê bike. Bi wê re wê zarok, tevbigerihê. Zarok, hê ku di zikê dayika xwe de ya û ji navikê ve bi dayika xwe ve girêdayî ya, wê wê hîs bike. Hizirkirin, axiftin û hêstên dayikê ên ku ew di wê demê de dijî, wê zarok wan hîs bike. Wê li ser heyîna zarokê jî, wê bandûra wan wê hebe. Heta wê di afirîna wî û mejiyê zarokê de jî wê, bandûra wê hebe.

Dayik, di vê demê de pirr zêde hêstîyar û bi hîsî û hêstîyarî şîyar a. Di hiskirin û ankû dengkirina dengan de jî wê dayik, pirr zêde hêstîyar bê û weke ku gûhê wê zêdetirî ji dengan re vekirî bin. Wê di têj û ankû hildana tahmê ji xwarinekê wê dayik, dîsa bi heman rengî wê rewşê bijî bi xwe re. Ev rewş û gelek rewşên din ên bi dayikê re wê xwe bi wê re bidina dîyarkirin. Her wusa, biyên dayikê û ankû dema ku destldana li devereka laşê wê dibê jî, wê bi wê re pirr zêde bi hêstîyarî wê hîs bike.

Ev rewşa bi dayikê re, têkiliya wê bi zêde pêşketina hormonên wê re ên di vê demê ve girêdayî ya.

Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê jî bi wê re fahm bike ku dayik, wê rewşek teybet bijî. Wê weke ku ji nû ve bibê xwediyê keseyetîyekê wê lê were. Rewşa dayikê, a berî bûyîna zarokê di zikê de, rewşa dema ku zarok di zikê de bûya û heya û rewşa piştî bûyîna zarokê a ji dayikê û piştre, mirov dikarê weke sê pêvajoyên ji hevdû cuda şîrove bike û werênê ser ziman. Her wusa, ev pêvajo jî, wê di hundurê xwe de pirr zêde demkên kort ên tişî bi xwe re bide pêşxistin û jîyankirin. Minaq dema bûyîna zarokê di zikê dayikê de û heta dema bûyîna zarokê ji dayikê, wê hefte bi hefte wê gûharînên giştî di laşê dayikê de wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa bi wê re jî wê dayik, wan bi xwe re bijî. Wê dayik, pirranîya wan gûharînan hîs bike û fahm bike. Gelek ji wan gûharînên ku di wê demê de fahmnekê jî, wê piştre hin bi hin derxê têgihiştinê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku gelek rewşên ku bi hevdû re û di zikhevdû de di nava hevdû de pêş dikevin di vê pêvajoyê de wê dayik, hemûyan bi carekê dernexê têgihiştinê. Lê bi demê re wê derxê têgihiştinê. Her çendî ku derdixe li têgihiştinê jî, wê dayikê, bi wê derxistina li têgihiştinê hem pêşketinê di meji û laşê xwe de bide çêkirin û hem jî wê bandûrê li zaroka di zikê xwe de jî bike. Li vir, bandûr, ji dû aliyan ve bi wate ya. Aliyê pêşî ê fîzyolojikî ya ku em dikarin li ser hormonan re bi hîs û hêstan re werênina ser ziman a. Aliyê din jî, biderûnî û têgînî ya ku bi mejiyê mirov û bi pêşketinên mejiyê mirov ve girêdayî ya. Mirov dema ku van pêşketinan di destpêkê de fahm nekê, di vê pêvajoya hebûna zarokê a di zik de wê gelek xof, gûman û tirs bi hevdû re bi gelek reng û cûreyan wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de ev jî, wê bi demê re ew karîgerîya (´hîperaktiv´) îya bi mejî re a li ser hormonan re wê bike ku zûtirîn wan fahmkirinan derxê têgihiştinê. Dema ku dayik wan di xof, gûman û tirsan di cih de dernexê têgihiştinê, wê pirr zêde bi wê re acizî, wastandin, serêşî û hwd bi gelek bertekên din ên di laş de re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa dii vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî fahm bike û werênê ser ziman ku dayik, van pêvajoyan, pirr zêde di nava hevdû de dijî. Aliyê ku me hinekî li jor hanî ser ziman û weke rewşên ku di destpêkê de ku ne hatina derxistin li têgihiştinê ku me bahs kirin, wê ev alî, bi demê re temenê hinek bertekna bin. Laş, di vê demê de weke ku di rewşeka ku zûtirin fahm dike ji mejî. Her wusa, di vê çerçoveyê de gelek rewşên ku mejî

dernexistina li têgihiştinê wê laş, di têgîn û têgihiştina wan de bê. Lê mejî, di vê pêvajoyê de ketina wê ya fahmkirina wê de wê, bike ku weke ku rewşna cuda di nava mejî û laş de biafirênê.

Rewşa mejî li vir, di aslê xwe de teybet a ku divê ku mirov wê fahm bike ya. Her wusa dayik, wan aliyan hemûyan pirr zûtirîn derdixe li têgihiştinê. Em li vir, divê ku vê gotinê werênê ser ziman ku mejiyê dema bûyîna zarokê û ankû mejiyê dema bi hemlbûnê, wê weke ku wê hebe. Mejiyê dema bihamlbûnê, wê giring bê ku mirov wê fahm bike. Her wusa, di aslê xwe de çi rewş û pêşketinên ku bi zaroka di zikê wê de re çê dibin, wê bi dayikê re jî xwe bidina dîyarkirin. Dayik, wê bi wê re jî her pêşketina bi zaroka di zikê wê de re wê pirr zêde wê hîs bike. Her labitandina wê, wê hîs bike. Ew hêsta ku dema ku zarok, di zikê dayikê de temem bûya û amedeya ji bûyînê de û dema ku tevdigerihê di zikê dayikê de wê ji gelek aliyan ve hêstna bi dayikê re çê bike ku di wan hêstan de tirs, xof, gûman, û hwd hena.

Ji aliyekî din ve jî, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, ji xwarina ku dayik dixwe û her wusa ji rengê razana dayikê jî bibandûr dibê. Weke ku çawa ku dema ku zarok di zikê dayikê de hertimî bi şev di tevgerê de ya. Bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dema ku dayikê bi şevê xwe dirêjkir li ser cih, dema ku xwe li hasanê piştê dirêjkir, wê bandûrê li zarokê bike. Ev rewş, wê bike ku bandûrê li zarokê û çûn û hatina xwûnê a di laş de jî bike. Her wusa dayik, zarok dema ku ew ket rewş bi vî rengî de wê di cih de bertekê bide nîşandin. Berteka zarokê, nîşanaka wê ya ku ji dayikê re dibêjê ku xwe li tihêla rastê û ankû çapê dirêjke. Bizêdeyî wê zarok ji xwe dirêjkirina li aliyê çapê baş hîs bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî din jî li ser rewşa xwe dirêjkirinê bisekinê. Di xwe zîvirandinên bicarekê de ên dayikê, wê zarok bi bandûr bibê. Bo vê yekê, zarok ji dayikê dixwezê ku dema ku dirêjkirîya, her care ku xwe zîvirand, rabê ser xwe û weke nîv-daqîqayê û ankû kêlîkê li ser xwe bimênê û piştre xwe bizîvirênê. Bo ku zarok jî karibê derfetê bistênê bo xwe bi dayikê re zîvirandinê.

.

**Destpêka bûyîna zarokê, û bi wê re dêûzarok** ..

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, di van rewşên bi şevê ên di dirêjkirina di nava nivînan de wê, xwe li pozisyona ku bi dayikê re bi rehetî razihê wê bigerihê. Lê zarok, hertimî, bi roj weke ku di rewşek razahî de na, bêtevger in. Lê bi şevê di rewşek

bitevger a şîyar de na. Ev jî, rewşa ku zarok, xwe hertimî bilabitênê ya. Di rewşek bi vî rengî de dayik, hertimî, weke hinekî bilindkirina ranê xwe yê li ser re wê weke ku karibê bêhnê bi zarokê jî bide standin. Di rewşek razanê de dema ku dayik bi tihêla çapê û ankû rastê de dirêjkirî bê, ku balgihekî bike nava lingên xwe de û wan ji hevdû bilind bike, wê ev rewş, di zikê dayikê de qadaka ku di wê de zarok tevgerînê bike wê biafirênê. Ev jî, wê hem bo dayikê û hem jî bo zarokê, bê temenê rehetîyek demkin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ew ava zarokê a zikê dayikê ku hormonan tevdigerînê, wê zarok di vê rewşê de karibê di nava wê de xwe bilabitênê. Her wusa zarok, di vê rewşê de ji xwe ji heyva sê û ankû çaran û pê de bidest girtina dengan kirîya. Dema ku dengekî di bihîzê û ankû dengê helbestekê diçiyê de wê zarok wan dengan hîs bike. Zarok, dengên ku di zikê dayikê de dibihîzê û hîs dike, piştî zarok hat dunyê jî wê wan dengan weke ku nas bike. Her wusa, ev rewş, bi vê re hatîya dîtin ku dema ku piştî zarok bû û piştre ku bidest girînê kir û ku dema ku ew dengê helbesteka ku berê hê ku di zikê dayikê de ku lê hatibû dayin hisandin, wê zarok, bi hisandina li wê, wê weke ku bêdeng jî bibê. Her wusa, ev rewş jî, dide nîşandin ku zarok, wan dengan di mejiyê xwe de hê di zkê dayika xwe de wan qayd dike. Ev rewşa, ku di temenê wê de ya ku dema ku zarok çar û ankû pênc heyvî ya di zikê dayikê de û deng dike, xwe dilabitênê.

Zarok, dema ku ew di zikê dayikê de ya, bidest fêrbûnê dike. Her wusa, ji heyva çaran û pê de, bi dest girtina dengan û dayîna bertekan li wan dike. Heta ku dibêt ku ez dem, hinekî din jî korttirtir bê. Zarok, di vê demê de bi destdayîna dayikê li ser zikê xwe, wê ev rewş temenê hîskirineke xort ya zarokê bê. Bi pirranî, her cara ku dayik vê dike, wê zarok bertekê bide nîşandin. Car bi car, di nava xalk û ankû gel de weke ´tenê xwe labitandinê´ ev rewş dihê hanîn ser ziman. Lê ev ji wê zêdetira bi zarokê re. Hinekî jî li ser hîskirinê re zarok, ji dayikê, hinek qalikên fêrbûnê bi wê re dem bi dem digirê.

Ev pêvajoya hê ku zaro di zikê dayika xwe de ya, di wê demê de weke dema ku zarok derve ya û hin bi hin mazin dibê û deng dike û fêr dibê, wê ji heyva çaran û pê de, wê di zikê dayika xwe de wê vê bike. Bi wê re jî, dema ku dayik, li helbestekê dihisênê, dema ku axiftinê dike û ankû lê dihisênê, û hwd, wê zarok, van deng bike. Di vê çerçoveyê de zarok, êdî di pêvajoya xwe ya pêşketinê de jî ya bi pêvajoya xwe ya afirînê a di zikê dayikê de re. Bîyên dayikê di dema destlêdanê de biqasî

dayikê wê zarok jî, wan hîs bike. Heta ku di rewşna de zarok dikarê ji zayikê zêdetir jî wan hîs bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku di dema destlêdana dayikê de wê ev rewş xwe zêdetirî bi zarokê re bidina dîyarkirin. Dayik, li ser aqil û hişê xwe re dike ku wan fahm bike. Lê zarok, li ser temenê destlêdana fîzyolojikî re wê fêr dibê. Piştre jî, hin bi hin, ev rewş dibê ku bihiş jî bibin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku ev pêvajoya hê ku zarok di zikê dayika xwe de ya, wê pêvajoya pirr zêde wastandar bê bo dayikê. Her wusa, wê ev pêvajo hem ji aliyê barkirina zarokê di zik de wê wastandar bê û hem jî wê ji aliyê derûnî û ankû gelek aliyên din ên weke vê ve wê wastandar(wastandin) bê. Yanî, bi gotinaka din, wê dayik pirr zêde biwastihê. Ber ku ji aliyê fîzîkî ve di zikê wê de zindiyek diafirê û hin bi hin bi mazinbûna wê re jî ew giran dibê. Bi wê re wê zarok, qada tevgerên dayikê jî kêm bike. Wê dayik, nikaribê, weke ku ew dixwezê gavê biavêjêê û tevgerihê. Bi wê re jî aliyê din ê derûnî jî, divê ku mirov li ser afrîna hormonan re werênina ser ziman. Hormonên dayikê, wê ji her aliyê ve pirr zêde di pêvajiyek afirînê de bin. Afirîna hormonan û bi wê ´adranalînê´ ji aliyê fizyolojikî û hwd ve, wê di temenê wê heyîna derûnî de bê. Ev, afirîna hormonan, ji gelek aliyên derûnî û fizyolojikî ve mirov dikarê li ser wê bisekinê. Wê bi dayikê re li ser wê afirînê re di wê pêvajoya bihamlbûnê de weke ku dayik, laşê wê xwe ji nû ve biadilênê û biafirênê wê lê were. Her wusa, wê heta ku gelek deverên dayikê ên ku di zik de ku nexweşî bi wan re hebû jî, wê bi wê re baş bibin. Ji vê aliyê ve li ser afirîna hormonan re dayik weke ku xwe ji aliyê fîzyolojikî ve bi vê aliyê ve nû dike. Ji aliyê derûnî ve jî, wê rastî rewşek nû were ku divê ku fahm bike. Çendî ku karibê zû fahm bike, wê ji gelek aliyan ve barê xwe yê derûnî jî sivik bike. Her wusa, li vir, di vê pêvajoya bûyîna zaroktiyê de bûyîna sergêjek, serêş, dûbare dilxalînek û hwd, wê weke ancama wê bin. Di her sê heyvên pêşî ên bihamlbûna dayikê de pirr zêde sergêjek, serêş û dilxalînek wê werina dayikê. Heta ku wê dayik, nikaribê xwarinê bixwe û wê di gelek deman de jî heya ku bivarişihê jî. Di destpêkê de ev hormon û afirandina wan ku dibê, hê di destpêkê de laş fêrî wan nebûya. Heta ku laş fêr bibê û bialimê, wê ev sergêjek, serêş û dilxalînek wê pirr zêde û mazin werina dayikê. Lê di vê pêvajoyê de pirr zêde giringa ku dayik karibê xwarina xwe bixwe. Di vê pêvajoyê de ya herî zor jî dibêt ku ev bê. Dayik, wê nikaribê xwarinê jî carna bixwe. Lê divê ku wê bike. Her wusa, ev pêvajoya di van hersê heyvên pêşî de wê laş xwe biadilênê. Di vê pêvajoyê de wê bi li xwe meyizendina dayikê û xwarina xwe re wê,

biryarê bide ku dixwezê ku zarok bijî û ankû na. Her wusa, di vê pêvajoya afirînê debo vê yekê, mirov dikarê weke pêvajoyek jîyanî jî werênê ser ziman. Bi teybetî, ev pêvajoya pêşî a sê-mehî ku bi **sergêjek, serêş û dilxalînekên** giran re dibûhûrê, wê bi dayikên ku cara pêşî re dibina dayik re wê zêdetir bê. Di hundûrê van hersê heyvan de xelat tevgerîn, gavavêtin û ankû xwarin û vexwarin, dikarê zarokê jî ji ber bike. Di hundurê van hersê heyvan de dûr sekinîna ji biharhanîna dermanan, goştê weke yê masîyên mazin, û hwd jî bi heman rengê dibê. Tiştên weke kişandina çixarê, bikarhanîna ´alkolê´ û her wusa tiştên weke qalandinê û baş ne kelî na û hwd, ji wan dûr dihê sekin in. Bi wê re jî xwarinên ku zêde hesin di wan de hebe û bi wê re jî xwarinên ne kelendî ên weke hêka bi tememî ne kelendî, xwarinên weke ´şuşî´, hinek cûreyên panîr ku hatina binardkirin û kûf girtina, nayêna bikarhanîn. Tabî, bi vir ve girêdayî divê ku mirov werênê ser ziman ku di dema bihemlbûnê de bêxwûnî pirr zêde xwe dide dîyarkirin. Di vê rewşê de bi zanebûnî xwarinên ku madeya wê ya hesin zêdeya bikarhanîna wan de divê ku mirov heyîder bê. Bi heman rengî weke van rewşan xwarinên ku baş û têr ne kelî na, dikarin zarokê ji ber dayikê di hundûrê van hersê heyvan de bide kirin. Li vir, divê ku mirov werênê ser ziman ku bi teybetî mirov dikarê vê pêvajoya bi hemlbûnê li sê pêvajoya beş bike. Beşa pêşî ya ji destpêkê heta nêzî hefteya 13´an a. Pêvajoya duyem jî, vê ji vê demê heta nêzî hefteya 26´an û dibêt ku li gorî fîzyolojiya hinek mirovan bigûherê ku hinekî bin û ankû ser vê demê re bê. Pêvajoya sêyem jî ji wê ji hefteya 26´an heta dawîya bihemlbûnê ya. Yanî, heta dema bûyîna zarokê ya. Dema ku pêvajoya pêşî a bihemlbûnê derbas dibê, wê weke pêvajoya bi hemlbûnê a herî xatarnek wê weke ku derbas bibe. Pêvajoya piştî vê re, wê mirov hinekî din xwe baştir hîs bike. Wê dilxalînekên mirov kêm bibin. Lê li vir, divê ku mirov tiştekî ji bîr nekê ku mirov divê ku dîsa di vê pêvajoya duyemin a ji hefteya 13´an û heta 26´an jî, çendî ku ne weke pêvajoya pêşî pirr zêde bi xaterî bê, dîsa xaterîya xistina zarokê heya. Yanî, xaterîyan ji berçûyîna zarokê û ankû windakirina zarokê, xaterîya wê wê hê jî dewam bike. Dawîya vê pêvajoya duyemin, wê rastî heyve 6´min û hwd were. Piştî vê pêvajoyê, wê xaterî kêm bibê. Lê wê dîsa ew telûke hebe. Vê carê wê xaterîya zû hanîna dunyê ya zarokê wê bibê. Ev pêvajo jî, pirranî bi mirina zarokan re biancam dibin. Bi teybetî di pêvajoya pêşî de wê weke pêvajoya afirîna zarok bê. Di vê pêvajoyê de wê zarok, hema bêja nêvî bi nêvî wê biafirê û reng bistênê. Di pêvajoya duyemin de wê bilaşî û ankû

fizyolojikî û hwd wê zarok hema bêja afirîna wê temem bibê. Di hundurê vê pêvajoyê de jî wê mejî û zêhn jî wê pêşketina xwe **bijî**. Em vê jî divê ku bibêjin ku di pêvajoya pêşî de yanî di hundûrê hersê heyvên pêşî de hingî dilxalînek zêde hena, dibê ku hinek dayik dikevine zorê de ku xwarine jî bixwûn. Lê bi wê re jî ev pêvajo, weke pêvajoye herî giring a ku divê ku dayik li xwarin û vexwarina xwe pirr heyîder jî bê. Hertimî tiştên ku wê hêzê bidinê de bixwê. Her wusa, gelek dayik, ji ber ku di vê pêvajoyê de li xwarin û vexwarina heyîder nabin, zaroka wan di vê demê de ji ber wan diçêt. Zarokê winda dikin. Gelek dayik, di vê pêvajoya pêşî de ber ku heya wan ji wê tûna ya hindik avê divexwûn û ber vê jî di rehma wan enfeksiyon dibê û pirranî jî ev jî dibê sedeme windakirina zarokê jî. Bo ku ev nebê jî pirr hindik jî bê, tiştên weke mast û hwd, xwarina wan, wê baktarîyên ku wan baktarîyên bi enfeksiyonê afirîne ku ji holê radike diafirin. Ev jî, şêwayekî parastinê ê li ser **rehmê re ya**. Bi teybetî, ji destpêka bihemlbûnê û heta hefteya 13´min, di vê çerçoveyê de weke hefteyên giring û dîrokî na. Zarok di van hefteyan de diafirê. Her wusa divê ku mirov werênê ser ziman ku weke hebûna zarokê zêhnê zarokê jî di zikê dayikê de pêş dikeve. Ya ku wê bandûrê li vê pêşketinê bike jî wê, xwarin û vexwarinên mirov jî bin. Divê ku mirov ji tiştên ku wê ne baş bin, ji wan dûr bisekinê. Herî zêde, wê bi êş û zora wê re carna werina wê astê ku jîyane wan û hwirdora wan jî ji berçavên wan reş bibe. Bi wê re jî, wê gelek bertekên din jî wê bidina nîşandin. Lê li vir, çendî ku li xwe meyizend û xwarina xwe xwar û xwe bihêz li ser lingan girt, wê karibê, bandûra wan sergêjek, serêş û dilxalînakan jî kêm bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku em nikarin bibêjin wê bi hemû dayikan re bibe weke hevdû. Bertekên ku me hanîn ser ziman, bi hinekan re pirr zêde hena, bi henekan re jî heman bertek kêm heya. Lê bi hinek dayikan re jî heta dibê ku bi rengna din xwe bidina dîyarkirin û nebin jî.

Lê bi afirîna wan hormonan re zîzbûn û ankû xesasbûn wê pirr zêde bidayikê re bihêstîyarî û hîssî çê bibê. Heta ku wê wilqasî xesasbûn çê bibe, ku carna li rohniya rojê binerê, sergêjek û ankû serêş bi wê re çê bibe. Dema ku rabê ser xwe, nikaribê xwe li ser qaramên xwe bigrê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku bi hinek dayikan re ji aliyê xêvê ve car bi car jibîrkirinên kin bi wê re çê bibin. Carna nizanibê ku çi dike. Carna bidest karekî bike û piştre ji bîr bike ku ji ber çi dest pê kirîya. Her wusa bi wê re bi gelek rengên din jî, rewşên xwe ji bîrkirinê bi wê re dibê ku xwe bidina dîyarkirin.

Di aslê xwe de ev ne rewşên ji bîrkirinê na. Ev rewşna ku divê ku mirov wan bi teybetî hilde li dest in. Bi dayikê re di wê demê de hişê wê bi aqilê re ji derve qût dibê û li hundûrîna xwe li zarokê û afirîna wê dihizirê û ankû diponijê. Bi wê re zarok, wê hişê dihilde li ser xwe. Dayik jî, di vê demê de di mejiyê xwe de bi mejiyê xwe re ji vê rewşê re pirr zêde bi mêyl a. Yanî mêla wê ji ber ku li ser zaroka di zikê de ku diafirê ya, êdî wê hiş û aaqil jî herê li ser wê. Êdî wê, hişê wê herê ser zarokê.

Lê wekî din, divê ku mirov werênê ser ziman ku ev rewşên jibîrkirina bi xêvê, ne rewşna ku mirov wan bi nehêrênî şîrove bike na. Vajî wê, mirov divê ku mirov werênê ser ziman ku dayik, di vê demê de wê bi hiş û hîsên xwe pirr zêde şîyar bê û wê ev di temenê ji mirovên li dora xwe zêdetir fahmkirina wê jî bê. Her wusa, minaq weke hundûrê mezelekê ku pêşî di wê de pênc rohnî hebin û sê ji wan pêketî bin. Lê bi wê şîyarîya dayikê re wê bi wê re weke ku hemû rohnî pêketî bin. Yanî, wê di hemû rewşan de dayik şîyartir bê. Heta ku dengan jî zêdetir bike. Miroveke jin ku hê nebûya dayik, ku berê dibêt ku carna deng jî ne dikir, di dema bûyîna dayikîya wê de dibê ku ji herkesekê li dora xwe zêdetir deng bike. Ev rewş, bi afirîna bi laşê wê re ya. Di vê rewşê de di aslê xwe de laşê jinê di afirînîyaka wusa ya ku mirov divê ku bi teybetî wê hilde li dest a.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dayik bi hîsên xwe pirr zêde di vê demê de xort dibê. Ev rewş berê di nava kurdan de bi gelek şîroveyan jî hatîya hanîn li ser ziman. Heta ku kurdên berê, digotin ku ´jina bi haml çi bêjê wê rast bê´ Ev rewş û gotin, bo rewşên ku jinê ne dîtina û ku li ser wê aqilê xwe dihênê ser ziman jî wusa dihat gotin. Ji aliyê bawerîyî ve jî di nava kurdan de weke bawerîyek pirr kevn a bihezaran salan a ku dihat ser ziman ku dihat gotin ku ”di vê dema bihamlbûna xwe de ku jin dûayekê jî bike wê dûaya wê qabûl bibê.” Di vê çerçoveyê de wê gelek gotin û vegotin, wê di nava civatê de bi kevneşopî û bawerîyî werina ser ziman. Hê jî, di nava kurdan de ev gotin dihêna ser ziman û bi wan dihê bawer kirin. Gelek caran hatîya gotin di nava kurdan de weke gotinaka xalkê ku dihat gotin ku dema ku mirovekî di rewşek xirab de ba û ku piştre rewşa baş dibû, jê re dihat gotin ku ”qey jineka bi haml ji ter dûa kir û tu baş bûyî.” Bi vî rengî, gelek gotin dihatina gotin di nava xalkê de. Di vê çerçoveyê de bi ´hîsa xort a jina bi haml´ ve girêdayî wê gelek vegotin û çîrok jî werina çêkirin û hanîna hanîn li ser ziman. Ev jî, hemû bi wê re rastiyekê dihênina ser ziman. Rastîya xortbûna hêst û hîsê dayikê ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dayik, di vê demê de xwe dide dîyarkirin. Wê di vê pêvajoya bi hemlbûna wê de wê jin, weke ku ji nû ve xwe biafirênê wê lê werê. Wê bandûra wê li mejî û pêşketina mejiyê wê jî bê. Her wusa, lê bi wê re jî, ev pêvajo, divê ku mirov werênê ser ziman ku wê gelek aliyên zor û bi êş jî bi xwe re biafirênê. Ev êş carna dibina weke perdeyekê li ser wê asta pêşketina hîs û hêsta dayikê jî. Piştî sê-heyvên ku bi ser bihemlbûnê re ku bûhûrtin re asta zor û êş kêm bibê. Wê barê jinê, hin bi hin bi demê re giran bibê. Dayik, di vê demê de çendî ku ew karibê ku li xwe heyîder bê û bi xwarin û vexwarina xwe li xwe binerê, wê her wusa, di vê rewşê de jî serkevtî bê.

Rewşa jinê a dema i hamlbûnê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê bi demê re di çerçoveya bi hamlbûna wê de rûnihê. Yanî, bi gotinaka din, wê qaysa xwe bigrê. Di vê çerçoveyê de wê hinek bi hin laşê jinê li gorî wê qays û rewş bistênê û wê xwe biadilênê. Bi wê re mejiyê jinê jî, wê bi derxistina têgihiştinê a vê rewşê re wê, li ser wê re êdî têgîna dayikatiyê bi xwe re pêşbixe. Têgîna dayikatiyê, wê hê ku zarok ne hatî dunyê wê bi derûnî û hwd re bi dayikê re pêş bikeve. Aliyê têgîna dayikatiyê ê fizyolojikî, divê ku mirov werênê ser ziman ku wê ser hormonan re wê xwe bide pêşxistin. Hormonên dayikatiyê wê pêşbikevin. Di mejî de weke dema ku mirov cêrekî tişî av dike û didênê deverekê û ew cêr hin bi hin aliyê xwe yê derve şil dike bi rengê ´zayin´a xwe re, wê bi heman rengî mejiyê jinê jî, bi afirîna di nava xwe de wê xwe bi wê biadilênê û biafirênê. Hormonên ku ji aliyê fizyolojikî ve di hundurê mejiyê jinê de afirandin kirina, wê temenê vê bi jinê re biafirênin. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de ev afirîna ji aliyê fizyolojikî ve ku di meji de bûya, wê weke temenê têgîn û fêrîya dayikatiyê ku pêş dikeve jî bê. Mirov dikarê vê rewşê ji aliyê derûnî ve bişibihênê wê rewşa dayikê a piştî bûyina zarokê a ji wê. Piştî ku zarok bû û bidest jîyane xwe kir, wê zarok li ser bêhnkirin, hîskirin û derûnîya dayikê re wê têkiliyê dênê. Herî zêde wê bêhna şîrê dayikê ji wê bike. Bi vê yekê re ev bêhn, wê temenê têkiliya dê û zarokê a bi hevdû re jî bê.

Zarok, wê bêhnê di asta têgînekê û fêrbûnekê de bikardihênê. Bi wê re xwesteka xwe ya şîrdayînê û hwd bi girîn û rewşên weke wê re dihênê ser ziman. Zarok, bi demê re wê bi laşê dayikê re hevnasînê bike. Di vê çerçoveyê de wê bi demê re bi bav re jî hevnasînê çê bike.

Hevnasîna zarokê a bi dêûbav re wê di vê çerçoveyê de hin bi hin pêş bikeve. Hevnasîna dayikê û bav, mijaraka giring a, emê li jêr jî li ser wê

bisekin in. Lê li vir, weke aliyekî ku bi vê xale mijarê ve girêdayî, mirov di çerçoveya biminaqkirinê re emê werênina ser ziman. Her wusa, dayik û zaro, têkiliya wan di vê çerçoveyê de wê pêşbikeve. Zaro, bi demê re wê asta hevnasîna bi dayikê re wê ji wê rewşa bi bêhnkirinê hwd, derxê asta naskirneka fêrbûyî ku em dikarin li serr gotina derûnîyê re werênina ser ziman.

Ev rewşa hevnasîna dayikê û zaro, wê gelek tiştan bi me bide têgihiştin. Her wusa, li vir, xale pêşî û ankû pêvajoya pêşî wê li ser rewşên weke bêhnkirinê û hwd re bê. Rewşa duyem jî, wê li ser êdî rewşa hevnasîna bi laşî ku mirov dikarê bifizyolojikî re jî werênê ser ziman re bê. Piştre jî, weke rewşeka sêyem jî, wê li ser rewşan re wê hevnasînê bi fêrbûnê bike. Ev rewşa sêyem, bi gotinî divê ku miov di temenê wê de gotina derûnîyê di temenê wê de bicih bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de ev rewş û gotina derûnîyê ku em di çerçoveya rewşa zarokê a teybet bi şêwayekî teybet em divê ku wê hildina li dest. Zarok, wê weke ku çawa ku wê di pêvajoya destpêkê a bûyînê de bêhnê dike temenê têkiliya xwe ya bi dayikê û hwd re, wê êdî vê rewşa derûnîyê bikarbênê û wê têkiliyê bi rewşan re dênê. Minaq, em vê yekê pirr bi hesan kifş dikin, ku dema ku dayik, pirr wastîyayî bê û ankû bêxew mabê û nikaribê xwe li ser lingan bigrê û ev rewş xwe di rûyê wê û tevgerên wê re ku dide dîyarkirin, wê zarok wan hîs bike. Ev rewşa dayikê, wê temenê ne rehet sekinîna zarokê jî bê. Wê zarok, xwe di destekî rehet de hîs nekê. Bo vê yekê, zarok, dema ku li rûyê dayikê dinerê û van rewşên weke ku me hanîna ser ziman bi derûnî û tevgerên wê re kifş dike, wê ew zarok jî ne rehet bê û wê ne rehet bê.Zarok, aramîya bi dayikê re û rehetîya dayikê ji rû, tevger, deng û gotinên ku bi dengî ji devê wê derdikevin kifş dike. Rewşa zaroyeka ku dema ku hat şeş û ankû heft heyvîya xwe, ku dema ku bibînê ku dayika wê digirî, wê ew jî bi wê re bigrî. Ev rewş, bo demên zarokê ên destpêkê jî wusa ya. Weke azmûnekê ku ez bixwe bi zarokê re bi wê jîya me, divê ku bibêjim ku zaroka ku yek-hefteyî û ankû du hefteyî ku hê nû ji dayikê bûya, dema ku rewşa ken ji rûyê min dîtîya ew jî, weke min kenîya. Lê dema rewşek bêaram û ankû bêalaqadar bi min re kifşkirîya, di cih de bidest girî kirîya. Zarok, ji destpêka bûyina xwe, wê êdî tevger, mîmîkên rûyê mirov, ken û girîyê mirov, rehetî û ne rehetîyên mirov û hwd, çi rewşên ku ew xwe bi mirov re bidina nîşandin, wê zaro, wan kifş bike û li gorî wan bertekê bide nîşandin. Dayikeka pirr xêde wastîyayî û ne rehet bi derûnîya, wê zaroka wê ne rehet bê û herî hindik wê dayimî bi girînîya xwe wê xwe bi wê

rewşê re werênê ser **ziman**. Dayik, derûnîya wê çawa bê, wê bandûra wê li zarokê bê. Dema ku dayik aciz bê, wê zarok jî di nava wê acizîya wê de aciz bibê. Dayikeka ku xwe rehet kirî û dayikeka ku xwe rehet nekirî, wê zarok di destê wan de xwediyê rewşên ji hevdû cuda bê. Em vê yekê bi awayekî vekirî baş kifş dikin ku dema ku dayik rehet bê û bi derûnîya xwe ne xirab bê, bi dengê wê re zarok dema ku digirî wê zûtirîn haş bibê û ne girî. Lê dema ku dayik wastîyayî bê, di destê wê de çendî ku zarok bike ku zarokê bi hedininê bo ku negirî jî, wê zarok zû bi zû ne sekinê û wê girîyê xwe bidomênê. Yan jî, wê demên dirêj di nava demên girîna zarokê de nebin. Wê ji girîyê xwe bisekinê û piştre cardin dest bigirî bike. Ev rewşa zarokê, di aslê xwe de di derbarê derûnîya dayikê de jî wê, gelek tiştan ji me re werênê ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku derûnîya dayikê, di vê çerçoveyê de mirov bi hesanî kifş dike ku li ser zarokê bi bandûra wê re heya. Zarok jî, wê rewşa derûnîya dayikê, ji yekî mazin zêdetirî kifş dike û wê hîs dike. Zarok, êdî bi wê derûnîya ku ne baş re ew jî, wê xwe baş hîs nekê û wê ne hedinê. Wê rehet nebê. Wê dayimî bigirî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê bi awayekî vekirî pirr baş dikarê werênê ser ziman ku dayik, di vê çerçoveyê de çendî ku di farqê de bê û ne di farqê de bê wê ev têkiliya wê ya bi zaro re a li ser derûnîya wê re wê ji zarokê re pirr giring bê. Heta ku di fêrbûn û hildana aqilê zarokê de jî wê bandûra wê hebe.

Her wusa, ev rewş, bo vê yekê ji aliyê mejî ve baş tê xwandin. Mejiyê dayikê, weke ku me li jor hanî ser ziman, rewşê dayikatîyê wê di pêvajoya xwe ya bi hemlbûnê de wê hilde têgihiştinê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê jî bi wê re werênê ser ziman ku rengê mejiyê dayikê, wê êdî bi rengê hizirkirina wê re wê biafirê. Ev rewşa dayikatiyê, em divê ku werênina ser ziman ku em nikarin tenê li ser derûnîyê re fahm bikin. Divê ku em binxat bikin ku wê bi aliyên wê yên fizyolojikî û hwd re wê hebê û wê mejiyê xwe yê jina ku bûyî dayik û ankû wê bê dayik, wê di pêvajoya bi hemlbûnê de wê biafirênê. Çendî ku zaro di zikê dayikê de afirî û pêde çû, wê bi heman rengî di vê çerçoveyê de bi dayikê re wê pêşketin û pêşveçûn li ser rastîya dayikê re wê xwe bidina dîyarkirin.

Dayik, her wusa, di pêvajoya bihemlbûnê de bi derûnî, wê xwe ji dayikatiyê re amede bike. Wê gelek gûharîn di vê çerçoveyê de di derûnî û fizyolojiya wê de bibin. Jina ciwan ku cara pêşî dibê dayik, çendî ji van gûharînan re amede ya, wê rewşa wê û ya zarokê bi têkiliya wan ya ib

hevdû re jî bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov di dewama wê de vê jî werênê ser ziman ku dayik û zarok, têkiliya wan di destpêkê de li sser bêhnê re bi fizyolojikî û her wusa bi derûnîyê re heya. Ev herdû bendên têkiliyê ku hena, wê temenê têkiliya wan ya bi hevdû re jî biafirênê.

Zarok, hê ku di zikê dayika xwe de ya, dema ku dayika wê diçê bin tava rojê, wê rohniya rojê hema bêja biqasî dayikê hîs dike. Dema ku dayik, dikeve nava avê de ew, rewş wê bi heman rengî pirr zêde bandûrê li zarokê bike. Zarok, ji van rewşên weke van rewşan hazê digirê. Bihîsî bi bandûr dibê. Di vê çerçoveyê de her wusa, weke ku ew jî xwe dişoyê lê tê.

Rewşa dayikê, li vir, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi heyînîya fizyolojikî re di destpêkê de werênê ser ziman. Hemû rewşên ku di dema ku hê zarok di zikê dayika xwe de ya, wê bandûrê pirr zêde li ser heyîna zarokê bikin. Ji xwarina dayikê bigirê û heta rehetbûn û razana wê, wê di hemû qadên ku ew bi wan dijî û rewşên pêş dikevin re wê zarok ji wan sûd bigirê. Bi heman rengî dengên gotinan wê bi zarokê re werina bihîstin. Weke ku çawa ku zarok di zikê dayikê de dengan dibihizê, wê bi heman rengî piştî zarok hat dunyê rewşên rengînî û hwd, wê bi dîtinî bandûra wan li ser zarokê hebin. Zarok, wan farq dike. Li ser wê farqkirinê re di mejiyê xwe de qayd dike.

Mejiyê zarokê, di destpêkê de wê her dîtina xwe ya ku dît wê bigirê. Bi wê re jî wê mejiyê zarokê, di pêvajoya kifşkirinê de bê. Ev rewşa kifşkirinê a bi mejiyê zarokê re mirov, dikarê bi rewşan re werênê ser ziman. Rewşa pêşî, wê bi dîtinê û kifşkirina mejiyê zarokê re bê. Rewşa din ya duyem jî, wê di çerçoveya salixkirinê de bê. Minaq, zarok hê di zikê dayika xwe de ya, ew dengên weke helbestekê û hwd ku bihîstîya, dema ku hat dunyê ji dayikê, piştre ku li wê dengê helbestê û hwd hisand, wê zarok bi mejiyê xwe re weke ku rastî dengekî naskirî wê were. Bi wê re jî wê mejiyê zarokê, têkiliyê bi carên berê ên ku ew di zikê dayikê de ku li wê dengê hisandîya û piştî ku heta dunyê ji dayikê û ku li wê dihisênê wê dênê. Ev têkilî danîn, her wusa çendî ku mirov dikarê weke temenê fêrbûnekê werênê ser ziman jî, bi heman rengî mirov dikarê weke kifşkirinekê jî werênê ser ziman. Zarok, çendî ku şibandinekî di nava hemen dengê de dike jî, lê her care ku li wê dengê hisand, wê weke ku her car wê dengê kifş bike wê lê were.

Di vê çerçoveyê de weke ezmûnekê ez li vir divê ku werênima ser ziman ku dema ku min bixwe zarok(´hê du hefteyî ya´) hilda li dest û biriîya ber rengên weke kesk, sor û zer ku pirr rengna vekirî û xort in,

zarok, pirr zêde li wan şaq maya. Di vê çerçoveyê de gelek caran li ser hevdû, min zarok biriya heman cihê û li wan rengan daya temeşa kirin. Piştre, zarok min danîya ardê li ser cihê wê. Di heman demê de çavê wê bi dîmenên tv´ya ku vekirî ketîya, di wê rewşê de rengê sor û hinek rengên din ê ku ev reng jî di nava wan de ya, di nava wê dîmenê tv´yê de temaşa kirîya, piştre weke ku ew temeşa kirinên wê yên berê werina bîrîya wê, serê xwe bi aliyê din ve zîvirandîya û weke ku li wan rengên din ên ku berê li wan nerîya gerîya ya.

Ev rewş, vê rastîyê dide nîşandin ku zarok, ji destpêka bûyîna xwe ve bidest dîtin, gûhdarkirin û hwd dike. Bi wê re di dewama vê de ez divê ku vê jî werênima ser ziman, dema ku tv´ vekirîya û deng ji wê tê, wê ew deng balê bikişênê. Carna wê bi kêlîkan berê xwe bide wê tv´yê û li dîmenên ku li ber çavên wê derbas dibin binerê. Lê di nava wê temaşakirinê de tiştekî bale mirov dikişand. Ew jî, ew bû ku dema ku helbest dihatina ser ser ekranên tv´yê, wê weke ku zêdetirî balê bidayê de. Hinek, helbestên ku dûbarê dayikê di dema ku hê zarok di zikê wê de ya ku temeşa dikirin, zarokê pirr bi bêdengî li wan temaşe dikir. Lê hinek dengên ku ne bi ahnegî bûn jî, ku zarokê li wan dihisand, pirr bale mirov dikişand ku zarokê ya weke ku ne rehet û bêrewş dibû û yan jî di cih de piştre ne bi gelekî re bidest girî dikir. Ev rewş, gelek caran hatîya dûbare kirin.

Li vir, tiştekî mirov fahm dike ku mejiyê zarokê, hinek dengên ku berê dayikê li wan hisandîya, ku piştî ku zarok bû û li wan hisand, weke ku hevnasînekê bi wan dengan re çê dike û her wusa li ser wan dengan di rewşek aram de wê bêdeng bimênê. Wê heya xwe li nûqteyekê bide çêkirin. Di vê demê de ev rewşên ku heya zarokê li nûqteyekê didina çêkirin, hinekî jî, weke ku di temenê wan de hevnasîneka bi vî rengî a li ser dayikê re di temenê wê de bi zarokê re heya.

Li vir, bi dîmenî divê ku mirov dikarê ji gelek aliyan ve dema ku hê zarok di zikê dayikê de ya, bi gelek minaqên bi vî rengî bi demên piştî bûyîna zarokê ji dayikê re têkiliyê bi wan re dênê. Zarok, di aslê xwe de bi mejiyê xwe wê têkiliyê didênê. Bi wê têkiliyê re zarok, têkiliyê bi rewş, reng û her wusa hewirdorê re didênê. Rewşa zarokê ya dîtina wê ya piştre ku pêş dikeve, wê di vê çerçoveyê de li ser temenê wê dema ku hê zarok di zikê dayika xwe de ya bê. Di vê demê de dengên ku zarokê bihîstina wê gotinan di mejiyê zarokê de bide qaydkirin. Qaydkirina gotinan, wê tiştekî bide nîşandin. Ew jî, ew a ku xêva zarokê afirîya û bidest girtinê dike. Xêva zarokê, her wusa, hertimî wê di vê demê de ji

girtinê vekirî bê. Demên ku zarok di zikê dayika xwe de şîyar in, demên weke şevê û hwd, di van deman de wê zarok, weke ku di lêgerînekê de bê. Her wusa, ev dema ku zarok pirr zêde şîyar a û ku dayik jî dirazihê, wê her wusa, ne levkirinek bo zarokê xwe bide dîyarkirin. Zarok, wê di vê demê de weke ku bixwezê dayika wê şîyar bibê, wê xwe bi labitênê. Ber ku ew şîyar a. Mejiyê wê şîyar a. Di vê demê de dengkirin, wê bandûra wê jî zêdetirî li ser zarokê zêde hebe. Lê her dengek û ankû labitandineka bi dayikê re a di nava nivînan de di şevê de wê, zarokê ji dayikê zêdetirî şîyartir bike. Her wusa, di vê dema bihemlbûna dayikê de dayik, dema ku li hesanê piştê xwe dirêj dike, zarok bertekên mazin dide nîşandin, ber ku hinekî ne rehet dibê. Di vê demê ya her baş bo zarokê, ew a ku dayik li tihêlên çapê û ankû rastê xwe dirêj bike. Zêdetirî, zarok, kêfa wê ji tihêla çapê re tê ku dayik xwe bi wê aliyê ve dirêj dike. Li hesanê piştê xwe dirêj kirin, wê bandûrê li hildana bêhnê a zarokê jî bike. Heta ku ev rewşa dirêjkirina li hesanê piştê, dikarê zarokê di zikê dayikê de jî bi zîvirênê û serê zarokê di wê dema ku bi jêr de ya bide bi jor ve. Ber ku zarok, wê carna zan bike ku dayik şiyar a. Ev rewşên dayikê û zarokê ên berî dema bûyîna zarokê, wê di demên dawî ên nêzî bûyîna zarokê de wê, zêdetir bibin. Her wusa bi teybetî, heyvên şeş, heft û heşt wê ev rewş pirr zêde wê hebin. Di heyva neh(9)an de wê hinekî ev tevgerên zarokê kêm bibin. Ber ku zarok di zikê dayikê de mazin bûya û bi wê re hem qada xwe labitandinê a zarok tang bûya û hem jî zarok li şûna bertekên bi laşî, wê bertekên bi şîyarîya mejî û hwd re êdî wê pêşbixe. Di vê çerçoveyê de di rojên heyva neh(9)an de wê, rojê hindik caran bi fizîkî xwe bi labitênê. Ev rewş, hinekî jî nîşanaka pêşketina mejiyê zarokê ya. Lê tevgerîyên di mejiyê zarokê ên di vê demê de wê, ji ya demên berî heyva dawî ên bi labitandina zarokê re ku dibin, ji wan ne kêmtir bê. Di heyvên şêş, heft û heştan de zarok, dema ku dayik zêdetirî destê xwe dide zikê xwe û ankû tevgerîyekê dike, wê bertekê bide nîşandin. Wê li hemberî dengan jî bertekna bide nîşandin. Di her dengê de wê bertekekê weke ku bide nîşandin. Lê di heyva dawî de wê zarok, êdî dengan di mejî de di xwe de qayd bike. Wê bertekê bi vî rengî li ser nîşanak û qaydkirin ku piştî dengan dike re wê bersivê bide deng û tevgerên dayikê û ankû ên derve ku ew ji wan bi bandûr dibê. Me li jor, hinekî bi çend gotinan hanî ser ziman ku di zikê dayikê de wê zêhnê zarokê bidest pêşketina xwe bike. Ev rewş, tenê bi serê xwe jî, dema ku mirov li ser wê bihizirê, mirov wê bigihijê ancamna giring ên bi pêşketina zarokê û mejiyê zarokê re.

Zarok, dema ku dayika wê li helbestekê û hwd bi dengî li wê dihisênê, wê zarok jî li wê bisênê. Deng wê herê zarokê û zarok wê bertekê şanî wê bide. Lê li vir, tiştekî giring heya ku mirov divê ku binê wê xîz bike. Ew jî ew a ku zarok, wê di vê dema xwe ya ku dihisênê û bertekê dide nîşandin de wê, ji du aliyan ve wê hiskirina bi dengî ji wê ancamê bi xwe re bigirê. Ji aliyekî ve bi dengê ku zarok êdî his dike û bertekê dide nîşandin a. Ji aliyê din ve jî, dema ku dayik jî dihisênê, mejiyê dayikê wê bandûrê ji wê hiskirinê bigirê. Ev bandûra li ser dayikê, wê pirr zêde bê. Zarok, wê ji wê bandûrê jî bi hîssî bandûrê di xwe de bigirê. Di vê çerçoveyê de zarok, hem ji dayikê ancama wê hisandinê digirê û hem jî bi xwe bixwe ew wê digirê. Ev rewş jî, di pêvajoya navînî a ji heyfteya 13´an heta 26 û ankû 27 û hinekî din jî wirdetir, wê ev rewş hebe.

Di pêvajoya bihemlbûnê de wê biyên dayikê hemû pirr zêde zîz û ankû xesas bin. Dayik, wê dengan baştir hilde. Wê têjê û ankû tahmê baştir wê hilde. Wê çavên wê weke ku baştir **bibînin**. Hîskirina wê, di vê demê de zêdetir a. Ji her aliyê ve wekek u şîyarîyek fizyolojikî di laşê wê de afirîya. Heta ku dayik wê şîyarîyê di mûyên pova xwe de jî hîs dike.

Lê ev dem, biqasî demeka ku di wê de zarok êdî bi tememî pêşketîya her wusa demeka pirr xesas a jî bo jîyane zarokê. Her wusa, di vê demê de dayik, wê nikaribê bi tememî bi rehetî rûnihê û rabê. Wê di meşên xwe de pirr zêde bikevê zorê de. Dayik, divê ku hertimî di vê heyvan nehan de balabala yanî lingên xwe ji hevdû vekirî divê ku bimeşê. Ber ku serê zarokê bi tememî li rehma wê sekinî ya û her jidandinên dayikê wê zorê bide serî û laşê zarokê. Di vê heyva nehan de wê her roj, hinekî xwe bilabitênê. Her xwe libitandinên di vê demê de ku zarok di zikê dayikê de dike, zarok bi wan labitandinan xwe di rehma dayikê de bicih dike û xwe ji bûyîna ji dayikê re amede dike. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê labitandinên vê demê di vê çerçoveyê de weke labitandinên xwe amedekirinê ên bûyîna ji dayikê jî werênê ser ziman. Ji ber ku ev labitandinên vê demê bo amedekarîya bûyîna ji dayikê na, wê her labitandin, hinekî zor û êşê bidina rehma dayikê û dûvikê wê. Ji ber ku ev hastûyên laşê wê di vê demê de wê ji hevdû vebin. Bi vebûna wan hastûyan re wê tenê tûra muskulatûran wê bimênê. Piştî ku hastûyan xwe kişand, wê êdî piştre ew muskulatûr jî wê hin bi hin xwe ji hevdû vezîlênin û rehma dayikê wê bidina vekirin.

Ev dem dema bûyîna dayikê a ji dayikê ku wê, weke demeka pirr xesas bê. Ji hevdû vekişina muskulatûran, wê temenê destpêka sanciyên dayikê ên bûyîna zarokê bin. Ev sancî, her wusa divê ku mirov werênê ser ziman

ku hinekî bandûrê li mejiyê zarokê dikin ji aliyê baş û ankû herênî ve. Bo vê yekê ya, gelek lêkolînvanên ku li ser vê rewşê lêkolîn kirina, hertimî pêşnîyarkirina kişandina van sancîyan giring in bo zarokê. Divê ku ev pêvajo, bo zarokê were jîyankirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de ev rewşa kişandina sanciyan, wê temenê afirîna hinek hormonan jî bê. Wê bi wê re hinek adranalin biafirê. Ev adralinek, wê hem bo laşê dayikê û siheta wê û hem jî bo ya zarokê wê giring bin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dayik, di vê dema xwe de bi ji hevdû vekişana muskulatûrên rehmê wê re wê sanciyên wê zêde bibin. Ku sancî gihiştina wê asta ku her serê pên daqêqayan û ankû ku hê hindiktir ku bûn, êdî ev nîşanaka bûyîna zarokê ya û êdî dem nema ya. Wê êdî zarok bibê.

.

**Bi pêvajoya pêşketina zarokê re pêşketina hîsên weke dîtinê, hisandinê, tahmkirinê û hwd, bi zarokê re û şêwayê bikarhanîna wan. ..**

Rewşa bûyîna zarokê, di vê demê de wê her wusa bo zarokê, piştî kişandina wan sanciyan re wê êdî bibe. Lê zarokên ku berî vê demê ji dayikê bûna û ku dayikê bi zaroka xwe re ev pêvajoya dawî a sanciyan jîyan nekirîya, wê temenê telûkeyên mazin jî bo dayikê û zarokê jî biafirênê. Zarok jî, van pêvajoyan bi awayekî xwezayî weke ku bi dayikê re dijî û hîs dike. Her wusa dayik, xwe bi wê re çawa ku ji bûyîna zarokê re amede dike, wê zarok jî xwe amede bike. Zarok, piştî ku bû û pê de, wê dayik êdî bi wê adranalina hormonan ku bûya re wê piştîbûyîna zarokê wê xwe weke derman bike û baş bike. Di vê çerçoveyê de aliyekî wê adranalina ku bi wan sanciyên ku dayik di dema dawî de dikişênê ku dibe, wê di vê çerçoveyê de bo vê rewşa dayikê a piştî bûyîna zarokê a başbûna wê jî wê giring bê. Her wusa, wê bo hatina şîr li singên wê jî wê giring bê. Ev rewşên sanciyan ên kêlîkên dawî, çendî ku di demek kort û kin de dibin jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê bandûra wê pirr zêde û mayindayî li ser laşê dayikê, bûyîna şîrê singên dayikê û her wusa başbûna wê. Di vê çerçoveyê de bi wan sanciyan laşê dayikê, weke ku bi wan sanciyan û adranalina wan, dermana başbûna xwe ya piştîbûyîna zarokê jî di laşê xwe de diafirênê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ji hevdû vekişina wan muskulatûrên laşê dayikê bo vebûna rehma wê ji bûyîna zarokê re, wê dîsa bi bandûra wê adranalina wan sanciyên ku ew di kêlîkên dawî dikişênê bê. Di vê çerçoveyê de laşê dayikê weke karkerekî di xabitê û

xwe ji wê rewşê re amede dike. Çendî ku ev sanci zêdebûn, wê afirîna hormonan û bi wan jî ji hevdû vekişina muskulatûrên rehmê wê jî bibin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov van rewşên weke ya bi muskulatûran, sanciyan û her wusa bûyîna hormonan bi hevdû re şîrove bike û werênê ser ziman.

Ev pêvajoya bûyîna zarokê giringa ku mirov wê fahm bike. Ev pêvajo, her wusa, wê gelek aliyên wê yên giring hem bo dayikê û hem jî bo zaroyê wê hebin. Di her hanîna zarokê li dunyê wê de wê sancî û êş wê hebin. Ev jî, wê weke pêvajoyeka bi wê pêvajoya dawî a bi hemlbûnê ve girêdayî bê. Her wusa, ya ku wê pêvajoya dawî a bi hemlbûnê dawîyê li wê werênê û bi awayekî bi ewla zarokê werênê dunyê û siheta dê û zarokê biparêzê jî wê ev rewş bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî li ser vê rewşê bisekinê.

Me li jor hinekî bahse pêvajoya pêşî a bi hemlbûnê kir. Ev pêvajoya pêşî a bi hemlbûnê li vir, divê ku mirov hinekî din jî li ser wê bisekinê. Her wusa, çendî giring a. Ev pêvajoya pêşî, ku mirov wê baş fahm bike û baş wê bi ancam bike, wê bandûra wê li pêvajoya duyemin û pêvajoya dawiyê a heta hatina zarokê li dunyê jî wê bike. Bo vê yekê, giringa ku mirov hinekî din jî li vir li ser wê bisekinê.

Pêvajoya pêşî a bi hemlbûnê, çendî ku weke pêvajoyek xesas û xaternek jî mirov dikarê li wê binerê, dema ku mirov ew bi awayekî baş û serkevti bi dawî kir, wê ne tenê jîyane zarokê bi serfirezî bi serbixe, wê bi heman rengî temenê ppêvajoyên din û pêşketina wan jî bi xwe re biparêzê. Her wusa, di vê pêvajoya pêşî a bi hemlbûnê de divê ku mirov xwe ne wastênê û pirr heyîder bê di avêtina gavên xwe de. Her wusa, ku pêvajoya duyemin jî di nav de, divê ku mirov xwe di wan de di rewşek tevgerîyê de bihêlê. Hertimî aktîv û karîger bê. Herê meşên piçûk ên bi armanca werjîşê. Çendî ku dayik, di vê pêvajoyê de bi vî rengî bi tevger bê, wê pêvajoya sêyemin jî wê hesanîtir bike. Her wusa, gelek pêvajoyên dawî ên bi hatina zarokê li dunyê re ku pirr zêde bi zorî di bûhûrin, têkiliya wê bi zorê bûhûrînê, bi pêvajoya duyemin ve heya. Ji ber ku bi awayekî başî li ne nerî ya. Baş xwe li ser lingan negirtî ya. Meşên piçûk ên bi armanca werjîşên piçûk nekirîya.. Bi vê rengê, mirov dikarê xwarin û vexwarinê jî werênê ser ziman. Dayik, divê ku di wê hêstîyarî û têgihiştinê de bê ku tişta ku ew dixwe, wê du jîyanan li ser lingan bigrê. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi vê têgihiştinê dema ku li xwe nerî, wê hinekî siheta xwe û zaroka xwe jî biparêzê.

Me li jor bahse meşînê û ankû werjîşên piçûk û kirina wan kir. Em li vir, divê ku vê yekê di vê çerçoveyê de jî werênê ser ziman ku çawa ku dayikek ku hê di pêvajoya pêşî a hersê heyvên pêşî de ku ji wê re derketina rê û rêwîtî ne rast bê bi heman rengî tenê rûniştin jî ji wê ne rast û xatereya. Bêtevgerî û ankû bêgavî, dikarê bibe temenê wê ku xwûn hişk bibê di rayan de û ku bi wê re êdî di ranan de dîsketa çê bibê. Bi wê re jî, ev hişkbûna xwûnê dikarê bandûrê li kezebên dayikê bixwe jî bike. Bo vê yekê, hertimî di tevgerîyên piçûk de bûyîna wê, wê hem wê di rewşa wê ya baş û zindî de bigrê û hem jî wê van xaterîyan ji ser wê û laşê wê dûr bike.

Bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku xwe dana berrojê û her wusa di nava avê de xwe soba kirin di pêvajoya bihemlbûnê de di roja me de pirr zêde weke rêyên ku serî li wan dihê dayîn in. Av ku mirov di navê wê de bê, bêgûman, wê ji aliyê bêhnstandinê ve bandûrê hem li dayikê bike û hem jî li zarokê jî bike. Di vê çerçoveyê de wê dayik, bi vê rewşê re zindîbûna zarokê xwe bi zarokê re biparêzê. Zarok, wê zinditîya dayikê hîs dike û bi wê re ew jî zindî dibê. Bandûra wê zindîbûnê li zarokê wê di afirîna wê de xwe, bide dîyarkirin. Zarok, ku dayik di nava avê de wê ji çavikên çermê dayikê ve wê weke ku bêhnê hilde wê lê were. Di vê çerçoveyê de wê dayik û zaro jî xwe baş hîs bikin.

Zarok, tevgerên dayikê bi xwe re qayd dike. Her wusa, dayik çê dike û nakê, wan bi xwe re qayd dike. Di vê çerçoveyê de dayik, dema ku tiştek kir, wê zarok jî bi wê re wê tiştê bike. Zarok, wê hîs bike. Her wusa wê bi dayikê re hîs bike. Dayik, ji her aliyê ve di vê pêvajoyê de gûharînekê bixwe re jîyan dike. Her wusa, pêvajoya bihemlbûnê, şaneyên mirî ên di laşê jinê de jî diavêjina derve û wê nû dikin. Her wusa şaneyên wê yên xirab, bîrîndar û zirer dîtîna jî wan ji nû ve çê dike. Wan ava dike. Her wusa, kêmesîyên laşê dayikê di vê çerçoveyê de bihemlbûna wê, bi wê re dide derbaskirin. Gelek dayikên zû bi zû nexweşîyên weke pênceşêrê nagirin, hinekî jî di vê çerçoveyê de bandûra vê rewşê bi wan re heya. Rewşa rehme dayikê û ya singê dayikê tenê ji vê van nexweşîyên bi vî rengî re vekirî dimênin. Berkû, dayimê bûhûrîna adetê û hatina xwûnê, wê di vê çerçoveyê de wê rewşa rehme ku ji ber hertimî dewrûdayimitiyê bi xwe re dike, di demên xwe yên ber bi pîrbûnê ve ji ber ku ev zêde nabê, êdî zûwabûn dibê û temenê nexweşîyên wir diafirin. Bi heman rengî, rewşa singê jî bi wê rengê ya. Lê rewşa singê, hinek fektorên din ên fizyolojikî û hwd hena ku mirov dikarê wan werênê ser ziman in.

Hinek fektorên ku bi lenfên şîr û zûwabûna van ve girêdayî hena. Piştî zûwabûnê, hinek rewşên ku bi wê zûwabûnê re diafirin hena. Li vir, mijara me ne ev a. Bo vê yekê, em li ser van rewşên rnexweşîyan zêde ne sekin in.

Di pêvajoya ku hê zarok di zikê dayika xwe de bi tevgerbûyîn û çûyîna meşên piçûk bo vekirina ling û laşê xwe, wê fêdeya wê pirr zêde wê hebe. Ev rewş û kirinên ku dayik wan bi tevgerî bike, wê di dema bûyîna zarokê de jî ji dayikê re bê alikar. Dayik, wê hanîna zarokê li dunyê wê rehettir bê.

Ev rewş û gelek rewşên bi vî rengî bo sihet û tendûrîstîya zarokê û dayikê jî hertimî hatîya pêşnîyarkirin ji dayikê re ku bike. Bi wê re jî dayikê, dema ku ew kirina, bi demê re hem xwe baş hîs kirîya û hem jî di zindîyê de hiştîya.

Di vê pêvajoyê de dayik, ji aliyê hêstîyarî û derûnî ve jî pirr zîz û tenik a. Zû dikarê dilê xwe bigrê û bişikihê. Zû dikarê xamgîn bibe û ankû dilşa bibê. Carna, bêî ku sedemek hebe, heya ku dayik ji xwe re şa bibe û xamgîn jî bê. Ev rewş hemû wê temenê wan de hormonên dayikê ên ku pêşketina wê di temenê wan de hebin. Ev rewş, hinekî jî, wê weke ancama wê rewşa dayikê bê. Her wusa li vir di dewama wê de divê ku mirov werênê ser ziman ku weke ku çawa me bahse şîyarîya bi dayikê re kir, bi heman rengî ew şîyarî wê di mejiyê wê de jî wê bibe. Ew zanîn, têgîn, têgih û gotinên ku bi wate û kirdeya wan de berê dizanîn, wê ew jî di mejiyê wê de bivejin û dem bi dem zindî bibin. Dayik, wê li gorî wateya wan gotinan, wê yan şa bibe û yan jî wê xamgîn bibê. Bi wateyî û kirdeyî, ew gotin çawa hatina salixkirin û dihên zanîn, wê ev zanîn bi hişmendî, wê di vê çerçoveyê de xwe bide dîyarkirin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku şîyarîya ku dibê, bi vê rengê wê di mejî de jî di rengê weke li ser wan wate û kirdeyên gotinê re bi rengê zanînekê û zanebûnekê re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, ev rewşa dayikê, divê ku mirov werênê ser ziman ku wê dayikê, ji gelek aliyan ve bi bandûr bike. Ev rewşên dayikê, ji aliyê zanebûna wê ve jî wê, bandûra wê li herênî û ankû pozitîv wê li wê bibê. Ev şîyarîya laş, her wusa, dema ku di mejiyê dayikê de bi vî rengî di vejînê û ankû zindî dike, wê ew vejînbûn û ankû zindîbûn, wê êdî li ser zarokê jî wê bandûra wê hebe. Carna dema ku dayikê dihizirê ku bi wê hizirkirina xwe re kelecane wê zêde dibe û bi dilper dibe û dilê wê zû diavêjê, wê di zikê wê de jî zarok jî wê bertekê biwê rewşê re bi xwe re bide nîşandin. Zarok, wê vê rewşê

hîs bike. Her wusa bi heman rengî dema ku dayik xamgîn bê, wê dîsa bi heman rengê wê zarok, wê bi dayikê re wê hîs bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê di dewamê de werênê ser ziman ku mejiyê dayikê di vê demê de dema ku dihizirê û wê adranaliya ku diafirênê di xwe de wê, ew adranalin, wê her wusa ne tenê bi dayikê re lê wê bi zarokê re jî wê bandûra wê hebe. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê rewşek û ankû dîmenekî dûyemin wê bi dayikê û bi wê hzirkirina wê re wê biafirê. Wê dayik jî wê, bi xwe re hîs bike. Wê her wusa, li gorî wê, carna destê xwe dênê ser zikê xwe û wê bi firkênê. Carna wê tenê destê xwe dênê ser zikê xwe û hwd. Lê ev rewş çendî ku temenê bertek nîşandina zarokê a di zikê dayikê de ya, bi heman rengî carna wê hizirkirineka dayikê a zelal jî ku wê dilşa dike û ankû xamgîn dike, wê bi heman rengî bi zaroka di zikê wê de re wê bertekê bide nîşandin.

Ji zû avêtina dilê dayikê jî zarok, wê rewşê fahm bike. Dema ku dilê wê bixwe jî zû biavêjê, wê zarok, bi wê re bikeve tevgerîyê de di xwe de.

Zarok, di zikê dayikê de çendî ku weke zindiyekî duyemin heya jî, wê ji aliyekî din ve weke ku bi navikê ve bi dayikê ve girêdayî ya, wê bi heman rengî di rengekî din û dîmenekî din de wê weke laşê dayikê jî bê. Di vê çerçoveyê de jî wê, di her rengê bertekên dayikê de wê bertekê ew jî bide nîşandin. Di vê çerçoveyê de ew bi dayikê de bêhnê distênê û dide.

Li vir, divê ku mirov di dewama wê de werênê ser ziman ku dayik, vê pêvajoya wê bi hemlbûnê, wê ji wê re weke pêvajoyek pirr zêde giring bê. Wê ji her aliyê ve wê afirandinekê bi dayikê re di laş û mejiyê wê de bide çêkirin. Ew hormonên ku diafirin û diafirênin, wê her wusa, temenê têgîna dayikê hê ku zarok di zikê dayikê de ya wê bi wê re biafirênin. Giringîya wan hormonan divê ku mirov ji gelek aliyan ve hilde li dest û fahm bike. Herwusa ev hormon, wê bi keseyetîya dayikê re bi jinê re weke ku keseyetîyekê ji nûve biafirênê bi jinê re bi navê dayikê.

Dayik, wê pirranîya van pêvajoyan bi xwe re hîs bike. Gelekan ji wan jî, ji xwe dayik wan bêî ku di farqê de bê dijî. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dayik, ew cara pêşî ku hîn dibê ku zarokek di zikê wê de ya, wê pirr hêst di nava hevdû de bi wê re çê bibin. Care pêşî, dema ku jinê fêrbû ku bi hemlbûya, wê gelek hêst û hîs ku hêstên şabûnê û ên tirsbûnê û xûfbûnê û hwd jî di nav de lê ku dikeve zorê de ku wan biwate bike, wê bi wê re biafirin. Ev pêvajo, hemû wê wê di destpêkê de di mejiyê wê de weke xolubatekê bê. Di vê demê de jin, wê êdî xwe ji dayiktiyê re amede bike. Ji kêlîka ku dayikê fêrbû ku ew

bihemla û di zikê wê de zarok heya, wê pirr bihizirê. Ev rewş, bi hinek dayikên ciwan re di destpêkê de dibê sedema hinek sendromên piçûk û ankû mazin jî. Di vê çerçoveyê de wê dayik, pêvajoyek derbas bike. Lê dayikê, ev pêvajoya pêşî ku derbas û pê de, wê bi demê re hin bi hin wê fêrî fêrbûna wê rewş bibê. Wê nas bike. Wê rewşê êdî hin bi hin bi xwe re herê bike. Heta ku dayik wê rewşê di mejiyê xwe de bi rastî herê nekê, wê ji wan pirsgirêkên sendromî û derûnî û hwd jî, wê nikaribê xwe rizgar bike. Dayik, wê rewşê di destpêkê de nikarê herê bike. Ev rewşa dayikê, wê hinek xoslet û teybetîyên wê, weke yên hersê heyvên pêşî ên bi hemlbûnê û hersê heyvên piştî bûyîna zarokê bin. Li vir, divê ku mirov bi gotinekê bibêjê ku hersê heyvên pêşî ên bi hemlbûnê û her wusa hersê heyvên piştî bûyîna zarokê ên pêşî, wê weke du pêvajoyên giring bin. Piştî ku dayik, ket van pêvajoyan de wê pêşî, nizanibê ku wê çi bike. Wê rastî gelek rewşên ku wê di wastênin û ankû wê hizir bike ku nikaribê bi ser wan ve herê bê. Wê ev rewş, heta bibin temenê hinek pirsgirêkna derûnî. Gelek dayikên ku zaroka wan hatîya dunyê, di wê destpêka zaroka wan ku hatîya dunyê de bi wan re wê, hinek pirsgirêkên derûnî jî wê bi wan re xwe bidina dîyarkirin. Hinek dayik, wê zû wê pêvajoyê derbas bikin. Lê hinek, wê zû derbas nekin. Wê pêwîstîya wan bi alikariyê wê hebe. Bi teybetî, piştî ku zarok hat dunyê, gelek dayik, di destpêka vê pêvajoyê de dema ku van pirsgirêkan din, bi ser ve jî dema ku rastî wan hersê heyên pêşî ên jîyane zarokê ên zor tên, ku ev jî li wê zêde dibin, êdî zarok, weke ku bi derûnî xwe di tangesîyekê de dibînê. Ber ku piştî ku zarok bû û pê de, ji gasa di hundurê zikê zarokê bigra û heta fêrbûna wê ya li jîyanê, wê pêvajoyek, zor bi wê re bijî. Bi şev narazihê. Her serê sê-kêlîkan û ankû hindiktir şîyar a. Dayimî, divê ku dayik wê şîr bide ji singa. Vêca axlebê, wê hinek dayik, di destpêka şîrdayinê de wê serê singên wan kul bibin û heta ku xwûn jî wê ji wê werê. Ev jî, bo ku serê singê fêrî devê zarokê bibê, xwe ji nû ve serê singê xwe bi qays dike û nû dike. Ev rewş, hemû wê di destpêka van hersê pêşî ên zarokê, pêvajoyeka zor hema bêja bo hinek dayikna, weke pêvajoya hersê heyvên pêşî ên bi hemlbûnê ên zor, wê pêvajoyekê bi xwe re bide afirandin.

Dayik, bi xwe wê bixwezê ku bi ser wê ve werê. Her wusa, wê dayik, çawa zarokê bihadinênê, wê çawa zarokê razênê û şîr bidiyê de û hwd, wê di gelek aliyan de dayik zorê bikişênê. Pêvajoya pêşî a bi hinek dayikna ku zarokên wan ji dema zûtir hatina dunyê û ankû bi sezeryanê ku hatina dunyê, dibê ku di destpêkê de şîrê wan kêmbê. Ev jî, wê ji

aliyekî din ve temenê wê pêvajoya zor bê. Heta ku hinek dayik, vê pêvajoyê derbas nakin û ji ber ku di destpêkê de baş li xwe nanerin, şîrê wan qût dibê. Bêî ku şîr destpê bike û werê ji singê, qût dibê û sing zûwa dibê. Êdî ev jî, pêvajoya bi zor a dayikê a pêşî ya bi wan hersê heyvên pêşî re dikarê dirêjtir jî bike.

Li vir, divê ku mirov di dewama wê de vê yekê werênê ser ziman ku dayik bixwe, wê gûharînan di laşê xwe de hîs bike. Çendî ku wan gûharînan nas bike û li gorî wan tevigerihê. Wê hertimî pêvajoyên piştre ên ku wê werin û bên jînkirin, wê hesanîtir bike. Her wusa di vê çerçoveyê de hinekî bi zanebûnê ve girêdayî ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku di pêvajoya pêşî a piştî bûyîna zarokê de ku zarok êdî hatîya dunyê, di wê de ji ber ku carna hinek dayik xwarinên ku gasê bi wê re didin çêkirin dixwe, êdî ev di serî de wê temenê ne hedînîna zarokê a di destpêkê de bê. Her wusa, ji xwe zarok, di van rojên xwe yên pêşî de wê bi xwezayî bi gasê re di nava gengêşîyekê de bê. Wê hertimî gasa wê hebê. Dayik jî, her dema ku piştî ku şîr da, piştre bi hêdîka destpêka danîna li ser pişta zarokê û firkandina wê û ankû hêdîka li pişta wê xistinê re wê bike ku gsa wê derxe dakû zarok rehet bike û negirî. Ev di destpêkê de wê, weke karekî mazin bê bo dayikê di destpêkê de.

Dayik, di pêvajoyên xwe yên ku dijî de, di aslê xwe de ku hinekî di farqê de bê, wê bersiva pirraniya pirsên xwe yên ku di serê wê de na, wê di nava wê pêvajoya bi hemlbûna xwe de bigrê. Her wusa, di vê pêvajoyê de gûharînên di laşê wê de wê mamosteyê herî mazin ê wê bê.

Pêvajoyên ku jin di demên bi hemlbûnê de di bûhûrênê, wê pirr giring bin bo wê. Her wusa, di vê demê de wê jin, bigihijê keseyetîyek din ya bi navê dayikê. Jin, wê bê dayik, Dema ku care pêşî bû dayik, ev hêst pirr jidahîtir in. Wê hertişt di vê demê de care pêşî werina jînkirin. Bo vê yekê wê jin, weke ku di pêvajoyeka ku fahmnekê de bê. Wê weke ku di rêwîtîyeka ku ew bixwe jî fahm nekê de bê. Wê tirs û xûf, di vê pêvajoya pêşî de zêdetir li pêş bin. Ji ber ku jin nizanê ku çi li pêşîya wê heya. Wê çi bijî. Her wusa, ew û ankû zaroka wê, karibê bijî? Wê çawa ew pêvajo bi rêve herê? Çendî ku dervî dayikê, hinek ji wê re wê werênina ser ziman jî, lê di aslê xwe de di vê pêvajoyê de jin wê bizêdeyî bi hundûrê ve girêdayî û mijul bê. Bo vê yekê, wê tenê ya ku ew dihizirê, bi wê re ji destpêka bihemlbûnê û heta dawîya bi hemlbûnê wê bi wê re lê serdest bibê. Di vê pêvajoyê de dema ku piştî ku zaroka wê hat dunyê, wê weke ku di azmûnek pirr zêde mazin û dirêj de derbas bûyî wê jin xwe hîs

bike. Her wusa, dema ku care pêşî zaroka xwe dît û çavên wê pê ket, wê weke ku pirr ji wê re xarîb were. Wê hin bi hin bi zarokê re hevnasînê bike. Ew hêst û hîsên nasînê ku di dema ku zarok di zikê dayikê de bû û ku bi dayikê re afirî bûn, wê hin bi hin di mejiyê jinê ve bivejin û zind bibin û wê bi wê re zarokê bi wê bidina nasîn.

Ev dema hevnasîna dê û zarokê wê zêde nekişênê. Lê bi hin dayikan re zêde dirêj dikişênê. Fêrbûna dayikê li zaroka xwe wê hinekî bi hinek dayikan re zêde dirêj bikişênê. Her çendî ku ew zarok weke beşek ji laşê wê jî bê û ew jî wê hîs bike û bizanibê jî, lê dîsa bi awayekî pirr xarîb wê ew rewş bi dayikê re xwe bide dîyarkirin. Ev hêst, piştre hin bi hin wê cihê xwe ji ya dayiktiyê re berdê. Dayik, wê piştre zaroka xwe nas bike. Wê bi hîsî û hişmendî jî wê êdî piştre nas bike. Pêşî ew naskirina bi hîssî, wê piştre bi hişmendî, wê xwe bide pêşxistin bi dayikê re.

Pêvajoyên vê demê, wê di nava xwe de gelek rengên pêşketinê bidina çêkirin. Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dayik, wê weke ku ji nû ve were dunyê wê lê were. Di vê çerçoveyê de wê weke ku dunyê ji nû ve kifş bike wê lê were. Wê bi keseyetîyek nû û hêstîyarîyek nû a pirr zêde pêşketî re wê dayik, vê pêvajoya xwe ya nû pêşwazî bike û pêş bixe. Li vir, têkilîya di nava dayik û zarokê de wê li ser du rewşan re bê. Rewşa pêşî ji aliyê fizyolojikî ya ku ev alî wê li ser girtina bêhnê û hwd re wê xwe bi têkiliya dayik û zarokê re werênê ser ziman. Zarok, dema ku di destê yekî din de bê, wê hertimî bi wî girîyê ku di destê wan de dike de wê, bi wê dayika xwe bixwezê. Lê dema ku ew ket nava destê dayikê xwe de wê bi carekê re bihedinê û dawî li girîyê xwe werênê. Têkiliya vê bi bêhna dayikê û şîrê yê ku zarok dihilde re ya. Her wusa ev bêhna ku zarok di hilde, wê zarok wê di pêvajoya xwe ya pêşî û ankû di heyvên xwe yên pêşî ên ji dayikbûyînê de wê, di asta hîsbûnê, hêstbûnê û hatta ku di asta hişmendiyek teybet de bikarbênê. Di vê çerçoveyê de ew bêhna dayikê, wê weke mirtelek zindî ku zarok xwe di nava wê de di ewlayîyê de hîs dikê jî bê.

Ev bêhna dayikê, li vir, divê ku mirov hinekî bi teybetî bahse wê bike. Zarok, wê çawa bikardihênê û çawa xwe bi wê re di ewleyîyê de hîs dike, wê bi wê re ew were dîtin. Her wusa, em li vir, di dewama wê de divê ku vê rastiyê jî werênina ser ziman ku dayik, bêhna wê, wê zarokê bi wê ve bide girêdan. Li ser wê rewşê re jî çendî ku jîyankirin bi têkiliya dêûzarokê re çê dibê jî, wê hin bi hin tevger û ahlbûn di nava wê têkiliya dayik û zarokê de pêş bikeve. Zarok, wê hin bi hin tevger û rengên

gavavêtinên xwe pêş bixe. Wê vê jî, bi wê ewlayîya ku ji dayikê digrê wê bike.

Dayik, vê yekê, biqasî zarokê jî dibê ku fahm nekê. Lê zarok, bi tevgerên xwe yên weke yên girî û hwd re wê hertimî rastiyê bide nîşandin. Zarok, di vê çerçoveyê de weke heyîneka fîzyolojikî wê rastîya bi xwe re dihênê ser ziman. Gelek caran li ser vê rewşê re tê gotin ku ”zarok fêrî dayika xwe dibê.” Û ankû tê gotin ku ”zarok dialimê dayika xwe.” Lê di rastiyê de rastî, ji ya ku bi van gotinan re dihê ser ziman, zêdetir xwe bi heyînîyekê dide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku rewşa zarokê, di van pêvajoyên pêşî de wê li ser vê aliyê fîzyolojikî re wê pêş bikeve. Lê piştre wê hin bi hin fêrkirinên derûnîû bi xwe re pêş bixe ku em dikarin van fêrkirinên derûnî weke pêşketina hişmendiyê a bi zarokê re jî bi nav bikin û werênina ser ziman. Ev aliyê duym, wê her wusa, bi demê re li ser rengê pêşketina tevgerên zarokê û alimandinên wê re xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê çendî zarok van pêşbixe, wê ewçendî jî hin bi hin rengê keseyetîyê wê xwe bi zarokê re bide dîyarkirin. Zarok, di vê rewşê de weke ku ew êdî ji jîyanê bidest fêrbûnê û alimandinê dike. Ev rast a. Lê ji wê zêdetirî jî, aliyên tevgerî û ankû rengên gavavêtinên mirov wê di temenê xwe de aliyekî vêşarî ku em dikarin bi rakendîtîya mirovî re werênina ser ziman re wê xwe bide dîyarkirin. Ev rewş, her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku hinek tevgeran dide nîşandin, wê bi wan tevgeran re hine şibandinan bi mirov re bide çêkirin. Ev jî, di aslê xwe de ji vê rastiyê ya.

Li vir, divê ku mirov di dewama wê de vê jî werênê ser ziman ku aliyê zarokê ê fêrbûnê û alimandinê, wê di vê çerçoveyê de hin bi hin bi demê re bi zarokê re wê pêş bikeve. Zarok, wê van aliyan bi xwe re bide pêşbixistin. Dema ku tevgerna dayikê zarokê dîtin, wê li wan şaq bimênê. Bi wê re zarok, wê weke ku wan qayd bike. Di vê demê de mirov çawa gotinê ji zarokê bibêjê, wê temenê vê pêşketina zarokê baştirîn bide dîyarkirin. Di vê dema zar ya pêşî de wê zarok dengan derxê. Wê bigirî û wê di nava rengê girîyê wê de wê, cûreyên deng derxistinê ên girînê wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, dema ku mirov van kifş bike û ser wan re bi awayekî cidî gotinê bikarbênê ji zarokê re bi dengekî bilind ku ew karibê bi xwe re bigrê, her wusa wê ev di pêşketina zarokê de bê temenê gavavêtinên mazin.

Zarok, di vê demê de wê bike ku dîmenên ku temaşa dike bigrê di mejiyê xwe de. Her wusa, dema ku rengan dibînê, li wan heyîder dibê.

Dema ku kompozisyoneka rengan dibînê ku di wê de gelek reng hena, wê zarok, li wê heyîder bibe û heta ku wê hin bi hin bike ku wan rengên wê ji hevdû zelal bike di mejiyê xwe de bi nerîna xwe re. Vê yekê, wê bi xwe re pêş bixe. Carna, zarok, bi kêlîkan li rewş û ankû tiştna şaq dimênê û dinerê. Ev rewşa nerandinê, mirov dikarê li ser wê heyîder bê û bi wê re bike ku heya zarokê zêdetir pêş bikeve. Zarok, dike ku heya xwe li wê bide hevdû. Ya ku li vir, ku mirov dikarê bi wê ji zarokê re bibe alikar, wê ew bê ku zarok di wê heyîderîya xwe de ji wê re bibîina alikar ku pêşde herê. Yanî, di meyizendina wê de di zelalkirina rengan de ji wê re bibê alikar.

Dema ku gotinek tê gotin û ankû dema ku tiştek dihê dîtin li berçav û hwd, wê bi wê re zarok, bixwezê ku bi mejiyê xwe re wê zelal bike. Di heyva pêşî de wê zarok, bike ku dê û bav nas bike, bêhna zarokê nas bike û wê bike ku dengên ku ji dê û bavê nas dike, wan nas bike û ji hevdû zelal bike. Bi wê re wê bixwezê ku dengên wan di mejiyê xwe de bicih bike. Wê bixwezê ku nas bike. Wê li bêhna dayikê werê girêdan. Heta ku ev jî, di vê dema destpêkê de hatîya dîtin ku dema ku zarok di destê yekî din de bidest girî kirîya, di cih de cilna dayikê ku bêhna wê ji wê tê ku hatîuya xistin bin çeng de û ku zarokê bêhna wê kirîya, bi wê re di cih de dev ji girî qarîya ya û hedinî ya. Ev pêvajoya pêşî a zarokê wê bi teybetî wê bi nerîn û dîtinê wê re derbas bibe. Wê hertimî bi çavên xwe re binerê ku nas bike. Wê heyîderîya xwe car bi car pêş bixe li tiştan, rewşan û kesan. Ev pêvajoya destpêkê a zarokê heta şeş hefteya wê, wê bi vî rengî bi bûhûrê. Zarok, wê heta hefteya şeşan, wê êdî nerînên xwe yên balkêş pêşbixe, wê bikenê, wê bi laşê xwe re wê bidest fahmkirin û têkildanînê bike. Di dema girîyê xwe de wê dengên ji hevdû cuda bidest derxistinê bike. Li ser tevgerên dê û bav ên ku zarok, ji wan bidest girînê dike wê pêş bikevin. Ev wê dide nîşandin ku zarok êdî tevgeran nas dike. Her wusa, dema ku di ancama tevgerekê de zarok lêva xwe bênê xwerê û bidest girî bike, her wusa ev nîşanaka naskirin û hinekî jî fahmkirinê ya. Di vê demê de zarok, wê nerînên demdirêj û mayinda wê bide pêşxistin. Wê dengan bidest derxistinê bike.

Di vê demê de pirr giring a ku mirov hêstên hêskirinê şanî zarokê bide. Zarok wan fahm dike. Bi wê re zarok, wê dema ku birçû bû, ankû binxwe şil kir û hwd, wê bigirî. Wê dengên cuda di nava girîyên wê de xwe bidina dîyarkirin. Di vê demê de pirr giringa ku mirov li zarokê bipeyivê. Mirov gotinan ji wê re bibêjê. Mirov gotinên bi dengên zelal û hêdîka bibêje ku zarok karibê wan hilde nava xwe. Her wusa, di vê

çerçerçoveyê de wê ev bina alikariyna mazin ji pêşketina zarokê re. Zarok, di vê demê de wê pirr zêde ji ber ku birçû, ya binxwe şilkirîya û ankû gasa wê heya, wê bigirî. Di vê demê de pirr giring a ku dema ku mirov gotinên xwe ji zarokê re gotin bi hêskirinekê û hêstîyarîyeka ku mirov wê şanî zarokê bide, mirov wan gotinan bibêjê. Her wusa, gotinan bi hêskirin, mirov divê ku di vê demê de ji zarokê re werênê ser ziman. Wê ev, pirr giring bê ji girtina wê ya wan gotinan re. Zarok, bi wê hêsta hêskirinê û meyizendinê ku gotinan ji devê dê û bav pêşî dibihîzê, wê wan gotinan di mejiyê xwe de zûtirîn bigrê. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi dengekî hêskirinê û hêstêyarî ku mirov ew gotinên xwe ji zarokê re hanîn ser ziman, wê hingî zarok, wan dengan bigrê. Wê ew rengê hêskirin û meyizendina li zarokê binerînê, wê bê wêneyek ji wê gotina ku mirov ji zarokê re dibêjê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, di vê demê de çi hilde wê bi hêstîyarî wê hilde. Her wusa, di vê demê de divê ku mirov bi germenhiyekê hêskirina xwe bi hêstîyarî şanî zarokê bide. Divê ku mirov di nerînên xwe yên li zarokê de wê hêskirinê û hêsta wê bide zarokê. Wê zarok van fahm bike. Wê bersivê li gorî xwe û tevgerên xwe bide wan. Zarok, di vê demê de zimanê ku ew bi wê fahm dike, zimanê laş, bêhnkirin û hêskirina evîndarî ya. Zarok, wê germehiya hêskirinê ji her tiştê zêdetirî wê hîs dike. Her wusa, bi wê hêskirinê û nerîna wê hêskirinê ku mirov li zarokê nerî û gotinên xwe bi zimanekî zelal û hêdîka hanî ser ziman, wê zarok, wê kifş bike. Bi vê yekê, bi hêskirina xwe mirov wê hertimî kifşkirina di mejiyê zarokê de bide çêkirin ku ew bi wan pêş bikeve.

Zarok, hertimî bi hêskirin û zimanê hêskirin divê ku lê nêzîkatî werê kirin. Divê ku hêstîyarî bi vî rengî di vê çerçoveyê de ji wê re were dayîn nîşandin. Hêskirin, wê weke temenê û ardnîgarîya ku li ser wê pêşketina zarokê dibê bê. Di vê çerçoveyê de rastîya zarokê, bi hêskirin û evînî û gotin û zimanê wê were nêzîkatî lê kirin û pêşwazî kirin. Zarok, wê bi zimanê hêskirin û hêsta wê, wê hem gotinan zû di mejî de bigrê û hem jî wê derxê têgihiştinê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê navenga ku zarok di wê de mazin dibê, di vê çerçoveyê de were afirandin. Her wusa, zarok, wê di vê demê de wê nêzîkatîya hêskirinê li ser wê bidest fêrbûn û fahm kirinê û her wusa naskirinê bike.

Di aslê xwe de, di vê çerçoveyê de dema ku ev dema zarokê baş were bûhûrandin, wê temenê axiftina wê di vê demê de were pêşxistin. Dema piştî vê re yanî ya piştî heta şêş hefteyan, wê heta nêzî sê û ankû heyva çaran, wê ya pêşketina wê bê di mejiyê zarokê de. Zarok, vê pêvajoya

duyem ya piştî bûyînê, wê hem nas û fêr bike û bi wê re jî wê temenê xwe yê bikarhanîna gotinan û ankû kirina dengan weke gotinan wê pêşbixê. Di vê çerçoveyê de di hundûrê van pêvajoyan de pirr giring a ku zimanê hêskirinê û hêstîyarîya wê, di têkiliya dêûbav û ya mirovên li hewirdorê de hebe.

Her wusa rewşa navendî ya bihêskirinê, ziman û hêstîyarîya wê, destpêka wê ji wê girêdana zarokê a bibêhnê ve ku bi zarokê ve ya. Zarok, wê li ser wê re bêhna dêûbav nas bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok, dêûbav, weke hêsteka tê nasîn, wê hin bi hin bi xwe re derxê têgihiştinê û pêşbixe. Her wusa wê di vê çerçoveyê de nêzî wan bibê. Mejiyê zarokê, her wusa bêhnê di çerçoveya rewşek hoyandî de di vê çerçoveyê de bi xwe re bikardihênê.

Dengên ku zarok, di vê demê de derdixe, wê bi wê rewşa hêskirinê û girêdanê, wê hin bi hin reng û awa bistênin. Zarok, wê xwediyê rengekî pêşketinê ê bi wê re bê. Dengên ku zarok, derdixe, wê bi wê re pêşbikevin.

Zarok bixwe jî wê dengan derxê. Dengên ku zarok wan derdixe, wê weke bertekên zarokê bin. Lê di vê demê de bi giringî divê ku mirov werênê ser ziman ku divê ku mirov, dengên hêdîka, zelal û di ahengekê de mirov derxe ji zarokê re. Di du rewşan de divê ku di ahengê de bin. Rewşa pêşî, li ser dengên ku zarok derdixe mirov ku divê ku wan dengan bike ku bi şekil bike û ankû ji wan dengên wê gotinan biafirênê û ji wê re dûbare werênê ser ziman. Ji aliyê rewşa din a duyem ve jî, divê ku mirov bi dengînî di ast û ahengekê de werênê ser ziman. Nehêlê ku bi qalabalixî ew deng derkevin.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji aliyê dê û bav ve werênê ser ziman ku dê û bav, divê ku bi hevdû re bi heman rengî di ahengê de bin li hemberî zarokê. Dê û bav, hem bi dengên ku derdixin, hem bi gotinên ku dibêjin û hem jî bi nêzîkatîyê, divê ku bi hevdû re bin. Ji hevdû cudabûn, wê di meji de qatbûnê bi zaro re werênê. Her wusa, nêzîkatîya wan ya li hemberî hevdû û her wusa hevdû vala dernexistin li hemberî zarokê ji destpêkê û heta hemû demên piştre wê, di pêşketina zarokê de jî xwediyê heyînîyaka giring bê. Carna hin dayik dibêjin ku ez baştir dizanim û dikarin bav li hemberî zarokê bişikênin. Ev şikandina li hemberî zarokê, wê weke şikandina zarokê jî bê. Bi heman rengê, divê ku mirov ji aliyê bav jî werênê ser ziman. Hinek baş weke ku her tiştî dizanin nêzîk dibin û biwê helbestîya xwe re gelek nezaniyên ku dikin,

wê hem têkiliyên xwe yên jin û mer di çavê zaro de xira bikin û hem jî wê têkiliya xwe û zarok jî xira bikin.

Li vir, divê ku mirov, hemû pêvajoyên pêşketina zarokê li dûv hevdû û di temenê hevdû de werênê ser ziman. Di pêvajoyekê de kêm pêşketin û ankû zirar dîtin, wê bandûra wê li pêvajoyên piştre jî bibê. Bo vê yekê, divê ku mirov ji destpêkê û heta hemû demên piştre jî bi awayekî bi plangerî û di jîyanê de birêxistin kirî û di gotinan ku mirov dizanê ku mirov çi wê bibêjê û hwd, divê ku mirov di çerçoveya jîyane zarokê de li ser wê bihizirê. Ji destpêka jîyane zarokê, ku mirov bişibihênê weke ´kevirê domîno´ bi pêvajoyên wê pêşketinê ên li dûv hevdû re wê rast bê. Dema ku mirov avahiyê lê dike, mirov ji qata binî destpê pê dike. Piştre qatên din ên li ser wê lê dike. Bi heman rengî, wê êdî li dûv hevdû pêşbikevin û werin. Dema ku tu qata binî ne dênê û baş û zaxm çênekê, wê qatên din jî, ne baş bin û temenê wan ne zaxm bê. Her wusa, zarok jî, bi pêvajoyên xwe yên pêşketinê de mirov dikarê bişibihênê vê yekê. Zarok, di vê çerçoveyê de bi pêvajoyên xwe yên pêşketinê re di navende germ, bi hêsta hêskirinê ku mirov di wê de xwediyê nêzîkatîyê ya û her wusa bi wê re ku mirov bi hevdû re xwediyê têkili û mejiyekî pirr baş civaknas a, wê rengekê jîyanê ê ku pêşketina zarokê baş bide dîyarkirin bê. Navenda jîyanî, civaknasiya wê û têkiliyên wê yên civaknasî, wê bandûra wê ji temen ve pirr zêde li pêşketina zarokê wê hebe. Her wusa di vê çerçoveyê de vê rewşê jî weke mijaraka pirr giring a ji destpêka pêşketina zarokê û heta pêvajoyên piştre re jî divê ku mirov, bigirîngî werên ser ziman.

Têgîna civaknasî, weke mijaraka giring divê ku mirov werênê ser ziman. Navendek jîyanî a malbatî ku xwediyê mejiyê baş ê civaknas a, wê temenê pêşketina zarokê bê. Her wusa, mejiyê civaknasîyê, li vir, bo pêşketina zarokê di temen de ku mirov werênê ser ziman, wê rast bê. Her wusa mejiyê civaknasiyê, bi têkiliyên mirov ên di nava mirov re wê bi bandûra wan re wê hebin. Bi wê rengê jîyane malbatî û her wusa rengê pêşketina têkiliyan bi mejiyê civaknasiyê, wê temenê pêşketina zarokê ji gelek aliyan ve biafirênê. Zarok, di destpêka xwe de dema ku pêşketina xwe dide çêkirin, li ser hêst û hîsan re wê pêşketina xwe dide çêkirin. Her wusa, aqilê civaknasî, bi wê re di temenê wê de hêstîyarî jî heya. Di vê çerçoveyê de di nava jîyanê de *aqilê civaknas* û *jîra hêstî* û hwd, wê di vê çerçoveyê de bi wan re temenê pêşketina zarokê werê afirandin. Weki din, ku mirov giringîyê nedê navend civaknasî bi aqil û têiliyên wê re wê piştre zarok, bi mejiyê xwe re ne civaknas bê. Wê di kirina têkiliyên xwe

de bikeve zorê. Heta ku wê ji danîna têkiliyan wê bi ravê. Ev jî, bi çend xosletan mirov dikarê werênê ser ziman ku zarok, wê bi demê re tenê bi xwe re bijî û dervî xwe ne xwestekbar bê ku têkiliyê dênê. Wê, ji mirovan biravê. Ev jî, ji ber nebûn û ne afirîna aqilê civaknas a bi têgîn û têgihiştina wê re. Di destpêka jîyane mirov de dema ku mirov li ser vê rewşa jîra hêstê a zarokê û ankû aqilê civaknasî ku mirov ne ponijê, mirov wê piştre rastî zaroke û ankû ciwanekê ku nexwezê têkiliyan dênê û di danîna têkiliyên xwe de ne serkevtî ya, wê derkeve li holê. Bo ku serkevti bê, divê ku miirov di destpêkê de temenê wê bi zarokê re dênê. Rewşa danîna têkiliyan û di wan de serkevtin, wê di bêşên jîyane zarokan a ciwaniyê de pirr zêde derkeve li pêşîya wan. Her wusa, divê ku mirov, vê yekê jî werênê ser ziman ku mejî bixwe jî di rewşên civaknasî de zêdetirî serkevtî ya. Mejiyê ku karibê bi xwe re jîra hêstî pêş bixe, wê di pêşxistina aqil û têkiliyên xwe de jî serkevtî bê. Divê çerçoveyê de mijara mazinkirina zarokê, wê weke mijaraka giring û ku divê ku mirov pirr zêde li ser wê bisekinê bê. Zarokên ku di jîyane xwe ya piştre de serkevtî na û di têkiliyên xwe de serkevtî na, zarokên ku xwe mejiyê civaknas û jîra hêstî ku di destpkê de bi wan hatîya pêşxistin a. Bi hîs û hêstan têkilî danîn, wê bi serê xwe rastîya mejiyê jîra hêstî bê. Bi vê jî, di temenê de divê ku mirov têkiliyên civaknasî bi aqilê wê re di temen de bihasibênê û werênê ser ziman.

Zarok, dema ku ji dayikê dibê, wê vala bê bi mejiyê xwe re. Her wusa, ew dema ku dibê, di mejiyê zarokê de xêvek ku rewş û gotin girtin di wê de hena, bibê. Nîşanaka vê jî, zarokeka ku yekhefteyî û ankû du hefteyî ku karibê xewnan bibînê, di xewnê de bigrî, di xewnê de weke ku bitirsihê û biveciniqê û rabê ser xwe bigirî û hwd, vê rastîyê piştrast bikin. Ev rewş, bi zarokê re hena. Di van rewşan de jî dema ku zarok, di rewşek bi vî rengî de ji xewê rabû û ankû di rewşa xwe ya asayî de ku ji xewê rabû, divê ku mirov bi zarokê dengên zêde bilind newina derxistin û bi wê nêzîkî zarokê newê kirin. Hin bi hin, di nav wê rewşê de li gorî derûnîya wê rewşê, bi dengê nerm û gotinên deng nizm, divê ku nêzîkatîyê bike. Dema ku zarokê çavên xwe vekir û li nava çavê dê û ankû bav xwe nerî, pirr giring a ku ew herdû jî bi rêdêneka biken, nerîna zarokê pêşwazî bikin. Divê ku hêsta xwe ya hêskirinê şanî zarokê bikin. Zarok, wê wê hîs bike. Zarok, herî zêde jî ji dayika xwe û bavê xwe wê nerînê dixwezê. Dema ku li wan nerî, dixwezê hêskirina li xwe bibînê û fahm bike. Her wusa ev rewşa zarokê, ne rewşek dembûhûrîner a. Rewşek mayînda ya ku zarok, wê piştre jî bide domandin. Dema ku

zarok mazin bû, pirr hatîya dîtin ku dema ku zaroka wê li wê hêrsbûya, pirr xemgîn bûya. Ji xamgînîyê zêdetirî, xwe kêm û tûna hasibandîya. Lê kengî dayikê nêzîkatî li zarokê da nîşandin û ew bi dilxweş û dil pêşwazî kir, wê zarok di xwe de bibê weke ´mîrê dil.´ Zarok, w hêstîya bûyîna mîr dil, pirr zêde dixwezê û ev hêst li ser derûnîya zarokê, ji ya ku em dizanîn bandûra w heya. Heta ku wê li ser vîna wê jî, piştre pirr zêde wê bandûra wê hebê. Hemû şiketinên piçûk ên ku zarok, di pêvajoyên zaroktiyê dijî, wê bandûra w li ser keseyet û vîna zarokê pirr zêde wê hebin.

Emê li jêr, zêdetir li ser wê bisekin in. Lê li vir, ez divê ku li ser gotina ”zarok harbûnîyan dike” bisekin in. Gotinên weke ”zarok harbûnîyan dike”, ”zaroka nahs”, ”zaroka li gotinê nahisênê” û hwd, w pirr gotin di demên berê de di nava civate kurd de hebûn. Her wusa, gelek dê û bavan jî, bêî ku di farqê de bin ku çendî li ser derûnîya zaroka wan bandûrkirîya li zarokên xwe xistina jî. Piştî wê lêxistinê, çendî ku hêsta xwe ya hêskirinê bidina nîşandin jî, wê cihê wê lêdanê ji holê ranekin. Ew, wê di pêvajoya pêşketina zarokê de weke bîrinekê wê hebe. Rewşên bi vî rengî wê hem temenê vîna şikeştî û her wusa hêrsbûyînên bêdem ku mirov di jîyane xwe didina dîyarkirin jî bin.

Di serî de li vir, rêbaza çareserîya vê rewşê çi ya? Divê ku mirov bi vê pirsê dest bi mijarê li vir bike. Hertimî dema ku zarokê kêmesîyek kir, li şûna ku mirov rûyê xwe li wê bi qirmiçênê û lê hêrs bibê, mirov bi zimanê hêskirinê û gotinên xweşik dikarê wê ji zarokê re werênê ser ziman û pê bide nîşandin ku ya rast û ya ne rast çi ya. Ji xwe, wê ev jî bê fêrek giring ji zarokê re. Zarok, tiştên bi vî rengî zû di aqilê wê de cih digirin. Bo vê yekê, giringa ku mirov, hertimî zimanekî çêker û baş, bikarbênê. Di aslê de mirovê ku zimanê çêker nikarê bi zarokan û axiftina bi wan re bikarbênê, weke pirsgirka wan ya zarokê jî mirov dikarê werênê ser ziman ku wan di zarokatîya xwe de ew ziman nedîtîna. Her wusa, rewşeka ku nedîtî, mejiyê wî mirovî, bikarnayênê. Çawa dîtîya, dixwezê ku bi wê re jî, nêzîkatîyê bidê nîşandin û ziman bikarbênê. Ev rastî, di aslê xwe de dide nîşandin ku mirov dema ku çawa di zarokatîya bi nêzîkatîyê re bibînê, mirov wê bi heman rengî piştre nêzîkatîyê jî bike. Di demên zarokatîyê ên pirr piçûk de jî ew nêzîkatîyên ku mirov dibînê, çendî ku mirov mazin bû, weke ku mirov wê ji bîr dike û ankû nayê bîra mirov û hwd, lê di aslê xwe de di mejiyê mirov ê binî de wê, ji binî ve nêzîkatîya mirov û tevgerên mirov bike ku bide dîyarkirin ku çawa **bin**.

Zarok, bi dengên ku ji zarokê bilind werin û ankû ji wan biveciniqê, divê ku nêzîkî zarokê newê kirin. Di vê çerçoveyê de hertimî di ahengekê de nêzîkî zarokê werê kirin û ev aheng ne rojekê di vê pêvajoya zarokê de were parastin.

Zarok, dengên ku dike, wan di xwe de baş êdî wê nas bike. Dema ku di ahengekê de û di derûnîyekê de û di dengekî de nêzîkatî hat kirin. Wê zarok, ji wan dengan sûdbigrê. Wê hin bi hin fêrî wan dengan bê. Bi wê re wê bi xwe re bigirê. Dengên u zarok di xwe de digirê, çendî ku weke dengê ku mirov derdixe jî bê, lê dema ku ew deng ji aliyê zarokê ve hat girtin, wê ji aliyê zarokê ve ew deng bê weke kifşkirinekê. Her kifşkirin, wê bê rastîyeka ezbûnîya zarokê. Her kifşkirin, wê piçekî din ezbûnîya zarokê bi xwe re biafirênê û werênê li holê. Bo vê yekê ev kifşkirinên zarokê bi afirîna keseyetîya zarokê bi pêvajoyên wê yên pêşketinê re wê pirr giring û jîyanî bin bo zarokê û pêşketina wê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku dengên ku nû bi hevnasîna zarokêê re ku werina çêkirin, ew jî, bi alikarîya dengên ku zarok nas dike ên weke yên dayikê û yên bav re dikarin werina kirin. Her wusa, di malekê de çend mirov bijîn, wê di wê dema xwe ya pêş de zarok bi dengê wan re hevnasînê bike weke dengê dê û bavê xwe. Di vê çerçoveyê de ahlê malê, hertimî di çerçoveya derûnîya zarokê de wê xwediyê wateyê bê. Zarok, vê yekê, pêşî bi xwe re kifş dike. Her wusa, nîşanaka vê jî, ew a ku dema ku zarok hinekî mazin dibê, ku dema ku ahlên mazin di rajihina wê û wê dihildin û bi wê re dileyizin û hwd, lê zarok, bertekên dijber ên weke girînê nadê nîşandin. Lê dema ku yekî ne ji malê bê, were malê û dengê xwe bikê li cem zarokê û ankû rajihê zarokê, wê zarok, bertekê bi girîyê xwe li hemberê wê bide nîşandin.Ji ber ku ev dibê weke rewşek ku zarok nas nekê.Bo zarokê, ev rewşa nenas, wê weke rewşa ku zarok, xwe bi wê re di ewlayîyê de nabînê bê. Ya ku wê di temenê wê girîyê zarokê ê di destê yê beyenî de wê ev rewş bê.

Li vir, dema ku mirov bahse pêvajoyên pêşketina zarokê bike, divê ku mirov bigirngî li ser pêvajoya pêşî a sê-heyvên pêşî bisekinê. Di vê demê de zarok, wê bidest nasîna dê û bav û hwdirdorê bike. Bi wê re jî, wê bidest nasîna mirovên li hewirdorê bike. Her wusa, bi vir ve girêdayî divê ku mirov werênê ser ziman ku Zarok, nerînên li lê dibin kifş dike. Bi wan nerînan re wê, têkiliya xwe pêş bixe. Minaq, dema ku dê û ankû bav, çavên xwe li zarok miç û bal bikin,, zarok w dibînê. Lê Zarok, w bersiva wê bide. Bi wê re jî wê zarok, bersivê bide waan miçûbalkirina çavan.Carna jî, wê weke wê bike. Ev jî, wê zarokê bigihênê têgîneka

serdest. Dema ku zarokê tiştek dît ku li berçavê wê hatina kirin, wê weke wan bike. Piştre jî, wêê dûbare bike. Zarok vê ji wan bigrê û dimejiyê xwe de qayd bike. Lê bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dema ku zarok çû ser şêş hefteyan û hinekî din jî mazin bû, zarok wê bixwe bidest kirina tevgeran bike. Ev jî, wê tevgerên zarokê bikin. Di pvajoya ku zarokê li dê û bav û dinerî û ew tevger digirtin, weke wan dikir. Bi vê yekê û rengê zarok xwe bi wan re hîs dikir. Lê piştre dema ku zarokê tevger kir û piştî wê tevgerê re dê û Bav weke wan tevgeran dûbara kir li berçav, wê ev wê têgînê bi zarokê re çê bike ku zarok li wan serdest a. Her wusa, bi vê yekê, wê zarok, êdî xwe mîrê dê û bav bibînê. Wê xwe weke yê ku weke wan dike û ew weke wê dikin wê bibînê.

Zarok, dema ku tevgerîyek kir û weke wê hat dûbare kirin û ankû dê û bav destê xwe li ser serê zarokê, piştre zarokê, hinarîkên zarokê û dengê zarokê re hanî, wê zarok, wê ji wê kirina xwe ya ku piştî wê re weke wê hatîya kirin, wê fahm bike ku ew dike kifşkirin ku dê û bav çi dikin. Di vê çerçoveyê de dêûbav, wê întîbayê bi zarokê re didina çêkirin. Zarok, di vê demê de piştî ku tevger naskirin û pê de, wê bidest darazkirina wan bike. Di aslê xwe de ev rengê dana kifşkirinê a zarokê a bi dêûbav re mirov dikarê ji wê daraza zarokê jî bixwenê.

Zarok, gotinên ku girtin û nasîn li ser wan re bi mejiyê xwe re da çêkirin, wê ev ji zarokê re temenê kirina darazê çê bikin. Her wusa, dema ku dayik zarokê di hilde li dest û zarok fahm dike ku wê dayik wê şîr bide, û li ser wê re jî êdî di hedinê û dikenê û ankû tevgerek din ya weke wan dike û hwd, wê di vê çerçoveyê de ev jî darazek bê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku daraza zarokê wê pêş bixe. Zarok, dema ku bigrî û piştî giriyê xwe re ew şîr hilde û ankû ew were pêşwazî kirin, wê zarok, girînê, di vê çerçoveyê de weke rêbaz û şêwaya dana kirinê a wê tiştê wê bikarbênê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku girîyê zarokê, weke zimanê wê yê ku ew bi wê tiştan bi dêû bavê xwe dide kirina jî. Zarok jî, piştî ku bû û piştre ne bi gelekî re wê ev jî, vê yekê biheman rengê fahm bike û di xwe wê êdî wê derxê têgihiştinê.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku zarok li ser tevgerên bi vî rengî re wê bide kirin. Her wusa, zarok, wê bi mejiyê xwe re her kirina pêşî ku hat kirin bi wê re û ya berî wê re wê têkiliyê dênê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê bi mejiyê xwe re têkiliyê di çerçoveya girîn û kirina tiştên ku piştî girînê re tê kirin wê dênê. Piştî ku

girî, bi zêdeyî dayik di cih de bo ku zarokê bi hedinênin û girîyê wê bidina birrîn, wê di cih de wê şîr bidin. Ev rewş, wê bi zarokê re di mejiyê wê re rûnihê. Zarok, li vir, di destpêkê de wê di nava girîna xwe û şîrdayina ku dayika wê li wê dike re wê têkiliyekê di mejiyê xwe de dênê. Ev têkilî jî, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku zarok, vê weke aliyê xwe serdest kirinê wê bikarbênê. Dema ku zarok hinekî mazin bû, dema ku ew tiştekî bixwezê û li gorî xwesteka wê newê kirin, w zarok di cih de bigirî. Wê bixwezê ku bigirîyê xwe wê tişta ku dixwezê bi dê û bav bide kirin. Ev rewşa zarokê, bi gelek minaqên me ev ceribandîya. Her wusa, zarokek ku di nava sê û çar hefteyan de ya, dema ku ji xewê di rabê, di cih de digirî, Di cih de weke ku ew dayika xwe û ankû bavê xwe de dixwezê. Lê bi pirranî, ji wî giriîyê wê zarokê tê fahmkirin ku ew zarok dayika xwe dixwezê. Ber ku dayik zarokê şîr dide. Ew rewşa şîr dayinê a zarok, wê weke mifteyekê û ankû weke ´şifreyekê´ di mejiyê dayikê xwe de xwe bicih bike. Wê zarok, bêhna şîr bike. Lê bi wê re zarok, wê nêzîkî dayikê bike. Zarok, dema ku ji xewê di rabê, carna çend mirov ku di rajihênê de jî wê nikaribin zarokê haş bikin û bihedinênin. Wê nikaribin, pêşîya girîyê wê bigrin. Wê piştre bavê wê were, wê di destê bavê xwe de weke ku haş bibê û girîyê xwe êdî nekê. Lê zarok, di wê demê de li dayika xwe digirihê. Dauik, di mejiyê zarokê bi heyîna wê, bêhna wê, bêhna şîrê wê û bi şîrdayina wê re hatîya rûniştin. Di vê çerçoveyê de wê zarok, vê yekê bi xwe re pêş bixe ku dema ku zarok ket destê dayikê de wê zarok were şîrdayin. Bo vê yekê wê zarok, piştre di destê bavê xwe de bidest girînê bike. Wê bi wî giriyê xwe jî dayika xwe bixwezê. Her wusa, divê çerçoveyê de girîyê zarokê, wê zimanê zarokê bê.

Di vê çerçoveyê de peyama ku zarok bi girîyê xwe de ew a ku dayika xwe dixwezê û dixwezê ku ew ji aliyê dayika xwe ve were şîrdayîn. Zarok, vê yekê jî bi girîyê xwe re kifş dike ku ew bigirîyê xwe tişta ku dixwezê bi wan dide kirin. Bo vê yekê, girîyê zarok, wê hertimî ji vê demê û pê de wê sedemeka wê hebe. Dema ku sanciya zarokê hebe ji zikê wê, dema ku deverekê wê biêşihê, dema ku biçî bibê û dema ku bixwezê ku bê hildan li dest û alaqayê ku ji wê re bidina nîşandin, wê bigirî. Di vê çerçoveyê de girîyê zarokê, wê rastîya dana kirinê a van rastîyan bi dê û bav bê.

Bi pirranî, weke rewşekê û întîbayekê ku wê dayik ten karibê zarokê haş bike û bihedinênê dema ku digirî. Her wusa, dema ku zarok digirî û dema ku dayikê ew hilde li dest, her wusa, wê zarok wê dayikê kifş bike

û wê di cih de bihedinê û wê dev ji girî berdê. Rewşa girînê a zarokê, di çerçoveya rewşa hoyandina zarokê wê li wê de divê ku mirov werênê ser ziman. Zarok li girînê dihoyê. Lê dema ku zarok, dengekî dervî wî girîyê xwe his kir û bihîst, wê ew hoyandina zarokê wê li girî, wê weke ji hevdû belav bibê. Zarok, di kêlîka ku deng dikê de wê weke bêhnê weke ku navberê bide girîyê xwe û wê bike ku fahm bike ku ew dengê ku ew hoyandina wê zarokê a li girî ji hevdû belav kir, wê bike ku fahm bike. Di vê demê de zarok, yan wê êdî negirî û yan jî wê êdî piştî ku rewş fahmkir, wê cardin bidest girîna xwe bikê. Di demên pêşî ên zarokê de wê bi zêdeyî, sedemên ku zarokê didina girîn, wê sedemên weke gasa zikê zarokê ku wê ne rehet dihêlê, birçîbûn û ankû hewldana xwe gihandina dayikê ya. Ev hewldana xwe gihandina dayikê, di temenê wê de hêsta ewlahiyê ku bi hêsta hêskirinê hatîya germkirin di temenê wê de ya.

.

**Bi pêvajoyên pêşketina zarokê re hin bi hin pêşveçûnên fizyolojikî ên zarokê û pêvajoya pêşî a ku zarok, dema ku xwe dilabitênê, hemû laşê xwe weke makineyekê bi hevdû re dilabitênê. ..**

Li pêşketina zarokê aliyê tevger, qarakter û nêzîkatîyê ve jî divê ku mirov hinekî li ser wê rewşa wê bisekinê. Zarok, dema ku ew hat dunyê û pê de, weke fêrek dêûbavikan ku wê çawa nêzîkatiyê li wê bikin a. Zarok, dema ku ew çawa nêzîkatiyê li wê were kirin, wê wusa mazin bibe û wê zarok jî, li gorî wê wan tevger, nêzîkatiyên ku ew li wê dikin, wê zarok tevger û kirinên xwe bide nîşandin. Zarok, çawa were rahiştin, şîrdayîn, nîşandin û muamele lê kirin, wê bi wê rengê mazin bibê. Her wusa, ev jî weke rewşeka ku pêvajoya pêşketina zarokê yan ji rê derdixe û yan jî şikeştinan di wê de dide çêkirina ku dêûbav û ankû hinek mazin nêzîkatîyan bidina nîşandin û piştre wan ne domênin. Ev jî, wê temenê ne rehetî û bêrewşîya bi zarokê re bê. Zarok, dema ku ew pirr nêzîkatîyan dibînê, di nava wan de weke ku ew pirr şaş dibê. Tevger, kirin û nêzîkatîyên ku ew ne di ahengekê de na û wê piştre carek din li zarokê newina dayîn nîşandin, bi teybetî ku mirov ji wan dûr bisekinê. Şaşbûna zarokê, wê li ser tevger, kirin û nêzîkatîyan, şîrdayîn û hwd re wê pirr caran bibê. Ya ku wê, hinekî zirerê bide zarok jî wê ev bê. Minaq, carna hinek dayik, bîberonê didina zarokê, bi wê re jî mijînkê dikina devê wê de û piştre jî wê ji singê didina mijtin. Ev rewş, wê pirr caran şaşbûnê bi zarokê re çê bike û heta ku car bi car dikarê bibê sedema ji şîr qûtbûna zarokê jî. Zarok, di nava wan hersê rewşan de şaş dimênê.

Zarok, di destpêkê de çawa li wê nêzîkatî, kirin û tevger hatina kirin, ew divê ku di ahengekê de bi zarokê re werina domandin. Li ser wê re, demên ku zarok piçûk û hinekî mazin dibê, li şûna ku mirov weke dêûbav li wan tevger, kirin û nêzîkatîya zêde bike, wan pêşbixe û berfireh bike. Zarokê, di vê demê de ji dengên bialoz, rewşên ne aram û nêzîkatîyên bêrewş dûr bigirê. Li vir, di dewama wê de divê ku mirov werênê ser ziman ku dema ku mirov, heta ku zarokê fêrî razandina di nava axiftina mirovan de jî bike, wê wusa fêr bibê û piştre dema ku ew razîya û ankû di xewê de bê, ku dengê axiftina mirovan herê wê jî wê zû bi zû ji xewa xwe ya şêrîn nerabê. Di dema wê de birina ser cihê wê û razandin, fêrkirina spaskirinê kirin dema ku ew ji ser sofreya xwarinê hat rakirin û ankû hat dayîn rûniştandin. Fêrkirina gûhdarkirina li dêûbav, wê temenê pêşketina wê mazin bê. Her wusa fêrkirina xwandinê, hisandinê û nîşandina nêzîkatiyên rast li derve. Dema ku mirov li cem zarokê, bi gotinên çîre û ankû ên weke sêf bi hevdû re biaxifê, wê zarok jî fêrî wan bê. Fêrkirina zarokê ku ew şaş a, wê zarok jî wê bi wê rengê fêr bibê. Zarok, wê ji aliyekî rastîya jîyane mirov û aqilê mirov jî bê bi ast û pîvana mirov wê re. Her dêûbav dixwezin ku ew ya rast bi pirranî bidina zarokên xwe. Di nava kurdan de weke gotinaka xalkê de heya ku ew dibêjin ku «ti kes, naxwezê ku kesek ji wan çêtir bê ji zaroya wan û pê ve.» Bi vê gotinê qadrê zarokê li cem dêûbav dihênina ser ziman. Rengekî din ê vê gotin jî, bi vê rengê tê gotin ku «dêûbav, dixwezin ku hertimî zaroka wan ji wan çêtir bê.» Bi vê, ya ku mirov dibînê ew a ku mirov zarokê çawa mazin bike wê wusa fêr bibê û mazin bibê.

Fêrkirina zarokê, wê pêşî li ser nêzîkatî û nîşandina li wê ya tevgera re wê bibê. Minaq, dema ku dayikê rahişta zaroka ku ew şîr bide û dema ku ew şîr bide û dayik xwe di cihê xwe de bihejênê, wê zarok fêrî wê bibê û wê xwe li wê nêzîkatiyê bihoyênê. Piştre jî, dema ku dayika wê rahişta zarokê û ew da ber singa xwe ku wê şîr bide û dayikê weke carên pêşî xwe dicihê xwe de ne hejand, wê zarok şîrkirinê ji singê nexwe. Ber ku ew fêrî wê rewşa dema ku ew di destê dayika xwe de ku ew şîr dixwe û dayik xwe di cihê xwe de dihejênê.

Zarok, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku fêrbûna zarokê a di hefteyên wê yên pêşî de wê li ser tevgeran re bê. Bo vê yekê, tevgerên ku zarok wan li xwe dibînê, wê xwe li wan bihoyênê û li gorî wan bike bijî. Weke ku çawa ku zarok, di hefteyên xwe yên pêşî de ku ew li gorî bêhn û dengê dayikê xwe dihoyê bi nasîna wan re wê bijî. Her

wusa, weke rewşa sêyem a li wê wan rewşên weke bêhn û dengê dayikê, wê tevger û awayê tevgeran jî bê.

Zarok, van rewşan baş di mejiyê xwe de qayd dike. Piştre jî dema ku zarokê ew tevger dîtin û bi wan re dem derbas kir, wê piştre jî wusa bixwezê. Ev nêzîkatî, wê bina mifteyên têkiliyê ên zarokê jî. Zarok jî, dema ku were hildan li dest, wê wan tevgeran bixwezê. Dema ku ew hat şîrdan, ku ew di carên pêşî de çawa dihat şîrdan, wê heman nêzîkatiyê bixwezê bo şîrdayînê.

Gelek dayikên ciwan, dema ku zarokên wan nû hatina dunyê û piştre dema ku ew li wan dinerin û mazin dikin, di wê demê de nêzîkatiyên wan ên li zarokê, divê ku ew bizanibin ku wê zarok wan nêzîkatîyan piştre jî weke wan bixwezê. Dema ku zarok, bê fêrkirin ku ew di nava rewşek pirr bêdeng de were razandin û bi wê were fêrkirin, piştre dema ku ew zarok, hat razandin, wê bidengek piçûk û nizm jî wê şîyar bibê.

Pirr giringa ku dema ku dêûbav dirajina zarokê li dest, rehet bin û di rewşek asayî de bin. Her wusa, bi wê re weke zarokê li ser nêzîkatîyên xwe re wê fêr bikin. Her dema ku zarok girîya û ew hildan li dest û ankû hejandin, wê piştre wê heman reşwê dûbare bixwezê. Bo vê yekê, wê di destpêkê de çawa li zarokê nêzîkatî were kirin, divê ku dûbav li wê serwaxt bin û bizanebin. Divê ku bizanebin ku zarokên hir ku ew di rewşa xwe de heta ku ew mazin dibin û zarokên ku har dibin û hertimî harbûnîyan dikin jî, wê ji nêzîkatiyên dêûbav biafirin û derkevin. Zarok, bixwe wê fêr nakê. Zarok ji nêzîkatiyên dêûbav wê fêr dike. Her nêzîkatîya dêûbav a li zarokê, wê weke mifteya nêzîkatîya zarokê bê. Zarok, wê piştre jî li ser wan nêzîkatîyan re wê xwe mazin bike.

Bo vê yekê, divê ku mirov werênê ser ziman ku temenê tevger û eferêndîyên zarokê di destpêkê de wê werin avêtin. Zarok, wê piştre li ser wan re mazin bibê. Di vê çerçoveyê de li ser nêzîkatîyê, kirin û tevgerîyê re bi nêzîkatîyeka qarakterîstîkî nêzîkatî dan nîşandin, wê her wusa bandûra wê li pêşketina zarokê bê. Dema ku zarok, di hefteyên xwe yên pêş de bi dengên qalabalix ew hat mazin kirin, wê ev temenê ne sekinîna zarokê a piştre jî bê. Her wusa çawa were fêrkirin, wê zarok bi heman rengê were fêrkirin.

Li vir divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, di van demên xwe yên pêşî ên weke yên hefteyên pêşî de wê zarok, bi vê rengê nêzîkatîya li wê pirr bizanebûn were kirin. Piştre jî, di dewama wê de hefte bi hefte dema ku zarok mazin dibê û gûharîn û pêşketinê bixwe re dide çêkirin, wê bi wê nêzîkatîya pêşî a li zarokê re di ahengekê de wê

nêzîkatî were dayîn nîşandin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê di dewama wê de êdî wê di vê çerçoveyê de wê pêşketina wê li ser temenekê were dayîn kirin. Zarok, piştre jî, dema ku ew demê dibûhûrênê, wê nêzîkatîyên ku wê pêşî dîtina wê wan nas bike. Her wusa, nêzîkatîyên di aramiyê de û hir, wê zarok, di wê çerçoveyê de wê xwe bi tevger û kirin bike. Zarok, li vir, hiper-aktivîya wê, wê di vê çerçoveyê de wê ew tevgerên wê ji nêzîkatiyên dêûbav bin. Li vir, ew rewşa tevgerî a zarokê, bi mejiyê zarokê re ku mirov wê bide çêkirin û her wusa di jîyane xwe de ku ew mazin bû, hin bi hin ku ew xwediyê tevger, kirin û nêzîkatiyên baş bê. Di awayekî rast û baş de mazin kirina zarokê, wê bidest dayikê bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dêûbav, bo wan giring dibê ku ew dema ku zarokê mazin bikin, xwe baş bi wê bidina naskirin û xwe li wê bidina hisandin.

Dêûbav, wê çawa xwe li zarokê bidina hisandin û wê zarokê bi tevger, kirin û nêzîkatîyên xwe re bidina mazin kirin, wê temenê wê di destpêka mazinkirina zarokê de wê were avêtin. Bo vê yekê, giring a ku dêûbav, li vê rewşa zarokê heyîder bin. Her wusa, nêzîkatîya dêûbav a li zarokê, bi nêzîkatîya di nava wan de jî wê di mejiyê zarokê de rûnihê. Dema ku ew li hevdû ne hisênin û gotina hevdû neyênina li cih, wê zarok jî, vê yekê ji xwe re weke mînaq bigirê.

Weke nêzîkatîya rast a mazinkirina zarokê, ku dêûbav bi gotinên baş karibin xwe li zarokê bidina hisandin. Her wusa, zarok jî ku ew li wan bihisênê. Dema ku wan ji zarokê re gotin got, ku zarok li wan bihisênê.

Bi wê re divê ku dêûbav, nebêjin ku emê nêzîkatiyê li zarokê bidina nîşandin û ew piştre wê jibîr bike. Her nêzîkatîya ku wan li zarokê da nîşandin, wê zarok, piştre bi heman rengê, wê nêzîkatiyê ji dêûbavê xwe jî bixwezê. Carna, hinek mêhvan dema ku ew tên malê û bo ku ew hêskirina xwe bidina nîşandin ku ew dirajina zarokê li dest, zarok, wê piştre wê dengê nas bike. Wê şêwayê girtina wan nas bike. Piştî ku ew çûn, wê zarok weke ku bêxûy wê bibê. Sedema wê, ew a ku ew zarok, dema ku ew mirov li wir bûn û bi şêwayê ku wan rahiştiyê de wê di mejiyê xwe de qayd kirîya, wê zarok, wê êdî wê rengê rahiştinê û nêzîkatiyê piştî wan re jî bixwezê. Lê dema ku ew wê nabînê, wê piştre bêrewşî bê û weke ku nexweş bibê. Wê bidest girî bike. Heta ku ew piştî wê rewşê re fêrî dayika xwe û rengê rahiştina wê ji nû ve newbê, wê ew bêrewşîya zarokê wê bidomê. Zarok, fêrî rengê rahiştinê, nêzîkatiyê, tevger û kirinê a li xwe dibê.

Di van demên xwe yên piçûkatiyê de zarok, wê li ser dîtina şêwayê tevger, kirin û nêzîkatîyan re wê fêrî wan bibê. Her wusa, bi rewşa wan re tevger, kirin û nêzîkatiyên biaram, hir û di rewşa xwe de mirov divê ku şanî zarokê bide. Zarok, dema ku wan dibînê, wê bi wan re mazin bibê. Wê wan nêzîkatîyan, weke nêzîkatîyên rast, wê bi xwe re qayd bike. Tevger, kirin û nêzîkatiyên bêrewş û ne di aramiyê de na, wê bi heman rengî di mejiyê zarokê de cih bigirin û wê li ser wan re zarok di pêvajoyên xwe yên piştre de wê, wusa bê xwediyê tevger, kirin û nêzîkatiyan. Nêzîkatiyên ku pêşî zarok wan dibînê, wê wan tenê di mejiyê xwe de qayd bike. Piştre wê bidest li gorî wan tevbiergirê. Lê piştre, wê zarok, hin bi hin wan nêzîkatî, tevger û kirinan derxê têgihiştinê. Ev jî, di pêvajoyên zarokê ên pêşketinê de ku ew mazin dibê de wê bibê.

**Zarok**, di hefteyên xwe yên pêşî de dema ku digirî, çendî ku carna weke ku ji ber êşa zikê xwe jî wê girîyê dike jî, lê dema ku dengek kir û ew hoyandina zarokê a li girî hat şikandin, wê zarok, wê dev ji girîyê xwe berdê. Ev rewşa zarokê, wê li ser hiskirina deng re bê. Zarok, di vê pêvajoyê de ji ber sedemên weke êşa zik û birçîbûnê û hwd, wê bigirî. Lê zarok, dema ku ket pêvajoya xwe piştî şêş hefteyan de wê êdî zarok, wê girîyê xwe derxê têgihiştinê. Her wusa, wê bo xwe gihandina dayikê û ankû bo ku zarok tişta ku dixwezê bide kirin, wê êdî wê girîyê xwe bikarbênê. Zarok, di vê çerçoveyê de li ser hîs û ajoyê re pêşî bi hêst tevdigerihê. Lê piştre wê zarok hin bi hin, ku ev rewş di temen de na, wê hişkirinê bi xwe re pêşbixe.

Girîyê zarokê, di pêvajoya destpêkê a zarokê de wê zarok, di vê çerçoveyê de wê bigirî. Her wusa, carna di xewna xwe de heya bigrî. Di nava xewna xwe de wê weke ku bidest girî bike û weke bi kêlîkekê bigrî û piştre bixwe bisekinê û xewe xwe bidomênê.

Girîyê zarokê, weke rêyeka xwe parastinê a wê jî ya. Dema ku zarok, rastî tiştekî ku ji wê bi tirsihê jî, wê bigrî. Her wusa di vê çerçoveyê de wê zarok, rewşekê bi xwe re bide nîşandin. Lê bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê di vê demê de bi zarokê re wê tevger pêş bikevin. Zarok, wê êdî tevgera pêş bixe. Dema ku li ser wan tevgerên xwe re zarok, were pêşwazî kirin bi hêsta hêskirinê, wê zarok, wê tevgerê bi wê re di mejiyê xwe de kifş bike. Her wusa, ev rewşa li ser tevgerên zarokê re ew pêşwazî kirin û ew hêskirin, wê temenê zû axiftina wê jî bê. Zarok, minaq, dema ku dê û bav li ber wê çavên xwe miçû bal bikin û zarok jî, wê dûbare bike, wê wusa wê wergerênê bigotin kirinê jî. Rakirin

û danîna birhan li xwerê û hildana li banî, wê di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring bê.

Giriyê zarokê, her wusa, wê bi demê re dawî li wê newê. Rewşa girîyê zarokê, piştre ku zarok hinekî mazin jî dibê, wê zarok girîyê xwe weke çekekê bikarbênê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê girî berteke zarokê bê. Zarok, bi nasîna tevgerîyan re wê zarok, were û tevgeran derxe li pêş. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi rêxistinkirina dengan weke gotinan û hwd, wê hin bi hin pêş bikeve. Zarok, temenê axiftinê di aslê xwe de hê ku di zikê dayika xwe de ya bi wê heya. Ji aliyê mejî, xêv û her wusa girtîna di xêvê de ev temen heya. Lê piştî ku hat dûnyê û pê de, wê bi rewşên jîyanê re zarok, wan girtinên xwe pretîze bike. Wê bike kirinê de. Di vê çerçoveyê de wê zarok, êdî temenê afirina bi dengî wê derxe li pêş. Zarok, dengên ku ji dê û bav digirê û ankû ji hewirdorê digirê, wê zarokê pirr baş bicerb bike. Gotinên ku piştre zarok bi wan diaxifê, wê gotinên ku zarok wan bicerb kirina bin. Di vê çerçoveyê de gotinên zarokê, ên ziman hena. Zarok, temenê zimanê dayika xwe hê di zikê dayika xwe de bi xwe re daya rûniştandin. Her wusa, dema ku em dibêjin zimanê dayikê, ne tenê di çerçoveya ku dayikê wê zimanê diaxifê de wê gotinê dibêjin. Her wusa, di zikê dayikê de zarok dema ku wê pêşketinê bi xwe re dide çêkirin, di wê çerçoveyê de jî wê gotinê bi temenî dibêjin. Zarok, wê her wusa, pêşketina xwe ya ku ew di van demên xwe pêşî de dike de wê zarok, li ser wê temenê hevnasînê re wê bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, di vê dema xwe de pirr zêde hîper-aktiv a. Her wusa, zû pêş dikeve. Zû digirê. Mejiyê zarokê, di vê demê de wê li ser hevnasînê, fahmkirinê û piştre kirina axiftinê re wê bi pêvajoyî wê pêş bikeve. Em li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku weke ku me li jor hanî ser ziman wê girî, weke rengê pêşî ê axiftin û têkildanîna zarokê a bi derve bê. Zarok, li ser wê temenê wê hinekî pêş bikeve û wê fahm bike ku ew bi girîna xwe re ancamê bidest dixê. Bo vê yekê, wê hertimî bo ku ya ku ew dixwezê bibê, wê bigirî. Lê di vê navberêê de jî wê zarok, bidest fahmkirinê bike. Wê herkirina xwe ya ku ew dike, wê piştre bi wê kirina mirov a bi wê re wê têkiliyê bi wê re dênê. Dema ku zarokê kirinek kir û dema ku kirinek beremberê wê ji dê û bav di çerçoveya weke nêzîkatîya pejirendina wê kirina xwe dît û ankû kifşkir, wê li ser wê re di mejiy xwe de wê bicih bike.

Derûnîya zarokê, di vê dema wê ya pêşîka a ji dayikê bûnê de wê bi ya dayikê ve girêdayî û li wê hoyandî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê bi bêhnê ve li dayikê hoyandî bê. Her wusa, di vê demê de zarok, wê bi dayik û bav ve girêdayî bê. Bo vê yekê, hebûna dê û bav bi hevdû re bi zarokê re wê bo pêşketina zarokê, wê giring û dîrokî bê.

Zarok, di vê pêvajoya xwe de bi dunya ku hatîyê de hevnasînê dike. Li ser wê hêsta hevnasînê re wê li dûnyê binerê. Hevnasîna pêşî bi dayikê û piştre bi bav re dike. Piştre bi hewirdorê re dike. Li ser wê re jî, piştî ku hat dunyê, wê li ser biyên xwe û ankû hîsên xwe re wê bike ku kifş bike. Bêhnkirin, naskirin û dîtinê wê pêş bixe. Li ser van hersê rewşan re wê êdî hêstên ku ew hîs dike bi zarokê re wan nas dike. Hêsta xwe hewla hîs kirinê, fahmkirina xwarinê û ankû şîrdayînê, nerîn û hisandinê wê hin bi xwe re pêş bixe. Her wusa, wê tiştên ku bi ber nerîna wê dikevin, wê pirr li wan heyîder bê. Wê li ser wan re dîtinê û hisandinê û ankû bihîstinê kifş bike. Li nerîna li wêneyekê û ankû dîmenekî û li helbestekê bi dengî hisandin û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê êdî bi zarokê re bibê. Zaarok, wê bi wê re jî weke ku dema ku birçî dibê, singa dayika xwe dixwezê ku şîrê wê bixwe, wê hêsta xwestinê kifş bike. Piştî ku zarok birçî bû û bidest girî kir, wê hinekî jî vê rewşê bi xwe re salix bike û werênê ser ziman.

Zarok, piştî ku hat dunyê û pê de, di nava malbatê, bi hevdû re bûyîna dayikê û têkiliya wan ya bi hevdû re wê pirr zêde bandûrê li ser zarokê bike di sale wê ya pêşî de jî. Her wusa, bo vê yekê giring dibê ku bi hevdû re tevbigerihin û bikin û bi wê hêstîyarîya bi hevdû re hêst û hewlahîya di nava malbatê de bi wê bidina hîs kirin. Nêzîkatîya dê û bav, wê zarok wê nas bike. Bi demê re wê dê û bav, weke rastiyeka ku zarok xwe bi wê di ewlehiyê de hîs dike, wê xwe bide dîyarkirin. Zaroka ku pêşî dike ku dunya dora xwe kifş bike, wê pêşî wan li ser dê û bavê xwe re bike. Ev rewş, li vir, giring dibê ku mirov wê bi teybetî hilde li dest û fahm bike.

Rewşa fahmkirina zarokê a fahmkirina dunya derve, her wusa, wê ji destpêka bûyîna zarokê ve destpê bike. Zarok, di vê demê de dike ku hewirdora xwe nas bike. Wê nasîkirina pêşî li ser dayikê re wê bike. Her wusa, piştre dinava malbatê de wê vê rewşa fahmkirinê pêş bixe. Zarok, bi girêdana bi dayikê ve wê, bi wê re hin bi hin pêşketinê bi xwe re bide çêkirin. Wê li ser wê rewşa zarokê a bi dayikê û bêhna wê re wê vê rewşê bi xwe re pêş bixe. Li vir, divê ku mirov di dewama wê de vê yekê jî

werênê ser ziman ku zarok, wê rewşên ku dibînê, wê pêşî li ser bêhna dayikê re wê xwe di nava wan de bi ewla hîs bike. Rewşên ku zarok bi dê û bav re di navê de bidest jîyanê dike, wê zarok, wan rewşan hin bi hin derxê hiş kirinê.

Mejiyê zarokê, wê ji wê re bimêyla ku wê bi dîtin, dengkirin û her wusa destlêdana biyên zarokê re ku bi wan hîs dike. Her wusa bi wan re digirê. Li ser wê re jî wê zarok, hin bi hin bi hewirdorê re hevnasînê bike. Rewşên ku pêşî zarok di nava wan de dijî, zarok, wê li ser dayikê, bêhna dayikê û her wusa heyîna wê ya ku ew bi xwe re hîs dike re wê, bi wê hilde nava xwe. Pêvajoyên jîyane zarokê ên destpêkê wê pirr giring bin. Divê ku mirov wan pêvajoyan bi teybetî hilde li dest û fahm bike.

Her wusa, divê ku mirov werênê ser ziman ku weke ku çawa zarok, bi heyîna wê ya di zikê dayika wê de re wê zêhnê wê jî bidest pêşketina xwe bike, bi wê re jî wê piştî bûyîna wê ya ji dayikê, wê êdî li ser wê re pêşketinê bijî. Zarok, li vir, divê ku mirov werênê ser ziman ku xwediyê temenekê ku wê li ser wê re piştî ku bû û ku wê pêşbikeve bê. Her wusa zarok, di vê çerçoveyê de giring a ku mirov divê ku wê baş fahm bike û hilde li dest.

Zarok, bi wan benên fizyolojikî û derûnî ku ew bi wan bi dayikê ve girêdayî ya, wê bi wan re hin bi hin pêşketina xwe bijî. Derûnîya zarokê, di vê dema wê ya pêşî a piştî ji dayikbûnê de wê, temenê pêşketina wê ya giring a li jîyanê bê. Zarok, wê têkiliya derûnî, wê pêşî, bi dê û bav re dênê. Di aslê xwe de ev rewşên derûnî, divê ku mirov wan bi teybetî hilde li dest. Ber ku zarok, wan dijî û zarok, bi jîyankirina wan re wê di mejiyê xwe de hin bi hin ji wan bidest girtinê bike. Li vir, têkiliya wê derûnîyê û navenda malbatî û hwd ku zarok di navê de mazin dibê, wê bi bandûra wê re li ser pêşketina mejiyê zarokê pirr zêde hebe. Her wusa, gelek tiştên ku zarok, wan di nava malbatê de dibînê, wê bi demê rê wê, ber ku dayimî bi wan re dijî û dibînê û ankû deng dike û hwd, wê di mejiyê wê de cih bigirin. Her wusa, dubare di nava malbatê de wê zarok, wê rewşê baş bijî. Zarok, rastîya ku ew wê pirr baş li ser wê re hin bi hin hişkirinê bike. Li vir, ew derûnîya pêşî a zarokê ku em divê ku weke benekî têkiliyê ê bi hewirdorê re jî ku divê ku werênina ser ziman wê zarok, wê li ser wê benê re peresendineke li pêşxistina hişmendiyê a bi xwe re wê bike. Li vir, em dikarin, navê wê derûnîya zîz a zarokê, her wusa weke navê pêşketina aqilê zarokê jî lê bikin û werênina ser ziman.

Zarok, li vir, wê benê derûnî, baş bi xwe re dide pêşxistin. Ew ben, rastîyeka jîyane malbatî di temenê wê de heya. Zarok, bi wê ve girêdayî

ya. Zarok, weke ku çawa di dema ku di destpka bûyîna xwe ya ji dayikê de wê bi bêhna dayikê, wê wê hîsa ewlahiyê ya bi xwe re bide pêşxistin, bi heman rengî, piştî ku hin bi hin jîyankir wê zarok, wê benê derûnîyê ku carna bi kirinên dûbara re jî xwe dide dîyarkirin, wê êdî werênê ser ziman. Em dikarin, wê pêvajoya pêşî a wê dema ku zarok bi derûnîyê û benên wê re bi dê û bav re girdana xwe xort dike jî bi wê pêvajoya pêşî ku zarok bi bêhnê û hwd re têkiliyê didênê re werênina ser ziman. Bêhna dayikê û piştre dengê dayikê wê, bi zarokê re bicih bibin. Zarokek ku hê heyve xwe ya pşî tişî nekirî, dema ku dengê dayika xwe dike, wê bi wê dev ji girîyê xwe yê ku dike berdê. Her wusa, bi wê re jî, di temenê wê dengê û bandûra wê de jî wê bêhna şîrêdayikê ê ji wê jî wê hebe. Her wusa zarok, vê yekê bi awayekî pirr baş bixwe re dijî. Li ser wê re zarok, xwe di ewlahiyê de dibînê û hîs dike. Zarok, di heyve xwe ya pêşî de jî ew, dema ku destê hineke dervî dê û bav bigihijina wê û ankû ew ji wan destlêdanan biêşihê, wê di cih de bidest girî bike. Girîyê ku zarok, di vê rewşê bikê, wê ji girîyê ku dema ku zarok yan birçîya û yan jî binxwe şil kirîya û hwd, wê ji wê cûdatir bê. Li vir, weke ku hinekî li jor jî hanî ser ziman, em divê ku werênina ser ziman ku zarok, dema ku mirov li dengê girîyê wê heyîder bê, mirov wê kifş bike, wê gelek rengên girînê di nava girîna xwe de bide dîyarkirin. Cûreyên girînê, her wusa, mirov ji wan dikarê rewşa zarokê jî baş fahm bike. Carna, mirov dikarê vê ji wê fahm bike ku dema ku zarok, digirî ya  deverek wê diêşihê û yan jî doza şîrdayînê û hwd dike ji dayikê.

Ev pêvajoyên zarokê, wê zarokê pirr zêde pêş bixin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok girînê weke rêya xwe hanîna ser ziman bikardihênê. Bi wê re jî zarok, girîna xwe, di vê çerçoveyê de weke rêya xwe serdest kirinê jî bikardihênê. Bi teybetî, di pêvajoyên piştre ên zarokê de dema ku zarokê dît ku dema ku her girîna wê, tişta ku ew dixwezê dihê kirin, wê di vê çerçoveyê de zarok, vê girîna xwe êdî bo vê yekê bikarbênê. Wê bo danakirinê wê bikarbênê.

Pêvajoyên piştre ên zarokê, wê zarok di wan de di vê çerçoveyê de wê pêşketina xwe bide jîyan kirin. Li vir, divê ku mirov vê jî werênê ser ziman ku di dewama pêşketina zarokê de wê di demên  wê yên piştre de wê zarok, hin bi hin hişmendiyê bi xwe re pêş bixe. Pêvajoya destpêkê a ku zarokê li ser bêhnê û dengên weke yên dayikê wê dijî û ku piştre li wê heyîna derûnîyê ya navendî û ankû malbatî û hwd li wê zêde dibê, wê êdî di pêvajoyên de li ser wê têgîna derûnîyê re wê hişmendî pêş bikeve û wê li wê zêde bibê. Hişmendî, li ser fêrbûna ziman re wê bi zarokê re pêş

bikeve. Li vir, dema ku em bahse ziman bikin, em divê ku li vir vê yekê binî xîz bikin ku ziman, gotinên wê, wê ji gotinên ziman zêdetirî û bêhtirî di mejiyê zarokê de xwediyê wate û heyînekê bin. Her wusa mejiyê zarokê, bi vê re rewşan dijî. Di vê çerçoveyê de zarok, ji xwe dema ku ji dayikê dibê, bi wê re temenekî zimanî heya. Lê bi rewşan re û li ser rewşan re ku salixkirina gotina re wê êdî hişmendî û zêhnê zarokê ê jîyanî û civaknasî wê xwe bide dîyarkirin û pêşxistin. Ya ku mirov di serî de bi gotina ziman re werênê ser ziman wê ev bê.

Ziman, wê li ser rewşan û salixkirina wan re wê bi zarokê re bicih bibê. Bikarhanîna gotina, di aslê xwe de dihê wê wateyê ku zarok, bi hişmendî dikarê gotinê biafirênê û werênê ser ziman. Destpêka bikarhanîna gotinan a zarokê, wê wateyên wê yên giring wê hebin. Wateya wê ya pêşî, wê li ser fahmkirin û salixkirinê re wê bibê. Bi wê re wê li ser hişmendiyê re bê. Zarok, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ew pêvajoya wê pêşî ya sale pêşî ku di wê de zêde nikarê biaxifê û carna heta salekê weke ku dike ku biaxivê, wê ev pêvajo, ne tenê biheyîna gotinên ziman ve girêdayî wê hebê. Her wusa, hinek fektorên din jî, bi vê ve girêdayî mirov dikarê werênê ser ziman. Fektora pêşî, ya li gorî wê zimanê di devê mirov de ku bike formekê de ku karibê bikarbênê ya. Her wusa, fektora duyem jî, ew a ku bi wê re mejî xwe ji axiftinê re amede bike ya. Lê li vir, fektora pêşî, girîngîya wê zêde heya. Li vir, çendî ku ziman, hesan bê, wê zarok, zûtirîn karibê qirikê û ziman li gorî zê bide awa û ankû reng kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ziman, di vê çerçoveyê de dema ku mirov wê şîrove bike, divê ku mirov bi sêkoşeya mejî, qirik û ziman û her wusa ya gotinan re wê hilde li dest. Di vê çerçoveyê de ziman, benên wê yên fizyolojikî ku girêdayî hena, wê li ser keseyetîyê û her wusa derûnîya wê re wê aliyna derûnî wê biafirin. Di vê çerçoveyê de em divê ku vê derûnîya vê rewşê jî weke derûnîya axiftinê binav bikin û werênina ser ziman.

Derûnîya ziman, di temenê wê ben, têkilî û her wusa girêdanên bi mejî û laş ve girêdayî di temenê wê de hena. Di vê çerçoveyê de ev jî, wê rewşa zarokê bi xwe re di çerçoveyek hişmendî de weke kirdeyekê werênê li holê. Zarok, di nava wê têkiliya ziman, laş û mejî de weke kirdeyekê ya. Her wusa di vê çerçoveyê de wê biafirênê bi mejî re. Lê bo ku ew afirandin, were hanîn li ser ziman, divê ku laş li gorî w were qaymgirtin. Piştre jî, gotinên ziman, bi rewşê re werina salixkirin û qaydkirin di xêva mirov de. Di vê çerçoveyê de wê ev rewş, temenê

axiftina zarokê bi xwe re biafirênin. Laşê zarokê, di destpêkê de pirr zêde ji aliyê fizyolojikî ve nerma ku dikarê xwe li gorî rewşê biadilênê. Ev rewşên adilandina qirikê, ziman û hwd, wê di vê demê de wê bibin. Lê adilîna qirikê û ziman, di vê pêvajoyê destpêk bi wê re dibê. Wê piştre, bi fêrbûna ziman re wê bi zêdebûna gotinan re wê êdî xwe zêdetirî bike wê qaysa li gorî axiftinê a li gorî wan gotinan. Her gotin, wê qaysakê wê bi xwe re bide çêkirin. Weke ku çawa ku dema ku mirov tîpekê dibêjê mirov bi deng derxistinê re dev û zimanê xwe tênê xwere û ankû banî û bi wê re bi awa dike, wê di vê çerçoveyê re rastîya qaysgirtinê wê xwe bide dîyarkirin.

Zarok, her wusa, bi dengê ku dikê re wan bi xwe re digirê. Bi fêr, azmûn û cerbê wê zarok, her wusa dengê xwe çê bike. Zarok, dema ku digirî, dema ku mirov hinekî li ser dengê girîyê biponijê, mirov wê kifş bike ku weke hinek dengên tîpî jî derdixe. Ew dengên ku zarok wan derdixe weke ´b´, ´p´, ´m´, ´n´, ´g´, x´ û hwd, wê her wusa hebin. Carna jî zarok i dengê weke ´m, a-h, e-h´ û hwd, digirî. Lê ev deng, wê, piştre di pêvajoyên din ên demên wê yên mazinbûnê de wê dema ku ew bileyizê û hwd de jî wê derbixe. Zarok, li hesanê piştê dirêjkirî, dema ku xwe di labitênê, wê hemû laşê wê bi zik, dest û lingên wê re wê bi hevdû re bilabitin. Her wusa, zarok, weke ´motorekê´, wê bi vê rengê di çerçoveyek giştî de wê xwe bilabitênê. Her wusa, zarok, wê laşê xwe li hevdû bikişênê li hevdû weke dema ku di zikê dayikê de ya. Her wusa, lê dema ku gaza wê hebe, wê xwe rast bike bi laş û lingên xwe re. Ev, weke nîşanaka ne rehetîya wê ya.Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê zarok karibê, xwe ji hesanê piştê bi qûlibênê li ser zikê xwe ve. Di vê çerçoveyê de zarok,, dikarê xwe weke bangorekê bixindirênê.zarok, di vê demê de yanî di pêvajoya hersê heyvên xwe yên pêşî de wê, pirr zêde rehet bê, dema ku weke ku di zikê de dayikê de ku lingên wê bi zikê wê ve na. Her wusa, zarok, hê ji wê pêvajoyê xilas nebûya. Di vê demê de zarok li hewirdorê dinerê û kifş dike. Rengan ji hevdû cûda dike. Li wênayan dinerê. Li ber tv´yê, ku di sekinê, dikarê heya wê herê ser tv´yê û dîmenên ku di wê de dibûhûrin.Mirovên ku beyenî ku nû bibînê, wê li wan bihey bê. BI heman rengî ji aliyê dengkirinê ve, dengê çapka ji destê, dengê helbestan û hwd li wan dihisênê. Dengên di ahengekê de na, wan dihisênê û heya zarokê diçê ser wan. Lê dengê weke qalabalix, wê heya zarokê ji hevdû belav bike. Her wusa, weke berteka li wê jî, wê zarok, bigirî. Lê dema ku deng zelal û hêdîka û di ahengekê de bi dengekê nizm werê zarokê, wê zarok karibê

wê bigirê. Zarok, dikarê bihêsênê, dema ku dihisênê wê karibê heya xwe bide li ser. Dema ku navê wê hat hanîn li ser ziman, wê heya wê herê li ser wê. Gotin û hevokên ku dûbare berê ji zarokê re hatina ser ziman, dema ku tên ser ziman, heya zarokê, diçê ser wan. Dûbare kirin, bi şêwayê hanîna ser ziman a gotinê û piştre piretîze kirina wê gotin, minaq dema ku bêjê ´bixwûm´, piştre li berçavê zarokê bixweê, wê di mejiyê zarokê de bicih **bibê**.  Lê carna bi dengê ´ma´ û ankû ´maaaa´ û hwd re w dengê derxe. Zarok, wê li gorî rewşa xwe ya xweza, wê bi dengên xweza ên ku ew dikarê bikarbênê, wê deng derxe. Li ser wê re wê dengên nû hin bi hin li wê zêdetir bikê. Zarok, bi dûbare dengkirina ji dê û bav, dema ku ew dengên ku ji dê û bav dike ku di nava wan de dengên zêde hebin, wê zarok, wan dengan jî bi xwe re bigirê.Bo vê yekê, hertimî derxistina dengan û dûbara kirina wan, wê fêr û azmûna wan di mejiyê zarokê de bide çêkirin. Ev rewşa pedegojikî a li ser dengê tîpan re wê hin bi hin li dora xwe gotinan bihûnê. Di temenê pêşxistina dengan wê fêr, azmûn û cerb wê hebê.

Dema ku mirov di çerçoveya van adilandinên qirikê, ziman, mejî û hwd re dihizirê, mirov divê ku werênê ser ziman, zarok, bi levkirina gotina xwe ya pêşî re wê, pêvajoyek giring a ku ji gelek aliyan ve di pêvajoyên pêşketinê de ya, wê biserbixe.

Li ser rastîya axiftinê re ku mirov werênê ser ziman, divê ku mirov werênê ser ziman ku axiftin, bi hişmendi û salixkirina rewşan a ji aliyê mejî ve re dibê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku salixkirin, hinekî jî di temenê wê de girtinên di mejî û bi teybetî jî ên di xêvê de hena. Mirov dikarê xêvê, weke temen werênê ser ziman. Zarok, wê hê di destpêka bûyîna wê de pêşketina wê xwe bide dîyarkirin. Lê li v ir, mirov dikarê her wusa, bi kortasî, heyv bi heyv hinekî jî werênê ser ziman. Pêvajo bi pêvajo ew, pêşketina zarokê wê xwe bide dîyarkirin. Di hefteyên pêşî de zarok wê bi lefleksên xwe yên weke ên şîrdayînê, kenînê, çûyînê û hwd re wê bi awayekî ´rûtînî´ xwe bide dîyarkirin. Zarok, bi van lefleksan, wê dest bi têkiliya bi hewirdorê re bike. Wê pêşî deng û bêhna dayik nas bike, piştre jî ya bav wê nas bike. Rûyan(´rûdên´), dirêj dinerê û wan nas dike. Rengê rû, dev, çav û pora serî û hwd, wê hin bi hin di mejiyê zarokê de bicih bibin.  Divê demê de wê devê xwe vekê û dibêt ku hin bi hin bidest nîşana zimanê xwe jî bike. Ev rewşên zarokê wê heta nêzî heyva duyan, wê hin bi hin pêş bikevin û bi zarokê re wê rûnihin.

Zarok, dema ku hê di hefteyên yên pêşî de ya, wê zarok, xwe bi dê û bav re di ewlahiyê de hîs bike. Zarok, wê wê hêsta bi dayikê re bûyînê wê baş fahm bike. Minaq, dema ku dayikek li deverekê rûniştîya û dema ku hinek mirovên beyenî werina cem wê, wê zarok li wan binerê û wê bikenê. Di vê demê de wê weke ku di şabûnê de bê. Lê dema ku zarok bi tenê bê û dayika wê ne li cem bê û ew xwe bi tenê hîs bike, wê wusa bi heman rengî nêzî beyenîyan nebê. Li vir jî, di nêzîkatîya zarokê a li derve de wê di temenê wê de hêst û hîsa dayikê û bêhna wê û her wusa dengê wê, wê hebe. Zarok, heta ku ew hîs bike ku ew li wir bi dayika xwe re wê di vê çerçoveyê de nêzî beyenîyan jî bibe û wê bi wan re bikenê jî. Lê dema ku dayika wê ji wê dûrket, wê êdî zarok, wê nekê. Ber ku zarok, hîs dike ku dayika wê ne li wir. Bêhna wê nakê. Bo vê yekê, wê bidest girî bike. Wê xwe rehet hîs nekê. Bêhna dayikê, wê weke mirtalekê ku zarokê diparêzê bê bo zarokê di rewşên têkilî danîna zarokê de. Zarok, li vir, wê hêsta meyizendinê a dayikê, biardihênê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok bi wê re xwe werênê ser ziman.

Ev rewşên zarokê her wusa divê ku mirov werênê ser ziman ku wê bi demê re bi zarokê re pêşbikevin. Zarok, dema ku dayika wê û ankû bavê wê bi werê re dileyizê di vê demê de wê bi zivîrandina serê xwe re wê karibê sînyala wastahîbûnê, xwestinê û ankû ne xwestina leyistikê jî wê bide.Minaq, zarokeke ku ew di nava 4 û ankû 5 heyvan de ya wê li gorî dengan tevbigerihê. Dema ku zarok, bixwezê ku bi dê û bavê xwe re bileyizê, wê berê xwe bide wan û wê wê nerînê bi wan re çêê bike ku dixwezê ku bi wan re bileyizê. Lê dema ku wastîyayî bê û ankû xewa zarokê werê, wê zarok, wê yan bigirî, yan berê xwe bide bi aliyê din ve û yan jî wê heya xwe bide deverekê. Ev jî sînyalên zarokê ên ne xwestina wê na ku ew didêt. Di vê çerçoveyê de zarok, her wusa, li ser tevgerên xwe re wê weke ku sînyalê jî **bide**.

Dem ku tê heyva duyan, wê zarok, lingê xwe rakê ser xwe, serê xwe êdî hin bi hin rakê, lingên xwe bikişênê hûndûrê zikê xwe, serê xwe bi zîvirênê û xwe ji rewşên ku wê bibin re amede bike. Minaq, dema ku dê wê şîr bide wê zarok wê fahm bike û wê xwe ji wê re amede bike. Di wê demê de zarok bi bêhvil, dev, çav û hwd re wê xwe zindîtir bike. Wê, bide nîşandin. ..

Zarok, wê vê pêvajoyê di heyva sêyan de weke ku temem bike. Wê di heyva sêyan de wê bidest têkilîdanîna bi çavan bike. Wê rengan kifş bike. Her wusa, wê bidest ji hevdû cudakirina rengan û hwd jî bike. Minaq, rengên di malê de ên weke yên mahfûran, nîgarê dalaqandî û

hwd, wê karibê ji hevdû cuda bike. Vê demê de w karibê zêdetirî kontrolê li ser serê xwe dênê û li ser xwe bigrê. Wê karibê hin bi hin destên xwe weke destekê bide berxwe. Û wê di vê demê de biceribênê ku bixwe li ser xwe rûnihê jî. ..

Ev rewş wê di heyva çaran de zêdetir bibin. Wê zarok, hinekî din zêdetirî wê karibê tevgeran bide nîşandin, wê xwe li ser xwe bigrê û wê bikenê. Wê bi çavên xwe ji hevdû binaqênê. Dîtin, hiskirin û ankû bihîstinê w baştir êdî di vê demê de weke ku bike. Wê fahmkirinê jî di vê demê de wê pêş bixe. Wê tevgerên bi hevdû ve girêdayî wê zêdetir bike. Zarok, di vê demê de dema ku derî divebê û yek wê di hilde li jor û hwd, vê yekê baştir fahm dike. Heyva dikarê pêşbixe. Di vê demê de wê karibê nêzîkatîya leyistikî pêşbixe, têkilî(´nerîn´)yên bi çavî ên dirêj pêşbixe û xwe amede bike ji rewşên ku dibînê re.

Nêzî heyva pêncan, wê zarok, wê rewşa jidayikbûyînê w dûrkeve û wê hin bi hin keseyetîya wê xwe bide dîyarkirin. Wê zarok, di vê demê de karibê bi dê û bav re bi hevdû re bileyizê û têkiliyê bi vê rengê bi hevdû re dênê. Wê hêskirina xwe bide nîşandin. Wê bide dîyarkirin ku rû û rûdênên ku dibînê nas dike. Ji mirovên beyenî, bitirsihê. Di vê demê de wê zêdetirî bi dê û bavê ve xwe girêbide. Wê bi wê re jî, xwe bi malê ve girêbide. Wê, li cihên nû, wê rûdêna xwe bide nîşandin ku li xoşa wê diçê û ankû naçê. Di vêê demê de wê zarok, zêdetirî têkiliyê pêşbixe. Wê destên xwe rakê li jor li dê û bav ku rajihinê de. Wê wê di vê demê de wê bidest çûyîna li ser çokên xwe bike. Wê bidest leyistikan bike, ji hevdû belav bike û li hevdû bide hevdû. Tiştan ji cihên wan bibê cihekê din. Û wê di destê mirovên din de jî wê, zarok, bidest leyistikê bike.

Di dewama wê de wê di heyva şêşan de wê zarok, dayika xwe ji xwe re bike navend. Wê bêhtirî li wê xwe bide hevdû. Ji wê dûrketinê û nêzîkbûnê, wê zêdetirî bandûra wê li zarokê bike. Di vê demê de zarok, wê ji rûyan wê fahm bike û wê fahm bike ku li pişt hêstan çi hizir heya. Di vê demê de wê bidest leyistikên ba bike. Wê di vê demê de zêdetirî bixwezê ku zarok, bi dê û bavê xwe re bileyizê. Wê bixwezê ku dê û bav di derbarê tiştan de bi zarokê re biaxifin û werênina ser ziman. Zarok, wê bixwezê ku ji wan bibihîzê. Di vê demê de wê zêdetirî alaqaya li cem mazinan wê bi wê re çê bibê. Wê zêdetirî, ji wan alaqayê jî bixwezê. Di vê demê de jî êdî zarok, bi tiştên mazin re alaqadar dibê. Tiştên piçûk dema ku dibînê, diavêjê devê xwe. Di vê demê de wê bidest afirandina gotinan bike. Gotinên weke ´ba-ba´ û ankû **´da-da´** û hwd wê bidest biikarhanînê bike. Di vê demê de wê hin bi hin dinanên zarokê jî wê

derkevin û derketina dinanan wê bizarokan re carna dibê sedema hinekî êşê jî.

Bi van rewşan re dema ku zarok tê dema nêzî heyva heftan wê zarok, wê êdî ji gelek tiştan re wê amede bê. Wê lingên wê û ranên wê, hinekî din xort bibin ku karibê xwe li ser wan bigrê. Heta ku bi alikariyê wê karibê xwe li ser lingan jî bigrê. Hinek zarok jî, di vê demê de bixwe dirûnihin û vê jî baş dikin. Di vê demê de pirr zêde zarok di tirsihê ku ji dê û bav dûrkeve. Di vê demê de dema ku ji wan dûrdikeve, dibê ku bi hêz jî bigirî. Di vê demê de zarok, dixwezê ku wê hêskirina dê û bav zêdetirî bi hêz ji wan bibînê. Bi wê re jî dema ku ew li malê ya, wê ew hertimî li rex dê û bi wê re xwe baş hîs bike. Di vê pêvajoyê de zarok, pirr zêde hêskirinê dixwezê ji dê û bav. Dema ku ji kê ji wan wê hêskirinê kifş dike, wê xwe nêzî wan bike. ..

Dema ku zarok di vê çerçoveyê de digihijê heyva heştan wê zarok, destê xwe lev dixe, di hejênê, di ceribênê şîroveyê bike. Yanî, di ceribênê ku fahm bike. Bi dê û bav re dema ku axiftinek bibe, wê zarok xwe nêzî wan bike û wê bi wê axiftinê heya ku pirr kêfxweş jî bibê. Bi vê rengê, wê bixwezê ku wan fahm jî bike ku çi dibêjin. Zarok, di vê demê de gelek zanîn û hişmendî di derbarê kirin û tevgerên wê de hena. Wê biçoçka wê herê hewirdorê.

Di heyva nehan de wê zarok, zêdetirî bi tevger bibê. Wê di vê demê de zêdetirî bi çoçka, li ser lingan bi alikariyê û heta ku bi gavên piçûk û ku ne zêde dirêj wê li ser lingan bimeşê jî. Wê di vê demê de zarok, bidest bikarhanîna gotinan zêdetir bike. Wê tevgerên weke şabûnê, xayidînê û hwd wê bide nîşandin. Wê di kirinan de wê tevgerên weke bêsabir wê zêdetirî bide nîşandin. Di vê demê de wê gotinan zelal bikarbênê. Gotinên weke ´dê´ û ankû ´bav´ wê bidest bikarhanîna wan bike. Heta gotinên din jî, zêdetirî bikarbênê. Di vê demê de wê zarok gotinên hesanî zêdetirî bikarbênê û pirr giringa ku mirov gotinên hesanî kifş bike û bi wê re dûbare werênê ser ziman ku ew bikarbênê. Minaq, weke navên tiştên di malê de û hwd. Piştî vê pêvajoyê ku zarok gihişt heyva xwe ya dehan wê zarok, zêdetirî gotinan bikarbênê, qaramên xwe yên ku pêşketina wê bide berxwe û wê gotinên kifşkar wê bikarbênê. Wê di vê demê de zêdetirî fahm bike. Heta ku wê hinekî tişta rast û ne rast jî ji hevdû cuda bike. Di vê demê de wê zêdetirî qaramên xwe bide berxwe ku zarok li ser lingan bimeşê û wê bimeşê jî. Dema ku çoçka diçê zûtirîn diçê. Di leyizê bi mazinên xwe re. Li wan dikenê. Di vê demê de hem wê zarok bixwezê rabê ser lingan û bimeşê û hem jî wê weke ku ji dê û bav

bixwezê ku ali bike û wê biceribênin. Di vê demê de wê zêdetirî, weke ku bi serê xwe bê. Wê tevger kirinên bi serê xwe bide nîşandin. Ji heyva pêncan ve wê tevger kirinên serbixwe bike ku pêşbixe. ..

Lê vi demê de ku li dora heyva dehan wê zarok, êdî wê di kirin û tevgerên serbixwe de wê serkevtî bê. Wê wan bide nîşandin. Di vê demê de hanîna li ser zêdetirî xwesteka xwe, mereq û mêyla xwe, wê zêdetirî bi zarokê re pêş bikeve. Di vê demê de jî zarok, çendî ku ceribandinê û piretikê bi dê û bav re dike zarok, zêdetirî serkevtî dibê û tevger û kirinan zêdetir dike û dide nîşandin. Her wusa, piştî ku zarok hat û gihişt heyva yanzdehan wê zarok, zêdetirî serbixwe bê û wê karibê xwe li ser lingan bigrê û bimeşê. Wê di vê demê de gelek astengiyên ku li pêşîyê hebûn wê wan derbas bike. Wê bixwe bê. Wê gotinên zelal bikarbênê. Wê biaxivê bi mazinên xwe re. Wê têkiliyê zêdetirî dênê. Wê di vê demê de serbixwe û bêî alikar wê tiştan bike û wê bimeşê. Alaqaya zarokê a li ser gotinan zêdetir bê. Wê bixwezê ku gotinan zêdetirî bihîzê û bikarbênê. Bo vê yekê, wê hey û bale xwe bide ser dê û bavê xwe. Wê ji wan gotinan bigirê. Wê, di vê çerçoveyê de hazîneya gotinên ku gotinên ew bikardihênê wê mazintir bike. Wê gotinan bi rengê xwe şîrove bike û werênê ser ziman. Zarok, hertimî, wateya ku dide gotinan, ya mazinan cudatira. Zêhnê zarokê di vê demê de wê zêdetirî xwe bi axiftina wê re bide dîyarkirin. Heta ku di vê demê de wê hevokên kin jî wê ava bike. Di vê çerçoveyê de wê zarok, di kirinê de wê bixwezê serbixwe bike. Lê bo ku zêdetir bike jî, wê çav û mêyla zarokê li dê û bavê wê bê ku ew hertimî li rex bin û alikariyê bidinê de. Di vê demê de dema ku dê û bav bo axiftina zarokê, pirr zêde gotinên û hevokên kin ji wê re biafirênin û di mejiyê de bicih bikin, wê alikariyek mazin bidina zarokê. Ji ber ku zarok jî pêwîstîya wê bi wê heya. Zarok jî, wê hîs dike. Zarok, di vê demê de dema ku tişte ji wê tê pirsîn û navê wê nizanê, wê pêşî bihizirê li nava hevok û gotinên ku dizanê. Lê dema ku nebînê, wê hinekî şikeştî bê. Divê ku derfet ji vê rewşê re newê hiştin ku zarok wê şikeştinê li ser ziman re bixweê. Ber ku wê ev şikeştin, wê bandûrek mazin li zêhnê wê û hewldana fahmkirina wê bike. Di vê demê de zarok, pirr dixwezê ku çîrokêên piçûk hesan ku li wan bihêsênê ji dengê dê û bav. Ji dengê dê û bav, zêdetirî fêr dibê û di mejî de digirê. Li vir, dema ku di vê dema zarokê de dê û bav zimanê hêskirinê bi gotinên wê û hêsta wê re li zarokê bidina nîşandin, wê zarok, pirr zêde di vê demê de pêşketinên mazin bide çêkirin bi xwe re.

Piştî vê re jî zarok, ku sale xwe tişî kir, wê di van waran de hemûyan de hinekî din pêşketîtir bê. Zarok, zûtirîn pêşdikeve. Her wusa, zarok, ew hêza wê ya fahmkirinê, li ser hîskirin, hêst û hişmendiyê re pirr zêde pêşketîya. Zarok, di vê demê de ji girtinê û fahmkirinê re dayimê divebê. Lê dema ku mirov jî di vê demê de ji wê re bi şêwayê rast alikar bê, hingî mirov wê karibê zarokê bi wê hêza xwe ya fahmkirinê zêdetirî pêde herê û fahmkirina xwe pêşbixe.

Zarok, di vê demê de pêwistiya wê ya bihîstin û ankû hiskirina bi alikarîya dê û bav a gotin û hevokan heya. Her wusa, bo ku karibê xwe bi wan werênê ser ziman. Di alikirinê de jî divê ku dê û dav, ne kifşkar bin ku wê çawa gotin û ankû hevok werina bikarhanîn. Divê ku zêde gotinên zarokê rast nekin li gorî xwe. Bihêlin ku zarok, li gorî xwe werênê ser ziman. Her wusa, di çerçoveya ku zarok dihênê ser ziman de tenê wê çerçoveya wê ya ku ew bi wê dihênê ser ziman zêdetir û firehtir bikin. Ya ku zarok jî pêwîstîya wê bi wê heya jî ev a.

Zarok, di vê dema xwe ya ku digihê destpêka salê, wê di vê de zêdetirî êdî bi hişmendî wê dunyê kifş bike. Wê hewirdorê nas bike. Wê bi hişmendî dê û bavê xwe û hewirdorê û mirovên li hewirdorê bibînê. Zarok, di vê demê de wê her wusa, wê di mejiyê xwe de êdî xwediyê hişmmendiyek kifşkar bê. Ezbûnîya zarokê, wê hin bi hin biafirê û wê derkeve li pêş. Dema ku zarok, tiştekî bixwezê, ku bidest nexê wê bigirî. Ankû wê helwestê dênê. Her wusa dema ku zarokê, tiştek dervî vîna wê ji destê wê hat girtin û derxistin, wê li berxwe bide ku wê nedê. Wê hewl bide ku wê di dest de biparêzê. Zarok, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek teybet bê. Pêvajoya zarokê a giring wê di vê çerçoveyê de wê êdî di çerçoveya pêşkatina zarokê de wê xwe bide **dîyarkirin**.

.

**Bi pêvajoyên pêşketina zarokê re dema ku zarok bidest fêrbûnê dike û nêzîkatîya mirov ya ji wê re ku mirov divê ku bide nîşandin. ..**

Rewşa zarokê a fahmkirinê wê di destpêka bûyîna wê ya ji dayikê wê destpê bike. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku pêvajoya fahmkirina zarokan wê li ser dengê dayikê re wê bi derînî, dengînî û her wusan fizyolojikî wê pêşbikeve. Zarok, divê ku ji aliyê fizyolojikî ve jî dayikê bixwênê û fahm bike. Wê zarok vê yekê jî bike. Zarok, dema ku dihê pêvajoyên xwe yên weke piştî şê heyvan, wê bidest dengkirina gotina bike. Dengên ku zarok wan ji dayikê his dike, wê wan di mejiyê xwe de wan digirê. Her wusa, weke fêr, azmûn û cerbekê ez divê bibêjim ku zaroka hê nûka heyva tişî dike, dema ku dayika wê û

bavê wê li berçavên zarokên ve dibûhûrê, wê zarok, nerîna xwe ji ser wan qût nekê. Heta ku dayik û ankû herê û li wê rûnihê, wê zarok ji cihê ku lê dirêj kirîya, wê çavên xwe bi nerînî bênê ser ziman û li wan binerê. Bi vê yekê zarok, dide nîşandin ku ew kifş dike. Her wusa, ew dibînê. Ev dîtina zaroka, wê zarokê bi aqilê wê re pêşbixê.

Her wusa, bi demê re wê zarok, dengn gotinan di mejiyê xwe de bigirê. Minaq, wê gotinan di rengê navan de di mejî de bigirê. Her wusa, zarok, wê li ser wan gotinan re hewl bike ku salixkirinê çê bike. Minaq, dema ku ji zarokê re bê gotin ´rûniştin´, ku li berçavê zarokê bi wê re were rûniştin, wê zarok, têkiliyê bi wê re bigotinê re wê dênê. Her wusa, Her wusa dema ku bê gotin, ´xwarin´, ku li berçavên zarokê di wê demê de bidest xwarinê werênê kirn, wê zarok têkiliyê bi wê re dênin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê, werênê ser ziman ku gotinan û piştre li berçav kirina piretîk û kirinîya wan, wê her wusa, di mejîyê zarokê de wê, wê gotinê bi wê rewşa ku piştî gotinê hata kirin re wê zarok wan di mejî de bide rûniştandin. Her wusa, di vê çerçoveyê ez divê ku vê yekê jî bibêjim ku bo fahmkirina girtina zarokê a di mejiyê wê de weke azmûnekê, ya ku min kir, zarokek sê hefteyî bû, min dengê dayika wê di dema ku ew di razand de min qayd kir. Piştre, dema ku zarok digirîya min, ew dengê dayika wê bi razandina wê re min li wê dida hisandin, Bi heman rengî, rewşa ku derdiket li holê, ew bû ku zarok, dema ku dûbare li wê dengê dihisênê, weke rewşa pêşî ku çawa di xewê ve diçû, wê dîsa di xewê ve herê. Her wusa di vê çerçoveyê de ya ku weke ancam derdikeve li holê, ew a ku zarok, wan dengên hefteyên pêşî ên ku ji dayikê dibihîzê, wan di mejiyê xwe de qayd dike. Her wusa, wê piştre, wê wan salix bike. Her wusa, zarok, wê, divê demê de dengan bigirê. Lê wê zarok, dengan di mejiyê xwe de her wusa wê hewlbide ku wan salix jî bike. Di vê çerçoveyê de di heyvên piştî ya sêyan re wê zarok, mejiyê wê hinekî jî wê bi vê rewşa salixkirina gotinan re wê mijul bibê.

Mejiyê zarokê, wê bidest hewldana salixkirinê bike. Di dema ku zarok tê heyva çar û pêncan de wê zarok, dengên ku digirê û kirinên ku dibînê, wê hewl bide ku di ew di nava wan de têkiliyekê dênê. Zarok, wê di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşekê bê. Mejiyê zarokê, wê di heyva çar û pêncan de wê, li ser rewşa salixkirinê re wê têkiliyê di nava deng ku dike û kirina ku piştre dibînê wê re dênê. Her wusa, di vê çerçoveyê de ev bi awayekî fizyolojikî û derûnî, rewşeka vacî ya. Ev rewşa vacî û ankû ´mantiqî´ a derûnî û fizyolojikî, di pêvajoyek bûhûrîna li pêşketina hiş a di mejî de ya. Her wusa, zarok, dengên ku weke gotinan dema ku dike ku

bi têkiliyê bike di nava wan rewşn ku dibînê re wê zarok, di vê çerçoveyê de di xwe de temenê vacek jîyanî jî biafirênê. Di aslê xwe de ev destpêka zarokê a dîtina bihis a. Piştre jî, wê zarok, van rewşan, bi dûbarekirinên ku dike û dibînê re wê zêdetir bike. Di vê çerçoveyê de rewşa zarokê û fahmkirina wê, di vê demê de wê bi vê rengê bi temen bibê. Piştre jî di heyva şêş û heftan de wê zarok, weke ku bidest serdestîya li wan dengan weke gotinan bike. Her wusa, piştre weke gotin bidest bikarhanîna wan kirina zarokê, wê nîşanak û birhana vê bê.

Zarok, bi aqilê xwe re di vê çerçoveyê de wê destpêkên giring di vê demê de bi xwe re bike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêjê ku pirr giring a ku zarok karibê xwe werênê ser ziman. Carna, di rewşna de zarok, dikarê weke ku bihizirê, lê nikarê wê werênê ser ziman. Bi nerîneka ku dinerê dixwezê ku wê werênê ser ziman. Nerîna zarokê, wateya wê giring di serî de divê ku mirov werênê ser ziman. Di aslê xwe de ji destpêka bûyîna zarokê û nerîna wê ya ku ew dike li hewirdorê, wê di vê çerçoveyê de ew nerîna wê ya biwate wê hebe. Di pêvajoya wê nerînê a destpêkê de wê zarok, hewl bide ku hewirdorê nas bike. Lê di pêvajoya piştre ya pişt sê-heyvan de wê zarok, her wusa li ser wê re bike ku salixkirinê pêşbixe. Piştre jî ji pêvajoya ji şêş û heft heyvan û pê de zarok, wê bike û bixwezê ku dengên ku digirê, wan bi rewşan re qayd bike. Salixkirina dengan bi rewşan re wê pêvajoyek giring a rengê pêşketina zarokê bê. Piştre wê zarok, ji heyvên heşt û nehan, wê bidest salixkirina rewşan bi gotinan re bike. Wê vê rewşê, kûr bike. Wê her wusa, wê vê rewşê bi ast û pîvan bike. Wê nirxa zarokê pêşbikeve.

Zaroka yek heyvî, dema ku dayika wê zarokê şîr dide û destê xwe dide gûhê wê û gûhê wê difirkênê, wê zarok, bertekê bide nîşandin. Wê xwe bijidênê û dengê xwe derxe ku ew deng tê wateya wê ku ew ji dayikê dixwezê ku ew didestê xwe nedê gûhê wê. Ev berteka zarokê, nîşanaka pêşketina tûrên wê yên sîniran in.

Zarok, têkiliya ku ew di vê demê de di nava deng û rewşan de didênê, wê temenê afirîna gotinan di mejiyê wê de bê. Her wusa, dema ku mirov rahişta tiştekî li berçavê zarokê bi navkirina wê tiştê, wê ew tişt bi wê bi navkirinê re wê zarok, wê hilde mejiyê xwe. Her wusa bi heman rengî, dema ku zarokê rahişta tiştekî, nîşankirina wê tişta didestê wê de û bi navkirina wê, wê bi heman rengî li ser wê tiştê re zarok, wê dengê di xwe de bigrê weke navê wê. Ev rewşên li ser rewşan re bi navkirin û ankû vajî wê li ser gotinan re danîşana rewşan bo wê gotinê û hwd, wê salixkirina

zarokê pêşbixe. Zarok, wê di vê çerçoveyê de mejiyê wê, bidest girtina salixkirî wê bike.

**Zarok**, êdî wê zêhnê xwe û jîra xwe bidest bikarhanînê bike. Li vir, çendî ku zarok, derfetê bidest bixe wê, êdî wê zêhn û jîra xwe pêşbixe û wê bide dîyarkirin. Ev jî, di vê demê de wê bi alikarîya dê û bav wê bibe. Her wusa, di vê demê de zarokên ku ew êdî dikarin gotinan bikarbênin û hevokên piçûk ava bikin, d û bav car bi car, ji wan dixwezin ku hedinî bin. Yanî bi gotinaka din, çendî ku hedinî bin û negirin, wê hinek dayik, wê vê weke herênîyekê şîrove bikin û pêşwazî bikin. Lê di aslê xwe de divê ku mirov vajî wê, şîrove bike. Ev ne herênîyek û ankû rewşek pozitiv a. Zarok, dema ku tişta ku dixwezê ku wê bidest xist û pê de, wê karibê bihedinê. Ew hedinîya zarokê a wê ya li ser hanîna li cih a xwestekên wê re wê zarokê, di temenekî ku ew pêş dikeve ve bê. Zarok, di van demên xwe de pirr zêde bi tevger a di mejiyê xwe de. Mirov dikarê bibêjê ku di mejiyê xwe de hîper-aktiv a. Zû diafirênê. Di vê çerçoveyê de aliyekî wê tevgerîya zarokê û xwestina zarokê, di aslê xwe de mejiyê zarokê ji wê dide xwestin. Di vê çerçoveyê de zarok jî, dike ku wê bike. Bo vê yekê, zarok, wê tevgerîyê û kirînîyê dide nîşandin. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, mejiyê wê di vê demê de li gorî wê tevgerîya mejî, çendî ku pêwîstîyên wê hatina kifşkirin û hatina hanîn li cih, wê zarok, zêhn û jîrîya xwe jî bikarbênê. Li vir, zarok, di aslê xwe de di vê dema xwe de pirr zêde temenê pêşketina wê li ser zimanê dayika wê bi wê re heya. Heta ku ev pêşketina wê, sînorê wê tûna ya. Di vê dema zarokê de wê zarok, bi wê pêşketina xwe re karibê, xwe pêş bixe.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, pêşketina wê, di sale wê ya pêşî de, hemû pêvajoyên ku heyv bi heyv bi wê re di çerçoveya pêşketina wê de bi wê re ku destpê dikin, wê hertimî bi rûniştandina wan ya bi meji re wê pêşketina xwe bide domandin. Ev jî, wê temenê pêşketina keseyetîyê a bi hişmendî ku bi wê re pêş dikeve bê.

Pêvajoyên destpêkê, çendî ku mirov wan baş kifş dike û li gorî wan temenê wê diafirênê, wê zarok li ser wan karibê zêhn û jîra xwe pêşbixe. Her wusa, di vê çerçoveyê de zarok, wê pêşketina wê ya di vê demê de wê weke pêşketina temen bê. Her wusa pêşketina zarokê, di sale wê ya pêşî de wê di rastteqînîya wê de wê xwe bi temen bike. Wê keseyet, bi çi şêwayê pêşbikeve û xwe pêş ve bibê û piştre bi çi rêngê û şêwayê pêşbikeve, her wusa divê ku mirov werênê ser ziman ku wê di vê demê de temenê wê werê avêtin.

Mêyla zarokê a di vê demê de ku hin bi hin li gotinên zimên û heyîna ziman pêş dikeve, di aslê xwe de ji wê aktivîya zarokê a di mejiyê wê de ya. Zarok, di vê çerçoveyê de bi xwe re hîs dike. Bi hîskirina xwe zarok, di aslê xwe de li pêşîya ya ku ew dihênê ser ziman a. Nîşanaka wê jî, ew a ku dema ku gotinên bi helwest karibê bibêjê, dema ku karibê bixwezê. Dema ku tiştek di destê wê de bê û ku ji destê wê hat standin ku li berxwe bide û wê bixwezê û heta li ser wê bigirî û hwd a. Bi wê re jî her wusa rewşa zarokê a bi mêyla wê ya li ziman a. Zarok, ya ku wê bi sînor dike ne mejiyê wê ya û ankû ne zêhn û jîra wê ya. Ya ku wê bi sînorê dike, rewşa zanîna bikarhanîna ziman a teknikî ya. Dema ku zarok, karibê xwe bi ser vê ve bibe û vê pirsgirêka xwe ji holê ra bike, wê zarok, di rengê biaqiliyeka bêsînor de wê xwe werênê ser ziman. Li vir, zarok, bi vê yekê, hertimî dike ku xwe di van rewşan de pêşve bibe. Di aslê xwe de zarok jî, vê yekê bi xwe re kifş dike.

Zarok, piştî ku sale xwe dagirt û bidest jîyane xwe ya piştî wê salê kir û pê de, wê rewşa wê ya pêşketinê pirr balkêş bê. Herwusa, hertimî, wê mêyla wê, li mazinên wê hebe. Wê bixwezê ku li wan bihisênê. Di temenê wê mêyla zarokan a li mazinên wan, hinekî jî ew xwesteka gûhdarkirina ji mazinên xwe ya. Dema ku ew ji wan dihêsênê jî, pirr zêde bi hey û bal li wan dihisênê. Dema ku mazinên wê çîrokekê ji wê re dibêjin, bale xwe pirr zêde didina wê çîrokê. Li vir, weke hûrgilekê, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dema ku ew vegotin û ankû çîrok bi gotinên zimanê hêskirinê û hêstîyarîya wê ji zarokê re hatina hanîn li ser ziman, wê ev zêdetirî bandûrê li mejiyê zarokê bike. Wê zarok, wê rewşê di mejiyê xwe de bi çerçoveya wê re di mejiyê xwe de bicih bike. Wê her wusa, wê hêstîyariya di temenê gotinan de ku ew çîrok û ankû vegotin bi wê dihê hanîn ser ziman, wê temenê têkiliya zarokê ya bigotinan jî baştirîn biafirênê. Li vir, di dema hanîna li ser ziman a gotina li zarokê re wê pirr giring bê ku zarok, ji helwest û tevgerên mirov fahm bike ku mirov wê di hilde cidîyetê û hês wê dike. Ya ku wê zêdetirî wê heya wê bikişênê li ser gotinê û hisandinê jî wê, di rastiyê de ev bê. Zarok, di vê demê de wê cîdîyeta bi hêstiyarî û ku bi wê ji wê re dihê hanîn li ser ziman ku kifş dike, mêyla wê zêdetir pêş dikeve. Bi wê re mejiyê zarokê, zêdetirî wê adranalina fêrbûnê wê biafirênê. Wê zarokê, li fêrbûnê û hisandinê weke ku wê bide hoyandin.

Mejiyê zarokê li vir divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê mêyla xwe li ser hîskirinê û hêstiyarîya ku ew kifş dike re wê bide hanîna li ser gotinan. Di vê çerçoveyê de ew, wê weke temenê hildana zarokê jî

bê. Zarok, li vir, dema ku mirov wusa bi helwestek zûwa ku mirov bi wê hêstê û hîsê nadê nîşandin ku werênê ser ziman, wê zarok, vê rewşê jî weke bêalaqaya li wê wê bixwênê bi mejiyê xwe re. Bo vê yekê, wê heya wê neçê li ser gotinan. Heta ku wê li mirov nehisênê. Ev rewş, wê di rewşên jîyanî û xwe li zarokê dana hisandinê de jî wê wusa bê. Zarok, dema ku ew germehî bi hêstîyarî û hîssî ji mirovekî girt, wê zêdetirî xwe nêzî wan bike. Ev, dibê ku dê û bavê wê bin. Û ankû dibê ku hinek ahlên ên ji malê ên weke dapîr û bapîr bin. Û ankû hinek ahlên din ên weke xwûsk û bira û ankû mam û metik bin. Her wusa ku kî bê, ku dema ku zarokê ew germehîya bi hêstîyarî ji wan hîskir, wê xwe nêzî wan bike. Lê dema ku zarokê, ew hîs nekir, wê xwe ji wan dûr bike. Wê zêde neçê bi ser wan de. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku nêzîkatîya zarokê, di vê demê de jî wê di temenê wê de germehîya hêst û hîssî bê. Ya ku wê di temenê wê de bê ku zarok çendî xwe aîdî wê hîs dike û ankû hîs nakê. Li vir, bi gotinekê jî bê, em divê ku werênina li ser ziman ku têgîna aîdîyetê, di temenê wê de bi zarokê re hêst û hîskirina germ, pirr zêde heya. Ya ku mêyla zarokê jî dide dîyarkirin, di aslê xwe de wê ev bê.

Her wusa li vir, di dewama mijarê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ev rewşa hêstî û hîssî, wê temenê zêhn û jîra zarokê jî bê. Zarok, xêva wê di vê demê de wê bidest bîrkirina xwe ji berkirinê bike. Her wusa, zarok, wê tiştên ku ew xwedî ya wê, têgîna wan pêşbixe. Têgîna xwedîbûnê û ankû xwedîderketinê, wê di temenê rewşa zarokê a bi pêşketina xêvê û girtina wê de jî bê. Li vir, divê ku rewşa xêvê, bi teybetî hilde li dest. Rewşên ku wê temenê girtina di xêvê de biafirênin ên weke têgîna xwedîbûnê û ya aîdîyetê û hwd, wê aqilê zarokê bi jîra wê re derxe li pêş. Zarok, van rewşan bi xwe re kifş dijî.

Di nava kurdan de hertimî bahse xortbûna xêva wan û ankû ´zû ji bîrnekirina wan´ dihê kirin. Bi vê yekê, weke ku carna navê kurdan derketîya. Ev rewşa xêvê, mirov divê ku bi teybetî hilde li dest. Emê li jêr li ser bisekin ku di nava civate kurd de **rewşa mazinkirina zarokê çawa bi hezaran salan** xwe daya domandin heta roja me.

Di nava kurdan de berê, hatîya kifşkirin ku hatîya pêşxistin ku hê ku zarok piçûka wê di nava malê de wê têgina zarokê a xwedîbûnê û aîdîyetê wê were hewl hatîya dayin ku were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de li ser pêşxistina mejiyê zarokê hatîya hizirîn. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku di çerçoveya pêşketina zarokê de wê weke

fektorên giring, rakendîtî, hebûna genetikê û her wusa awayê pêşketina mejî re wê xwe bide dîyarkirin.

Zarok dema ku hat dunyê di hefteya xwe ya pêşî de wê dîtinê, tahm û ankû têjgirtinê, hiskirin û ankû gûhdarkirin û hîskirinê wê bi xwe re bike. Bo vê yekê wê zarok, li ser wan hîsan re wê hewirdor bike ku nas bike. Wê dengê dê û bav û bêhna wan hin bi hin wê nas bike. Li ser wê re wê têkiliyê dênê. Ev rewşa zarokê, wê giring bê ku mirov wê bi teybetî hilde li dest û werênê ser ziman. Di vê demê de pirr giring a ku mirov pirr zêde li zarokê biaxifê. Dengên ku zarok, hin bi hin derxê, mirov ali zarokê bike ku wan wrgerênê li rengê gotinan. Her wusa, di çerçoveya derûnîya wan dengan de ku mirov hewl bide gotinan kifş bike bi derûnîya wê dengê re bi dengekî wê ji zarokê re wê werênê ser ziman.

Ev rewş, wê her wusa, zarokê, zûtirîn pêşbixe. Kurdên berê, di destpêka zarokê ve dayikan bi dengên xwe hertimî helbest li gûhê zarokê digotin. Her dema ku zarok şîyar bû, wê bi dengê xwe ji wê re bigotan. Hertimî jî dema ku dayik li hevdû dicivîyan, zarok bi wan re bûn. Li xwe didana hisandin û ankû gûhdar kirin. Bi wê re jî zarokê li wan dihisand. Dayikan di nava xwe de hem diaxiftin û hem jî bi dengbêjî bi hevdû re û ji hevdû re distirandin. Ev dengên bi stirandinê, wê biçûya gûhê zarokê. Zarok li wan şaq dima. Dihisand. Ev yek, bizarokê re dihat kifşkirin. Piştî ku zarokê li wan dihisand jî, wê êdî piştre zarok, li wê bihata axiftin. Dayikan, hemû demên xwe bi zarokên xwe re ku wan derfet didît di bûhûrand û ji wan re diaxiftin. Her wusa, di vê çerçoveyê de zarokê, bi deng û gotinan re didan hevnasîn. Zarokê, pirr baş li dengê dayika xwe dihisand. Bertekên pêşî wê li dengê dayika xwe zarok bide nîşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de dengê dayikê pêşî û piştre yê bav, wê di mejiyê zarokê de rûnihin. Her wusa zarok, bi van dengan tişta ku bihîst, wê wan di mejiyê xwe de bigirê. Zarok, pêvajoyên wê pêşketinê ên destpêkê, wê di vê çerçoveyê de bi dayikê re derbas bibin. Di nava kurdan de heta roja me jî, bi vegotinî û çîrokî wê bi hezaran çîrokên ku hertimî dayikan ji zarokên xwe re dihanîna ser ziman hebûn. Zarok, di nava wan çîrokan de mazin dibû. Ji destpêka bûyîna xwe ji dengê dayikê wê bidest hisandina wan bikira. Lê zarok, dema ku hat dema xwe du salî û ankû sê salî jî, wê her şev li zarokê vegotin û helbestên dengbêjên kurd ku bi kêlîkên dirêj didoma di wan civatan de wê li zarokê biheta dayin hisandin. Zarok, bi vê rengê, weke ku di nava gotinan û deng de dihat gevistin. Hertimî li wê dihat dayîn hisandin. Di vê çerçoveyê de bi wê re weke kevneşopîyekê bû ku zarokên kurd di nava 6 û heta 9 mehan de bi zêdeyî bidest axiftinê

dikirin. Bidest bikarhanîna gotinan dikirin. Pirr zêde rewşên axiftinê, hertimî ji zarokê re dihatina dayin afirandin.

Rewşa mazinkirina zarokan a dayikên kurd, pirr teybet a. Ez dikarim bêjim ku rewşa mazina zarokan a dayikên kurd, heta roja me jî, di nava ti xalkî û milletî de minaqe wê ne hatîya dîtin. Rewşa dayikên kurd ên ber, bi teybetî weke mijareka sereka ya pedegojikî divê ku mirov hilde li dest.. Her wusa, di vê çerçoveyê de ku mirov bahse pergaleka têgînî ku bûya weke kevneşopîya dayikên kurd û di nava wê de gelek rengên pêşketinê hatina afirandin û pêşxistin, mirov dikarê bahse wê bike. Rewşa mazinkirina zarokan a dayikên kurd, wê bi hezaran salan, xwe bide domandin. Di vê çerçoveyê de dayikên kurd, dema ku zarok mazin kirina, ji xwezayê pirr zêde sûd wergirtina. Em dema ku bahse mazin kirina zarokan li kurdistanê bikin, divê ku em vê pergale mazinkirina zarokan a pedegojikî a dayikên kurd bi giringî û teybetî bi dîroka wê re hildina li dest û werênina ser ziman. Ev pergale mazinakirina zarokan a dayikên kurd, minaqe wê li ti deverên dunyê heta roja me jî, ne hatîya dîtin û pêşxistin. Weke pergalek mazin kirina zarokan ku dayikên kurd ew heta roja me, dana domandin û hanîna. Pergalek mazin kirina zarokan a dayikên kurd, li vir, divê ku mirov bi kortasî hinekî li ser wê bisekinê. Ev wê gelek têgînên giring di derbarê dîroka civate kurd û rengê pêşketina wê de jî hizirna baş ên dîrokî bide me.

Dayikên kurd, dema ku zarokên wan dihatina dunyê, wê pêşî, hertimî dayikên pirr pîr ku weke ”dayikên welidendinê” dihên bi navkirin û navê wan bi wê rewşa wan ya welidendina zarokan re ku di nava civate kurd ji wan re tê gotin ”pîrk” wê hebin. Pîrk, wê ew jinên ku di derbarê welindendina jinên bi heml de, weke jinên ku di nava civatê de ên pirr zêde xwedî zanebûn in. Hertimî serî li wan dihat xistin. Ew, weke jinên di karên xwe de serkevtî na. Pîrk, weke jina bizanebûn a welindendinê ya.

Di nava civate kurd de pîrk, weke dayika duyemin a wê zaroka ku wê di hatina wê ya li dunyê de ku ali dayika wê de kirîya jî dihê dîtin. Di vê çerçoveyê de ew dayika duyem a û heta ku di ava civate kurd de bo wê dihê gotin ku ”mafê wê yê dayiktiyê jî li ser mirov heya.” Her wusa, sê rengên dayiktiyê, di nava civate kurd de bahse wê dihê kirin. ”Dayika şîr” heya. Dayika şîr, weke dayika dema ku zarok hat dunyê û ku şîrê singa dayika wê tûna bê û ku ew herê wê zarokê ji singa xwe care pêşî wê zarokê şîr bide, ji wê re dihê gotin. Ev dayik jî, di nava civat de ew,

mafê wê yê li ser wê zaroka ku ew wê şîr daya heya. Wusa jî, weke nirxekê hatîya pejirendin û herê kirin.

Dayika din a ku em bahse wê bikin jî, zaroka ku ew zarok hanîya dunyê ya. Her wusa, ev dayik jî, weke dayika binirx a zarokê ya. Dayik, dema ku zaroka wê bû, wê ew pêşî weke ku di nava civatê de hertimî hatîya pêjirendin, wê hertimî sê-rojan di nava cihan de bê. Ku dayikê zarok hanî dunyê ku rewşa wê çawa bê bila bibê, wê herî hindik, sê rojan di nava nivînan de bimênê. Piştî sê rojan, wê zarok, rabê ser xwe. Wê male xwe bidest pêşxistinê bike. Wê li male xwe xwarina xwe çê bike û hwd. Dema ku zaroka dayikê çêbû, dîsa weke vê kevneşopîyeka civatî a civate kurd de ku heta 40 rojî dayik ji hundurê malê dernekeve. Wê di nava malê de bê bi zaroka xwe re. Ev jî, weke nirxekê hatîya pejirendin. Heta ku dayikek, berî wê 40 rojê derkeve, wê weke binpêkirina kevneşopîyekê jî wê li wê were nerîn. Di vê çerçoveyê de ji dayikê dihê xwestin ku ew cil rojî, di malê de bê.

Bi wê re jî dayik, piştî zaroka wê çêbû, wê weke kevneşopîyeka din ya pirr giring a jina kurd bê ku jina kurd zaroka xwe ´girêdida´. Ji vê girêdanê re dihat gotin ku ”pêçek.” Wateya ´pêçekê´, ji navê wê tê. Ew paçê ku zarok dinav de dihat pêçan, wê ji wê re bihata gotin ku pêçek. Zarok, bi awayekî dihat pêçan di nava wê pêçekê de ku nikarîba dest û lingên xwe bişikanda. Bi wê re jî dayikê, wê heta sê heyvan herî kêm wê zaroka xwe pêça ba di nava ´pêçekê´ de. Dayikê, berî ku zaroka wê were dunyê, wê pêçeka xwe ya ku zarok di nav de dipêça, wê amede bikira. Wê ew pêçek, piştî ku zaroka wê bû, wê êdî di nav de bipêça. Ew pêçek, bi wê rengê di hat çêkirin, ku dema ku zarok di hat xistin li navê, wê zarok weke bangorekî lê hatiba. Bi wê re jî, dema ku ew pêçek ji dest ketiba jî, wê karîba zarokê bi parasta. Bi rengekî bi vî rengî ew pêçek dihat çêkirin. Pêçek, weke paçekî ku navika wê pirr berfireh û her keviyên wê wê yên çap û rastê ku pirr zêde bi şerîteka ku wê ji navê û ku heta ku di hat dawîya serê şerîtê ku zirev dibû bû. Bi wê re jî, serîyên wê paçê ê jor, li gorî ku serê zarokê di hat çêkiirn û amede kirin. Serîyê jêr jî, wus dihat amede kirin ku wê çawa karîban, li noqa zarokê bipêçan û bi wê zarok biheta girtin bû. Piştre jî, wê şerîtên çap û rastê wê biheta li zarokê li noq û ser zikê wê heta ku ji ber lingê û ber singê bi wê dihat girêdan, wê li zarokê biheta badan. Bi wê re jî wê paçên piçûk ên ku di nava pêçekê de dihatina xistin binê zarokê jî wê cuda bihetan amede kirin.Bi wê re jî, dayikên kurd, wê hertimî ku ew weke kevneşopîyeka wan ya bi hezaran salan a, wê axa sor ku dihat bêjinkkirin, wê bixistan

bin zarokê de. Ew axa sor, pirr hûr bû û di navê de ti zuxor ne dihat hiştin. Wê zarok, li ser wê axê birîya. Dema ku rî jî, wê wê gû û mîza zarokê ji wê axê derbasî pêçekê nebû ba. Dema ku pêçek dihat vekirin, dema ku zarokê bixwe de rîtiba, wê bi wê axa ku li ser rîtiya, wê ji pêçekê bihata avêtin, û ku axa pêçekê kêm maba, wê lê biheta zêdekirin û piştre dîsa pêçek bi heta pêçan.Herwusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku pêçek,weke kevneşopîyek gitin a civatî a civate kurd a. Kevneşopîya pêçekê, weke kevneşopîyek malbatî ya pirr giring a dîrokî ya. Herwusa, bi wê re zarok, heta ku ji wan dayikan dihat, baştirîn dihat mazin kirin.

Kevneşopîya pêçekê bi rengê dayikatîya jina kurd re divê ku mirov hilde li dest. Her wusa, divê ku mirov wê kevneşopîyê, baş fahm bike. Heta ku mirov kevneşopîya pêçekê fahm nekê, mirov wê mazinkirina zarokan a ji aliyê dayika kurd ve mirov wê wê baş fahm nekê.

Kevneşopîya dayikên kurd a pêçekê, wê bi hezaran salan bi wan re xwe bide domandin. Her wusa, gotina ´pêçekê´ dem bi dem ji vê rewşê hatîya girtin û li zaroka li ser dest a piçûk a di destê dayikê de jî hatîya kirin. Gotina pêçekê, bixwe jî di zimanê kurdî de weke gotinaka pirr kevn a. Her wusa, wateya gotinê ji girêdan û ankû ´pêçanê´ tê. Gotina ´pêç´ di kurdî de mirov dikarê gelek wateyan ji wê derxê. Lê wateya pêşî, ew a ku dema ku mirov bipêçê. Dema ku mirov tiştek xist nava paçekî de û ew paç li dorê zîvirand û ew di navê de pêça, wê hingî, bê gotin ´pêça´. Lê gotina pêçek´ dema ku ´k´ di hilde li dawîya xwe, wê wateyê lê dike ku tiştekî piçûk tê pêçan.

Dayikên kurd, ji zarokê jî digotin ´pêçek´. Bi wê re navê jinê dihildan û digotin pêçeka w. Minaq, navê zelalê dihildin û wê bêjin ”pêçeka zêlalê´. Navê delalê´ hildin û bêjin ´pêçeka delalê.´ Navê gûlistanê hildin û bêjin ´pêçeka gûlîstanê.´. Bi vê rengê gotina pêçekê, dihê bikarhanîn. Pêçek, hertimî, weke navê zaroka li ser dest a ji nûbûyî re dihê gotin. Dema ku zarok di nava pêçekê de ne hat girêdan, êdî wê bigotan, wê ji wê re bigotan ´zaroka ku ji pêçekê derketî´ û ankû ´zaroka ji pêçekê xilasbûyî..´ Bi vê rengê wê ji wê re werê bikarhanîn.

Di nava kurdan de kevneşopîya mazin kirina zarokan, wê her wusa, di vê çerçoveyê de wê bi kevneşopîyekê werê hanîn li ser ziman. Bi wê re jî, ew zarok, di hemû pêvajoyên wê yên ku ew bi wê dihat mazinkirin re wê li ser wê bihata sekînin. Zarokê kengî care pêşî çi gotin got û ankû care pêşî kengî li ser lingên xwe sekinî. Ev hemû di mejiyê mirovan û ankû jinan de dihat hiştin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê werênê

ser ziman ku kîjan zarok, ku pêşî gotina pêşî digot û care pêşî xwe li ser lingê xwe digirt, wê ev weke nîşanaka aqilbûna wê zarokê jî biheta dîtin. Her wusa, çendî ku zû û berî ya zarokên ku bi wê zarokê re di heman demê de ku hatîya dunyê ku kiriba, wê ev weke nîşanaka jîrbûna zarokê bihata şîrovekirin.

Her wusa, di vê demê de hertimî dayik jî, wê bi zarokên xwe re biaxivin, dakû zarok zûtirîn gotina xwe ya pêşî bibêjê bidest axiftinê bike. Dayikên kevneşopîyek wan ya pirr giring hebû. Ew jî, ew bû ku dema ku zaroka wê û ankû ´pêçeka´ wê dihat dawîya çil-rojîya xwe, wê êdî dayikan bidest axiftina bi wê re kiriban. Berî wê jî, biwê re ev dikirin. Lê ji vê demê û pê de, wê zêdetirî ev bikir**an**.

Ji aliyê dayikên kurd ve mazinkirina zarokan wê weke kevneşopîyekê bê. Her wusa, di nava wê kevneşopîyê de wê dayikên kurd, hertiştî wê bihizirin û tefkîr bikin. Piştî ku zarok hat dunyê, wê dayikên kurd wê sê rojan di nava nivînan de maban. Her wusa, ev weke ku wê bi navê dayikên kurd re wê bûba nav û herkesekî bizanîya. Piştî ku zarok hat dunyê û dayika kurd ji nava nivînên xwe rabû, wê bidest girêdana zarokê weke ´pêçekê´ bikê. Zarok, dihat pêçek kirin. Piştî ku zarok hat pêçan, wê zarok, ser rûyê wê jî biheta girêdan, heta hefteyekê wê ev bidomîya. Armanca vê ew bû ku rohniya bihêz zirerê nedê çavên zarokê.

Dayikên ku wê serê zaroka xwe ku ew kûr jî ba û keç jî ba, wê girêbidan heta sê heyvan. Dayikên kurd, tefkîr dikirin û digotin ku ´serê zarokê, heta vê demê û piştre jî ê qaliqê wê yê hastû nerma û wê şekl bistênê. Bo ku serê zarokê rast qaysa bigirta û xwe qays negirta, wê bi awayekî rast wê, girêdan. Zarok, piştî ku ´zarokê ku wê çilê xwe tişî kir´, pêşî wê çil kevçî av biheta xistin li zerikekê û dema ku ew serê wê dihat şiştin, wê bi serê wê de biheta kirin. Hinek dayikên kurd, wê heta ku zarokê çilê xwe ne dagirtiba, wê zêde av li laşê zarokê wê bikarne hanîba. Wê bi pambo, wê ew paqij bikira.

Her wusa, carna dibû ku zarokên hinek dayikna yan singa wan ne digirt û yan jî şîrê wan kêmbû, wê dayikên bi şîr wê bihetan hanîn û wê ew zarok ji singa wan biheta şîrdan. Ew zarok, wê hingî bûba ´zaroya wê dayikê a şîr.´ Dayik jî wê bûba ´dayika zarokê a şîr´. Hingî, zaroyên wan dayikan jî, wê weke ´bira´ bûban. Heta ku wê hinek dayikna, wê zaroyên xwe yên ku wan ew şîrdana, wê bihevdû re nezewicendiban. Ev weke rewşek teybet bû.

Dayikên kurd, wê di vê demê de wê pêçeka xwe mazin bikiran. Wê hertimî li berserê wê wê ´lolî´ bigotiyan. Zarok, wê bidengê dayika xwe

wê mazin bûba. Dayikan, bi demê re wê karîban ew dengên ku zarokan derdixistin ku wan şîrove bikin û ji wan dengan gelek dengan derxin bo ku ew zaroka wan zû bidest axiftinê bikê.

Zarok, dema ku ew ket heyva xwe ya sêyan de wê zarok, piştre weke ´zaroka sê mehî´ wê biheta bi navkirin û wê ji wê re biheta gotin ´zaroka sê mehî´ û ankû ´pêçeka sê mehî.´ Pêvajoyên zarokê ên piştî sê heyvîya wê re wê bi dayikên kurd re wê pirr bi teybet li ser wan biheta sekin in. Hertimî dayikên kurd, piştî ku zarokên wan bû û şeş heyvîya xwe tişî kir û pê de, wê li bendê tiştekî bi tirs maban. Ew jî, ew bû ku wan ne dizanî ku wê zaroka wan kengî bi sohrika biketa bû. Nexweşîya sohrika, weke nexweşîyeka ku wê hemû serokê pê ketiba. Ji yeksalîyê heta pêncsalîya zarokê, wê di nava vê demê de wê zarok bi vê nexweşîyê biketa. Hinek zarok jî, di hundurê vê demê de jî wê bi vê nexweşîya sohrika neketiban û wê heta demek piştre a dirêj wê pê ketiba.

Weke nexweşîya sohrika wê nexweşîya zerikê´ wê heba ku wê dema ku hinek zarok dihatina dunyê jî, dibêt ku ew bi wê ketiban. Bo vê yekê, wê çareserîyên wê pêşî w amede kiriban. Dema ku rengê rûyê zarokê piştî ku ew bû ku zerikî bû û weke ku şîrewolkî bû, ew weke nîşanaka wê bû ku ew zarok zerikî ketîya. Bo vê yekê, zaroka zerikî, ku weke rewşeka başkirina zarokê a bi sedsalan bû wê, pişt gûhê zarokê wê hinekî birrîban û wê hinek xwûn ji wê hanîban û piştre sîra ku baş hatî pirçiqandin, wê li ser wê danîban. Bi wê re wê zarok, di demek kin de wê ji zerikê xilas bûban. Nexweşîya zerikê, dema ku zarok, di dema wê ya pêşî de ew ne dihat derman kirin, zarok, weke ku ew di laşê wê de xwûn nebê wê laşê wê zerikî bûba. Wusa rengek bistanda.

Zarokên kurd, piştî ku ew ketina pênc û ankû şeş heyvîya xwe de wê dayik li bendê ban ku ew gotinekê ji devê xwe derxê û ew bidest axiftinê bike. Dema ku wan care pêşî gotin ji devê zarokê di bihîstin, wê zarok, êdî weke ku care pêşî axifîba û wê vê jî dilê wan pirr xweş kiriba. Heta ku wê piştî wê axiftina pêşî, wê xwarina xêrê wê biheta dayin û ankû belav kirin. Zarok, piştî ku mazin bû, wê her kirin û tişta pêşî ku bi zarokê biheta kirin, wê wateyek li wê biheta kirin. Minaq, dayikên kurd, dema ku wan pova zaroka diqûsandin, wê bi beremberî tişta herî biqiymet wê bi wezinendan.Û wê ew bidan yekî ku ew mihtacê wan bi wê tiştê hebû. Bi wê re jî wê li dora zarokê gelek sênik ku wê heryekê di wê de wê yek çil lib genim, yek çil lib nahk, yek çil lib nîsk û hwd, wê bi vê rengê wê gelek tişt bihetan û danîyan li dora zarokê û wê bi vê rengê ev kevneşopî bidan domandin. Zarok, dema ku ew ket şeş heyvîya xwe

de wê zarok û ku dema ku care pêşî pov û ankû pora wê qûsandin, wê zarokê dênina ardê û li sê aliyên wê tiştên weke genim û hwd, wê dênin. Zarokê care pêşî berê daba bi kîjanê de wê, bigotan qaraktere zarokê wê bi aawayê wê awa û şekl wê bistê**nê**.

Zarok, dema ku dihat heyva xwe ya duyem, wê li nava çavên dayikê raq maba. Wê hetimî li hewirdora xwe binerîya. Dayikan jî, wê pirr zêde ji vê rewşa wê re bûban alikar. Wê, zêdetirî tişt û xwe bihanîyan li berçavên wê. Zarok ku dihat heyva xwe sêyan, êdî dema wê ya ku hin bi hin ew ji pêçekê bi heta derxistin bû.Lê hinek zarok, wê zêdetir jî bihetan bipêçekê girêdan. Zarok, dema ku dihat heyva xwe ya sêyan, êdî dayikan dikarîn ku wê li ser lingên xwe yên ku weke kefamista dest li hevdû didana kom û li ser wê dirûnandin, dakû qaqa xwe bike, êdî zarokê dikarî vê bike. Ev rewşa zarokê, wê weke rewşek giring biheta hasibandin. Zarok, dema ku dihat heyva çaran, wê heyva li dunyê zêdetir bûba. Wê d û bav xwe nas bikira. Wê hin bi hin bidest derxistina dengan bikira. Wê li ser dayika xwe bigîrîya dema ku ji wê dûrket û ankû dayika wê ne li cem wê ba. Her wusa ev dema zarokê, wê weke demek giring ba. Pirr zêde dayikan di vê demê de bi wê re alaqadar dibûn. Ber ku bawer dikirin ku ev dem, weke dema zarokê a xwe ji axiftinê û li ser çoçka çûyînê re amedekirinê re dihasibandin. Dema ku zarok dihat heyva xwe ya pêncan, êdî weke ku zarokê demeka xwe ya giring tişî kiribê. Di vê demê de wê zarok, bi teybetî li ser çoçka wê were rûnandin. Wê balgih bên xistin bin çengên wê de ku xwe bi wan bigirê. Bi wê re jî, ev weke rewşa fêrbûna zarokê a li rûniştinê jî dihat şîrovekirin. Zarokên kurd, bi teybetî wê di vê demê de bidest derxistina dengan bikiran. Ev deng, wê carna weke gotinna ku zarokê bikardihanîn jî wê bihata gûhê mirov. Bo vê yekê, ev dem weke ´dema kin a pêşîya axiftina zarokê´ jî dihat dîtin û jê bahs kirin. Zarok, dema ku di vê demê de bûn, wê pirr zêde deng ji hewirdorê bi bîhîstan. Dayikan jî, bi wê re alaqadar dibûn ku zarok xwe bigihênê dengan. Her wusa, weke bawerîyekê jî bû di nava dayikên kurd de ku zarok bi dengên xweş û xweşik, zûtirîn diaxivê bû. Bo vê yekê, hertimî dikirin ku dengên xweş û xweşik li wê bidan hisandin.

Di vê demê de divê ku mirov werênê ser ziman ku dayikên kurd, wê li bendê ban ku zarok gotinekê ji devê xwe derxin. Ev gotin ku navek ba û ankû gotineka din ya ku wan di jîyane xwe de bikardihanî bû. Bo vê yekê, wê ji vê demê û pê de wê, heya wan zêdetirî çûbûba ser dengê zarokê ê ku wê derdixist.

Dema ku zarok dihat heyva xwe ya şêşan, êdî ev dem weke dema bilêvkirina gotinê a zarokê jî dihat dîtin. Wê bi pirranî, di vê demê de weke ku dayikên kurd dihênin ser ziman, wê zarok gotinekê ji devê xwe derxe. Piştî ku zarokê gotina xwe ya pşî got, wê ev weke pêvajoya wê ya pêşî biheta hasibandin û ser ziman. Wê êdî bi wê re dayikê, bidest axiftina bi zarokê re bikira. Wê ji wê re çîrok bigota. Ji ber ku hertimî dihat bawer kirin ku divê ku zarok li wan bihisênê dakû karibê biaxivê. Her wusa di vê demê de wê êdî weke dema ku hertimî li zarokê dana hisandinê bê. Zarokê, di vê demê de wê jî, hertimî heya xwe dide hewirdorê weke dihisand. Dema ku deng diçûna gûh zarokê, wê weke ku bihisanda heya xwe bide ser wan. Dayikan di vê demê de wê gotinên hesanî bijartinên bidehan caran wê ji zarokê re li ber gûhê de bigotan û dûbare bikiran. Bi wê re jî, bi demê re ew zarok, didan hisandin. Hertimî, dema ku axiftin dibûn, li wê dinerin kiu zarok şîyar bê. Zaroka ku hertimî dema xwe bi xewê bi bûhûranda, wê weke zaroka ku wê ´şevekorî´ bûba lê dihat nerîn. Vêce, her dayik, bo ku zaroka wê şevekorî nebê, wê hertimî, bike ku zaroka wê şîyar bê û bihêsênê.

Ji heyva şêşan, heftan û heştan, weke heyvên ku zarok di wan de xwe pêş dixe li wan dihat nerîn. Ji van aliyan ve li van hersê heyvan bi vê giringîyê dihat nerîn. Zarokê, di van heyvan de wê temenê axiftina xwe ya ku wê piştre bike, wê bide rûnandin. Her wusa, bo vê yekê, wê dayikan di vê çerçoveyê de heya xwe bidan ser zarokê. Wê heya zarokê, pêşbixistan. Her wusa, ev jî weke rewşeka ku dayikên kurd pirr zêde bale xwe didanê û li ser wê disekin in bû. Pirr zêde dayikên kurd li ser wê disekin ku zarok heya xwe li ser xalekê bide hevdû. Ya ku wê temenê axiftina zarokê biafiranda jî li gorî wan, ev bû. Bo vê yekê, pirr zêde dikirin ku heya zarokê pêşbixin û wê ji aliyê mejî û hisandina li deng ve bi heyîderî bikin. Di vê çerçoveyê de wê di vê demê de li ser wê bisekinîyan. Zarokan di vê demê de wê aqil xwe êdî bidest pêşxistinê bikira. Zarok, di vê demê de wê bidest bikarhanîna gotinan bikira. Wê xwe li ser çoçkê xwe bigirta. Wê li ser çoçka bidest çûyînê bikira. Wê bi wê re jî, bi hêtan ve wê hin bi hin rabûban ser pîyan. Wê li ser lingên xwe w êdî qaramên xwe bikarbihanîya.

Zarok, di vê demê de wê bidest bikarhanîna qaramên xwe bike. Qaram jî, wê bi muskulatûran bê. Dayik, wê vê rewşê bi zarokê re kifş bikin. Ew jî, wê êdî bikin ku alikariyê bidina zarokê ku qaramên xwe bikarbênê. Li gorî dayikên kurd û bawerîya wan, dema ku zarokê qaramên xwe ne baş bikarhanî û lingên xwe rast negirt, wê êdî zarok di

meşên xwe wê ´şaht´ bê. Bo ku zarok şaht nebê, êdî wê di vê demê de dema ku zarokê kir ku rabê xwe wê hertimî ji wê re bina alikar dabû ew şahtbûn bi zarokê re çênêbê. Zaroka şaht, wê ne qaramên xwe bikarbênê, wê di gavavêtinên xwe de xwehr bê. Wê lingên xwe nikaribê di sazûmanakê de biavêjê. Wê hertimî bipirsgirêk bê. Li gorî dayikên kurd, têkiliya vê rewşa bikarhanîna qaraman, bi dîtina çavên zarokan ve girêdayî heya. Bo vê yekê, dema ku zarokê rast qaramên bidest bikarhanî, wê bi wê reng di mejiyê xwe de qayd bike û wê êdî rast karibê gavên xwe biavêjê. Wê çavên mirov jî, wê rast bibînê. Her wusa di vê çerçoveyê de rewşa dîtinê û ya bikarhanîna qaraman, wê weke rewşeka ku zarokan di vê demê de bi zarokê re bi hevdû re hildaba li dest. Di vê çerçoveyê de zarok, wê hertmî bi alikarî bihişta. Dema ku zarokê, bi alikarîyê jî rabûba ser xwe, wê pirr li wê bi heybûban ku zarokê gava xwe rast avêtiba li pêşîya xwe. Zarok, di vê demê de bi wê re pirr giring a ku mirov fêrî bikarhanîna qaraman bikira.Li gorî, dayikan, du rewş li vir giring bûn ku mirov fahm bike.Yek, fêrbûna bikarhanîna lingê xwe ya di rebûna xwe de. Ya din jî, karîna kirina rabûnê ya. Ev herdû, du rewşên ku dayik, wê li ser wê sekinî ban bûya.

Rewşa fêrbûna zarokê, dema ku mirov bi demên bûhûrî ên civatê re dihênê ser ziman, her wusa bi wê re wê bi aqilê civatî ê kevneşopîkî re wê werê ser ziman. Pêvajoya mazinkirina zarokê a jinên kurd, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa divê ku mirov werênê ser ziman ku wê, weke pêvajoyek pirr demdirêj bê.

Kevneşopîya mazinkirina zarokê a di nava civate kurd de di vê çerçoveyê de weke kevneşopîyek kevn a demdirêj a. Bi dîroka wê ya civatê re li ser wê hatîya hizirîn. Her wusa, em dibînin ku hê di demên piçûk ên zarokê de wê, li fêrkirina wê jî wer hizirîn. Her wusa, ´nûbara piçûkan´ a ahmedê xanî jî minaq û birhana vê rastiya civatî ya.

Di çerçoveya têgîna civatî a kevn û kevneşopî de dema ku mirov binerê, her wusa mirov bi wê jî mirov wê kifş bike ku ji destpêkê ve hîsên mirovî ên fêrbûn û hildanê hena. Mirov di dunyeyekê de dijî. Hewirdorek mirov heya. Ev hewirdor, wê bandûra wê li ser mirov û pêşketin û pêşveçûna mirov wê hebe. Her wusa, mirov, bi rêya hîsên xwe dihilde û fêr dibê. Bi demê re mirov, tişta ku dît, mirov wê bi serwaxtbûna li wê re mirov wê fêrî w bibê. Her wusa, hişê di derbarê rewşê de mirov, dikarê weke azmûn(´fêrbûn´)a mirov a di derbarê rewşê de jî werênê ser ziman. Mirov, di nava civatekê de weke andamên wê dijî. Her wusa, ew civate ku mirov bi wê re dijî, bi ast û pîvan, hinek

rêzik, sazûman û rengekî jîyane wê ya. Rengê jîyane civatî, di aslê xwe de wê bê ardnîgarîya ku mirov ji destpêka xwe li ser wê fêr dibê ya. Dîroka civatê, hebûna civatê, her wusa rengê jîyane civatê û hwd, bi hemû aliyên xwe ve wê mirov ji wan ancamê bigirê di pêvajoya pêşketina xwe de. Mirov, di vê çerçoveyê de wê bigihijê têgîn û têgihiştineka kevneşopîkî ya civatî jî. Ev jî, wê rengekî pêşketina mirov a li gorî rengê jîyane wê civatê bê. Li vir, em divê ku vê rewşê baş fahm bikin, zarok, wê li vir, du sînorê xate fêrbûna civatî a kevneşopîkî û ya têgîna têgihiştina gerdûnî a hizrî û hwd bisekinê. Wê di vê pêvajoya wê ya fêrbûnê de kîjan alî zêde bi giranî derkeve li pêş, wê bi wê re rengê hizirkirina xwe pêşbixe. Li vir, pirsgirêka levkirina têgihiştin û fêrbûna kevneşopîkî û ya ne kevneşopîkî, wê hertimî zarokê di mejiyê xwe de bike lêpirsînê de. Mirov, wê van tiştan di pêvajoya zarokatîya xwe pirr zêde bijî. Lê dema ku mazin bû, ku bi giranî li gorî wê têgîna kevneşopîkî a civatî ku mazin bûbê, wê bi wê re ku li gorî wê dijî û ku weke andamekê wê civatê ê baş ku herî baş wê dijî jî wê êdî bike ku derkeve li pêş. Li vir, asta herêkirina mirov a li gorî tgîna kevneşopîkî ku mirov li gorî wê mazin dibê ya ne kevneşopîkî û hwd, wê li vir, jî li ser rêzik û nirxên mirovî ên keseyetîyê re wê xiyalekê hertmî xwe bide hîskirin. Li vir, her wusa, mirov herî baş di nava kîjan rengê pêşketinê wê baştirîn pêşbikeve? Ev pirs, wê hertimî, wê weke pirseka ku mirov bi wêrek wê bipirsê û ankû ne bi wêrek bê ku wê bipirsê jî, lê wê xwe bide dîyarkirin. Mirovê kevneşopîkî, wê di vê warê de dema ku rewş hat li sînorê wî yê kevneşopîkî sekinî, wê hem bi tirsihê û hem jî wê bixwezê ku bersiva wê jî bizanibê.

Li vir, divê ku mirov vê jî werênê ser ziman ku çendî ku zarok ji azmûn û cerbên xwe fêr dibê jî, di dem û pêvajoya fêrbûna xwe de di nava wê fêrbûnê û ya ku dixwezê ku wê fêrbibê de wê, weke ku ne levkirinê jî, wê bijî. Zarok, li vir, wê vê rewşê, weke dema fêrbûna xwe ya bi çanda civatî a ku heyî û her wusa bi aqilê demê ê ku heyî bi asta wê re jî wê êdî vê rewşê bijî. Lê li vir, ev ast, wê hertimî bi zarokê re gavekê bi pêşde herê. Nîşanak û birhana vê jî, wê li gorî demê û aqilê demê xwe adilandina li ser perwerde bûna mirovî re ya. Perwerde, çendî ku astaka çandî ya civatî bi rengê jîyane wê re di çerçoveya giştiya wê de bi wê re pergale wê perwerdeyê re hebê jî, lê wê zarok, wê bi perwerdeya xwe re wê derkeve li ser wê re. Zarok, li vir, asta wê ya pêşketinê, wê keseyetîya wî xwe heta deverekê bide dîyarkirin.

Zarok, dema ku li rewşan dinerê, her wusa di çerçoveya ku ew dibînê de wê bike ku vacekê di mejiyê xwe de bide çê kirin. Ya ku zarok, di mejiyê xwe de bi rengê wê re digirê û ya ku heyî, heya ku ji hevdû cuda jî bê. Li vir, ev rewş, vajî wê, dema ku mirov di çerçoveya têgîna civatî û kevneşopîya wê de mirov bihizirê, wê weke ku çawa ku mejiyê zarokê li giştîya koma ku ew di nav de mazin dibê li wê dinerê. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werênê ser ziman ku zarok, piştî bûyînê wê bi azmûn û cerbên bi dîtin, gûhdarkirin û biyên xwe yên laş re wê pêşbixe. Lê li vir, berî bûyînê di zikê dayikê de temen û potansîyala fêrbûnê weke ku temenê wê hatîya avêtin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku pêvajoyên pêşketin û pêşveçûna zarokê ji zaroktiyê û heta ciwantiyê, wê ne di ahengekê de di dewama hevdû de ne xwediyê sekneke stabîl bê. Wê gelek fektorên ku bi bandûr dikin, wê bi demê re biafirin. Dema ku mirov li xate jîyane mirov dinerê, ji bûyîn û heta mirina mirov, wê weke ku di dewama hevdû de weke ´jîyanek´ê wê xwe bide li berçav. Lê biheman rengî, dema ku mirov li ser rengê jîyankirina jîyane mirov binerê, wê gelek fektorên ku wê bandûrê lê bikin, wê hebin. Ev jî, wê li gorî rewşan xwe werênê ser ziman. Mirov, di nava jîyane xwe de wê her wusa, ji zaroktîya xwe heta ciwanîya, ji ciwaniya xwe heta balixbûna xwe û ji baixbûna xwe heta pîrbûna xwe wê, pêvajoyên jîyanî derbas bike. Her wusa, ev pêvajo, biheman rengî, dema ku mirov li ser pêvajoyên pêşketina aqil re hilde li dest, wê bi heman rengî pêvajoyna bi minaqî werênê ser ziman. Xat û pêvajoya pêşketina mirov jî, wê di vê rengê de bi jîyane mirov re xwediyê awayna pêşketinê bê. Lê aqilê mirov, her wusa, di nava xwe de wê di vê çerçoveyê de pêvajoyên destpêkê ên naskirin, piştre ên salixkirin û fêrbûnê û piştre jî li ser wê re pêvajoyên hişkirinê wê bi xwe re bijî. Di vê çerçoveyê de her wusa ew balixbûna bi aqilê mirov re ku azmûn û fêrên xwe re mirov bidest dixe wê di temenê wê de bê Pêvajoyên aqil, her wusa, wê pêvajoya pêşî, a bi zaroktiyê re bê. Ev pêvajo, li ser salixkirina rewşê û ankû bi navkirna wê re ya. Ev pêvajo, wê di nava xwe de hinekî tevlîhev bê. Her wusa di destpêkê de li ser rewşên weke ên bêhnkirin, dengkirin û naskirinê re ya. Wê bi demê re zarok, di mejiyê xwe de bigirê. Di xêve xwe de bigirê. Ev girtin hemû, wê bi şêwayekî weke azmûn û cerba mirov a ji jîyanê û dîtin û gûhdarkirin û her wusa naskirinên mirovî bin. Ev rewş, di aslê xwe de piştî ku ew ji aliyê xêvê ve hatina zantkirin, êdî wê xêv bi wan re weke rûniştandinekê temenî bi xwe re bide çêkirin. Wê di temenê wê pêşketina

destpêka axiftina zarokê û piştre jî bi lêvkirina gotinan a ji aliyê wê ve jî bê. Dengekî ku zarokê, wê bi xwe re di mejiyê xwe de digirê, wê pêşî bêalî bê. Piştî ku bihiş bû, wê bi şêwayekî darazî wê bi zarokê re temenê nêzîkatîya zarokê biafirênê. Zarok, dema ku li ser wê re hişkirinê çê dike, wê êdî wê weke nirxeka dîtinî û nerînî bikarbênê. Di wê şibekeya wê dîtin û nerînê re binerê. Li gorî wê di jîyanê de levkirin û ne levkirinên ku zarok, wê êdî li ser wê re ku kifş bike, wê rengê bûna weke darazê a wê dîtinê û ankû nerînê jî bixwe re werênê. Zarok, vê rewşê li ser hişkirin û ankû wê hişmendîya ku wê bidest xistî re wê bike. Ev rewş, wê piştre li wê werina zêde kirin. Beşên dîtinê ên ji jîyanê ku w mejiyê zarokê bigirê, wê li ser wan re jî hişkirinê bike. Her wusa, li vir, zarok, wê wê dîtina xwe ya pêşî ji bîrnekê. Lêhatinî û ankû lêkirina di nava wan rewş û wê dîtina xwe ya bihiş de wê li wê bigerihê.

Zarok, wê van pêvajoyan bi pêşveçûna xwe re ji temen ve wê bijî. Her wusa zarok, weke rastîyekê, wê rewşa ku dibînê di mejiyê xwe de bicih dike. Piştî ku di mejiyê zarokê de care pêşî bi hişkirin bû, wê êdî temenê girtinê bi hişmendî wê xwe pêşbixe û bide domandin.

Zarok, pêvajoya xwe ya zarokatiyê de wê, ji aliyê fêrbûna xwe ya li ser rewşên ku dijî re wê bidest fahmkirinê bike. Rewşên ku zarok wan dijî, wê fêrê bi zarokê re pêşbixin. Her wusa ev fêr jî, wê weke fêra azmûnan bê ku zarok wê, bi wê re xwe pêşbixe. Wê aqilê bidest bixie. Wê hişkrinê pêşbixe. Mijara fahmkirin a zarokê, her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku wê hertimî weke mijaraka sereka ya fahmkirinê bê. Zarok, ji temen ve çawa hat mazin kirin, wê bi wê re jî bidest pêşketina xwe bike. Hertimî, li ser rewşa mazinkirina zarokê re wê zarok, li rewşên civate ku ew di nav de dijî wê binerê. Heta di wê dema nerînê de wê, hem rewşên baş bibînê û hem jî rewşên ne baş bibînê. Minaq, zarokeyekî kurd, di roja me de heta heftsaliya xwe ku bi zimanê dayika xwe di ahengekê di nava malbata xwe de xwe pêş dixe, wê piştre ku w zarok bidest perwerde kir, wê ne bi zimanê dayika xwe bide perwerde bike. Zimanê dayika wê ji wê re qadaxaya ku bi wê perwerde bibînê. Li vir, ji aliyê pedegojikî ve di serî de wê zarok ji temenê xwe yê ku ew li ser pêş dikeve w dûr bikeve. Wê nikaribê wê fahm bike. Zarok, bi demê re hem bi aqilê xwe re xwe mazin diike û fahmkirina xwe re pêşdixe û hem jî, rastiyên civatî di çerçoveya aqilê kevneşopî û dîrokî û hwd de fahm dike û li ser wê re temenê xwe yê civakî ê ku wê zarok li ser wê re xwe bide domandin wê pêşbixe. Bo vê yekê, çendî ku carna di pêvajoyên pêşketina zarokê de bi hevdû re ne di ahengekê de jî bin, wê

zanîna gerdûnî a hizrî û ya kevneşopîkî a civakî, wê hevdû ji hevdû re bikina temen. Di vê çerçoveyê de wê ji hevdû sûdbigirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku pergale perwerdeyê, wê li ser pêvajoyên civakê ên pêvajoyê re wê hertimî temenê xwe nûkirinê bi xwe pêşxistina bi aqil re wê bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, rewşek biafirê. Zarok, di nava aqilê gerdûnî ê hizirkî de wê xwe pêşbixe. Çendî ku xwe bi wê re pêşxist, wê ji aliyê ve xwe pêşbixe. Biheman rengî wê ji aliyê civakî û têgîna wê ya civatî ve jî wusa bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku pergale perwerdeyê, zarokê, bi şêwayê ku di nava xwe de biaqilî sazûman kirîya wê pêşbixe. Li vir, çendî ku pêşketin hebe, wê ji aliyekî ve bişavtin jî, wê hebe. Di aslê xwe de ya ku wê zarokê, hinekî zêhn û jîra wê şevekorî bike jî wê ev rewş bê. Ber ku di çeçroveyekê de wê ew perwerde were dayin li zarokê. Zarok, derfetê ji xwe re nabînê ku derkeve dervê wê çerçoveyê. Lê di zarokatiya xwe de mejiyê zarokê, hertimî di wê mêylê de ya ku ew derkeve dervî wê. Di vê çerçoveyê de pevçûn, pêşveçûn û pêşketinên di destpêkê de ku bi keseyetîya zarokê re destpê dikin, wê di vê çerçoveyê de di nava vê rewşê de xwe bidina dîyarkirin.

.

**Bi pêvajoyên pêşketina pêşveçûna zarokê re pêşketina hiş, jîr û zêhnê zarokê**. ..

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman zarok, bi mejiyê xwe re wê di nava wê sînorê pergalî ê ´civakî´ ku hatîya xîzkirin de wê hertimî di mejiyê xwe de di nava tengezerîyekê de bê. Her rewşên ku zarok bi xwe re dijî û nikarê bi wan xwe werênê ser ziman, wê hinekî mirina jîr û zêhnê zarokê jî bi xwe re bênin. Mejiyê zarokê, di destpêka pêşketina xwe de hertimî wê bixwezê ku xwe werênê ser ziman. Wê sînoran nasnekê. Lê dema ku hin bi hin di nava sînorê ku ew dijî de ku sînor dîtin û ankû hatina danîn li pşîyê, wê zarok, pêşî bike ku wan di mejiyê xwe de û heta di jîyane xwe de derbas bike. Her wusa, dema ku nikaribê jî, wê êdî xwe radestî wan rewşan bike. Lê ev xwe radestkirin, nayê wê wateyê ku wê mejî jî xwe berdê û êdî wê hewl nedê ku dernekevê dervî wan sînoran. Wê vajî wê, mejî, wê hewldan û xabata xwe bidomênê. Mejiyê zarokê, di vê çerçoveyê de wê xwe di rewşekê de bimênê. Sînorê pergalî, wê weke bendên li pêşîya zarokê û mejiyê wê bin. Her wusa, zarok, di destpêka hizirkirina xwe de û ankû bidest xistina hiş xwe re wê xwediyê vaca xwe ya teybet bê. Bi demê re wê ew vaca zarokê, were bişavtin li gorî ya giştî a civakî û ankû ya pergalî. Di vê

çerçoveyê de wê zarok, weke ku ji destpêkê, wê ji aqilê xwe ve were qûsandin wê lê werê.

Zarok, ji pêvajoya xwe ya yeksaliyê û pê de, çendî ku mazin dibê, wê li ser laşê xwe zêdetirî sehêt(´kontrol´)a zarokê wê pêşkeve. Her wusa, wê zarok, di vê demê de wê bi aqilê xwe re pêşveçûnên mazin bide çêkirin. Di nava jîyane ku ew dijî de wê bike ku ahengekê û ankû ´balanse´kê bi xwe re çê bike. Di vê çerçoveyê de wê zarok, rengê pêşketina hewirdorê wê kifş bike. Wê bixwezê ku xwe di navê de werênê ser ziman. Her wusa, zarok, weke ku çawa di pêvajoya wê ya destpêkê de dixwezê ku were hêskirin û herêkirin ji aliyê dê û bav ve, wê bi heman rengî piştre jî, di nava wê hewirdor û civaka ku di nav de mazin bû jî, wê di nava wê hewldanê de bê. Çendî ku hat herêkirin, wê xwe wusa serkevtî û rast bibînê. Li vir, weke hîsekê wê bi zarokê re çê bibê, ku çendî ku ew hatîya herê kirin, wê êdî wê weke ast û pîvana serkevtin û rastbûna xwe jî bibînê. Di nava sînorê civakê, bi nirx û pîvana wê re wê di vê çerçoveyê de xwe pêşbixe.

Li vir, zarok, çendî ku ew di xwe de pêşxist, wê temenê sehêta wê ya li wê jî bê. Tişta ku zarokê bi aqilê xwe êdî xwe lê serdest kir, wê êdî ew temenê ji wê bûhûrîna wê jî bê.

Di vê demê de wê zêdetirî, têkiliya zarokê a bi derve wê biafirê. Her wusa, wê bibînê, kifş bike û binirxênê di mejiyê xwe de. Bi wê re jî wê zarok daraza xwe ya li jîyanê jî wê pêşbixe. Di aslê xwe de zarok, li vir, hertimî bi kifşkirin, dîtin û nirxandinê, temenê bûhûrîna ji wê asta civakî a ku ew di wê demêê de heya di xwe de dike ku biafirênê. Nirxandina zarokê, wê temenê hişmendiya wê biafirênê. Zarok, li vir, temenê ku ew li ser pêş dikeve, her wusa, wê li ser wê re şîrove û ankû nirxandinê di mejiyê xwe de bike. Lê wê mejiyê xwe re bigihij ancamna ku pirr ji wê temenê cuda û dûr in jî. Her wusa ya ku wê temenê pirr nakokîyên zarokê ên bi hwirdor û aqilê civakê demê re jî bê, wê ev bê.

Zarok, ji destpêka xwe hem civakî ya û hem jî ne civakî ya. Di vê çerçoveyê de xwediyê rewşek teybet a bi xwe re û bi pêşketina xwe ya bi keseyetîya xwe re ya. Zarok, piştî u bû ciwan û li ser ciwanîya xwe re dem bûhûrand, êdî wê bidest pêşketina xwe ya li gorî wê rengê pêşketina civatê bike bo ku di nava wê de bijî. Zarok, dema ku derfetê dervî wê nebînê ku bijî, wê bi ziman, çand û rengê jîyane wê re êdî xwe pêşbixe weke andamekê wê.

Di aslê xwe de li vir, dema ku em bahse rewşa vê zarok bikin, divê ku mirov li vir, hinekî bi teybetî bike ku zarokê fahm bike. Zarok, piştî

sale xwe ya pêşî û pê de, çendî ku dem li ser sale duyem re bûhûrandîya, wê di wê de pêvajoyn ezbûnîya keseyetîya xwe re bijî. Her wusa, têgîna ´ez´ û ankû ´ezîtîyê´, wê bizarokê re pêşbikeve. Zarokê, wê vê rewşê bi xwe re pêşbixe. Dema ku zarokê got ´ez´ û bahse ezîtîya xwe re kir, wê her wusa bi wê re bahse cudabûna xwe ya keseyetî jî bike. Ji xwe, dema ku bahse ´ezîtîya xwe´ dike, di vê çerçoveyê de têgînekê bi xwezayî dihênê li holê û dide mirov. Zarok, di vê çerçoveyê de dema ku ´ezîtîya xwe´ pêşxist û pê de, wê zarok, li gorî xwe nirxandinê û şîroveyê jî pêşbixe. Her wusa, zarok, di vê demê de wê bi mazinên xwe re dem bi dem bikeve nava nakokîyê de jî. Ev rewşa zarokê, ku xwe dide dîyarkirin, her wusa temenê wê di destpêka zarokê de heya. Minaq, di destpêka pêvajoyên zarokê ên pêşketina wê de dema ku zarok, dayika wê dixwezê ku wê razênê û ew naxwezê, dema ku dayik dibêjiyê de cilên xwe li xwe bike û ew li xwe nakê, dema ku tiştekî ku dayika wê ji wê re got nexwe û wê avêt devê xwe û xwar û hwd, rewşên bi vî rengî wê pirr zêde wê biafirin. Ev rewşên ku di nava civate kurd de weke ´harbûnîyên zarokê´ dihên bi navkirin, wê pirr zêde derkevina li pêş. Di nava malbatên kurd de herî kêm carekê jî bê dayikên kurd ji zarokên xwe re gotina ku ´ma ku tu jî weke zaroyê xalkê ba, wê çûbûba´ gotîya. Di dema ku zarokê, gelek harbûnî û gevezetî kir û ne sekinî di cihê xwe de dayikan ev gotin ji wan re digot. Ji vê gotina ku weke ´gotinaka xalkê´ di nava civatê de deng daya, dihê fahmkirin ku têgîneka civatî ya ku li gorî wê li zarokan dihê hizirkirin heya. Her wusa, dema ku hinek tevgerna dide nîşandin, ya ku ji vê gotinê dihê fahmkirin ku ew tevgerên zarokê li gorî yên civatê nayê dîtin. Bi wê re jî weke ku zarok dihê dewet kirin ku weke civatê bê û weke civatê tevbigerihê. Pêvajoyên pêşketina zarokê, dema ku mirov ji vê rewşê lê dinerê,, mirov fahm dike ku ne kêmî wê ya ku zarok, di astak mazin de ya û fahm dike. Hewirdora xwe nas dike. Wateyê dide. Carna jî, dema ku zarok tiştna dikê, ji wê re dihê gotin ku zarok, çendî ku fahm dike jî, ber çi van tevgeran dide nîşandin. Li vir, ya ku mirov fahm dike, ew a ku tevgerên zarokê, mirov nikarê bi ne fahmkirinê re û ankû bi li mirov ne hisandinê re werênina ser ziman. Li vir zêdetirî, ya ku mirov kifş dike, ew a ku zarok li gorî xwe gihiştîya astaka fahmkirinê. Her wusa, zarok, li gorî wê tevdigerihê. Her wusa, kirinên zarokê ên ku dê û bav, weke ´li wan ne hisandinê´ dihênina ser ziman û her wusa tevgerên zarokê en li gorî tevgerên civatî ên kevneşopî û hwd jî, mirov dikarê di vê çerçoveyê de hilde li dest û fahm bike. Li vir, divê ku mirov werênê ser ziman ku zarok, di serî xwe de xwediyê

têgînekê ya. Dema ku mirov wê têgîna zarokê fahm bike, mirov wê sedema wê kirina zarokê a ku ne li gorî mirov û ankû mirov aciz dike jî mirov wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de ew kirina zarokê li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi wê re şêwayekê hizirkirinê ê zarokê bi wê re kifş dike û fahm dike. Mirov, nikarê wê kirina zarokê bike sedema hêrsekê li zarokê. Ber ku zarok, bi hişekê û aqilekê wê dike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku zarok, dema ku ew bixwe kifş dike ku mirovên dervê wê ku dê û bavê wê jî bin ku wê fahm nekê, wê bidest girîyê bike. Di aslê xwe de girîyê zarokê ê weke yê ancama wê xayda wê ya û ankû dema ku wê tiştek kir û wê derfet ji dê û bav ne stand, wê hingî bi girî. Her wusa zarok, li vir, dema ku ew biser sale xwe ya pêşî ve çûbûbê û rojan ji sale duyemin dijî, di wê de ku dileyizê û yek tê wê leyistika wê çi hêncetê bê bila bibe ku bide sekinandin û ankû dawiyê li wê kirina zarokê bi wê re lê werênê, hingî, mirov dibînê ku wê zarok bigirî. Li vir, em divê ku vê rewşa zarok, weke rewşek teybet hildina li dest. Di aslê xwe de zarokên ku bi wan re tûra sînoran zêdetirî pêşketîya, wê vê rewşê zêdetirî bidina nîşandin. Lê ev zarok jî, di vê çerçoveyê de wê dema ku di kirina xwe de israr dikin û dervî vîna wan dawî li wê dihê hanîn, wê hingî bi hêrs bigirîn. Û ankû wê rûyê xwe ji mirov bikin û wê bigirin. Yan jî, wê lêva xwe bênina xwerê û piştre bidest girî bikin. Rewşa zarokê, di vê çerçoveyê de weke rewşek teybet a. Lê ev rewşa zarokê rewşek hê teybettira. Dema ku zarok, di hefteyên xwe yên pêşî de ya, wê li ser dayika xwe û şîrdayîna wê bigirî. Piştre jî, wê li ser hildana li dest bigirî. Dema ku zarok, di destê dayika xwe de ya, di xweşiyekê de ya. Dema ku di destê dayika xwe de nagirî û hedinî ya. Lê dema ku zarok, ji aliyê dayika wê ve hat danîn li ser cihê wê, wê di cih de farq bike ku tiştek ji wê kêm bûya. Ew jî, bêhn û ankû destlêdana dayikê ya li wê ya. Zarok, destlêdana dayikê, biqasî bêhn û dengê wê nas dike. Her wusa di vê çerçoveyê de ku ew zarok di xewê de jî bê, wê car bi car ji xewê rabê. Ankû, wê piştî ku hat danîn li ser cihê wê, wê ne bi gelekî re wê rabê ser xwe ji wê xewa xwe ya şêrîn a ku wê li ser destê dayikê dikir. Zarok, herî zêde wê xewa ku li ser destê dayik û li ser singa wê ku dike, weke xewek şêrîn dike. Ew xewa zarokê a pêşî ya şêrîn a. Ji vê, ti tişt di wê demê de ji zarokê re şêrîntir tûna ya. Di bin destlêdan, deng û bêhna dayikê de wê xewê bi ewlayî dike. Her wusa zarok, vê rewşê, bi xwe re pirr zêde xweşik dijî. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, di wê xewa wê de çendî ku êş di zikê de wê de hebe ji ber gaza di zikê wê de jî bê, wê ew jî wê xewa wê ya

şêrîn xira nekê. Zarok, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku dema w ya ku herî zêde xweş xew dike, wê ev dem **bê**. Zarok, wê rewşa xweş ya di nava destê dayikê de wê, piştre jî ji dayikê bixwezê. Zarok, wê piştre ji dayika xwe wê rewşê bixwezê. Wê germehîya wê ya ji nava destê wê bixwezê. Ev, wê hêsta xwe di ewlahiyê de hîskirinê wê bide zarokê. Zarok, di aslê xwe de hertimî dixwezê ku di nava vê hestê de bijî. Ev rewşên ku dibin mirov, dikarê wan ji gelek aliyan ve şîrove bike. Her wusa ji aliyê aktivîya mejî û hwd ve jî mirov hilde li dest. Lê li vir, bi zêdeyî, mirov dikarê di çerçoveya pîvanên zarokê ên binirxî ku ew bi wê re afirîna mirov dikarê lê binerê û werênê ser ziman. Herwusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku zarok, di vê demê de çendî ku mirov bi wê re ket nakokîyê de wê zarok, vê weke ne levkirina bi keseyetîya xwe re xwe kifş bike. Wê li wan nehisênê. Ya ku zarok li gorî xwe rast dibînê û ankû weke rast kifşkiriya, wê li gorî wê tevbigerihê. Ev rewşa zarokê, wê hertimî di çerçoveya pîvanên nirxî n ku bi zarokê re pêşketina re wê xwe bide dîyarkirin. Zarok jî, vê bi xwe re di jîyan xwe de dide dîyarkirin.

Pêvajoyên pêşketina zarokê, wê bi demê re xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, dema ku em bahse pêvajoya pêşketina zarokê dikin, em divê ku vê li vir, bi wê re werênina ser ziman ku em bahse hem pêvajoyên fizyolojikî û hem jî bahse pêvajoyên pêşketina zêhnî, derûnî û têgînî jî dikin. Zarok, di hundurê wê jîyane ku dijî, wê azmûnan bidest bixe. Li ser wan azmûnan re wê fêrkirinê bidest bixe. Ev di pêşketina dîtinê û bi wê re hiş, bihîstinê û bi wê biyendinê, ziman û bi wê re gotin û pêşketin û bikarhanîna wan, bikarhanîna dest, ling, dev û laşê xwe bi beşên wê yên din re û her wusa pêşketina muskulatûrên laşê zarokê û hwd. Mûskulatorên laşê zarokê wê di temenê pêşveçûnên din ên fizyolojîkî yên laş de jî bin. Muskulator, wê laşê zarokê biqaram bikin ku karibê bide berxwe. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok, van pêvajoyan bijî. Lê ev rewşên ku weke rewşên fizyolojikî na, wê bandûra wan li pêşketina mejiyê zarokê û hwd jî bê. Mejiyê zarokê, ji roja ku ew hatîya dûnyê û pê de, bidest kifşkirina hewirdorê dike. Li rengan dinerê û li wan heyîder dibê. Li rûdênan dinerê û dikê ku wan nas bike. Li dîmenan dinerê dike ku wan fêr bibê. Li kirinan dinerê, dike ku wan bialimê. Li rewşan dinerê ku wan, bi pêşveçûyîn wan re ku wan nas bike.

Zarok, van pêvajoyan di pêvajoyên xwe yên jîyanê de wê, zêdetirî pêşbixe. Her wusa, wê bi zarokê re hîskirin, wê pêş bikeve. Hîskirina zarokê, wê xwe di tevgerên wê de jî bide dîyarkirin. Piştî heyva sêyan û

pê de, wê ev hîskirin û kirinên di wê çerçoveyê de ên bi zarokê re wê zêdetir bibin. Minaq, wê hin bi hin dest û telîyên xwe bikarbênê. Wê teliyên xwe bike devê xwe û mijê. Wê zaroka ku hat berwê, wê dest û telîya xwe bike ku bike nava wê de. Wê zarok, bidest cûtina tiştan û gezkirinê jî wê bike. Ev rewş, wê hinek rewşên girig ên ku li ser hîskirinê re ku bi zarokê re pêş dikevin bin. Çendî ku dema ku zarok gezbike, ku mirov biêşênê û weke ku aciz bike jî, lê wê, ev li xoşa zarokê wê herê. Her wusa, di bin tava rojê de wê zarok, xwe baştir hîs bike. Wê razihê. Wê destên xwe hilde li jor, wê bi telîyên xwe nîşan bike. Wê zarok, **çapka** bi destê xwe bike. Ew hîskirina di nava sar û germbûnê de wê, zarok wê pirr zêde baş wê êdî bidest hîskirina wê bike. Dema ku zarok, serê wê tê şiştin û ew tê xistin nava ava hînik a hinekî germ de wê, li xoşa wê herê. Wê zarok, wê pirr zêde bi xwe re hîs bike. Ev rewşên hîskirinê, wê hin bi hin bi zarokê re zêde bibin. Tiştên ku li xoşa zarokê diçin û wan bi xweşî hîs dike wê, bi wê rengê di mejiyê zarokê re xwe bidina dîyarkirin. Her wusa zarok, tiştên ku li xoşê naçê, wê li ser wan re jî hîskirinê bi xwe re pêşbixe.

Hîsa zarokê, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveya fêrbûna wê ya li tişt û rewşan re wê xwe pêşbixe. Zarok, di vê çerçoveyê de tişta ku dijî, wan hîs dike. Hemû hîskirinên destpêkê ên zarokê, wê li ser jîyankirinên wê re bin.

Jîyankirinên zarokê, her wusa, wê di vê çerçoveyê de bi zarokê wê re wê hêsta wan ya xweşî û ankû nexweşîyê bide çêkirin.Pêvajoya xwe pêşî a zarokê de wê zarok, zêdetirî bi tahmkirinê û hwd, wê hîs bike. Minaq, dema ku tê şîrdayîn û ew şîr divexwe ji singa dayikê, dema ku ew deng dike, bêhn dike û hwd, wê hîs bike. Lê di pêvajoyên piştre de jî, wê sînorên dest, ling û hwd, ên beşên din ên laşê zarokê pêşbikevin. Wê bi serê telîya xwe hîs bike. Wê bi binê lingê xwe sar û germiyê û hwd hîs bike.Wê firkinadina li laşê zarokê ên weke ´firkandinê(´masajê´) li zarokê´ û hwd, wê pirr zêde hîs bike. Zarok, dema ku laşê wê tê firkandin û ankû rûnkirin û hwd li laşê wê dihê xistin, wê ev **germehiyaka hêstî** ya xweş bi zarokê re çê bike. Zarok, di wê demê de dema ku dengên weke ´aaahhh´ derdixe û ankû devê xwe divekê, lêvên xwe ji hevdû dûr dike û hwd, wê bi wan bide nîşandin ku ew wê zêdetirî dixwezê.

Heta ku mirov dikarê vê yekê jî werênê ser ziman ku ev rewşên firkandin û ankû ´masajê li laşê zarokê´, serşiştin, laşê zarokê rûnkirin û hwd, wê bandûra van rewşan û rewşn weke wan, wê li ser mejiyê zarokê û jîr û zêhnê zarokê jî wê hebin. Zarok, wê şîyarîya bi wan rewşan di laşê

xwe de dijî, wê bi mejiyê xwe re jî bijî. Bo vê yekê, ev rewşên ku zarokê bi laşê wê re şîyar dikin, wê zarokê bi heyîderîya wê re jî pêşbixin.

Zarok, wê bi demê re wê hîs bike ku wê hişkirina zarokê jî wê pêşbixê. Wê zarok, wê rewşan nas bike û wê hiş li ser wê rewşa naskirinê re pêşbixe. Wê zarok, tişta baş û ne baş, wê êdî bidest nasînê bike. Wê tiştên ku zirarê didina mirov û ên ku nadina mirov wê nas bike. Wê destê xwe bibê nêzî êgir û dema ku şawata êgir hîskir, wê bibêjê ´bivvv´ û wê xwe ji wê dûr bike. Wê zanibê ku ew zirar a. Wê xwe ji wan dûr bike. Li vir, zarok, hertimî bi azmûnkirinê re fêr dibê. Bo vê yekê, mirov dikarê werênê ser ziman ku ev dema zarokê, weke dema ku divê ku mirov pirr zêde li ser wê heyîder bibê ya. Ber ku hertiştî di ceribênê û azmûn dike, êdî wê tişta baş û ne baş yan destê xwe lêde û yan jî wê biavêjê devê xwe. Dema ku zarok, tiştek xwarinê ku avêt devê xwe ku ew tişt tûj bê, wê devê wê bişawitênê. Zarok, wê ji wê bi veciniqê û wê xwe dûr bisekininê. Dema ku destê xwe kir, nava avek pirr germ de û hîskir ku ew zêde germe, wê destê xwe ji wê bikişênê û zarok din, hewl nedê ku ew destê biavêjê nava avê di wê kêlîkê de. Zarok, di vê demê de dema ku wê destê xwe avêt tiştekî û destê wê êşiha, wê di cih de destê xwe bikişênê. Wê destê xwe bi şûn ve bikişênê.

Ev rewşên bi vî rengî wê bi zarokê re piştî sale pêşî, wê zêdetir bibin. Bi wê re jî wê zarok, wê rewşên nû li ser tevger, kirin û leyistikên dike û bi wê re dihên kirin re wê li wan zêde bike. Minaq, darêjkên nû bi rengên nû nas bike. Wê rewşên weke xelekan, çarkoşayan, sêkoşayan, darêjkên tiştên ku zarok bi wan dileyizê û hwd, wê di mejiyê zarokê de biafirin û wê zarok wan nas bike. Zarok, dema ku diçê bin stêrên li azmana de wê li wan binerê. Wê rohniya wan bibînê. Ev rewşên ku zarok, wan bi azmûnan bidest dixê, wê hin bi hin bizarokê re zêdetir bibin. Di vê demê de zarok, zêdetirî li ser şêwayê bi dîtina darêjkên tiştan, reng û awayê wan re dimeşê di mejiyê xwe de. Lê ev rewş, wê dimejiyê zarokê de pirr şîyarîyên giring bi zarokê re pêşbixin.Ev şîyarî, wê hin bi hin temenê hişmendiya tiştê ku bi zarokê re çê dibe wê bi xwe re biafirênê. Ev jî, wê di mejiyê zarokê pêvajoya girtinê û pêşketina zanebûnê, wê zêdetirî derxe astek nû ya giring de. Pêvajoya pêşî ku li ser tahm û ankû têjkirinê, bêhnkirinê, dengkirin û ankû bihîstinê û hwd re ya. Wê pêvajoya duyem a pêşketina zarokê, wê li ser dîtina wê re û her wusa biawakirina darêjk(´form´)ên tiştê ku ew dibînê ku di mejiyê xwe de bicih bike re wê pêşbixe. Ev pêvajoya duyem, wê zarokê ji pêvajoyek giring a pêşketinê re bide amede kirin. Her wusa, zarok, bi wê re fêrî fêrbûna li ser

dager(´sembol´)an re dibê. Fêrbûna li ser dageran û ankû ´sembolan´ re ku zarok di vê çerçoveyê de bi xwe re wê êdî dijî, wê mejiyê zarokê di wê de hin bi hin pêşveçûnan di wê de bide çêkirin. Zarok, wê êdî dageran di temenê fêrbûna xwe bicih bike. Leyistikên ku zarok, di vê pêvajoyê de biwan dileyizê, wê hinekî ew dagerên zarokê ên ku li ser wan re fêr dibê bin. Zarok, bi vî rengî pêvajoyeka ji temen ku bi dageran wê êdî pêşbixe wê bi xwe re bijî.

Dager, di aslê xwe de di dawîya pêvajoya a zarokê de wê, hin bi hin derkevina li holê. Wê zarok, di vê dema xwe ya pêşî de li ser tevger û naskirinê re wê fêrbûnê bi xwe re bide çêkirin. Tevger, di vê pêvajoyê de bo zarokê giring in. Rû û rûdênên ku zarok wan dibînê ku nas dike ku ev yên dê û bav jî bin, wê di vê çerçoveyê de jî wê karekî di mejiyê zarokê de bibînin. Ew naskirina di pêvajoya pêşî de ku zarok li ser bihîstin, bêhnkirin û dengkirinê re ku dike, wê her wusa di vê çerçoveyê de xwediyê awayekî giring bê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, baş fahm bike û werênê ser ziman ku zarok, di vê pêvajoyê de wê weke dagerên girtinê, van rewş û rewşên weke wan bikarbênê. Lê di pêvajoya piştî vê re ku taqabûlî pêvajoya piştî sê-heyvên zarokê dike, wê di wê de wê bidest naskirina darêjk(´form´)a tiştan re wê naskirinê dimejiyê xwe de bike. Her wusa, di vê pêvajoyê de zarok, bêhtirî êdî dengan jî dikarê bigirê. Di vê çerçoveyê de zarok, dema ku di vê pêvajoya xwe de ku ew tiştên ku zarok bi darêjka wan re dibînê ku bi dengî navê wan jî tê gotin, zarok, wê bidengê wan re wan tiştan bi vî rengî di mejiyê xwe de qayd bike. Zarok, di vê çerçoveyê de hîsên xwe ji girtinê vekirina. Hîsa bihîstinê, hîsa dîtinê, hîsa tahmgirtinê û ankû têjgirtinê û hwd, wê di vê çerçoveyê de ji vekirinê re zêdetirî vekirî bin. Heta ku wê ji tiştekî û ankû darêjkekê wê ev hîs hemû bi hevdû re lê biponijin. Ber vê yekê, minaq, dema ku di rajê leyistikeka û ankû lîstok xwe ku minaq ev lîstoka xezalekê bê, wê zarok bi bihîsa dîtinê wê bibînê û wê di mejiyê xwe de biwênê bike. Lê bi wê re jî, dema ku li ser wê tiştê re ku weke navê wê bihîst bi dengî, wê êdî wê jî bi xwe re qayd bike. Her wusa, dema ku ew lîstoka xezalê ku dengê xezalekê bi rastî derxe, wê zarok, li wê zarok, wê jî bi xwe re bigirê. Bi dûbarekî, dema ku piştî care pêşî ku mirov ew xezale zarokê hilda li dest û ew dengê xezalê ji wê derxist weke dema ku di destê wê de bû û ew deng ji wê derdiket, wê heya zarokê di cih de herê li ser wê û heta ku wê berê rûyê xwe jî li wê bizîvirênê û bimeyizênê.

Zarok, di vê çerçoveyê de bi xwe re li ser wê nasîna ku wê çêkirîya wê tevbigerihê. Dema ku zarokê ew deng kir, wê ew nasîna ku zarokê, berî

wê kêlîkê dimejiyê xwe de bi wê re çêkiribû, wê bivejê û wê zarok, wê bibîr bike. Di aslê xwe de ev rewş, nîşanaka tiştekî din jî ya. Nîşanaka wê ya ku mejiyê zarokê, di girtinê de wê êdî xort bûya. Xêva zarokê, êdî diafirênê û divêjênê.

Zarok, vê pêvajoya xwe ya duyem ku li ser dageran re wê dijî, wê bi wê re her tişta ku wê dît, wê qayd bike. Her qaydkirina wê jî, wê dagereka ku zarok, li ser wê re fêrbûnê dike bê. Di vê çerçoveyê de Ev pêvajoya duyem a fêrbûnê ku zarok, bi teybetî piştî heyva sêyan re wê êdî wê dijî, wê weke pêvajoya pêşxistin, girtin û ankû çêkirina dageran bê. Zarok jî, weke ku pêvajoya wê bi wê heya. Vê yekê, wê zarok, bi xwe re derxê astek bilind. Ev pêvajoya zarokê, wê heta wê dema ku zarok, navê van tişt, darêjk û hwd, bi dengînî werênê ser ziman, wê bi pêşketina xwe re û bi pêşketina zarokê re wê bidomê. Mirov, dikarê vê pêvajoyê, weke pêvajoya mîtolojikî a zarokî a bi çêkirina mîtosan a zarokê jî werênê ser ziman. Ev tişt û darêjkên wan ku zarokê ew di mejiyê xwe de girtina, wê piştre weke hişekî jî di mejiyê zarokê de pêşbikevin. Ev pêvajoya pêşketina van tişt û darêjka wan bihişî, wê weke destpêka pêvajoya sêyem a girtina dageran bi dengî û hişmendî jî bê. Wê piştî piştî pêşketina vê pêvajoyê û destpêkirina wê, wê heta demekê, ev pêvajoya duyem û ya dawî ku nû destpêkir, wê di zikhevdû de pêşbikevin. Ev di zikhevdû pêşketin, wê bi şêwayê hiş û dager ku bi hevdû re pêşdikevin û piştre wê bidest afirîna hevdû bikin re wê, hebûna xwe bidina domandin. Ev jî, wê bi xwe re pêvajoyên nû ên fêrkirinê re bi xwe re werênê. Minaq, piştre dema ku zarok, ji çîrokekê ku karibê dageran bi şêwayê **leheng** û **gernasan** ku ew derxe li holê di mejiyê xwe de wê pêşbixe. Pêvajoya ku zarok, di mejiyê xwe de leheng û ankû gernasan diafirênê, wê bi vê rengê temenê wê bê afirandin û wê ew jî bê afirandin.

Zarok, di vê pêvajoya xwe ya duyemin de wê, dagaran ji xwe re di mejiyê xwe de biafirênê. Weke kevirê di nava ava bahrê de na. Her wusa, ava li dora wê jî, mirov dikarê bişibihnê li hiş. Zarok, çendî ew di vê pêvajoyê de karê di mejiyê xwe de dageran çê bike? Her wusa, ev jî, wê bi dîtin û bihîstin û her wusa têjkirina zarokê ve girêdayî bê. Zarok, divê ku dunya derve bibînê. Divê, deng bike. Û divê ku tahm bike. Ev rewş, wê azmûnê bi zarokê re çê bikin. Her wusa li ser wê re jî wê zarok karibê hin bi hin aqilê xwe pêşbixe. Girtina lîstokan weke dageran û hwd, wê pêvajoyek giring a ji temen a destpêka bihişkirinê bê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê rastîya pêvajoya dageran û pêşketina wan werênê ser ziman.

Zarok, çendî ku ew dager di mejiyê xwe de girt û li ser wan re pêvajoyên jîyankirinê bi azmûnî ku bi ew bi leyistika bi lîstoka bê û ankû bi dîtina bi wan a dûbare û hwd bê, wê li ser wê re azmûnê di mejiyê xwe de çê bike. An jî, wê bi dîtina hewirdorê re wê zarok, vê pêvajoyê bijî.

Pêvajoya leyistina bi lîstokan, divê ku di şûnpêya mejiyê zarokê de ew, bi rakendî, hinek bîrkirinan û ankû şibandinan bi xwe re hebe. Her wusa, divê ku mirov werênê ser ziman ku destpêka pêşketina aqil û ankû ya mirovatiyê dema ku mirov di şikeftan de dijî, wê pêvajoyeka ku ew dişibihê, vê pêvajoya pêşketina zarokê a vê pêvajoyê wê bi wê re hebe. Zarok, weke ku vê bi hîssî jî bê, wê bi xwe re vê yekê hîs bike. Mirov dema ku digihijê vê întîbayê.

Zarok, wê pêvaoya dageran dema ku dijî, her wusa wê zarok vê pêvajoyê li ser dîtina xwe re bijî. Lîstok, çi azmûnê û ankû rewşê bifêrî di mejiyê zarokê de diafirênê. Ankû zarok, mêyla wê ber çi li ser lîstoka leyistinê dibê? Ev jî, weke aliyekî giring ê di temenê vê rewşê de ya. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê di serî de fahm bike ku ew lîstok, ne lîstokeka di destê zarokê de jî bê û ku tiştekî ku ew kevir bê û ankû tiştekî din bê ku li ardê jî bibînê û ku ber bi çavên wê bikeve, wê heya zarokê herê ser wê tiştê. Heya zarokê, li vir çûyîna li ser wê tiştê, bi teybetî, ji tiştê zêdetirî, diçê ser wê darêjk(′form′)a wê tiştê. Ew tişta ku zarokê bi çavê xwe dît, xwediyê darêjkek çawa ya, wê alaqaya zarokê ev bikişênê. Wê mêl û heya zarokê bi dîtina wê re herê li ser wê.

Ev rewşa lîstikê, wê çaxê, li vir, ji lîstokê zêdetirî ya giringtir ew darêjka wê tiştê û ankû lîstokê ya. Li vir, ya ku mejiyê zarokê wê darêjka lîstokê weke ku pêşî bi lîstokê re kifş dike. Lîstok, tenê, weke dagerek a. Ji wê û pê de bo zarokê, wê ti wateya wê nebê. Zarok, dema ku her ku lîstokekê dibînê, wê dilê wê bixwezê. Wê bixwezê ku xwe bigihênê wê. Her wusa, dema ku zarokê xwe gihand wê lîstokê, wê destê xwe bi darêjk û dîzayna wê. Wê li gorî ku ew hatîya çêkirin, wê rajiyê de. Zarok, di wê darêjkê de çi bi xwe re kifş dike? Ankû çi hîs bi wê re şîyar dibê? Her wusa ev rewş, hemû weke rewşna ku divê ku mirov li vir bi wê lîstoka zarokê re hilde li dest.

.

**Di dewama pêşketina zêhnê zarokê de pêşveçûnên di mejiyê zarokê de ên bi ziman re.**

Li vir, di aslê xwe de mejiyê zarokê, bi vê rewşê re dide dîyarkirin ku ew di pêvajoyek pêşketinê a bêsînor de ya. Her wusa zarok, vê yekê dixwezê bijî. Mejiyê zarokê, weke ku xwe mihtacê fahmkirinê dibînê.

Her tişta ku ew dibînê ku li berçavên zarokê weke ku darêjka, wê zarokê bixwezê ku xwe bigihênê. Ev darêjkîya tiştê, her wusa ya ku mejiyê zarokê li tiştê û ankû lîstokê şîyar dike ya. Her wusa, li vir, em divê ku vê yekê baş fahm bikin ku mejiyê zarokê, di vê dema xwe de pirr lîstokan dixwezê, bi wê re divê ku mirov vê rewşê fahm bike ku mejiyê zarokê dixwezê ku darêjkê bi hîsa wê re bijî. Bi demê re wê pirr lîstokan bixwezê. Her lîstok û ankû tişta ku bi darêjk heya wê kişand, wê zarok vê yekê bixwezê. Li vir, pirr giring a ku zarok, herê cem wê tiştê û ankû lîstokê û destê xwe bidiyê û wê fahm bike. Wê darêjka wê di mejiyê xwe de xîz bike. Ji xwe ya ku mejiyê zarokê jî dixwezê ev a. Piştî ku mejiyê zarokê ew tişt û ankû lîstok bi darêjka wê re dît, wê êdî darêjka wê kifş bike. Piştî ku ev kifşkir û dimejiyê xwe de bicih kir, wê êdî wê hin bi hin alaqaya zarokê ji ser wê tiştê herê. Wê tiştna din bixwezê. Wê zêdetir bixwezê.

Mejiyê zarokê, li vir, bi vê rewşê re dide nîşandin ku ew dixwezê ku wê darêjka tiştê di mejiyê xwe de hilde. Her wusa, darêjka tiştê dema ku zarokê hilda mejiyê xwe, wê weke darêjka wê tiştê û ankû lîstokê nemênê. Her wusa lstokeka ne zîndi ku zarok wê dikarê zindî bihizirê, wê rastî, nîşanak û birhana vê rastiyê bê.

Li vir, afrînrîya mejiyê zarokê jî hin bi hin xwe dide dîyarkirin. Her wusa, lîstoka ne zîndî ku bi zindiyî li wê dihizirê, mejiyê zarokê, di vê çerçoveyê de wê afrînerêya xwe dide dîyarkirin. Wê bi darêjkên ku mejiyê zarokê bi demê re dihilde mejiyê xwe re wê êdî wê afrînrîya xwe zêdetir jî bike. Darêjka, bo vê yekê ji zarokê re pêwîsta. Mejiyê zarokê jî, bi hîssî weke ku vê hîs dike û dixwezê. Her wusa, di vê çerçoveyê de fahmkirina wê darêjka tişt û ankû ya lîstokê, wê mejiyê zarokê bi azmûn bike. Her darêjka lîstokekê ku zarokê ew dît û destlêda û ew hilda li dest û fahmkir, wê bi wê re mejî fêr bike. Her wusa bi wê re jî, wê azmûnê bidest bixe. Her lîstok, di vê çerçoveyê de darêjka. Her darêjk jî, azmûneka. Her azmûn jî fêreka ji mejîyê zarokê re ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxatkê û werênê ser ziman ku mejiyê zarokê, di vê dema xwe ya duyem a zarokê de w, pirr zêde mihtacê bi darêjkkirinê wê bike. Her wusa, lîstok, dema ku care pêşî dikeve destê zarokê de wê, di vê çerçoveyê de karekî giring bi wê rewş û darêjka xwe di çerçoveya fêrkirina li mejiyê zarokê wê bike. Lê zarokê piştî ku ew lîstok bi darêjka wê re hilde mejiyê xwe, wê alaqaya wê ji wê bişikihê û wê kerba wê jî bişikihê. Piştî ku kerba zarokê şikeşt û pê de wê, zarok, wê di lêgerînên ji wê zêdetir û maztir de bê. Li vir, zêde

wateya gotina ´mazin´bûnê di mejiyê zarokê de wê tûna bê. Ya ku zêde wateya wê heya, wê zêde dîtin bê. Wê dîtina tiştên nû bê. Her wusa, wê zarok, di nava wê de wê weke ku xwe winda bike. Ber ku mejiyê zarokê, wê ya ku li wê digerîya wê xwe bigihênîyê de.

Her tişt, wê azmûn û fêrek bê ji mejiyê zarokê re. Mejiyê zarokê, wê di dawîya vê pêvajoya duyemin a zaroktiya ya afirandina biaqilê xwe de wê, wê bidest çêkirina lîstokên xîyalî bike. Her wusa, lîstokên xîyalî, wê weke dema dawî a vê pêvajoyê de bê ku wê alaqaya zarokê jî zêde ji ser lîstokên li berçavên wê ên ku hena wê kêm bike. Dema ku zarokê bidest xîyalkirinê kir, ya ku wê êdî ji zarokê re pirr zêde bialaqa û xweşik wê were, wê ev bê. Zarok, di vê demê de wê, êdî li xoşa zarokê biçê. Zarok, wê di jîyanê de li wê bigerihê ku tiştekî bibînê ku bersivê bide wê rewşê. Her wusa, zarok, vê rewşê di mejiyê xwe de dijî. Lê zarok, weke ku wê li dunya derve dijî xwe hîs dike. Bêdengbûna zarokê, wê di vê demê de zêdetir bibê. Bêdengbûna zarokê a di vê demê de wê di çerçoveya lêgerîna wê de bê. Lê dema ku ya ku ew lê digerihê ku wê nebînê, wê êdî zarok weke ku xwe berde û bêdeng bibê. Di aslê xwe de weke ku berê kurdên berê jî digot ku ´pêşketina şevekorîya zarokê´, dema ku zarokê di vê demê de ji xwestekên xwe re bersiv nedît, wê pêşbikeve.Hingî, wê mejiyê zarokê, wê aliyna xwe yê afêrêndêrî wê winda bike. Ev jî, wê windahiyek mazin bê bo zarokê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê, werênê ser ziman ku zarok, di vê demê de pêwîstîya afirandinê ya pirr zêde heya. Heta ku ez dikarim bibêjim ku wê ji her demê zêdetirî di vê demê de wê pêwîstîya zarokê bi afirandina bi mejî re û di mejî de wê hebe. Zarok, di vê demê de wê ji rewşa kifşkirina darêjkên di jîyanê de ku dibînê wê derbarê/bûhûrê li rewşa kifşkirin û ankû çêkirina darêjkan di mejî de bixwe. Mejiyê zarokê, di vê demê de dikeve pêvajoyek pirr aktîv de bo afirandinê. Ji wê re amede ya. Bo vê yekê, rewş û derfetê ji xwe re dixwezê. Her wusa rewş û derfet jî çi na? Ew jî, ew in mirov temenê kifşkirina zarokê biafirênê. Ev dema vê pvajoya zarokê, wê temenê demên piştre jî wê biafirênê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê mejî, bidest afirandinê bike. Mejî, divê ku wê fêrbûna xwe ya afirandinê, pêşbixe. Hinek azmûnên mejî ên berê ên li ser lîstokan re hena. Lê ew têr nakin ku mejî, li ser wan re karibê weke ku dixwezê biafirênê. L mejî, dîsa wê li ser azmûnên xwe yên ku wê girtina, wê heta sînorê xwe yê dawî, wê ji wan azmûnên xwe sûdbigirê û wê biafirênê. Mejiyê zarokê, di vê demê de destpêkek dii xwe de kirîya. Ew destpêk, ew a ku mejî êdî ketîya pêvajoya kifşan de. W kifş bike û

biafirênê. Wê darêjkan di xwe de biafirênê. Êdî mejî, ji wê asta bi dîtina darêjkê li derve û bi wê girtina di xwe de ku dike, ji wê derbas bûya. Ketîya pêvajoyek din de ku ew êdî dixwezê ku ew dixwezê bixwe biafirênê. Her wusa wê di vê çerçovey de mejî, wê ji şenberîya li berçav, wê wê heyîna darêjkê derbasî pêşxistina bi pêvajoyek razber bike. Dema ku mejî, bixwe bidest afirandina darêjkê kir, ev dibê pêvajoyek razber jî bo mejî. Di temenê wê afirandina dimejî de azmûn û fêrên wê yên ku girtina hena. Bi wê re jî, girtinên di xêvê de hena. Her wusa, zarok, gelek tiştan bi rêya rakendîyê û genetikê û hwd, ji aliyê bîolojikî û hwd ve ji dê û bav dihilde. Wê ev jî, weke xîyaleteke di mejî de di temenê wê afrînerîya mejî a di vê demê de ku hin bi hin pêş dikeve de bê.

Di aslê xwe de mejî, di vê demê de ketîya pêvajoyeka ku birazberî diafirênê. Pêvajoya pêşî a bidîtinê a şenber ku afirî li berçavê zarokê heya û mejî wê dihilde di nava xwe, wê piştre mejî ji wê derbas bike. Wê derbasî pêvajoya afirandinê a razber bike. Wateya gotina ´razber´ê bo mejiyê zarokê çi ya? Her wusa, wateya giring di vir de ya. Zarok, wê bixwe re dijî. Zarok, di mejiyê xwe de hin bi hin fêrî afirandina darêjkê kirîya. Carna dema ku zarok bi lîstokên zwe dileyizê ku ew dema ku wan dihênê berhevdû û ji wan darêjkna din diafirênê, wê di vê çerçovey de rewşekê bide li berçav. Û ankû, dema ku zarok, diraj pênûsekê û li ser rûpelekê bidest xîskirinan dike. Zarok, di wê demê de weke ku dixwezê tiştekî bi wan xizan bide dîyarkirin. Her wusa, ew xizkirinên zarokê, wê weke xizkirinna giring ên ji mejiyê zarokê bê. Çendî ku mazinek bi mejiyê xwe yê ´pêşketî´ ku nikaribê carna wateyê bide wan xîzkirinên zarokê jî, lê di aslê xwe de di wan de darêjkeka ku zarok bi wê hizirîya heya. Carna li rewşa xaniyekî dihizirê, çend xîzan ji wê dixîzênê li ser rûpel. Carna li rewşa mirovekî dihizirê, çend xîzan ji wê dixîzênê. Her wusa bi vî rengî, her tişta ku zarokê dîtîya bi darêjkî, wê di temenê wê xîzkirina zarokê de hebe. Ew xîzkirina li ser rûpel, dibê ku weke ku ew li berçavê mirov kêm bê. Lê di mejiyê zarokê de ew darêjk bi tememî heya. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê vê yekê jî werênê ser ziman ku mejiyê zarokê, ji ya ku dixîzênê baştirînî û xweşiktirin di xwe de dihawênê.

Ya ku zarok, li vir pêwîstîya wê dibînê ku biazmûnî fêrî xîzkirinê bibê ku karibê ya di serê xwe de werênê ser ziman. Rewşa mirovekî mazin(´ciwan´ û ankû ´mirovekî ku ji ciwaniya xwe derbas kirî´) ê balix, ew bixwe jî, di mejiyê xwe de pirr zêde dîtîya û bi fêr a. Lê ew jî heta ku ew fêrî xîzkirina bi pnûsê û hwd li ser rûpelê nebê, wê nikaribê bixîzênê. Ne xîzkirina wî mirovê ciwan ê mazin, nayê wê wateyê ku ew di mejiyê

xwe de nizanê û ankû ne bidîtîn a. Rewşa zarokê jî, di şêwayekî bi vî rengî de mirov dikarê li wê bihizirê û wê werênê ser ziman. Her wusa rêya xwe hanîna ser ziman, li vir weke ku bi şêwayên ku ew divê, pêwîstî bi wê heya. Pêwîstîya zarokê jî, di wê dema xwe de bi wê heya.

Zarok, di mejiyê xwe de pirr pêşketîya. Heta ku dibê ku zarok, di hinek rewşna de kirinên mazinên xwe jî bikêmesî bibînê, wilqasî di mejiyê xwe de li pêş a. Her wûsa di vê çerçoveyê de zarok, bi mejiyê xwe re li pêş a. Lê dibê ku nikaribê wê werênê ser ziman. Zarok, dema ku wê kêmesîya mirovê ciwan ê ji xwe maztir dibînê, ma dikarê ji wê zêdetirî wî zêdetir werênê ser ziman? Zarok, di vê demêê de çendî ku pêşketîya, lê laşê zarokê hinek astengîya li pêşîya xwe hanîna li ser ziman a zarokê çê dike. Her wusa, zarok, li vir, pêwîstî bi fêrbûna tevger, kirin û hwd heya. Ya ku wê zarokê, bike ku ew xwe baştirîn wêrênê ser ziman jî bê, wê ev bê.

Mejiyê zarokê, li vir, ji du aliyan ve pêwîstî bi fêrbûnê hertimî dibêt. Ji aliyê pêşî ve dixwezê ku dunya derve fêr bibê û hilde hundurê mejî. Aliyê din ê duyem jî, ew a ku pêwîstîya bifêrbûn û azmûnkirina bi tevger û kirinan û hwd heya. Zarok jî, vê yekê, bi xwe re hîs dike. Di vê demê de dema ku zarok, ji van aliyan ve wê hin bi hin hîs bike ku ew di rewşek kêm û ankû di rewşek astengdarekî de ya. Li vir, giringa ku mirov nehêlê ku zarok, vê hîs û hêstê bixwe re bijî. Her wusa, ev hîs û hêst, dema ku hat hîskirin û zarokê di mejiyê xwe de ji xwe re hanî ser ziman, wê ev weke rewşek şikeştinê ya bi zarokê re bê. Wê bandûrê li vîna zarokê ya fêrbûn û tevgerkirina wê bike.

Zarok, di vê pêvajoyê de wê ji aliyê pêşketina hişê xwe ve wê gavna giring biavêjê. Wê pêşketinê bi xwe re çê bikê. Di vê demê de biawayekî xwezayî, wê li ser azmûnên zarokê re wê hişê zarokê biafirê. Lê li vir, rewşa zêhn û jîra zarokê, wê xwe biawayekî teybet bide dîyarkirin. Her wusa, çendî dikarê wan darêjkên ku di mejiyê xwe de girtîya ku ew ji wan karibê biafirênê, wê bi wê re wê jîr û zêhna xwe bide nîşandin.

Zarok, di vê demê de wê êdî dagerên razber wê bidest afirandina wan bike. Wê biafirênê. Ev pêvajoya zarokê, giringa ku mirov li ser wê bisekinê. Her wusa, pêvajoya zarokê a bi şêwayê hizirkirinê ku ew bi wê ji şenberîyê gavê diavêjê li razberîyê, wê bi vê rengê rengê hizirandina li ser hiş re jî bê. Dagerên şenber, tiştên li berçav ku zarok wan dibînê, lîstokên ku zarok bi wan dileyizê û hwd in. Her wusa, tiştên ku zarok hem wan bi deg digirê û hem jî di dîroka darêjka wan de dîmenê wan zarok pirr zêlal dihilde ya. Zarok, hertişta ku zarok wan dibînê, di vê

çerçoveyê de wê darêjka wê bi şenberî di mejiyê zarokê e rûnihê. Ew rewşa hîskirina zarokê a li ser dîtina şenber re wê zarokê pirr di wê de û bi teybetî di mejiyê zarokê de wê zarokê, bifirênê. Her dîtin, wê pirr bi hey û xarîb ji zarokê re werê. Zarok, wê ji wê bi dilper jî bibê. Dema ku care pêşî zarokê re dît, wê piştre cardin jî bixwezê ku wê bibînê. Bi vê re wê zarok, hertimî bi wê hîs û hêsta ku ew bi wê dixwezê ku ew xwe bigihênê wê şenberîya darêjkê, wê bijî. Darêjka şenber, wê di mejiyê zarokê de weke hizrekê çê bike. Zarok, vê naqlê, wê hizrê, bi dîtina xwe re wê dijî. Dibê ku ew care ku ew wê dijî, nikaribê wê bi navkê û werênê ser ziman. Lê bi dîtina xwe re wê dîjî.

Pêvajoya duyem a pêşketina aqilê zarokê, wê di vê çerçoveyê de wê li ser darêjka şenber a ku ew dibînê û wê digirê di mejiyê de re wê bijî. Her wusa, wê jiv ê rewşa darêjka şenber, heta ku zarok bi mejiyê xwe ew xwe têr hîs bike, wê ew vê pêvajoyê bijî. Wê ji wê, darêjka şenber, zarok xwe mazin rûnênê. Ev pêvajoya ku bi darêjka şenber re dibê, wê weke pêvajoya hevnasîna zarokê a bi dunya derve a bicism re jî bê. Wê zarok, têrbûna di pêvajoya darêjka şenber de wê, bi gihiştina têgihiştinaka xort û têr a darêjka şenber re wê derbas bike. Pêvajoya ku zarok bi mejiyê xwe re derbasî wê dibê jî, wê pêvajoya darêjka razber bê ku ew di vê pêvajoyê de wê têgihiştina darêjka şenber dike temenê wê de û li ser wê re êdî ew diafirênê. Zarok, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de pêvajoyek giring û pirr zêde tişî derbas dike.

Di vê pêvajoyê de têgîna darêjka şenber, wê bi dîmen û dîtina tiştê û nasîna wê re wê xwe bi zarokê re pêşbixe. Zarok, wê vê pêvajoyê tişî û tişî bijî. Wê zarok vê pêvajoyê, bi têrehî bijî. Zarok, di vê demê de têgîna darêjkê a şenber, bi rûnandina wê ya di mejiyê xwe de re wê derbas bike. Darêjka şenber, wê rastîya dunyê ya dervî zarokê bi zarokê bide nasîn. Mirov dikarê vê pêvajoyê, bi vê rengê şîrove bike û fahm bike. Piştî vê nasînê re wê zarok, bidest afirîna li ser wê re bike. Zarok, pêvajoya pêşketina a bi darêjka şenber û nasînê re ku dibûhûrênê, wê piştre li ser wê re afirînê pêşbixe. Pêvajoya afirînê, wê demekê jî bi vê pêvajoya darêjka şenber û nasînê re wê di zikhevdû de wê pêşbikeve. Bi demê re wê zarok, bi tememî, darêjka razber bi afirînê li şûna ya darêjka şenber êdî bi demê re bidest pêşxistinê bike. Ev jî bi demê re wê, têgîna darêjka şenber, weke kirasê têgînî, hişî û hizirînî wê pêşbixe. Ev şêwayên aqil, wê şêwa û rengên hizirkirinê ên dema darêjka razber bin.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok çendî ku darêjka razber derdixe li pêş jî, wê bi şêwayekî ku ew darêjka

razber ku bi têgîna darêjka şenber re hatî hûnandin re wê bijî. Çîrokên ku ji zarokê re dihên vegotin, wê şenberîya di rengê vegotina wan de wê, vê rastîyê bi xwe re werênina ser ziman. Şêwaya hizirkirinê a darêjka razber ku kirasê darêjka şenber li wê hatîya kirin, wê zarok, wê bi xwe re pêşbixe. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de zarok, wê bi rengê darêjka şenber, wê di destpêka pêvajoya ku ew darêjka razber dijî de wê di destpêkê de bi darêjka razber bijî.Ev pêvajo, wê zarok, bi aqilê xwe bi şêwayekî ku ew, pirr bi hîs û hêsta xwe bi wê re tevlîhev dibînê re wê bijî. Zarok, teybetîyên ku ew kifş dike, wan di xwe de bicih bike. Zarok, wê êdî wê bi lîstokan ne leyizê. Zarok wê, li çîrokan bihêsênê. Wê, ji wan çîrokan wê di şêwayê wan lîstokên xwe yên berê de ku ew wan bi şenberî dijî wê qarakterên leheng û gernasan wê êdî ew kifş bike. Wê li ser wan re bi têgînî û têgihiştinî wê êdî wê ew dunyê fahm bike. Keseyetîyên lehengî ên di wan çîrokan de ku zarok, wan fahm dike, wê qarakterê wan nas bike. Her wusa, zarok, dema ku wan fahm dike û car bi car, di mejiyê xwe de ku ew, xwe dike dewsa wan de û ew, xwe weke wan dibînê, her wusa hinekî jî bi rengê keseyetîya zarokê a ku ji nû ve diafirê ve girêdayî ya. Her tişta ku zarok bi şêwayê qarakterî fahm dike û wê, tişta ku ji wê fahmkir ku ew di xwe de nabînê, wê ji xwe re jî bixwezê. Hewldana zarokê a xwe weke dîtin di mejiyê xwe de wê, weke hewldanaka xwe pêşxistinê jî bê. Zarok, dema ku xwe weke wê dît ku ew rewş fahmkir û têj û tahma wê girt, wê êdî zarok ji wê derbas bike. Şêwayê têjgirtina ji wê qarakterê ku zarok, bi xwe şibandinê re ji wê digirê, wê şêwayekî fahmkirinê û ankû hewldana gihiştina têgihiştina wê bê bi zarokê re.

Piştî ku zarok, gihişt wê asta ku ew ji çîrok û hwd, qarakteran fahm dike û dihilde, wê zarok êdî wê gihiştibê wê astê ku ew qarakterê xwe yê ku afirandî, hin bi hin pêş dixe.Her şibandina zarokê a xwe li wan qarakteran, mirov nikarê bi tememî di wê şêwayê de fahm bike. Zarok, bi wê rengê, hinek xosletên keseyet û zanînê, bi wê rengê xwe bi wan dide nasîn û wê fahm dike û piştre xwe ji wê dibûhûrênê. Zarok, şêwayê fahmkirinê, têjgirtinê, têgihiştinê û hwd, weke şêwayê xwe li ser wê re pêşxistinê bikardihênê. Fahm dike û ji wê dibûhûrê û derbas dibê. Xwe şibandina zarokê a destpêkê, hinekî valahîya zarokê a bizanînê dihênê ser ziman. Zarok ku ew zanîn bidest xist, wê êdî wê nekê. Piştî ku zarok, xoslet fahmkirin, wê başî û ne başîya wan xosletan ji hevdû cuda bike. Li ser wê re ji hevdû cudakirinê wê bi xwe re pêşbixe.

Zarok, wê bi demê re li ser van pêşveçûnên ku ew dijî re wê hin bi hin keseyetîya xwe biafirênê. Her jîyankirina ku ew dike, di aslê xwe de azmûneka ku zarokê, hinekî din bi ber keseyetîya wê ve dibê ya. Li ser ya xirab û ne xirab re wê zarok, ya rast û ne rast wê ji hevdû cuda bike. Wê ya rast çiya û ya ne rast çi ya, wê kifş bike. Zarok, bi vê rengê, wê hin bi hin xwe bi nirx bike û daraza xwe biafirênê.

Zarok, wê vê demê de dema ku ew van ji hevdû cudakirinên bi başî û ne başîyê ji hevdû dike wê, bi wê re helwesta xwe êdî wê bide nîşandin. Zarok, piştî ku tê ser dusalîya xwe re wê êdî biawayekî vekirî vê bi xwe re bijî. Her wusa, di mejiyê xwe de kifş dike. Dihizirê. Bihiş dibînê. Deng dike û dihisênê. Bihisandinê re dibihîzê. Her wusa di vê çerçoveyê de zarok, êdî van bi xwe re dijî.

Zarok, di vê demê de di aslê xwe de xwediyê potansiyeleka ji ya wê dema xwe ya fizyolojikî zêdetira a bi hizirkirinê wê re bi wê re heya. Li ser wê potansiyelê re diike û dixwezê ku ew bike. Bo vê yekê, ew di wê dema xwe ya piçûk de wê di kirina xwe de gelek tişt û rewşên ku mazinên zarokê dikin wê zarok, bide berxwe û bike ku bike. Zarok, ber ku di xwe de ji ya ku mirov bi wê re dibînê zêdetirî di mejiyê wê de bi wê re heya. Her wusa, zarok, di hizirkirinê de wê di vê demê de pirr zêde li pêş bê. Wê di afirandinê de wê zêde li pêş pêş. Di vê demê de wê zarok, hin bi hin bidest jîyankirina nakokîyan bi hewirdora xwe re bike. Her wusa, ev nakokî, wê bi zarokê re hem li ser rewşa jîyane civatê bê û hem jî wê li ser reng û şêwayê hizirkirinê bê. Mirov, ku mazin bû, di mejiyê xwe de bi aqilê xwe re vaceka xwe diafirênê û li gorî wê nêzîkatîyên xwe yên ´adilandî´ dide dîyarkirin û dihênê li holê. Zarok, vê yekê dervî xwe dibînê. Zarok, ji wê zêdetirî, di mejiyê xwe de xwediyê vace xwe ya teybet bê. Her wusa, li vir, reng û şêwa û pîvanên vac û ankû mantiqê zarokê, wê ji ya mazinan cudatir bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok wê di mejiyê xwe de û di rengê hizirkirina xwe de ji ya mazinên xwe cudatir bê. Ya ku rengê hizirkirinê mejiyê zarokê dide dîyarkirin, zêde ne bi sînor a. Sînor ji wê re tûna na. Lê rengê hizirkirina mazinan ji wê re pirr zêde sînor hena. Zarok, hê di mejiyê xwe de rastî wan sînoran ne hatîya. Hê zarokê ew sînor di mejiyê xwe de kifşnekirina. Bo vê yekê zarok, wa sînoran nasnekê. Ew sînorên mazinan bi pîvanên wan re bo zarokê nabûhûrin. Carna hinek mazin dihizirin û ji zarokna ku wan tiştna ku li gorî wan ne rastkirina re gotinê dibêjin û dihênina ser ziman ku «ne, li berçav a ku ev ne rast a, ma nabînê.» Di vê çerçoveyê de zarokê li gorî xwe wê bi nerîna xwe re bidarezênin. Lê çendî ku ew

mazin li gorî xwe ji zarokê hêvî bike jî wê zarok, weke xwe bike. Ber ku zarokê hem ew sînorê mazin kifşnekirîya û hem jî li gorî xwe ew xwediyê pîvan, nirx û nêzîkatîyê ya. Çendî ku ew zarok piçûk jî bê, rastî ev a.

Zarok, wê bi aqilê xwe re hin bi hin wê êdî pêşbikeve. Wê dunya dervî xwe wê bidest kifşkirina wê bike. Dunya derve wê zarok, bi wê re li ser hişê wê yê ku pêşdikeve re wê kifş bike. Hişmendî, ji vê demê û pê de wê hin bi hin pêşbikeve. Zarok jî, wê hin bi hin pêşveçûna bi xwe re wê kifş bike. Di vê demê de wê zarok, bi nêzîkatîya xwe re wê pirr zêde hêstîyar jî bê. Şêwayê aqilê zarokê, ji aliyekî ve mirov dikarê bişibihênê aqilê hêstîyar jî. Her wusa, zarok, di vê demê de wê zû karibê bixayidê. Wê dilê xwe bigirê û şawitênê. Wê dilê xwe, bixwe bişawitênê(´sotênê´). Dilzîzîya zarokê, wê di vê demê de wê pirr zêde pêşbikeve. Her wusa zarok jî, wê bi xwe re dijî. Hîs dike. Tiştan, rewşan û her wusa hewirdorê zarok, pirr zêde hîs dike. Biqasî ku zarok bi hişê xwe re dijî, wê wilqasî jî bi hîs û dilzîzîya xwe re jî bijî. Zû şikeştina zarok ji kirin, tevger û gotinên ku ew dibihîzê ji mazinên xwe re, hinekî jî bi vê ve girêdayî ya.

Di vê demê de zarok, bi nêzîkatîya derûnî ya teybet nêzîkatîyê li xwe ji mirov dixwezê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov kifş bike û werênê ser ziman ku w zarok, di vê demê de pirr zêde ji şikeştinên piçûk re vekirî bê. Gotunek, kirinek û ankû rewşek ku mirov ne farqê de jî bê, dibêt wê bandûr li zarokê kiribê û ew zîzkiribê û heta ku şikandinê bê. Zarok, di vê demê de wê şikeştinên xwe yên ku ew dijî, wê bike du beş. Beşekê li ser bertekên ku ew dide nîşandin re wê bide dîyarkirin û nîşandin. Lê beşekê jî wê zarok di xwe de bihêlê û wê di xwe de wê bijî. Ev şikeştinên ku piçûk in û zarok wan diavêjê hundurê xwe, wê di hundurê zarokê de pirr zêde mayinda bimênin. Heta ku hinek ji wan wê herina mejiyê piçûk ê binî û li wir bicih bibin. Zarok jî, wê weke ku bo demek kin ew jibîrkiribin wê lê were. Lê her kêlîya ku ew rewşên şikeştinê di mejiyê bin de na, wê bêî ku zarok jî di hiş û farqe wê de bê, wê ew rewşa şikeştinê ku ew di mejiyê piçûk ê binî de bicih bûya, wê nêzîkatîyên zarokê bide dîyarkirin. Di vê demê de ber ku zarok zêdetirî hêstîyarî bi wê re pêş dikeve, ev asta hêstîyarîyê wê bi zarokê re zêdetirî derkeve li pêş. Her wusa, divê ku mirov di dewama wê de vê jî werênê ser ziman, bandûrkirin û her wusa rewşên vê demê ku ew bi vî rengî li ser kirin û tevgerên mirov bi bandûr in, wê hin bi hin di pêşketina qaракterê mirov de jî bandûra xwe bidina dîyarkirin. Aliyekî pêşketinên vê demê ê zarokê, ji vê aliyê ve jî xwe bi teybetî dide dîyarkirin.

Bo vê yekê, bi vê re divê ku mirov bi teybetî bibêjê ku zarok, wê di vê demê de her tişta ku wê bijî bi xwe re wê ancamên wê yên mayinda ên bi keseyetîya zarokê re wê hebin. Di vê çerçoveyê de ev rewşên zarokê ên ew wan dijî, zarok, wan bihiş dijî û wan baş hîs dike. Bo vê yekê zarok, wan pirr zêde mazin dijî di xwe de. Gelek tişt û rewşên ku zarok wan dijî, wê bi zarokê re bin. Her wusa, zarok, li bendê dibê di destpêkê de ku ew şikeştinên wê werina kifşkirin ji aliyê mazinên wê ve û werina derman kirin. Zarok, di vê demê de carna dema ku ew ji mazinên xwe xayidî, wê herê di kûrçik(´konçik´)ekê de rûnihê weke ku ´xayidî´. Wê, berê xwe jî dibê ku bide hêtê ku li wê rûniştîya.

Ev rewşa zarokê, weke rewşek teybet a û divê ku mirov bi nêzîkatîyek teybet nêzîkî wê bibê. Dema ku zarokê bi vê rengê xayidî, divê ku mirov bi wê nêzîkatîya teybet û bi wê hêstîyarîya wê nêzîkatîyê lê bike. Her wusa, rewşa ku di vê demê de wê pirr zêde alikarîya wê ji zarokê re wê hebe, wê ev bê. Zarok, wê vê yekê pirr zêde bi xwe re hîs bike. Lê dema ku zarok wusa xayidî û mirov jî, weke ku li hemberê wê bêalaqadar a, wê zarok, wê rewşê bi xwe re pirr zêde dirêj wê bijî. Wê dûrketinê bi xwe re ji mirov pêşbixe. Wê her wusa, nêzîkatîyên bi vî rengî ji xwe re weke nêzîkatîyên refarans herê bike û li ser wan re ew jî nêzîkatîyê li yê li hemberê xwe bide nîşandin. Li vir, pirr giring a ku mirov li ser kirin û tevger û nêzîkatîyên zarokê re zarokê, bi şêwayekî ku ew di vê çerçoveyê de wê bijî bi darazî nêzîkî wê nebê. Her wusa, di vê demê de çendî ku mirov di farqê de bê û ankû dibêt ku mirov ne di farqê de jî bê, mirov nêzîkatîya ku mirov li hemberî zarokê da nîşandin, wê zarok, wê nêzîkatîyê weke refarans herê bike. Wê zarok, wê nêzîkatîyê bi cidîyetekê di mejiyê xwe de hilde li dest.

..

**Pêvajoyên pêşketina pêşveçûna zarokê a bi pêşketina ziman re. ..**

Zimanê zarokê, berî ku ew bidest axiftinê dike dest bi pêşketina xwe dike. Dema ku dêûbav, binê zarokê digûharênin, wê bi gotinên weke «ay zaroka min binxwe lewitandiya», «bi xwe de rî ya», «ezê nûna bin te paqij bikim» û hwd, wê gotinên bi vî rengî bikarbênê. Bi heman rengî dema ku serê zarokê dişoyê, dêûbav dibêjin «oy oy, wê keç im nûha serê xwe bişoyê» û ankû wê bêjê «kûrê min, wê nûha serê xwe bişoyê» û hwd. Bi vî rengî wê gelek gotin, di herîkîna jîyanê abi zarokê re li ser rewşan re wê werina gotin. Ev gotin, wê bi dengê wan re wê herina zarokê. Carna jî dema ku zarok digirî bo ku ew were haşkirin, wê gelek gotin bo wê li dûv hevdû werina gotin. Zarok, wê dengê van gotinan jî bi

xwe re bigirê. Ev gotinên ku dêûbav û ankû hinek mazinên din, wê dem bi dem di gûharê zarokê de wê bibêjin, wê zarok bi dengê wan re wê wan gotinan di xwe de bigirê. Çendî ku ew di wê demê de nikaribê biaxifê jî, wê di mejiyê xwe de xwediyê hinek gotinên ku ew bikarbênê bê.

Gotinên ku zarok di vê demê de digirê, wê ji nava wê rewşa civaknasî ku ew di nav de dijî wê ji wê bigirê. Her wusa, di nava wê malbatê û rewşê de çendî gotin û bi çi şêwayê dihên bikarhanîn, wê zarok wan bi deng û şêwayê wan re wê bi xwe re bigirê. Pêşketina zimanî wê hertimî bi mirov wê hebê. Heta ku mirov bijî, wê pêşketinên bi ziman re wê bi mirov re wê hebûna xwe bide domandin. Her wusa, zimanê dayikê bi teybetî pirr giring a bo zarokê. Wê zarok di wê de sînorê ji pşketina xwe re wê nasnekê. Zimanê dayikê wê ji zarokê re wê gelek deriyên pêşketinê wê bide vekirin. Zarok, di nava jîyane ku ew dijî de ku ew çend zimanan his bike, wê karibê wan fêr bibê. Zarok, heta ku ew tê 7 salîya xwe dikarê ji zimanê dayika xwe zêdetir zimanên din jî fêr bibê. Pirrzimanetiyê bi xwe re pêşbixe. Li vir, ev weke rastiyekê hatiya piştrastkirin ku mirov, dema ku zimanê zikmakî ê dayika xwe ku ew bi mazin dibê, wê di fahmkirina xwe, xwandin û nivîsandina xwe û her wusa aqilgirtina xwe de wê zêdetirî wê karibê bi serwerî xwe bi pêşketina xwe re bide dîyarkirin.

Deng derxistina zarokê, wê ji zarokatîya wê destpê bike. Ji dema ku zarok hatiya dunyê û pê de wê zarok, bidest derxistina dengan bike. Zarok, wê dengan derxe. Di destpêkê de wê zarok, rewşên weke girî, ken, nerînên dirêj, labitandin û hildana dest û lingên xwe, bi germ û sarbûnê û hwd re wê têkiliyê dênê. Zarok, wê di hefteyên xwe yên pêşî de jî wê gelek dengan, piştî ku ew hat dunyê wê kifş bike. Zarok, di nava rewşên germ de wê bertekna bide nîşandin. Bi heman rengî, wê zarok di rewşên sar de jî wê bertekna bide nîşandin. Zarok, wê di hersê heyvên pêşî de wê dengan bigrin û nas bikin. Wê zarok, xwe li ser deng û bêhnê re wê bike ku fahm bike. Lê dema ku ew gihişt heyva xwe ya sêyan û ji wê bûhûrt, wê bidest derxistina dengan bike. Wê bidest derxistina dengên ku ew li wan motive bûya derxe. Lê dema ku mirov wan dengên zarokê bigirê û ankû qayd bike û li wê bide hisandin, wê zarok bertekê bide nîşandin. Zarok, piştî ku gihişt, heyva xwe ya li dora 5 û 6´an, wê êdî bidest bikarhanîna gotinan bike. Her wusa gotinên weke ´yadê´, ´baba´, ´dada´ û hwd wê derxe. Wê bi demê re dengên ku ew his dike, wan bike ku dûbare bike. Ev rewşa zarokê, wê weke amedekarîya wê ya ji axiftinê re jî bê.

Her wusa, ji dengên ku zarok bi xweza derdixe, wê hin bi hin weke ku dengê tîpan wê derxe. Dengên weke ´p´ û ´b´wê derxe. Piştre jî wê dengên weke ´m´ wê li wan zêde bike. Ji nava dengên tîpan ên hesanî kîjan in, wê zarok wan derxe. Zarok, wê vê rewşê heta ku ew heyva xwe ya hêst û nehan, wê êdî zarok dengên gotinî ên zelal wê derxe. Zarok, di vê demê de wê bidest bikarhanîna gotinan bike. Zarok, di vê demê de ew çi gotinê his bike, di xwe de bigirê û wê wan weke ku dûbare bike.

Zarok, di vê demê de wê bi dengên ku ew derdixin re wê bikin xwe werênina ser ziman. Li vir, ya pirr giring dibê ew a ku mirov, divê ku katibê dengên zarokê baş dahûr bike û fahm bike. Her wusa li ser dengên wê re têkiliyê bi wê re dênê. Ew dengên zarokê ku wê mazinen wan dibêt ku ew fahm nekê, lê dema ku mirov bi rewşên zarokê re wê hilde li dest, wê ew weke xwe hanîna zarokê a li ser ziman bê.

Zarok, wê bi girêdana bi dêûbavê xwe re wê bijî. Lê zarok, hertimî wê bi têkiliyên xwe yên ku ew didênê re wê herênî bê. Zarok, rewşên ku ew wan dijî bi dêûbavê xwe re wê di mejiyê xwe de wan bicih bike. Li vir, di destêpêkê de divê ku mirov werênê ser ziman ku ew rewşê, bi navkirina wan, wê di mejiyê zarokê re rûnihin. Hemû pêşketina zarokê a di vê demê de wê li dora dê û bav bibê. Wê gotinên ku dêûbav dema ku têkiliyê bi wê re didênin bikardihênin, wê zarok wan di mejiyê xwe de pêşbigirê. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman kiu zarok heta ku tê 2 saliya xwe, wê gelek gotinan fêr bibê û bikarbênê.

Zarok, wê her roj, gotinan fêr bibê. Dema ku dêûbav û ankû mirovna din li cem zarokê axiftin, wê zarok hetimî gotina ji wan bigirê di mejiyê xwe de. Zarok, di vê demê de wê bidest kifşkirina xwe, hêza xwe ya afirandinê û hwd, bike. Di vê demê de wê bidest xwarinê bike. Carna jî, dema ku ew xwarinê dixweê, dixwezê ku ew avê jî vexwe. Zarok, di vê demê de wê bixwezê ku avê vexwe. Zarok, ji aliyê fîzîkî ve ne biserê xwe ya ku ew karibê wê biserê xwe bike. Bo vê yekê, weke ku zarok di farqe vê debê, wê bi deng, girî û her wusa bertekên xwe yên bidengî û bi tevgerî û hwd re wê bide dîyarkirin ku ew birçîya û ankû avê dixwezê vexwe.

Zarok, di vê dema xwe de ew wê bidest fahmkirinê bike. Minaq, dema ku mirovek ji zarokê bipirsê ku ew li kû dijî, wê zarok, bi teliya xwe wê nîşan bike û bibêjê ´derehe´. Her wusa, wê gotinan li dûv hevdû wê wê bikarneyênê. Wê zarok, bi nîşankirinê wê bide nîşandin. Bi wê re jî wê zarok, heya ku bi gotinekê bêjê ´ez li derehe dijîn´. Ankû bêjê´ ´mala me va ya´. Zarok, wê devera ku ew li wê dijî, wê wê nas bike. Wê

gotinê li ser wê re wê nasînê û deverê re wê bibêjê. Zarok, di vê demê de wê wê nasîna xwe pêşbixe. Minaq, lîstokên zarokê ên ku ew bi wan dileyizê û hena, wê zarok wan nas bike ku ew çi na û ankû ji çi na. Ew ku keçikek bê, ew ciwanekî kur bê, ku ew lîstok sawalak bê û hwd, wê zarok wan nas bike. Lê zarok, wê li ser lîstokan re ji wê zêdetir jî bi zimanê xwe bike. Minaq, ew lîstok ku lîstoka jinek xweşik û povdirêj bê û navê wê yê navdar ku ew di nava civatê de were nasîn bê.,wê zarok, wê jî nas bike. Wê navê wê bibêjê.Minaq li rojava û ankû li ´ewropa´ lîstoka sîndirella´ tê çêkirin. Zarok, dema ku ew li wê dinerê, wê li sûna ew bibêjê ev lîstika wê, bi wê navê wê yê wasifî re wê wê lîstokê nas bike. Wê bibêjê, ´ev sîndirelle ya´. Bi vê rengê, her lîstoka ku navê wê heya, wê ew navê wê lîstokê, weke kirdeya wê gotina lîstokê bê. Bi wê rengê, dema ku zarok li wê lîstokê dinerê, wê zarok, wê navê wê lîstokê bi wê re wê bibîr bike.

Zarok, wê di sê û ankû çar salîya xwe de wê bidest danîna têkiliyê di nava gotinê û fizyolojikîya laş de wê dênê. Gotin, wê di mejiyê zarokê de weke têgînekê wê bimênê. Minaq, dema ku zarok girî û ne hedinî, ku dayik destê xwe bi ser serê wê re dibê û tênê û wê difirkênê, wê zarok bi wê re wê bihedinê. Her wusa, di nava wê firkendina destê dayikê û wê gotina ku ew ji dev dihênê ser ziman bo hedinandina zarokê, wê zarok têkiliyê bi wê nêzîkatîya dê re wê bi wê re dênê. Gotin, wê di vê çerçoveyê de wê bi hiş, weke hêzek fizyolojikî wê xwe bi zarokê re di vê çerçoveyê de wê bidina dîyarkirin.

Zarok, di vê demê de ji kirinê zêdetirî xwediyê fahmkirinê ya. Fizyolojiya zarokê, wê li şûn fahmkirina wê bimênê. Minaq, zarok diçê û li toeletê dirûnihê û demekê bi tenê dimênê. Piştî ku zarokê toelete xwe bidawî kir, wê nikaribê bi tememî xwe paqij bike û karê xwe hemûyî bike. Wê di cih de ya ku wê were hişê wê, w dayik bê û ankû hinek din weke xweşk  û hwd ku endamên malbatê na û bi wan re dijî, wê werê hişê zarokê. Zarok, wê ji cihê xwe ji toeletê wê bidest bakirinê li mazinên xwe bike ku ew werin û alikariyê bidinê ku ew xwe amede bike û ew ji toeletê derkeve û ew di wê kêlîkê de ji toeletê xilas bibê. Zarok bixwe, wê bidest kirina toelete xwe bike. Toelete zarokê, wê di destpêkê de berî ku ew were dunyê, wê zarok xwe ji wê re amede bike û piştî ku ew hat dunyê wê bike. Toelete zarokê a pêşî wê bi ber reşîyê ve bê. Ber ku ew ji roviyên xwe de zêde maya. Ew gûyê pêşî ê zarokê, wê xwediyê hinek elementên teybet ên ku ew dema ku ew di zikê dayika xwe de bê û ew bi wê ne rehet nebê bê. Piştî ku ew heta dunyê, wê zarok, wê rewşê derbas

bike. Toelete zarokê, wê weke rewşek teybet derkeve pêşîya dêûbav. Her wusa, gelek zarok, di roja me de ew dema ku li nexweşxane na û ankû piştî ku ji nexweşxane derketin û hatina malê, wê ´mamaya amede a zarokê´ bikarbênê heta ku şîrê dayikê were û were wê asta ku têrî zarokê dike. Di vê demê de zarok, herî kêm wê carna di destpêkê de wê sê-rojan wê gûyê xwe nekê. Lê piştî ku ew zarok, bidest tenê hildana şîrê dayikê kir û pê de, wê zarok, êdî rojê çend caran jî dibê ku ew binxwe bilewitênê û bixwe de gû bike. Ev gûharîna bi zarokê re ku wê piştî hefteya sê û ankû caran re wê bibê, wê di destpêkê de dibê ku dêûbav bide hizirandin ku ew zarok ´zikê wê diçê´ û ew nexweş a. Piştî dema ku dayikê tenê şîrê xwe da zarokê, wê hingî zêdetirî zarok wê gûyê xwe bike. Heta ku wê rojê carna du û ankû sê caran, divê ku mirov bin zarokê bigûharênê. Ev gûkirina zarokê a dema ku ew tenê bi şîrê dayikê tê şîrdayîn û ji wê û pê ve ti tiştên nayêna dayin li zarokê, weke gûyê ji şîrêdayikê jî tê dîtin û ser ziman. Wê gûyê şîrêdayikê, wê hinekî din zer bê, rehn bê û bêhna wê biteybet wê hebe. Şîrêdayîkê, wê di roviyên stûr ên zarokê de wê hinek bakteriyên baş jî wê biafirênin. Ji ber ku gûyê ji şîrêdayîn pirr rehna, wê xwe di roviyan de negirê. Bo vê yekê, zû tê xwerê. Lê şîrê ne yê dayikê û mamaya zarokê, wê dikarê bike ku zarok çend rojan li ser hevdû gûyê xwe nekê. Bi şîrdayikê, hertimî dayik zû binê zarok digûharênin û wê paqij dikin.

Wê di şîrêdayîkê de jî wê gasazikê zarokê ku ew diafirê wê hebe. Lê ev jî sedemên wê bi dayikê re bin. Dema ku dayik, xwarinên ku wê di wan de zêde baharat bikarhanîya, xwarina pîvazê û hwd, xwarinên ku gasê didin çêkirin ku dayikê xwar, wê ew gasê bizarokê re jî çê bikin û wê zikê zarokê bi wê biêşihê. Ya herê giirng ew a ku dayik di van deman de ji xwarinên ku wê gasê di zikê dayikê de çê bikin û zikê zarokê bi warimênin û wê êşê bidinê de ew, ji wan xwe dûr bide girtin. Wê ev, zarokê pirr zêde rehet bike. Pirranîya girîyên zarokê ên bi teybetî di şevê de ku ew dike, wê sedema mazin wê bûna hewayê di zikê zarokê de bê. Heta ku zarok ji wê xilas nekê, wê zikê zarokê bi warimê û wê êşê bidiyê de. Wê bi pirranî, wê bi gûkirina xwe re wê zarok rehet bibe. Lê carna, ji ber ku hewaya zikê zarokê zêde ya, wê ev jî rehetîyek demdirêj û mayînda bi zarokê re nede çêkirin.

Lê zarok, wê hin bi hin ev rewşa wê bi mazinbûna wê re wê bigûharê. Piştre wê ew hewaya zikê zarokê wê kêm bibê. Zarok, wê bi rehetî karibê gûyê xwe bike. Heta ku wê zarok, ji heyva şêş û heftan û pê de, wê li ser lingan were rûnandin û ew wê gûyê xwe bike. Di vê demê de hinek

dayik, dema ku bidest dayina xwarinê li zarokê dikin, wê piştre zarok, bi heman şêwayê di encama wan xwarinan de wê hewaya zikê wê biafirê, êşa wê ya zik çê bibe û wê dem bi dem zorê bikişênê ku ew gûyê xwe bike û rehet **bibê**. Zarok, wê xwe di heyvên xwe yên piştre de wê, ew rewşa gûyê zarokê jî wê bigûharê. Zarok, wê bixwe wê rewşa xwe kifş bike. Piştî salekê û pê de, wê zarok hin bi hin bidest çûyîna toeletê bixwe bike. Wê ew bixwe herê wê bike. Piştre jî, wê di vê rewşê de ber ku fizyolojika zarokê têrê nakê, wê alikariyê bixwezê. ..

Zarok, wê van rewşên ku ew dijî, wê hemûyan bi xwe re wê bigotin bike. Wê zarok, karibê gotinan bikarbênê. Wê xwe bi gotinan werênê ser ziman. Zarok, dema ku dayika wê li wê diaxifê û ankû dema ku mazinên din ên ku ew li cem zarokê diaxifin û ku zarok li wan dihisênê, wê zarok wan gotinên ku ew bi rewşê re bikardihênin, wê fahm bike û di mejiyê xwe de bigirê. Ji malê, dê û ankû bav, dema ku wan got ´ezê çûm´ û derket û ji berçav winda bû, wê zarok, gotina ´ez çûm´ wê bi wê rewşa ji berçav windabûna dê û ankû bav bi wê re gotinê re qayd bike. Her wusa, dema ku got ´ezê xwarinê çê bikim´ û herê mitbaxê û bidest çêkirina xwerinê bike, zarok, vê gotinê bi wê re rewşê re bigirê di mejiyê xwe de.Dema ku dê û ankû bav gotin ´ezê çim û razihim´ û an jî ´dema razanê hat´ û piştî vê gotinê çû û ket nava nivînan û raziha û an jî kû zarok piştî wê rewşê re hat hildan li dest û hat birin li ser cihê wê û hat xistin nava nivînên wê, wê hingî zarok, gotina ´razanê´ bi wê re di mejiyê xwe de salix bike. Zarok, di vê çerçoveyê de ew bi kirinê re gotinan di mejiyê xwe de qayd dike. Her kirinekê, bi vê rengê wê bi gotina ku bi wê rewşê û ankû kirinê re hat ser ziman re wê bi hevdû ve girê bide û di mejiyê xwe de bicih bike. Di vê çerçoveyê de têkiliyek teybet a kirin û ziman di mejiyê zarokê de bi hevdû re heya. Bi heman rengî, zarok gotinan di mejiyê xwe de wê bi kirinê re bicih bike. Her kirina ku pêşî navê wê bi gotinî ji zarokê re hat gotin û piştre hat kirin, wê bi vê rengê di mejiyê zarokê de bi wê kirinê re wê rûnihê. Minaq, dema ku dêûbav got ´emê bi hevdû re herina geryanê´ û piştre zarok bixwe re hildan û çûn geryanê, wê zarok, wê rewşê bi gotina geryanê re di mejiyê xwe de qayd bike. Ev rewş, dema ku çend caran hat dûbare kirin, piştre di dawîya wan dûbare kirina wan çend caran de wê zarok, bixwe, dema ku dayika wê xwe ji çûyîna derve amede kir, wê ew hizra çûyîna geryanê bi wê kirina wê re wê were bîra zarokê. Heta ku zarok dibê ku ew li ser wê re ji dayika xwe û ankû bavê xwe bipirsê ku ´herina geryanê´ û ankû ´emê herina geryanê.´ Di vê çerçoveyê de di gelek rewşên bi vî rengî de dema ku dê û

bav çûna derve ku kar û xabetek wan hebê jî, wê zarok bi wê hizrê nêzî wan bibê û heta ku dema ku ew derketina li derve wê li ser wan bigirî jî. Wê li dûv çûyîna wan bigirî. Wê bixwezê ku ew jî bi wan re bê. Zarok, wê bixwezê herê wê geryanê ku ew di mejiyê xwe de bi wê dihizirê û li ser wê re li dûv çûyîna dêûbavê xwe ku digirî. Zarok, di vê demê de wê fêrî ´herê´ û na´ bibê. Her wusa, dema ku zarok, tiştek ji wê hat xwestin û ankû ji wê hat xwestin ku ew bike, wê zarok li gorî xwesteka xwe û wê derûnîya xwe ya wê demê wê bêjê ´herê´ û bikê û yan jî wê bêjê ´na´ û wê red bike.

**Li vir**, divê ku mirov bi teybetî li ser nêzîkatîya li zarokê bisekinê.Divê ku mirov nêzîkatîyê li vir li ser derûnîyê û hişmendîyê re bi teybetî hilde li dest û li ser wê bisekinê. Derûnîya zarokê di vê demê de bi teybetî, wê derûnîyek teybet bê. Her wusa, derûnîya zarokê a vê demê, wê li ser rewşên fêrbûn, azmûnkirin û salixkirinê re wê bimeşê. Zarokê zarokê, wê pirr zêde wê hîs bibê.

Zarok, di vê demê de wê, li ser wê derûnîya xwe re wê nêzîkatîyê jî pêşbixe. Her wusa, wê zarok, di vê demê de wê bidest bi xwe re pêşxistina derûnîyek ku ew xwe weke navend di wê de dibînê wê pêşbixe. Di çerçoveya vê derûnîyê de wê zarok, bi ezbûnî û ezîtîya xwe nêz bibê. Minaq, dema ku zarok, tiştekî bixwezê û bersiva nerênî(´nagativ´) di çerçoveya wê de ku hilde wê zarok, xwe pirr xirab hîs bike. Heta ku wê bixayidê. Ew xayidînîya zarokê, nîşanaka têgîna ezbûnî ya bi wê re ku pêşketîya ya.

Zarok, li ser derûnîyekê û têgîneka ezîtîyê re dixayidê. Di vê çerçoveyê de wê zarok, wê xwe weke navend hîs bike. Ew keseyetîya wê ya ku ew bi wê êdî xwe hîs dike, li ser wê re nêzîkatîyê dike. Wê weke navend dibînê. Di vê çerçoveyê de nirx û daraza zarokê pêşdikeve. Zarok, wê daraza ku dike, bi wê re pîvanên xwe yên herêkirin û redkirinê pêşdixe û dide dîyarkirin. Pîvanên zarokê wê, di çerçoveya keseyetîya wê û pîvanên wê yên pêşdikeve de bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê di mejiyê xwe de bikeve pêvajoyek afirandinê de. Wê bihizirê. Wê dagerên xwe yên razberî ku kirasê wan dagerên şenber ên berê wê bi dîtina xwe re didîtin, wê li wan bike, wê pêşbixe. Dagerên zarokê, wê di mejiyê zarokê de bin. Lê divê ku mirov vê yekê bi teybetî werênê ser ziman ku mejiyê zarokê ê ji nû ve pêş dikeve, wê dagerên xwe pirr zêde şenber û zelal wê pêşbixe. Di aslê xwe de zarok, pêşxistina wê ya dageran weke bi qaraktерê lehengan û hwd re wê zarok, tiştekî giring bijî. Zarok, mejiyê

wê, pêwîstî bi wê dibînê ku bi safîbûn û zelalîyeke teybet wê bijî. Her wusa rewşa kifşkirina lehengan ji çîrok û çîvanokên xalkê ên ku zarokê li wan hisandîya û di mejîyê xwe de bicihkirina wan, wê wê şêwayê şenberîyê bi zarokê re bide jîyankirin.

Zarok, wê şenberîyê, weke rêbaz û şêwayekê bi zanînê re bikardihênê. Vê jî, li ser hiş re dike. Ev têgîna şenberîyê, divê ku mirov wê weke rewşek teybet ya rengê fahmkirina zarokê hilde li dest. Her wusa, wê piştre li lehengên xîyalî ên ku zarok di mejiyê xwe de wan diafirênê û dijî jî wê weke kirasekî li wan jî bike. Wê, wê şenberiyê bi wan re jî bijî. Li vir, her qarakter, wê weke têgîneka zelal a di mejiyê zarokê de bê. Zarok, dema ku wê lehengê dibînê û ankû ji dîrokan û hwd, di derbarê dibihîzê ku çawa bahse qarakterê wan dihê kirin, wê zarok, li ser wê re jî bi qarakterê wan lehengên ku mejiyê zarokê ew girtina, wê bi wan re bi wan xosletan re hişkirina xwe zêdetir bike.

Mejiyê zarokê, dema ku ew lehengê xwe diafirênê, wê bi wê re bi xosletên re wê çerçoveya wê bi hişkirina xwe re biafirênê. Hişkirina zarokê, wê bi wan xosletan re wê hin bi hin teybetîyan biafirênê. Di aslê xwe de mejiyê zarokê, wê xoslet û teybetîyên ku ew dixwezê bi wan re bijî bi keseyetîya xwe re wê bi wê qarakterê lehengê di mejiyê xwe de re wê biafirênê. Her xoslet û teybetîyên ku ew mejiyê zarokê bi wê lehengê re kifş dike, wê xoslet û teybetîyên ku mejiyê zarokê, wan ji xwe re jî dixwezê bê. Bi vê re mirov divê ku vê jî kifş bike û binxat bike ku mejiyê zarokê, wê bi vê rengê di aslê xwe de çendî ku wê lehengê mejiyê xwe diadilenê û bi xoslet û teybetî dike, di wê çerçoveyê de di aslê xwe de ew hinekî jî bi wan xoslet û teybetîyan xwe bi xoslet û teybetî dike û diadilênê. Wan xoslet û teybetîyên ku zarok baxşî wê qarakterê lehengê di mejiyê xwe de dike, di aslê xwe de wê hinekî jî û piçekî jî wê keseyetîya zarokê jî di wan de û bi wan re wê bijî. Bo vê yekê ya ku ew leheng, wê di mejiyê zarokê de wê piştre jî hebûna xwe biparêzên û mayînda bibin. Mejîyê zarokê, dema ku wan derbas bike, wê weke ku xwe derbas bike. Di aslê xwe de wusa jî ya. Zarok, dema ku demeka xwe derbas dike, wê bi xoslet û teybetîyên wê demê re wê derbas bike. Wê li ser wan xoslet û teybetîyan re derbas bike. Bi wê re jî, dema ku bûhûrî dema nû û zarokê di dema nû de kifşkirinên nû bi xwe re kir di vê çerçoveyê de li gorî ast, rada û pîvana wê demê jî xoslet û teybetîyên qarakterîstikî bi xwe re afirand, wê bi wê re biafirênê bi demê re û li gorî demê.

Zarok,di vê dema xwe de ji pêşketinê ve pir zêde vekirîya. Her wusa, bi heman rengî ji girtinê re jî vekirîya. Çi dibînê, weke wê di xwe de digirê. Di mejiyê xwe de wê digirê. Di vê çerçoveyê de zarok, xwediyê rastiyekê ya. Ku mirov ji kîjan aliyê ve binerê, divê ku mirov werênê ser ziman ku ev pêvaoya zarokê a vê demê giring a.. Ji fêrbûn û pêşketina zanîna zarokê re jî wê giring bê. Ev dema zarok, wê weke demek teybet a temen jî bê ji demên piştre ên zarokê ku wê werin û zarok wan bijî. Ev dema zarokê, ku zarok di wê de û dimejiyê xwe de lehengan di afirênê, wê li ser wê re xwe pêşbixe. Di aslê xwe de ev dema zarokê a çêkirina lehengan di mejiyê xwe de ji xwe re, wê demeka zarokê a bi hevnasîna biderve a bitêgîn bê. Zarok, li ser xosletan re wê li derve binerê û fahm bike.

Leheng, her wusa aliyekî wan ê ku em weke di temena pêşketinê û zanînê wê de weke ajoyekê jî werênina ser ziman a, ew leheng xwediyê wateyê na. Her wusa, ku em rengê pêşketina mejiyê zarokê bişibihênina ava bahrekê, latên mazin ên di nava wê avê de jî wê bina ajoyên ku li dora wan xwegirtin dibê bin.

Ev pêvajoya pêşketina zarokê, wê her wusa ji aliyê pêşketina aqilî ve jî giring bê. Her pêşketina ku zarok di vê demê de bi xwe re dijî, wê weke pêşketinaka temen bê. Di vê çerçoveyê de zarok, wê bidest hevnasîna dunya derve li ser hişê xwe re bike. Ev dema zarokê, mirov dikarê weke demeka zîz û xesas jî werênê ser ziman. Zarok dema ku dikeve sale xwe ya duyem de wê rabê serlingan bimeşê û heta bibazdê jî. Leyistik dileyizê û bi hevalên xwe re gog dileyizê. Ji aliyê fîzîkî ve jî pirr aktiv a û hertimî di pêpelokan de ew, tê xwerê(´jêr´) û tê banî(´jor´). Bi lîtokên xwe re avahîyan ava dike. Pirr zêde ku ew lê bê hêskirin, zarok hês xêzkirina wêneyan dike. Her roj, herî hindik zarok wê ne bin 50 gotinê biaxivê û ev gotinên ku ew bikardihênê, pirranîya wan ji dev dihên fahmkirin. Yanî, dema ku gotin ji devê zarokê derket, wê bi awayekî zelal wê werê fahm kirin. Wê bi wê re jî, wê hevokên weke ”yadê birçî me”, ”yadê çima toeletê”, ”yadê xewa min tê”, ”ew ya min a”, ”dikim”, ”çima”, û hwd wê bikarbênê.

Her wusa, di vê demê de teybetîya zarokê ew a k u zêde naxwezê ku ew bitenê herê nava nivînan, herê toeletê, bi tenê xwarênê bixwe û hwd. Zarok, wê nexwezê ku van bi tenê bike. Wê dayika xwe li rex xwe bixwezê. Dema ku zarok, dayika xwe li cem xwe dibînê, wê hinekî jî xwe bihêz û bivîn wê hîs bike. Di vê demê de zarok, wê bidest kirina karên xwe yên piçûk jî bike. Minaq, weke bidest xwe, carna şekela xwe

dike lingên xwe, kûmê xwe dide serê xwe, çekêtê xwe li xwe dike û hwd. Bi wê re jî dema ku zarok xwarina xwe dixwe, ew bi kevçî, xwarina dike devê xwe. Her wusa, zêde pêwîstî bi alikariyê nabînê. Lê pêwîstî bi dayika xwe li cem xwe dibînê. Ber ku zarok, xwe bi wê hîs dike. Her wusa, xwe bi wê bihêz dibînê. Kirina ku bike jî wê zarok, bi xwe bibawerî bike. Her wusa, di vê demê de zarokê, gelek tişt bi navê wan re di mejiyê xwe de bicih kirina. Navê wan dizanê. Dema ku dayika zarokê ji wê bixwezê ku ew herê tiştekî werênê, wê zarok herê û rajiyê û werênê. Wê tişta ku navê wê hatî ser ziman binaqênê û werênê û dênê ber dayika xwe. Her wusa, tiştekî ku dayikê ji zarokê xwest û ku zarok çû wê devera ku dayikê ew şanda wir û ew tişt ne li wir bê, wê herê li wir binerê û meyizênê û wê tiştê li wir nebînê, wê were cem dayika xwe wê bibêjê ku ew ne li wir a. Wê zarok, werê û agahiyê bide dayika xwe. Her wusa zarok di vê demê de ew bixwe dikarê cilên xwe li xwe bike. Bi pirranî, dema ku dayik cilên zarokê lê dike, wê zarok, xwe biwê li ser lingan bigirê. Minaq, dema ku zarok wê şalê xwe li xwe bike, wê lingê xwe bixwe hizir bike û wê hilde û wê bixê lingên şal de. Di vê demê de zarok dikarê rengan ji hevdû cuda bike. Gelek rengên u zarok, nikarê navê wan werênê ser ziman jî wê zarok karibê wan ji hevdû cuda bike. Di vê demê de zarok, dem bi dem dema ku dayika wê karekî û ankû xabetekê dike û ew jî dibînê, zarok li wê kar û xabete ku dayika wê dike tê hêskirin û ew jî ji dayika xwe dixwezê ku ew alikarîyê bide wê. Dixwezê ku ew jî, wê karê bike. Dema ku dayik, li malê xwarinê çê dike, malê dimalê(´malistin´) û ankû karekî din dike, wê zarok, li wir wê zarok bi dayika xwe re bixwezê ku bike. Her wusa, xwestina zarokê a kirina kar bi vî rengî, di aslê xwe de şêwayekî fêrbûna zarokê a kirinê û girtina sermil a berpirsîyarê jî ya. Wê ev xwesteka zarokê ku baş ji aliyê dê û bav ve were fahmkirin û nêzîkatî li wê were kirin, wê berpirsîyarîya zarokê ji kirin û alikariyê re pêşbixe. Di vê demê de dema ku dê û bav û ankû hinek mirovên din ji malê ku ew dema ku ji ser sofra xwarinê dirabin û piştre ji hevdû ve di dawî de dibêjin ”afîyet bê!”, wê zarok jî, piştre fêrî vê bibê û dema ku wê xwarina xwe bidawî kir û ji wê qarîya, wê pêşî bibêjê afîyet bê! û piştre wê ji ser sofr rabê û wê herê. Di vê çerçoveyê de wê kirinên dê û bav û mirovên li hewirdorê wê bandûrê li zarokê bikin.

Lê zarok, dema ku ew zarokna din ên di temenê xwe de piçûk li rex xwe dibînê, bi wan re weke ku ew bikeve pêşbaziyê de lê tê. Her wusa, zêdetirî jî, wê derûnîya zarokê vebê û wê zindî bibê.. Zarok wê di demê

wê de hem bi kirinên xwe û hem jî bi kirinên zarokên din ên di temenê xwe de ku ew li dora wê na, wê bi wan re jî hevnasînê bike. Zarok, wê bi wan re weke wan tevbigerihê. Wê xwe rehet hîs bike. Di vê çerçoveyê de wê mejiyê zarokê ê civaknasî wê derkeve li pêş. Her wusa, zarok, wê di vê demê de kirinên bi vî rengî wê zêdetir bike. Her wusa, bi heman rengî zarok nêzî dayika xwe jî dibe. Minaq, dema ku zarok, bibînê ku dayika wê nexweş a û di nava nivînan de ya û rûyê wê ji qirmiçî ya, wê zarok zêdetirî xwe nêzî wê bê. Her wusa, wê zarok jî, weke ku bixwezê bi dayika xwe re nexweş bibê, wê bi xwe re rewşekê bijî. Wê herê cem dayika xwe wê û wê heta ku zarok, wê destê xwe li ser laşê dayika xwe re werênê. Wê destê xwe dênê ser rûyê wê. Destê xwe dênê ser serê wê. Wê xwe zêdetirî nêzî wê bike. Di rewşên bi vî rengî ên weke dayik naxweşa de wê zarok, zêdetirî xwe nêzî wê bike. Wê bixwezê ku ew li cem dayika xwe bê.

Di vê dema xesas a zarokê de wê zarok, hertimî bi vê rengê di nêzîkatiyekê de bê. Lê di vê demê de dema ku zarok, nêzîkatîya ku ew dixwezê ku ew nebînê ji dê û bav û ankû mirovên li dora xwe, wê her wusa tengezerîyan jî bijî. Wê bigirî. Wê tevgezerîyan bijî. Dema ku zarok, di vê demêê de nêzîkatîyên ne baş ji dê û bav xwe li xwe û hwd bibînê, wê bixwe re bikeve gûmanê de ku ew çawa nêzîkatîyê bike û ankû kîjan nêzîkatî rast a. Wê zarok, vê yekê, li ser nêzîkatîya dê û bav re yan baş û bi ewla bijî û yan jî wê bi vê rengê di derbarê de bikeve gûmanê û ji wê gûman bike. Di vê demê de dema ku zarok, wê hêskirina ku ew dixwezê ku nebînê û her wusabaş new pêşwazî kirin bi kirinên ku ew dike re wê zarok, bertekan li wê bide nîşandin. Gelek harbûyînîyên ku zarok dike, wê bi armanca kişandina hey û balê li ser xwe bê. Wê tiştan li malê lingê xwe û ankû destê xwe lêxê û bişikênê. Wê bixayidê. Zarok, ser wê xayida xwe re çendî ku demê derbas bike û weke ku ew bûhûrandibê jî lê zarok, wê wê rewşê bi derûnîya wê re bi xwe re bijî. Dema ku care duyem rastî rewşek ne baş hat, wê dîsa ew derûnîya zarokê bikeve dewrê û were bîra wê. Wê zarok, êdî wê li ser wê re dîsa bertekê bide nîşandin. Ya ku pirr caran dê û bav ne farqê de na jî ev a. Di vê çerçoveyê de dema ku zarok dûbare wê derûnîyê bibîr dike û dijî, wê bi wê re bi xwe re tişî bibe. Ya ku temenê bertekên zarokê ên nebaş, kirinên zarokê ên ´xirab´ û hwd de jî bê, wê ev bê. Gelek tiştên weke ´tiştên xirab in´ wê zarok, bi bertek û hêrsa wê bertekê ya ku ew di xwe de pêş dixe re wê bike. Di vê çerçoveyê de zarok, wê pêvajoyeyên tengezerîyê di vê demê de bi vî rengî zêdetir bijî. Zarok, di vê demê de ji rewşên bi vî rengî

ên bi tengezerî re pirr zêde vekirîya. Bo vê yekê, derûnîya zarokê a vê demê de ji ya ku em dizanin zêdetirî xesas û zîz a. Divê ku mirov derûnîya zarokê, di vê çerçoveyê de fahm bike û nêzîkatîyê li wê bike. Di serî de divê ku mirov ji zarokê re di vê demê de hertimî bide nîşandin ku mirov, hês wê dike û mirov li wê heyîder a. Ya ku wê zarokê baş bike û ji van tengezerîyên vê demê xilas bike jî wê ev herdû gotinên weke hêskirin û li cem wê bûnê bê, bin. Zarok, di van rewşan de wê xwe bihêz hîs bike. Di aslê xwe de zerok, di vê demê de van kirinan bi vê rengî bo ku ew heya dê û bav bikişênê dike.Zarok, di vê demê de dê û bavê xwe baş bi hişmendî nas dike. Dibêjê ´ev dayika min a´, ´ev bavê min a´, ´ezê çim û razihim´, nivîsa nîşan dike û dibêjê ´ez li vir dirazihim´, ´em xwarinê li mitbaxê dixwûn´, û hwd wê zarok gotinan bikarbênê. Her wusa, zarok, wê gotinan ji van zêdetir jî bikarbênê. ..

Bi gelemperî zarok, heta vê demê de binê wê tê girêdan. Zarok, wê êdî girêdana xwe jî hîs bike. Wê li mazinên xwe binerê ku ew nayêna girêdan. Carna jî, wê hinek zarokên di temenê xwe de bibînê ku ew nayêna girêdan. Ankû, ew êdî nayêna girêdan. Bo vê yekê wê zarok, êdî bidest nexwestina girêdanê bike. Wê nexwezê ku ew were girêdan. Lê dema ku dayik, dervî wê xwesteka zarokê, wê girêbide, yan wê zarok xwe bixwe vekê û yan jî wê li wê bihêrs bibe. Di vê demê de zarok, tişta ku bi zarokên bi temenê xwe re dibînê, ew jî dixwezê ku bi wê re hebe û ew wê bijî. Dixwezê bileyizê û her wusa wê bi wê re fêrî kirina hevalbendiyê bibê. Wê bi hevalên xwe re bileyizê. Wê bixwezê ku ew bileyizê. Wê hês leyistikê bike.

Zarok, di vê demê de wê pirr zêde li ser keseyetîya xwe jî bihizirê. Her wusa kirinên dê û bav dibînê. Zarok, kirinên mirovên dervî xwe dibînê. Wê zarok, li ser wan kirinan re wê lêpirsîna kirin, tevger û nêzîkatîyan bike. Her wusa, wê zarok, bi wê re têgîna ´kirina baş´ û ´kirina ne baş´ wê bi xwe re pêşbixe. Heta ku zarok, wê di nerîna vann gotinan de wê zarok, li xwe jî bihizirê. Wê bihizirê di mejiyê xwe de ji xwe bipirsê ku ew zaroyekî baş a û ankû nebaş a. Di vê demê de wê bo zarokê, pirr giring bê ku ew ji dê û bavê xwe bi bihîzê ku ew baş û qanc a. Di vê demê de dema ku zarokê ev bihîstin, dibê ku carna hinek gotinên ku wê, bi henekî jî bê, ji hinekan bihîstibê ku ew xirab a û hwd, werênê ser ziman. Li vir, pirr giring dibê ku mirov li ser rengê kirinan re mirov wê şîrove û salix bike di mejiyê zarokê de. Ya ku wê zarokê ji derûnîya wan gotinên ne baş rizgar bike, wê ev bê. Di vê demê de zarok, wê gotinan bi rengê wan re wê êdî bidest nas bike. Zarok, wê gotinan, bi

rengê ´baş´ û ´ne baş´îyê re wê bidest nasînê bike. Ev rengê fahmkirinê ê ser wateyê û têgihiştinê re ya. Bi watebûna gotinan bi rengê ´baş´ û ´ne baş´ di mejiyê zarokê de wê nîşanaka dem û pêvajoyek nû a pêşketina wê jî bê. Di vê demê de wê zarok, ji gelek aliyan ve pêşketinê bi xwe re bide çêkirin. Wê zarok, heta wê demê û kêlîkê, çend gotin fêrbûna, wê weke ku zarok, ji nû ve bidest şîrovekirin û salixkirina wan bike bi rengê başî û nebaşî.

Zarok, wê di vê demê de di wê têbigihê ku ya baş û ya nebaş çî ya. Her wusa, bi vê rengê wê li ser hiş re wê gotinan bi wate bike. Zarok, ber ku mejiyê wê pirr zîz û xesas e, di vê dema salixkirina gotinan bi vî rengî mejiyê zarokê dike, wê ew bixwe jî bi wê salixkirina xwe bawer bike. Bo vê yekê, zarok, wê li ser xwe bihizirê. Wê bi derûnîya gotinên baş re xwe baş hîs bike. Û wê bi derûnîya gotinên xirab re xwe xirab hîs bike.

Salixkirina gotinan, mirov divê bi pêşketina ziman a bi zarokê re hilde li dest. Zimanê zarokê ku ew bi xwe re pêşdixe, wê pirr teybet bê. Zarok, wê salixkirineka teybet a li gorî xwe bike. Potansiyala zarokê a fahmkirinê pirr zêde heya. Lê bi salixkirina wan, wê zarok dem bi dem wê pirsgirêkan jî bijî. Dema ku zarok, di bilêvkirina gotina xwe de ku ew ne li gorî rêzimanîya mazinan dihênê ser ziman, mazin vê weke ´pirsgirêka ziman´ dihênina ser ziman. Di aslê xwe de mrov dikarê vê rewşê bi du sedeman fahm bike. Sedema pêşî, bi rengê salixkirina zarokê re wê fahm bike. Sedema duyem jî, dema ku zarok, tenê ma û ji alikarî li gorî ew pêwîsta ku ne hilda, hingî wê zarok di rewşan de wê tevheviyê jî bike. Ev jî, weke aliyekî zarokê ya. Zarok, di vê çerçoveyê de ew dema zarokê, di vê aliyê meji ve jî divê ku mirov li wê heyîder bê. Her wusa, divê ku miirov di alixkirinên zarokê de alikar bê. Dema ku bi zarokê re axift, bi gotinên hesanî biaxifê û zelal biaxifê. Bi wê re mirov weke dê û bav, dema ku mirov bi zarokê re têkilî danî, gotinên hesan û kin werênê ser ziman. Her wusa, gotinên zarokê ku ew bilêv dike, gelek dê û bav, wan hertimî rast dikin. Ev jî, dibê sedema wê derûnîyê ku zarok, xwe ji bilêvkirina gotinan dide dûrkirin. Ev rewş wêretîya zarokê dişikênê. Mirov, weêe dê û bav, dema ku bi zarokê re axift, hertimî rast, zelal û bi gotinê hesanî biaxifê. Lê dê û bav û ankû mirovên din ên li dora zarokê,divê ku ew ji xwe nekirina weke kare û xabetekê ku ew hertimî gotinên zarokê ku zarok wan bi lêv dike ´rast´ bikin.Li şûna rastkirinê, pêşbixin. Rêbaz û şêwaya herî giring û baş ya ku wê zarok karibê bi wê bi ser ve were, wê ev bê. Di vê demê de pirr giring dibê ku dê û bav ji zarokê re vegotinên kin, hevokên hesanî û kin û hwd bi zarokê re têkiliyê

dênê. Bi wê re jî, bi teybetî gotinên ku zarokê bilêvkirina, wan hilbijêrê, du û du û ankû sê û sê gotinan werênê cem hevdû û ji wan hevokê ji zarokê re çê bike û ji wê re bibêjê. Mejiyê zarokê, gotinên xwe yên ku wê di xwe de girtina, wan ji bîr nekê. Gotinên ku zarokê hanîna ser ziman, heman gotinê weke pirsê mirovê ji zarokê bike.

Zarok, ji dema ku ew bûya ji dayikê, ji hingî be ew bidest derxistina dengê dike. Heta ku wê girîyê zarokê jî, weke deng wê di mejiyê wê de bicih bibê. Bi demê re wê dengên tîpan weke ´q´, ´k´, ´g´, ´t´, ´d´, ´n´, ´x´, ´a´, ´o´ û hwd, wê ji hevdû safî bike. Lê di nava dengên malê ên mirovên li malê ku weke yên dê û bav û mirovên din ên andamên malbatê û hwd, wê zarok dema ku wan his dike û dibihîzê, wê wan jî di mejiyê xwe de bigirê. Di vê demê de çendî ku zarok karibê zêde dengan his bike û bihîzê, wê ewçendî ji pêşketina zimanê zarokê re baştir bê. Di vê demê de zarok, dengên ji tv´yê dike. Zarok dengan ji hewirdorê dike. Dikarê pirsan bipirsê û bibêjê ew ´kî na´, ´li kû na´, ´çawa na´, û hwd. Bi wê re zarok, dema ku wê dest qirêşê´ kiribê, wê ji wir çi jîyankiriya wê, ji dê û bavê xwe re werênê ser ziman. Wê li ser aktivîtetên ku zarokan kirîya wê biaxifê. Di vê demê de wê zû fêrî avakirina hevokan bi dû û ankû sê gotinan. Bi wê re jî zarok, wê di vê demê de ew bêî ku gotinên xwe dûbare bike, wê werênê ser ziman. Di vê demê de wê carekê werênê ser ziman û derbas bibê. Ev rewşa zarokê a weke carekê hanîna ser ziman a hevokê û derbasbûna ji wê, wê ast, rada û pîvana pêşketina zimanê zarokê û girtina wateyê û ankû lêkirina wateyê ya mejiyê zarokê jî bê. Zarok, w vê pêvajoya xwe ya pêşketinê wê ji sale duyan heya sale sêyan wê derxê astek pirr zêde mazin û pêşketî. Dema ku heta vê dema dawî a sale xwe ya sêyen, wê karibê li çîrokên piçûk bihêsênê û wan bi pirranî fahm bike. Wê bihêsênê û ankû gûhdar bike, weke li qirêşê û ankû li malê û wê pirranî fahm bike. Dema ku zarok diaxifê li ser rewş û ankû tiştekî, wê karibê bi vegotina xwe re gelek hûrgilan bilêv bike û werênê ser ziman ji wê tiştê û ankû rewşê. Her wusa di hijmarê de jî wê bi vê rengê bike. Wê karibê, hijmaran li hevdû bihasibênê. Wê fêr bibê ku hijmara ´du(´2´)´yan du-tiştan dihênê ser ziman. Bi wê re jî, dema ku ´du caran du werina cem hevdû wê bina çar.´ Wê van rewşan jî bi xwe re pêşbixe.

Hê di sale duyan de zarok, di aslê xwe de vê rewşê pêş dixe. Lê zêde nikarê biser ve bibe û wê werênê ser ziman. Dema ku zarokê, sale xwe ya du jî bi dawî kir û bûhûrt li sale sêyan, bi azmûnên ku ew dijî re wê vê pirsgirêkê jî wê êdî derbas bike. Wê, êdî vê pêşbixe û bi dem re li wê

rewşan jî zêde bike. Minaq weke li rex ´du caran du werina cem hevdû wê bina çar´ wê zarok karibê ´sê caren sê werina cem hevdû wê bina şêş.´. Her wusa bi vê rengê, wê rewşên nû êdî ew bi mejiyê xwe kifş bike.

Zarok, dema ku ew tê vê dema xwe, wê karibê ji mirovên beyen jî fahm bike. Li vir, dîsa divê ku ez werênima ser ziman ku temenê fêrbûna ji beyenîyan wê di sale duyan de jî bi zarokê re wê hebê. Lê rewş, serborîn, jîyankirin û hwd, di mejiyê zarokê de kêm in. Dema ku mirovekî mazin rewşekê û ankû tiştekî dijî û ji yekî din re wê dihênê ser ziman û ku zarok li wan dihsênê, zarok ew rewş ne dîtîya û ne jîya ya. Wê li ser gotinên ku ew jîya ya re wê wan fahm bike. Li vir, bi rewşa gotinê re jîyankirin jî wê bo zarokê pirr giring bê. Jîyankirin û dîtin, wê bo zarokê di vê demê de hertimî şoreşan di mejiyê zarokê de bi wê bide çêkirin. Rewşa fêrbûna gotinan û hisandina gotina ji mazinên xwe, wê zarok di sale xwe ya pêşî û ya piştre de jî wê bike. Ev rewşên bi gotinê re wê zarokê re pêşketî bin. Pirsgirêka zarokê a ziman, li vir, ne bi gotinan û dengkirina wan a. Pirsgirêk, wê bi jîyankirinê re wê xwe bide dîyarkirin. Dema ku zarok jîya, wê zimanê xwe êdî wê bi wê jîyankirinê re wê di xwe de bide rûnandin. Li vir, bo zarokekê jîyankirin, wê di vê demê de biqasî wê gotina ku fêr dibê wê giring bê. Her rewşek, wê gotinek bê û salixkirinek jî bê. Di vê çerçoveyê de zarok, ji rewşê zêdetir dihilde bihisandinê re. Zimanê zarokê û pêşketina wê, wê hem gûhdarkirin û hisandin bi dîtin û jîyankirinê re hebe. Hisandin û gûhdarkirin, wê tenê aliyekî fêrbûna ziman a zarokê bê. Aliyê din jî, wê bi jîyankirin û dîtina rewşê re bê. Her wusa, aliyê ne jîyankirin û ne dîtinê, wê di pirr rewşan de di temenê pirsgirêkên zimanî ên zarokê ku wê di demên pêşî de xwe bidina dîyarkirin de bin. Zimanê zarokê, wê bi aliyê xweyê jîyankirin, dîtin û hisandinê re wê wan rewşên pirsgirêkî ên zimanî derbas bike. Gelek dengên tîpî ku wê bi zarokê re derketina wan di destpêkê de wê zor bê, di temenê wê de ev ne jînkirina rewşan bi dîtinê bê. Her wusa, di gelek rewşan de zarok, bi mejiyê xwe re rewşekê û gotinekê salix dike. Lê dema ku wê care duyem dike ku wê salix bike, wê li vir, yan ziman bialiqê û yan jî wê pêvajoya xwe ya bêhnstandinê a bo dengê tîpê wê dirêj bê. Zarok, dema ku ew fêr nekiribê, ew rewşa dirêjbûna navberê a bidengê, wê bê temenê deng aliqînê û ankû ne derketinê jî. Zimanê pertek ku wê biafirê, hinekî jî di temenê wê de ev rewş bi gelek şêwayên cuda hena.

.

**Pirsgirêkên zimanî ên mihtemel ku zarok wê wan bijî. ..**

Lê zarok, di destpêkê de bi jîyankirinê wê karibê w rewşê derbas bike. Zarok, mejiyê wê her rewşa ku ew dijî di xwe de qayd dike. Wê mejiyê zarokê, wê aliqînê jî di xwe de qayd bike. Ev jî, wê weke rewşek fizyolojikî wê karibê, xwe bi zarokê re piştre di çerçoveya aliqîna ziman, deng dernexistinê, derengmayinê di deng derxistinê û hwd de wê xwe bide dîyarkirin.

Zarok, wê van pirsgirêkên xwe wê bixwe bike ku derbas bike. Ew temenê wê, bi wê re heya. Dema ku mirov weke dê û bav û ankû yên li dora zarokê bi zimanekî xweş, hêdîka û zelal bi wê re biafirê, dema ku mirov pirsên zarokê di çerçoveya ku ew hîs dikê de hilde cidîyetê û bibersivênê, dema ku zarok bi zarokên din ên di temenê de re bileyizê û bi wan re demê derbas bike, dema ku mirov bi zarokê re bike û bibê sêrî, bi awayekî bisazûmanî ku mirov bi zarokê re bê û hertimî alikariyê û demê bidiyê ku ew vebêjê û hwd, wê ev rewş û rewşên weke van, wê bina alikar ku zarok bi ser xwe ve herê. Dermanê zarokê, wê pêşketina civaknasîya wê bê. Her wusa zarok, di nava rewşek civatî û civaknasî de bijî, wê hîs bike û karibê xwe di wê de werênê ser ziman. Hingî wê zarok, xwe beşek ji wê bibînê. Wê gotinên ku ew navend bikardihênê wê zarok hema bêja hemûyan di xwe de bigirê. Her wusa, şêwa û teknîkên axiftinê, zarok wê ji wê navendê bixwe wê kifş bike. Ew bixwe, dibînê ku çawa ziman dihê bikarhanîn, çawa gotin dihêna bi karhanîn, ew dibînê ku çawa têkiliya gotinan û rewşan bi hevdû re dihê dayîn. Her wusa zarok, wê di nava rewşek civatî û civaknasî ku ew gotin di wê de divejin û zindî dibin, wê di wê de xwe baştirîn bijî.

Ev yek, bi awayekî vekirî hatîya kifşkirin û destnîşan kirin ku zarokên ku ew di nava rewşek xort a civaknasî de ew najîn, wê bi wan re hem pirsgirêkên zimanî ên weke ziman aliqînê û ne karîna xwe hanîna li ser ziman û her wusa pirsgirêkên têkilîdanînê bi mirovên dervî xwe re wê bijî. Ev jî, wê bandûra hem li pêşketina zimanê zarokê bike û hem jî wê li pêşketina zêhnê zarokê bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, navenda civaknasî û civatî wê temenê pêşketina aqil û zimanê zarokê jî bi xwe re biafirênê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku mirov, divê ku bi çerçoveya pêşketina zimanê zarokê re hertimî weke têgînekê li pişt gûhê xwe bigirê ku zarok, wê hertimî ji destpêka bûyina xwe ve bidest axiftinê bike. Li derfetên w digerihê. Minaq, zaroka ku ew bi temenê xwe pirr zêde piçûk a, ku ew bidest qirêşê dike  û ankû dihê

xistin nava rewşek bi vî rengî a civatî de ku zarok karibê bi wê rewşan bibînê û biafirênê, wê bandûra wê li pêşketina zarokê hêrênî(´pozitiv´) bê. Ziman û pêşketina wê de zarok ku keç jî bê û kur jî bê, wê biheman şêwayê pêşketina xwe bidina çêkirin. Lê zarokên keç, her wusa mêyla xwe dikarin zûtirîn bidina ziman. Di vê çerçoveyê de dikarin, ziman û gotinê wê, zêdetirî di vê pêvajoyê de ew bixwe re pêşbixin. Çendî rewşa pêşketina zarokê, ji zarokê û heta zarokê, hetimî xoslet û teybetîyên xwe cûda ji hevdû hebin jî, lê di gelemperî de keçzarok, dema ku heya xwe li ser ziman diafirênin û bi wê re li rewşan diponijin, ew dikarin zûtîrîn herina li pêş. Di heman pêvajoyê û navbera wê de minaq ev dem salek bê, di hundurê wê salê de keç zaro û kûrzaro bi hevdû re werina perwerdekirin, wê di wê rewşê yên herî zêde ku ew dikarin ponijîyê di mejiyê xwe de çê bikin û heya xwe bidina ser, wê zûtirîn pêşbikevin. Mêyla keçzaroyan hatîya dayin nîşandin ku ew dikarin zûtîrn wê heyê çê bikin li wê rewşê. Zarok, di vê dema xwe de çendî ku ew karibê heya xwe bide çêkirin li ser rewşê, wê zûtrîn ahengê bi wê re di mejî de bide çêkirin. Mejiyê zarokê, bi wê ahengê re di nava rewşê û mejî de wê têkiliyê çêbike. Ev wê di aslê xwe de wê, di hundûrê mejiyê zarokê de bê, têkiliya nava gotinê û rewşê de jî. Ji xwe, ya ku mejiyê zarokê di vê demê de li wê digerihê jî wê ev bê. Gotinan, biwateya wê re wê di rewşan de nas bike. Di vê çerçoveyê de navkirina li rewşan, tiştan û kirinan, wê zarokê, bike ku zûtirin têkiliyê bi rewş û gotinê re dênê.

Li vir, divê ku mirov di dewama wê de werênê ser ziman ku zarok, wê di pêvajoya dûsalîya xwe de wê baş fahm bike. Lê tenê alîkarî ji wê re divêt. Her wusa, zarok, bo ku ew fahm bike, dema ku mirov bahse tiştekî li berçav kir, mirov bi telîyê wê nîşan bike. Minaq, dema ku mirov bahse beşên laş ên weke bêvil, guh, çav, dest, sing, ling, lêv, ziman, qirik, pişt, pêş û hwd kir, mirov bi teliyê nîşan bike. Dema ku mirov bi navkir û bi teliyê ew nîşan kir, wê zarok, wê êdî wê dengê weke navê wê û nîşankirinê bi hevdû re bihizirê û wê bi wan bi hevdû re bihizirê. Bi wê rengê, wê di mejiyê zarokê de ew bicih bibê. Bi wê re pirsên hesan, mirov ava bike, Minaq, weke ´gogê bixindirêna´. Ku zarokek pitik ji wê piçûktir hebe, wê helde hember û bêjê ´pitikê maçka´. Minaq, şekalê û ankû cilekê hilde li dest, navê wê bêjê û pirsa wê bike. Minaq, şekalê şanî bide û bipirsê ´ka şekal.´ Bi wê re jî, mirov helbestên hesan li zarokê bide hisandin. Pirtûkê şanî zarokê bide û wê bi teliyê nîşan bike û navê wê ji zarokê re bêjê. Ev rewşên ku mirov, di jîyane xwe de bi hesanî û pêwîstînî dike na. Mirov, her roj wan dûbare dike. Bo vê yekê, zarok,

dema ku wan dike, wê her wusa bi wê kirinê re di mejiyê wê de bicih bibê.

Bi wê re jî, her roj, mirov bi sazûmanî û di çerçoveya rêkarî(´disiplîn´)yekê de mirov, gotinan ji zarokê re bibêjê. Her roj, mirov hinek gotinên nû ji zarokê re bi kirinê wan re ji zarokê re bibêjê. Her gotina ku mirov ew ew ji zarokê re hat gotin, weke pirs jî ji zarokê were kirin. Minaq, dema ku mirov di rojekê de ji zarokê bipirsê ku ´kûrsî´ çî ya, mirov kûrsî şanî zarokê bide li ser rûnihê û ankû zarokê li ser rûnênê û bêjê ´ev kûrsî ya´ û ankû ´li ser kûrsî rûniştîya´ û hwd. Bi wê re jî dema ku mirov gotin ji zarokê re hanîn li ser ziman, bi zimanekî zelal û safî û hêdîka, herî hindik du gotinan werê cem hevdû û hevokan ava bike û biminaq bike li berçavên zarokê û ji wê re werênê ser ziman. Minaq, di destpêkê de mirov dikarê bêje ”pirtûka min”, ”lîstoka te”, ”nivîna te”, ” dayika te”, ”şîrê te”, ”çaroxa te”, ”gizlewête te” û hwd. Piştre heman hevokan tenê gotinê lê zêde bike. Minaq, di nava hevokên pêşî de hevoka ´dayika te´, dikarê bi rengê ”dayike te min”, û ”navê te zelal a”, ”Lîstoke te ev a”, ”çaroxa te ev a”, ”gizlewête te ev a” û hwd. Piştre dikarê di dewama wê de li wê zêde bike û bibêjê ”çaroxa te ev a, bike lingê”, ”gizlewête te ev, bike lingê” û hwd. Bi vê rengê, weke ku tê gotin li dewama gotina ”çaroxa te ev a”, ew pêveka ´bike lingê´ hatîya danîn. Bi vê rengê, di rêzekê de dikarê bi hemû gotinan ve were lê zêde kirin. Bi vê şêwayê, wê bo zarokê û fahmkirina wê jî wê zêde ne tevlîhev bê. Tenê li dawiyê gotina ”**min**” lê hatîya zêde kirin. Her wusa bi heman rengî dema ku dîsa ji hevokên berê hilde li dest û bêjê ”navê te”, dîsa dikarê bêjê ”navê te zelal a” Bi vê rengê tenê li dawiyê gotinê lê zêde bike. Ev şêwayê ji hevokên piçûk û bi awayekî hesanî ku ne zêde tevlîhev a bo zarokê li hevokê gotinan zêde bike û werênê ser ziman. Bi heman rengî ji heman hevokên ku mirov di wê demê de ji zarokê re hanîna ser ziman, bêî ku hevokê nû tevlî bike û ankû gotinan li wê zêde bike, wan hevokan bi hevdû ve bike û ji zarokê re werênê ser ziman bi minaqî. Minaq, bêjê ”dayike te me. Navê te zelal a” Ev herdû hevokên ku berê di nava hevokên hesan ên ku berê ji zarokê re hatibûbûna ser ziman in. Ev şêwayê fêrbûna ziman li zarokê û ankû danasîna zarokê bi ziman re, wê zarokê hem bi fahm û zimanê wê re pêşbixe û hem jî wê pirsgirêkên fahmkirinê ên ku wê mihtemel zarok bijî, wê wan jî pirranîyên wan ji holê rabike. Li vir, di dewama wê de mirov, divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku mirov, dema ku ji zarokê re hevok û ankû gotin hanîna ser ziman, mirov dûbare bi awayekî zela û hêdîka dengên

tîpan werênê ser ziman. Bi gotinekê re pirr dengên tîpî hena. Mirov dikarê wan jî, dûbare ji zarokê re werênê ser ziman. Ankû wan dengan bi zarokê bide dûbare kirin. Lê li vir, ya pirr giring weke rêgezekê, ew a ku miirov bi awayekî ku mirov karibê bi zarokê bide şêrînkirin, mirov wê bike. Dema ku zarok aciz bû, di cih de dev ji wê kirinê berê. Hertimî li ser kirin û tevgerên ku zarok hês wan dike re wê fêrkirinê bike. Bi vê rengê, wê hem zarok aciz nebê û hem jî bêî ku aciz bibê û jê nefretê bike, wê êdî wê rewşê bijî. Ev jî, wê ji zarokê re baş bê. Di dema fêrkirina zarokan li dengê tîpan, gelek şêwa û rêbazan mirov divê ku biafirênê. Minaq, zarokê hilde li dest û bibê dervê malê ku mirov li derve dikarê fêr bike. Li derve, dema ku mirov rastî sa(´kuçik´)yekî hat, tîpa serê navê sa çi ya ´s-s-s´ û hwd, ji zarokê re dûbare bike. Dema ku mirov malekê hat, tîpa ´m-m-m´ û hwd dûbare bi awayekî şêrînî ji zarokê re werênê ser ziman. Ev rewş, wê mejiyê zarokê bi minaqî bi wan dengan re bide naskirin. Minaq dema ku mirov dît ku taksîyek xabitî û kar kir û çû, bi dengê wê re mirov dikarê ji zarokê re dengê ´v-v-v´ û hwd, weke dengê ku ew ji wê taksiyê derdikeve mirov dûbare ji wê zarokê re werênê ser ziman. Van rewşan bi vê rengê, mirov dikarê her care ku mirov zarok derxist derve, dikarê bi wê re dûbare bike. Bi wê re wê zarok hem gera xwe bike û bêhna xwe bistênê û hem jî wê fêrbûna xwe jî bike. Her wusa, zarokê werênê cem taksiyê û navê wê, ji zarokê re mirov bibêjê û heta ku bi awayekî hesanî ji zarokê bixwezê ku ew dûbare bike. Bi heman rengî, navê rengên ku dayimî digûharin ên rê, weke ´kesk, sor û zer´, dikarê, her dema ku ew rohnî bû, ji zarokê re navê wê bê gotiin. Bi wê rengê, bi zarokê jî, navê wê bide gotin. Ev rewşên piretîkî na, di jîyanê de derdikevina ber mirov, her care ku mirov derkeve derve, mirov wê rastî wan werê. Bo vê yekê, wan rewşên ku mirov di jîyane xwe de hertimî rastî wan tê, bi zarokê bide nasîn û li ser wan re jî fêrbûnê bi zarokê re bide çêkirin. Wan rewşan jî, weke rewşna fêrkirinê ên bi awayekî xweza ên perwerdekirinê mirov bikarbênê.

Bi wê re dibêt ku zarok, di care pêşî de nikaribê, dibê ku di care duyem de dikaribê û heta ku zarok di care sêyem de jî nikaribê, lê di care çarem de ku ew zarok dûbare minaq rastî taksiyê hat, mirov ku teliya wê bi wê ve bike û nîşan bike û bêjê taksî, wê zarok jî wê vê fahm bike û wê weke mirov bike. Piştî ku mirov kir, mirov dikarê li dûv kirina xwe, ji zarokê bixwezê ku ew navê wê bibêjê bi nîşankirina me re. Dayik û ankû bav taksiyê bi teliyê nîşan bike û ji zarokê bixwezê ku ew navê wê bêjê.

Dibêt ku ew care pêşî, wê bi alikarî bêjê. Lê piştre, wê zarok, ku rastî taksiyê hat, wê ew bixwe wê bi teliya xwe nîşan bike û bêjê taksî.

Rewşa zarokê, di vê çerçoveyê de wê, pêşbikeve. Zarok, berî hertiştî wê bi dengê tîpan, gotinan û hevokan re bi vî rengî wê hevnasînê bike. Hevnasîna zarokê, wê bi minaq bê û di kirine jîyanê de bê.

Zarok, wê hevnasîna bi jîyane re wê bi gotinan re bike. Gotin di mejiyê zarokê de weke têgînna ku ew bi hiş kifş dike na. Di vê çerçoveyê de wateya gotinê zêde ya. Zarok, dema ku ew bi xwe kifş bike, wê hingî zêdetirî di mejiyê wê de bisekinê û cih bigirê. Zarok, gotinên ku ew kifş dike, wê wan bikarbênê. Lê zarok, ji dema ku bûya ve wê dengna ku mirov fahm nekê wê derxe. Şîrovekirin û ankû salixkirina wan dengên zarokê bixwe weke gotinan ji wê re wê, aliyekî giring ê temenê pêşketina wê bê. Zarok, bi wê re dema ku heya wê hat afirandin, wê hingî hoyandinê di mejiyê xwe de li wê çê bike. Di vê dema pêşî a zarokê de wê zarok, zêdetirî bi tevgerên ku ew bi wan laşê xwe dilabitênê û dike tevgerîyê de wê bike. Her wusa, bi wê re jî weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman, ku zarok, di nava jîyanê de bi wê bê dayîn kifşkirin. Ya ku wê ji wê re pirr giring bê, wê ev bê. Zarok, wê bi demê re awayê xwe yê deng derxistinê wê derxe. Her qirik çawa hatibê û pêşketibûbê, wê zarokê, wê li gorî wê şêwayê deng derxistinê wê derxe.

Di destpêka pêşketina xwe re her zarok, xwediyê awayekî û şêwayê pêşketinê ê bi serê xwe ya. Her wusa her zarok cudahîya wê heya û ev wê di temenê her zarokê de bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku zarok, di vê dema xwe ya piçûk û teybet de wê, hertimî zarok nêzîkatîyek teybet ji dê û bav bixwezê. Ankû ji mirovên ku ew li dora wê na, wê dibînin û bi wan re bi dîtin, dengkirin û beşên din ên jîyanê ku ew bihevdû re na. Di vê dema xwe de zarok, dema ku fêr dibê jî, gotinan weke ku mirov w dijî di mejiyê xwe de najî. Zarok, wê bi teybet dijî. Di aslê xwe de ji şêwayê gotinê zêdetirî, wê gotin bi dengê ku ew derdixe re wê ew giring bê. Di vê çerçoveyê de zarok, di vê dema wê de deng giring in. her wusa di sale xwe ya pêşî de jî dema ku zarok hinek zarokên din ên hemtemenê xwe dibînin, bi wan re bi şêwayekê weke ku ew dikevina têkiliyê de. Hebûna du zarokên hemtemen, wê wan weke miqnatisê bikişênê li hevdû. Wê heya wan bibê ser hevdû. Ew dengên ku ew ji xwe derdixin, dema ku heman dengê ji derve dibihîzîn, wê bandûrê li zarokê bike. Dema ku min ev rewş di mejiyê xwe de kifş kir, min weke ceribandinekê dengê zarokê ê ku ew di wê de digirî qayd kir û piştre di demek wê ya ku ew nagirî de li wê da hisandin. Ancama ku derket li holê

ew bû ku zarok, dema ku wê dengê xwe jî bê ku ew dengê girî bê, dibêt ku ew wê bigirî. Her wusa, li vir, ya ku mirov divê ku fahm bike ew a ku zarok, wê dengê di xwe de dûbare dike û ankû bi bandûrî ew bi wê dengê xwe yê girînê re digirî. Li vir, her wusa, ev jî, weke aliyekî din ê ku mirov, divê ku ji zarokê fahm bike ya.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, giringîyê de navend û cihê ku ew li wê ya. Her wusa, dema ku ew li qirêşekê bê û ankû deverek bi vê rengê û hwd bê, hinek zarok, wê bertekên zêde bidina nîşandin ku ev weke bersivdayîna zarokê ji pêşketinê re dihê xwandin a. Lê hinek zarok, bersivê nadina wê. Her wusa, li vir, rewş û hewaya wê cihê ku zarok di wê de dimênê, dikarê hem pozitiv jî û hem negatîv jî li ser zarokê bandûrê bike. Zarok, di pêvajoya xwe ya qirêşê de ne serkevtî bê, wê ev newê wê wateyê ku wê ew zarok di pêvajoyên xwe yên din ên dibistanê ku ew dest pê bike de wê ne serkevtî bê. Mirov, nikarê, vê rewşê bi vê rengê werênê ser ziman. Lê vajî wê jî, dema ku zarokek di qirêşê de ew, pirr zêde bitevger bê û weke ku ew serkevtî bê, ew zarok dibê ku dema ku wê dest bi dibistanê kir, ne serkevti bê. Her wusa, li vir gelek fektorên weke ên rewşa ku zarok di wê de ya, rewşa ziman, rewşa cihê ku zarok li wê dimênê û dixwênê û hwd, wê bi gelek fektorên din re wê bandûrê li zarokê bikin.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê di vê pêvajoya xwe de pirr zîz bê. Her kirinên li wê, nêzîkatiyên li wê û dengên li wê, wê bandûra wan li zarokê wê hebe. Zarok, wê karibê bi mejiyê xwe re wê şîrove bike û ancamekê ji wê derxe. Li vir, zarok, di vê pêvajoya xwe ya pêşî de, ahenge bi deng re, nerîna bi çavan re û her wusa germehîya laş ji mirovên li hewirdora xwe dihilde. Di aslê xwe de ya ku di temenê bertekên wê de ya jî, wê ev bê. Her wusa, zarok, di vê rewşê de xwe baş dijî. Di aslê xwe de rêyên têkilîdanînê ên zarokê ên bi derve û bi mirovên li derve ên li dora wê re wê, ji ya ku em dizanin zêdetir bin. Her wusa germehîya laşê mirov, wê rêyeka têkilîdanînê a zarokê bê. Zarok, bi wê germehiya laş re têkiliyê didênê. Bi wê têkiliya li ser wê germehiyê re wê zarok, heta ku em di farqê de bin û ne farqê de jî bin, wê têkiliyê bi mejiyê mirov re jî dênê. Her wusa, li ser vê rewşa germehiya laş re ez vê yekê jî werênima ser ziman ku mirovekî ku ew xwe nêzî zarokê dike, çendî ku ew rûken bê û xwe baş bide nîşandin jî, lê dema ku ew mejiyê xwe de ne rehet bê û hinek pirsgirêkên ku wê di wastênin ku ew di mejiyê wê de hebin, wê zarok, wan jî hîs bike. Her wusa, wê zarok, bi wê mirovê ku ew bi mejiyê xwe ne rehet re wê xwe

rehet hîs nekê. Zarok, bi rêya germehiya laş, nerîna ji çav û her wusa destlêdana li zarokê û ankû li laşê zarokê, wê zarok bi rêya wan re wê, vê yekê fahm bike. Bi mirovekî ciwan re jî ev hatîya dîtin ku ew, dema ku ne rehet bê, wê di kirin û tevgerên xwe re ne rehet bê, wê nikaribê, di cihê xwe de rehet bisekinê û wê nikaribê laşê xwe di rehetî û aramiye de bihêlê. Mirovên ku ew li dora wê mirovê ne rehetin jî, wê ji wê tevger û kirinên wê fahm bikin ku ew ne rehet a. Her wusa zarok, vê yekê pirr zêdetir hîs dike û fahm bike. Bo vê yekê, zarok jî, wê bi wê re ne rehet bê û xwe rehet hîs nekê. Zarok, bi rêya tevgerên mejî û laş, dikarê tevger dênê. Gelek caran mirov weke dê û bav û ankû mirovên li dora zarokê ku bi wê re diaxifê û ji wê re gotinan bi deng dibêjê, zarok wê ne gotinan lê ew hejhejok(´tîtreşîm´)ên deng ên bi rêya gotinê ku derdikevin, ji wan peyamên ji mejî digirê. Çendî ku gotin, weke rêyeka têkildanînê jî bê, lê zarok wê bi tîtreşîma dengên gotinê, wê her wusa fahm bike weke ku çawa ku zarok bi germehîya laş fahm dike. Weke ku çawa ku zarok, li ser germehiya laş re wê têkiliyê bi laş û mejî re didênê. Her wusa weke ku çawa ku zarok bi rêya tîtreşîmên dengên gotinê û germehiya laş têkiliyê didênê, her wusa bi heman rengî li ser dîtîna çavan re jî wê heman rengî têkiliyê dênê. Ew tîrêja ji çav zarok digirê, wê pêşî heya wê çê bike û piştre jî wê têkiliyê bi zarokê re dênê. Carna di vê çerçoveyê de bi rêya çav ku mirov li zarokê dinerê, ji wê nerîna çavên mirov carna zarok aciz dibê û carna jî rehet dibê û dixwezê dewam bike û bi wê nerîna li çav. Ev, sedema wê, ew a ku zarok, wê têkiliyê li ser çav re didênê ya. Zarok, di vê çerçoveyê de her wusa bi rêyên laşên mazin ên têkilî danînê re rêyên xwe yên teybet ên têkilî danînê diafirênê û bi wan re têkiliyê bi mirov re didênê. Zarok, van rewşan bi vê rengê baş fahm dike. Rewşn têkilîdanînê, carna mirov weke axiftin, nerîna bi çav û destlêdana li laş û hwd dihênê ser ziman. Lê rêyên zarokê ên teybet ku di hundurê van têkiliyên mirov re jî dibûhûrin zarok di wan re **têkiliyê didênê**.

.

**Hevnasîna dêûbav a bi zarokê re û derûnîya dayikê bi wê pêvajoya wê ya giran re ku ew dijî. ..**

Dayik, piştî demek dirêj a bihemlbûna xwe re wê were dema zarokbûnê. Wê zaroka wê were dunyê. Herkesek merek dike ku ew zarok çawa ya, xwediyê rewşek çawa ya. Dema ku ew zarok di zikê dayika xwe de ya, wê xwe bilabitênê. Her ku zarok xwe dilebitênê, wê gelek hêstan bi dayika xwe re çê bike. Wê dayik, bi wê re bijî. Dayik xwe ji bûyîna dayikatiyê re amede dike. Her ku dayikê, demê dûbûhûrênê. Wê vê

pêvajoyê. Ev pêvajoya ku zarok, di zikê dayikê de ya, wê weke ku dayik jî xwe bûna dayiktiyê re amede bike. Dema ku dem hata wê kêlîka ku wê zarok werê dunyê, wê weke ku ew dayik, zûve bûya dayik. Her wusa, wê xwe bi vê rengê bi awayekî pirr baş amede hîs bike.

Dayik, piştî ku hat nexweşxanê sanciyên xwe jînkirin, wê êdî ew dayik, bidest wê pêvajoya bûyîna zarokê bike. Dayik, di nava wê rewşê û gengeşîyê de wê li bendê bûna zarokê bê. Weke bav, mirovên li dorê jî, wê li wir, ku li rex dayikê bin û ankû li deverek din bin, wê ew jî wê pêvajoyê bijîn. Lê her çendî ku ew wê pêvajoyê dijîn jî, wê bi dilperîyekê wê pêvajoyê bijîn. Herkesek li bendê, bûyîna zarokê ya.

Zarok, weke pêvajoyek giring a bi bûyînê re ya. Zarok, dema ku hat dunyê wê bi dê û bavê wê re wê, xwediyekê çê bike. Bi wê re jî, wê bi hewirdorê re dilxweşîyekê çê bike. Ev zarok, çendî ku piçûk û nûbûya, wê bi xwe re gelek tiştan bi mirov bide jînkirin. Mirov, wê gelek hêstan biwê re bijî. Gelek hêstên ku mirov dikarê wan salix bike û niikarê salix bike, wê bi mirov biafirin. Ew pêvajoya dirêj a bihemlbûnê a dayikê, wê bi mereq û dilperîyan xwe bide domandin. Zarok, wê were dunyê. Dayik jî, pirr mereq dike ku ew zaroke çawa di zikê xwe de diparêzê. Zarok, çawa di zikê wê de pêşdikeve, wê pirr mereqe wê bike.

**Hêstên ku wê biafirin**, wê bandûrê pirr zêe ji aliyê derûnî û hwd ve li dayikê û bav bikin. Gelek hêst wê biafirin. Dayik, wê ji her aliyê ve wê hîs bike û wê bi hêstîyarî wê pêvajoyê bijî. Li derve bav jî, wê pirr zêde bi mereq û çûnûhatinên ku ew di mejiyê xwe de dijî re wê li bendê zarokê bê. Pirr mereq dike ku wê rastî zindiyekê çawa were. Pirr mereq dike. Bi wê mereqê li bendê ya.

Dem her ku wê herê, wê hêstîyarî jî, zêdetir bibê. Wê dayik û bav, wê pêvajoyê bi hevdû re bijîn. Wê li bendê bin, Piştî ku zarok bû, wê xêr hatina wê bikin. Wê êdî wê zarokê bibînin. Ew kêlîka pêşî ku dê û û bav jî, zarokê dibînê û piştre destê xwe didiyê de wê herdû jî, gelek hêstan bi hevdû re bi wê zarokê re bijîn. Wê gelekî xwe xarîb hîs bikin.

Zarok, wê were û wê ew were dîtin. Herkesek wê li wê lê binerê. Wê pêşî herksek lê binerê bi mereq. Ew zindiyek û ankû afêrêndîyek çawa ya, wê herksek bixwezê ku wê bibînê. Wê hêstên mazin biafirin. Pêvajoya pênasîna bi zarokê re wê pirr zêde, pêvajoyek hêstîyar bê.

**Bo dê û bav, xwe weke dêûbav hîskirin, wê bi pêvajoyê re pêşbikeve.** Pêvajoya hevnasîna bi zarokê re wê pirr zêde bi hêstîyarî bê. Dayik, wê hin bi hin bi bandûra wan hormonên xwe yên laşê xwe wê zûtirin bi wê hêsta dayikatiyê re hevnasînê bike. Bo bav, wê pêvajoya

jîyankirina bihemlbûnê a dayikê, pêvajoya bûyîna zarok û piştre dîtina zarokê, wê temenê pêşketina têgîna bavitiyê a bi wî re bin.

Piştî ku hevnasîn bi zarokatiyê re hat kirin, wê êdî zarok, weke ´zaroya xwe´ wê ji aliyê dûûbav ve were hêr kirin. Dêûbav, vê pêvajoyê wê bi hêstîyarî, piştî bûyîna zarokê re wê zêdetirî êdî hin bi hin bijîn. Piştre wê hin bi hin dayik jî û bav jî, dema ku zarokê dibînin, wê ew hêsta ku ew beşek ji wan re wê bi wan re biafirê. Wê, bi wê hêstê re bidest hevnasîna bi zarokê re bikin. Wê piştre, wê bi hêst û têgînî wê zarokê bi rengê ku dêûbav dibînin wê herê bikin.

Herêkirina zarokê, wê destpêka bûyîna dêûûbav a dê û bavê zarokê, wê bi xwe re wê êdî dê û bav bi jîyane wan re bide gûharandin. Dê û bav, wê ji nû ve weke ku ew xwe li jîyanê hîs bikin, wê bihizirin. Ew hîs wê bi wan re biafirê. Ev jî, bi rengê destpêkek nû ya. Dê û bav, wê êdî weke dêûbav wê bidest jîyankirina xwe bikin. Wê li wê weyn û rola xw eya dêûbavitiyê wê bidesr hizirînê bikin û bi wê re bijîn. Wê erk û berpirsîyarîyên nû wê xwe bidina ber wan. Her wusa, zarokek ku êdî jîyane wan ji nû ve diadilênê û dide dîyarkirin û kifşkirin êdî ketîya jîyane wan de. Wê hertişt li gorî wê zarokê û başbûna wê û pêşketina wê bê. Êdî pêvajoya dêûbavikatiyê destpêkiriya bo dêûbavê zarokê.

**Hevnasîna zarokê bi jîyanê re**, wê di vê demê de pêşbikeve. Zarok, wê weke hevnasînaka nû a li jîyanê bê. Wê jîyane malbatê li dora wê were hûnandin. Dê û bav jî, wê li gorî wê jîyane xwe biadilênin. Her wusa, dê û bav, vê pêvajoyê bi xwe re bi kûrehî dijîn. Zarok, wê bidest xwarinê bike. Wê pêşî ji singa dayika xwe wê şîr bimijê. Wê piştre wê hin bi hin wê mazin bibê. Wê bidest derxistina dengan bike. Wê zarok, bi bêhn û dengê dayika xwe re wê pşî hevnasînê bike. Piştre jî wê bi rû û dengê bavê xwe re wê hevnasînê bike.

Piştre jî zarok, bi nerîna xwe hewirdorê di nerê. Bêhn dike. Deng dike. Dibînê. Her wusa, wê bi vê rengê temenê pêşketina zarokê jî wê xwe bide pêşxistin. Zarok, hevnasîna bi dunya derve dike. Wê hewirdora xwe hin bi hin kifş bike. Zarok, diheyva xwe ya pêşî de li ser bêhn û deng re dijî. Wê bi nerîna xwe bidest hevnasîna herêmê bike. Wê piştre bidest dîtina herêmê bike. Wê nerînên kûr û dirêj wê li hewirdora xwe bike.

Zarok, wê di vê pêvajoya xwe de wê bidest hîskirinê bike. Wê sar û germ, şev û roj, reş û sipî û hwd, wê bidest kifşkirina wan bike. Wê rengan ji hevdû bidest derxistinê bike. Dema ku binxwe lewitand û birçîbû, wê bigîrî. Dema ku zarok, aciz bû, wê bigirî. Dema ku ew bixwezê ku dayik û ankû bavê wê zarokê hilde ser mil, wê zarok bigirî.

Zarok, bi demê re hewirdorê nas dike. Her wusa, hêsta xwe di ewlabûnê de hîskirin û ankû ne di ewlabûnê de hîskirin wê zarok, xwe li ser rû û hêstên ku ew dûbare dijî re wê xwe bijî. Ya ku wê hêsta ewlahiyê bide zarokê jî wê ev bê. zarok carna wê hêsta bêhewlahiyê dema ku ew binxwe dilewitênê jî dijî. Bo vê yekê, hertimî dema ku zarokê bixwe de rît, di bin xwe de mîj kir û hwd de, zarok, wê di cih de bigirî. Bo vê yekê, di vê demê de dema ku zarok bin wê hat paqijkirin û bipaçek nû ê pêçanê hat pêçan, wê xwe baş hîs bike. Hêsta başbûnê, wê bi zarokê re wê, xwe baş hîskirin, bin w paqijkirî bê, cihê wê baş bê, bi rû û û bêhn û dengê dê û bavê re, cihê ew ku lê ya ku ewder germ û nerm a û hwd re hevnasînê dema ku ew dikê, wê bijî.

Zarok di vê demê de ku ew cihê wê xweş bê, wê xwe di ewlehiyê de bibînê. Bi wê re jî, hertimî mirov bi wê re biaxifê. Her dema ku mirov bi wê re axift jî, ya giring ew a ku mirov gotinên xwe pirranîya wan dûbare bikê. Bi demê re bi pêşketin û mazinbûn zarokê re dem bi dem li gotinên ku mirov ji zarokê re dike, gotinan li wê zêde bike. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman, dema ku zarokê dûbare gotin bihîstin, wê li ser wan re jî xwe baş hîs bike. Ber ku wê ji wê re beyenî newin.

Zarok, dema ku ew digirî, wê girîyê wê were çi wateyê? Bêgûman, wateya girîyê zarokê, mirov dikarê bi zarokê re bi gelek awa û şeklan wê kifş bike. Lê dema ku zarok, birçîbê, binxwe şil kiribê û hwd wê bigirî. Zarok, bi vê rengê girî, weke rêyek xwe hanîna li ser ziman jî bikardihênê. Ev rewşên weke bêewlahiyê, wê di vê pêvajoyê de dayik jî wê bi xwe re dem bi dem wê bijî. Dayik, bi wê hêsta ku wê karibê meyizênê, wê karibê erka xwe werênê li cih û hwd, wê di mejiyê xwe de xwediyê pirsan bê. Zarok, dema ku ew çendî ku ew piçûk jî bê, ku wê li nava çavên dayikê nerî, wê fahm bike. Wê ji rûdên û çavê dayikê wê wê hêsta dayikê a ku ew dijî di xwe de wê kifş bike. Ev, wê bi zarokê re jî bandûra wê xwe bide dîyarkirin. Divê ku mirov li vir, fahm bike ku zarok, di nava nerîna çavan de, di nava dengê ku ew gûhadar dike û her wusa di nava destlêdana ku dayik û hwd li wê dike de wê zarok rêyên xwe yên teybet ên têkilîdanînê wê biafirênê. Ev rewşên zarokê, wê heta heyvên wê yê şêşan jî wê bi xortî werin û bijîn. Lê ji vê demê û pê de wê, bi ziman re hiş û hwd derkeve li pêş. Zarok, wê li ser wê re bidest fêrkirin û fahm kirinê bike.

Bêgûmman divê ku mirov werênê ser ziman, bûna jin wê zortir bê ji bûna mêr. Mêr, di jîyanê de hem dikar û xabate xwe de û hem jî di rewşên ku ew dijî de ew, heta roja me hertimî li pêştirbûya. Lê bo jinê,

mirov nikarê wê bi awayekî baş bibêjê. Hertimî astengî hem ji çanda civakê û hem jî ji rewşên fizyolojikî weke girêdana wê ya bi zarokê û hwd ve hena. Jin bi hezaran salan di nava civatê de ew, hertimî bi rol û weynekê hatina nasîn û bi wê re jî andamên civatê xwestina ku wê bibînin. Li vir, bi awayekî jin hertimî li pêşîya astengiyên mazin ên civatî derketina li pêş. Bo vê yekê, ew rewş, rol û weynên jin û mêr ên ji hevdû cuda, wê hertimî di pêşketina zarokê de wê, xwe bidina dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wê, aliyê bihêz kîjan bê, wê bandûra wê zêdetirî xwe bide li pêş. Di vê rewşê de jî wê jin, hertimî di rewşek li şûn de bimênê. Ev rewş, hemû wê weke rewşna ku wê, bandûrê li dayikê bikin. Di vê çerçoveyê de wê dayik, hertimî, pirr zêde xwe wastîyayî bibînê û ji gîyane dûr bikeve. Gelek pirsgirêkên derûnî û newrolojikî û hwd, di vê demê de hertimî bi derfeta ku wê bi dayikê re xwe bidiina dîyarkirin. Bi wê re jî ew hêsta bi dayikê re ku dihizirê ku ew alaqaya li hemberî wê gûharîya, wê bandûrê zêdetir li wê bike. Dayik, bi van rewşan re wê dilşikeştinekê bi awayekî derûnî û hêstî wê bi xwe re di xwe de wê bijî. Gelek dayik, wê didina derve. Lê gelek dayik jî, wê di xwe de vêşarî dihêlin. Ber ku dihizirin ku wê, ti kesek wan fahm nekê.

Pirsgirêkên bi vî rengî ên ku wê xwe bidina dîyarkirin, wê weke pirsgirêkna giring bin. Dayik, wê ew jîyane wê ya ku wê ji wê re dî bigûharê û ew gûhartinên ji wê re tên, wê dem bi dem xwe di bin wan de hîs bike. Bandûra wan, wê giraniyekê li ser dayikê çê bike. Bandûra wê wan gûharînên di jîyane wê de wê, di vê demê de heta ku wê temenê gelek pirsgirêkên wê yên jîyanî jî bê.

Di vê rewşê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê weke zarokê dayik jî pêwîstîya wê bi alaqayê û rûnîşana li wê hebe. Wê pêwîstîyê bi alikarîya derûnî û hestî wê hebe. Gelek pirsgirêkên jîyanî ên meyizendina li zarokê, wê li ser pirsgirêkên wê yên hêstîyarî re xwe bidiina zêdetir kirin. Ev jî, wê gîraniya dayikê zêdetir bike. Ev pêvajoya dayikê, wê di aslê xwe de wê ji wê re weke pêvajoyek giran jî bê. Rewşa dayikê, weke rewşek giring ya ku mirov divê ku wê bi teybetî li vir, hilde li dest a.

Di vê pêvajoya bûyîna zarokê de wê têkiliya dêûbav jî, wê giring bê ku mirov wê hilde li dest û fahm bike. Di vê demê de çendî ku dêûbav bi hevdû re di nava têkiliyek baş de bin û hevdû piştgirî bikin, wê di vê çerçoveyê de wê bê alikariya mazin ji wan û malbata wan re. Di vê demê de wê ji her aliyê ve têkiliyên jin û mêr, wê di mejiyê wan de wê li berçav ve derbas bibin. Her wusa, heta ku têkiliyên wan ên zayendî ên bi hevdû re jî. Di vê demê de wê zarok, weke navende wê têkiliyê bê. Pirr

giring a ku dêûbav, di pêvajoya mazinbûna zarokê de weke dû mirovên ku hertimî hevdû girtina ku ew bi wê rengê derkevina berzarokê. Ya ku wê bandûra wê, pirr zêde li zarokê wê bibê wê hebe. Her wusa, wê bandûra wê li têkiliya dêûbav jî bibê. Di vê demê de dêûbav, her wusa têkiliya wan ya xort û baş a bi hevdû re wê alikarîyek mazin ya derûnî û hêstî a ji dayikê re jî bê. Di pêvajoya mazinbûna zarokê de ku dêûbav, ne weke dû mirovên ku ew bi hevdû re di pêşbaziyê de na. Ya ku wê hem têkiliya wan ya bi zarokê re wê mêzîn(´pîvan´)a wê xira bike jî, wê ev rewş bê. Her wusa, wê bandûra wê li têkiliyên wan ên bi hevdû re jî bê.

Li vir, vê pêvajoya pêşî a dayiktiyê, weke ku me hinekî li jor hanî ser ziman ku ew çendî bo zarokê û pêşketina wê giring a, bi heman giringîyê li vir, divê ku mirov bo dayikê, hêst û derûnîya wê jî werênê ser ziman. Divê ku mirov jibîrnekê ku dayik, di vê demê de wê biqasî dema xwe ya bi hemlbûnê û dema zarokbûyînê wê hêstên wê yên tenik û zîz wê li wê serdest bin. Di vê demê de rewşên weke ên dêûbav ku ew bi hevdû re alaqadar nabin û ankû kêm bi hevdû re alaqadar dibû, wê pirr zêde li berçavên dayikê bi hêstîyarî werina dîtin. Wê ev rewş, bikin ku dayik xwe bi tenê pirr zêde hîs bike. Ev jî, wê biqasî birina di laşekê de wê, êşê bidina dayikê û wê biêşênin. Di vê demê de dayik, dema ku van rewşan bi derûnî û hêstî dijî, carna ew hêstîyarîya wê ya ji van rewşan dikarê wê ji xwe bibê ku ew pêvajoya pêşketina xwe ya wê demê jî bişopênê. Wê ev rewş, li ponijîna wan, pirr zêde bandûr bike. Hey û bale dayikê, li vir, wê ji ser zarokê winda bibe. Di vê demê de bav jî, hey û bale wî ku ew li ser zarokê pêşbixe, wê biqasî ya dayikê wê giring bê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêjê, ev pêvajoyeka ku dêûbav, pêwîstîya wan pirr zêde bi alikarîya wan ya ji hevdû re ku ew bi kirinên piretîkî ên jîyanî bê, bi hêstîyarîyê bê û ankû ji aliyê derûnîyê û hwd ve bê, wê pêwîstîya wan ji hevdû re wê hebê. Çendî ku ew karibin di van rewşan de weke dêûbav, ji hevdû re alikar bin û piştgir bin, wê bi heman rengî di pêşketina zaroka xwe de jî kifşkar û xwedî weyn bin.

Zarok, di van demên ku ew bidest kifşkirinê ji nava têkiliyên dêûbav dikê de wê, wan nêzîkatîya dayikê û bav pirr baş bixwênê. Ez dikarim bibêjim ku wê zarok, dibê ku ew ji dê û bav zêdetirî wê karibê wan bixwênê ji aliyê hêstê, derûnîyê û dane hîskirinê ve.

.

**Pêvajoya pêşketina zarokê ji du û heta sê saliya wê û hin bi hin pêşketina biryardarî û vîna zarokê.** ..

Zarok, piştî ku tê salê xwe ya sêyan wê bigihijê pêvajoyek xwe ya giring. Di vê demê de zarok, baştir fahm dike. Xêva zarokê baştir pêşketîya û di xwe de digirê. Zarok, hevokên herî hindik ku wê di wê de sê-gotin hebin, wê karibê ava bike.

Ev dema zarokê, wê weke demeka giring a zarokê bê. Zarok, di vê demê de wê xwe kifş bike. Wê hin bi hin keseyetîya xwe kifş bike. Di vê demê de wê zarok, zêdetirî demê bi kifşkirinên bi keseyetîya xwe re bi bûhûrênê. Ji ber vê yekê jî wê zarok, zêdetirî di hundûrê xwe de weke ku wê girtî bê ji derve. Wê ji têkiliyên zêde re girtî bê. Wê, vîna xwe dênê li holê. Wê tişta weke ku ew dixwezê wê bixwezê ku ew bike. Dema ku ew wê nekê, wê zû bixayîdê. Wê ji xayidîbûnê ve zêde vekirî bê. Wê keçzaro, zêdetirî vekirî bin ji rewşên xaydînê re. Ber ku ew zêde zîz in. Di vê demê de wê zarok, bi vîna xwe bixwezê, ku ew bihilbijêrê. Gelek dêûbav, di vê dema zarokê de ew dixwezin ku shet´(´kontrol´)a xwe li ser zarokê çê bikin. Bo vê yekê, gelek xwestekên zarokê, wê ji wan bersiva ´na´ wê hildin. Ev jî, wê bandûrê li pêşketina zarokê a zêhn û ziman jî bike. Li vir, pirr giring dibê ku mirov zarokê baştirînî fahm bike. Mirovê bi wê re di têkiliyeka baş de bê. Mirov di têkiliyeka fahmkirinê de bê. Bi zarokê re karibê bibe zarok û wê fahm bike. Ya ku wê pêşketina zarokê, bihêrênî bi bandûr bike jî wê ev bê. Di vê demê de zarok bi tenê newê hiştin. Bi zarokê re weke dêûbav, hertimî di nava têkilî û danûstandinê de bê. Hertimî, danûstandinê bi zarokê re bike. Û di wê danûstandinê de li wê pirr heydar bê ku bi gotinên herênî(´pozitiv´) hertimî hewl bide ku danûstandinê bi ancam bike. Her wusa, xwestekên zarokê fahm bike û bi wê bide fahm kirin.

Di vê demê de gotinên ku mirov bikarbênê, bi hesanî wê karibin vîn û xwesteka zarokê bidina şikandin. Di vê demê de zarok bi hişê xwe di astek li pêş de ya. Bi wê asta wê re ku mirov karibê bi zanebûnê re dênê, mirov wê karibê têkiliyek fahmker ku herdû alî jî hevdû fahm dikin dênin. Zarok, di vê demê de wê hin bi hin fahm bike ku ´ya rast û ya nerast´, çî ya. Mirov jî di têkiliyên xwe yên bi zarokê re de hewl bide ku wê aliyê têgîn û têgihiştina zarokê pêşbixe. Zarok, bi mejiyê xwe re ji ber ku wê di vê demê de zêdetirî bi pêşketina xwe re baştirînn bijî, wê alaqaya zarokê li ziman hinekî din di çerçoveya hewldana fahmkirina wê de zêdetir bibê. Ev jî, wê girêdayî, wê têkiliya bi zarokê re bê. Zarok, di vê demê de dikarê bêjê ku ew birçîya û çi dixezê ku ew bixwe. Dikarê bibêjê ku wê çi cilê li xwe kê. Dikarê bide nîşandin ku ew çi dike. Her

wusa, di vê demê de wê karibê, hijmartinêa hijmaran bike û hinekî jî hevok bi hevok bixwênê.

Di vê demê de wê mejiyê zarokê wê zêdetir bibînê. Her wusa, zarok, her tişta ku ew dibînê, wê dilperîyê bi wê re bide çêkirin. Bo vê yekê, wê zarok, bixwezê ew jî wê bijî. Di vê demê de ji ber vê yekê wê xwestekên zarokê zêdetir bibin. Her wusa, dema ku zarok wan nejî jî, wê şikeştinê bi wê re bide çêkirin. Ji ber vê yekê jî, zêdetirî giringtir dibê ku mirov têkiliyeka ku fahmkirina wê zêde pêşketîya bi zarokê re dênê. Her wusa, bi wê rengê, her tişta ku ew dixwezê ku bijî, wê çawa bê, bi axiftinê mirov dikarê ji wê re werênê ser ziman. Li şûna ku mirov bi carekê bi gotinn redkar nêzî zarokê bibê û wê şikeştinê bi wê re bide çêkirin, her wusa bi têkiliyek fahmker nêzîk bibê. Zarok, dema ku bi zimanê hêskirinê û wê hêstê nêzîkî wê bibê, wê zarok ji wê re vekirî bê.

Ev dema zarokê, weke demek giring a. Wê pirr zêde mereq bi zarokê re pêşbikeve. Zarok, ji ber ku bi zêhnê xwe re vekirîya û dixwezê ku ew bi wê re pêşbikeve, wê zarok, hertimî bi w mereqa xwe wê pirsan bipirsê. Carna dêûbav, ji aliyê zarokê ve li barana pirsan tê girtin. Her pirsa ku zarokê bersiva wê stand, wê hinekî zêhnê zarokê bi pêş de bibê. Zarok, di vê demê de wê hewl bide ku mirovên li hemberê xwe jî fahm bike. Her wusa, wê hewl bide ku ´**empetîyê**´ çê bike. Dema ku rewşa hêstîyarî ew dibînê, wê hewl bide ku wê fahm bike. Li vir, di nava wê rewşê de mirov, ji zarokê re bibe alikar ku ew fahm bike. Di rewşên weke ên pêşxistina ´empetîyê´ de mirov dikarê di fahmkirinê de alikariyê bide zarokê. Ev rewş, wê zarokê, pirr zêde bi bandûr bike.

Di vê demê de zarok, wê bi hêstîyarî bê. Her wusa dema ku ew dibînê ku mazinên wê, alikariyê didina hevdû. Ew jî, weke zarok, wê hewl bide ku ew alikariyê bike. Çendî ku ew hêza zarokê zêde ya alikariyê nebê jî, pirr giring divê ku ew derfetê bibînê ku ew karibê alikariyê bike. Ev, wê mejiyê hevbeş ê zarokê pêşbixe. Her wusa, di danahevdû a malê de bê, dema ku li derve karek were kirin ku zarokê xwest alikariyê bike û ew alikariyê bike û hwd, wê zarokê zêdetir pêşbixe. Ev, wê di mejiyê zarok de wê têgihiştinê bide çêkirin ku zarok aîdî w malbatê ya û cihê wê di wê malbatê de ya. Wê xwe aîdî wê bibînê. Wê malbatê jî, weke ya xwe bibînê.

Di vê demê de zarok, dema ku ew kirineka ku ne li gorî dêûbav bike, gelek caran dêûbavan ceza dana zarokê. Ankû gotinên weke gotinên cezayê ji zarokê re bikarhanîna. Ev wê, pirr zêde bandûrê li zarokê bike. Her cezakirin û ankû gotina cezayê, wê zarokê di mejiyê xwe de wê,

hinekî dûr bike. Hinekî bişikênê. Di vê çerçoveyê de wê zarok, weke ancama wê, wê kirinên xwe ne bi xwestek û hişmendîya xwe bike, wê kirinên xwe ancama tirsa ji wê cezay û gotinên cezayê, weke ku ji wê re hatîya gotin wê bike.Ev jî, weke aliyekî giring ku mirov divê ku di hişmendiya wê de bê û bi gotinên bi vî rengî nêzî zarokê nebê. Her wusa, hertimî bi xwe re wê bide tevgerandin. Weke malbatî, hertimî bi hevdû re li ser taştê, firevîn û şîvê rûnihin. Bi hevdû re rûnihin û rabin. Wê hêsta alikariyê ji hevdû re biafirênin. Wê alaqayê li hemberî hevdû bidina nîşandin. Di vê demê de gelek kirinên ku zarok, karibê bike wê hebin. Her wusa, mirov wan kifş bike û bi zarokê re bike. Ankû bi wê bide kirin. Ev jî, wê wê hêsta xwe têr dîtinê wê bi zarokê re çê bike. Her wusa, li ser sofra xwarinê weke dêûbav, bi kevçî, çatala û hwd, weke xwe bi wê xwarinê bide xwarin. Di fincana avê de avê pê bide vexwartin. Di vê demê de zarok, çendî ku xelatîyan bike, wan xelatîyên ku zarokê kirina li rûyê zarokê nexê. Nehêlê ku zarok, di bin bandûra wan kêmesîyan de bijî. Dema ku zarokê kirinek kir û bi serneket, li şûna ku mirov ji zarokê re bibêjê ku ew bi serneket, ji wê re were ser ziman u derfetê serkevtinê hebû û çawa ew derfet hebû, ji wê re werênê ser ziman.

Gotinên ku zarok xwe bi wan kêm hîs bike, wê bi zarokê re şikeştinên hêstîyarî bi xwe re werênê. Ev jî, wê şikeştinên mayinda bin. Di vê demê de zarok çendî serkevtinan bijî, wê pêşveçûnên dema xwe ya piştre wê li ser wê pêşbixe. Bi vê hişmendiyê û têgihiştinê, divê ku mirov nêzîkatiyê li zarokê bike.

Zarok, di vê dema xwe de wê pirr zêde zîz û tenik bê. Zarok, di vê demê de wê hertimî pêwîstîya gotinên weke ku ew xwe bi wan baş hîs bike, dixwezê ku ew bi bîhîzê. Her wusa, dema ku zarokê, tiştekî baş kir, û dayikê û ankû bav, ji zarokê re got ”te çi qanc kir” û ankû destê xwe danîna serpişta zarok û pêre hanî, wê zarok, vê bişanazî pêşwazî bike. Wê vê weke nîşanaka başkirina xwe wê bixwênê. Zarok, her dema ku ew bi vê rengê were pêşwazî kirin, wê bandûra bi vê rengê pêşwazî kirina zarokê û şênazkirina zarokê, wê li ser mejiyê zarokê jî wê hebe.

Li vir, divê ku mirov vê yekê mirov werênê ser ziman ku wê, zarok, bi vê rengê pêşwazî kirin, wê mejiyê zarokê jî wê di gelek rewşan de wê aktiv bike.

Mejiyê zarokê, wan rewşên ku zarok dike û ew ji aliyê dêûbavê ve baş û ankû xirab dihên pêşwazî kirin, wê pirr zêde bixwênê. Bandûra wan, pirr zêde li ser mejiyê zarokê heya. Her dema ku zarokê, kirinek kir û ew kirina wê bi başî hat pêşwazî kirin, wê mejiyê zarokê bi wê rabê şah ê.

Wê pirr zêde şîyarîyê di xwe de çê bike. Her wusa ev rewş, wê bê temenê gelek afirînêrîyên hişmendî ên di mejiyê zarokê de. Çendî ku wê bandûra rewşên baş û baş pêşwazîkirina wê, wê mazin li ser mejiyê zarokê wê hebe, bi heman rengî wê bandûra rewşên ku zarok dike û baş neyêna pêşwazî kirin jî, wê bi heman rengî wê bi nêrênî wê pirr zêde hebe.

Mejiyê zarokê, wê van rewşan ji xwe re di kirinên xwe yên piştre de wê, bike refarans ji pêşveçûnên kiu zarok bijî. Zarok, dema ku kirinek kir û ku ew kirin baş bê û ankû ne baş bê, wê zarok, wê bike temenê xwe berdanê û rehet hîskirinê û ankû wê xwe bike rehet hîs nekê. Bi vê rengê, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê deme ku kirinek kir û ew kirin ji aliyê dê û bav ve ne hat pêşwazî kirin, wê zarok, piştre gelek rewş û tiştên ku ew dihizirê ku ew bike, wê xwe ji wan bi şûn ve bikişênê û nekê. Wê xwe bi sînor bike. Hertimî, wê fêrî baş dîtina dêûbavê xwe ve girêdayî bê. Ev rewş, wê zarok bike rewşek girêdanî de. Zarok, wê fêrî wê bibe ku wê dema ku ji dê û bavê xwe kir, wê bike. Wê biserê titştî nekê. Wê zarok, nikaribê, bi xwesteka xwe vîn û xwesteka werênê ser ziman û bênê li cih. Rewşên bi vî rengî ên ku wê zarokê bisînor bikin, wê pêşketina zarokê wê bisînor bikin. Her mudaheleyeka ku mirov li zarokê û kirinên wê dike, wê zarok, wê weke mudaheleyeka li xwe bibînê. Di rewşekê de ku dê û bav mudaheleyê li zarokê bikin, wê zarok, vê weke giştî fahm bike û wê di vê çerçoveyê de wê giştîya jîyane xwe de wê xwe bisînor bike. Li vir, ev jî li vir, pirr giring dibê ku dema ku mirov mudaheleyek li zarokê kir, wê ji zarokê re vebêjê û ji zarokê re werênê ser ziman ku ew ji ber çi ya. Bo ku zarok xwe bi tememî ji ber wê mudaheleyê di jîyane bi tememî de bi sînor nekê û derbeyê li pêşketina xwe ya giştî nexê, ev yek wê pirr zêde pêwîst bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê di vê dema xwe de wê, karibê bi aqilê xwe ya baş û ne baş´ ji hevdû cuda bike. Her wusa, ev, weke nîşanakaya giring a ku mirov divê ku wê kifş bike ya ku zarok, wê karibê ´qancî û xirabiyê ji hevdû cuda bike. Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de bi vegotinên weke ên çîrokan, axiftinên kin ên bi gotinên zelal û hwd re mirov dikarê wê têgîna zarokê di mejiyê wê de xort û bi hiş bike. Di aslê xwe de ev wê temenê kirinên zarokê jî wê biafirênê. Zarok, di vê demê de ew hîs û hêsta wê ya ´empetîyê´ bi wê re hin bi hin pêşketîya. Ev jî, wê dide nîşandin ku zarok, dikarê xwe bike dewsa yekî din de û li şûna wê bihizirê. Her wusa, ji aliyê hêstîyarî ve ev rewş, wê karibê bi zarokê, kirinên wê jî bide têgihiştin.

Zarok, di vê demê de di aslê xwe de bi pirr zêde kirina tiştan ku weke ´baş´ û ankû ´nebaş in, zarok li vir, wê weke hewldanaka wê ya biaqilî jî mirov dikarê wê fahm bike. Li vir, ya ku bi wan kirinên zarokê re xwe dide dîyarkirin wê mejî, hiş û zêhnê zarokê bê. Zarok, di vê demê de ji nû ve fêrî darizandina kirinan dibê. Bo vê yekê, gelek rewş û kirinên ku ew dike, dema ku wê kir û dêûbav ew kirin bi xirabî pêşwazî kir û çû bi ser zarokê de û biser zarokê de xûriha û li wê hêrs bû, wê zarok, nizanibê ku ew ji ber çi rastî wê rewşê hatîya. Zarok, kirinên xwe, dema ku ew dike, ne têgîna ku ew ´baş a û ankû ´xirab a dike. Ew, weke kirineka ku ew pêşî dikarê bike û dike. Piştre jî, wê kirinê weke kirineka ku ew xwe di wê de hîs dike ku ew karê bike. Piştre jî, hêst, hêz, vîn û xwesteka kirinê bi zarokê re çêbûya û ew kirîya. Ya ku bi zarokê re ku di temenê wê kirinê de ya, wê di rastîyê de ev rewş û ankû têgîhiştin bin.

Her kirinek û rewşek di kirina wê de wê vîn, hêz û xwestek hebe. Her wusa bi wê re jî, wê zarok, van di xwe de wê hîs bike. Li vir, ya ku em bi wê re ku wê divê ku em kifş bikin, ew a ku wê armanca wê kirinê çi bê, zarok, wê bi tememî li wê ne hizirê. Her wusa, li vir, piştî ku ew kirin hat kirin û ancama wê derket li holê, wê ew ancama wê heya ku wê ji zarokê re weke tiştek û ankû rewşek ku ew ne li bendê bê wê bi wê re xwe bide dîyarkirin. Em dema ku li kirina mazinekî bihizirin, bi vîn, xwestek û hêza kirna wê kirinê re mirov bi hişmendî li wê dihizirê. Her wusa bi wê re jî, di çerçoveya ancam û armancê de wê, li wê kirinê werê hizirîn. Ber çi ew kirin hat kirin? Sedema kirina wê kirinê çi bû? Mirov wê bi vî rengî li ser kirinê re bi ancam û armancê wê bihizirê. Li vir, ev hûrgilên ku em bi rewşê re dihizirin, wê zarok, di çerçoveya yên ku wan di xwe de hîs dike û dibînê re wê kifş bike û wê bike. Her wusa, li ser kirina zarokekê mirov dikarê li vîn, xwestek û hêzê bihizirê û wê kifş bike. Lê mirov nikarê weke kirina mirovekî mazin di wê de li armanc û ancamê şîrove bikin. Ancam, di çerçoveya kirina zarokê de wê weke rewşeka ku ew ne li bendê ya û rûdaya wê hebe. Zarok, li vir, li ancamê ne hizirîya ku ew kirin kirîya. Carna hinek mirovên mazin, ku zarokekê kirinek kir û piştre ancamaka ne li gorî wan derket li holê, wê bibêjin ku ”ne, kifşa ku wê ev kirin, vê ancamê wê derxe li holê.” Bo mejiyê mirovekî mazin, kifşkirina wê hesan a. Lê mejiyê zarokê, li vir, weke ya mejiyê mirovê mazin ji ancamaka ku ew li bendê bê kirinana nakê. Zarok, di vê dema xwe de wê gelek kirinan bike. Li ser fêrbûna ku ew di wan kirinan de dike re wê, zarok hin bi hin bi ancamên ku derdikevina li holê û ew dibînê re wê êdî wê li ancamê bihizirê. Wê têgîna ancamê bi zarokê re wê biafirê. Piştî ku

ev têgîna ancamê bizarokê re afirî û derket li holê, wê êdî zarok, berî ku wê kirinê bi heman rengî bike, wê zanibê ku wê ew kirin, çi ancamê bi xwe re werênê li holê. Wê di vê çerçoveyê de zarok, wê êdî bidest ne kirina kirineka bi vî rengî bike. Dema ku zarok zanibê, ku wê dema ku sênîkek hilde û li ardê xist û ew sênîk şikeşt, wê zarok, wê sênîkê ne hilde û li ardê nexê. Li vir, çendî ku zarok, xwedîyê vîn, xwestek û hêza kirina wê kirinê jî bê, wê zarok di derbarê ancama wê de wê di serê xwe de wê ne xwediyê wê têgîna weke ancamê bê. Bo vê yekê, dema ku zarokê, ew sênîk, hilde û li ardê xist û şikand û pê de, wê li ser şikeştina sênîkê û dîtina qatên wê re wê zarok, bihizirê ku ew dema ku sênîkê li ardê bixe wê bişikihê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku di rewşa kirina kirinê de wê pêşî vîn, xwestek û hêza kirinê wê xwe bide dîyarkirin. Piştre jî, piştî ku ew kirin hatkirin û ancamên wê derketina li holê, wê li ser wan re jî wê têgîna ancam û piştre ya armancê wê bi zarokê re wê xwe bide pêşxistin. Zarok, bi aqilê xwe di vê demê de ew bişewk û hêzekê bidest jîyanê dike. Kêfxweşîya ji jîyanê ku zarok di vê demê de digirê, wê pirr zêde bê. Her çendî ku zarokê ew kirin kirin û ew kirinên zarokê bi başî hatina pêşwazî kirin, wê zarok di wê xweşîya dilê xwe de ku mejiyê zarok wê pirr zêde şîyar dike wê bi wê re bijî. Zarok, di vê demê de gelek tengezerî û pirsgirêkên ku ew dijî, di aslê xwe de wê ji vê rewşê bin. Ber ku zarok, bi wê şewk û xwestekê wê kirinê dike. Piştre dema ku ew kirina zarokê rastî bertekna ne baş hat, wê zarok, bisekinê. Wê nizanibê ku wê çi bike. Her wusa, wê tirs bi zarokê re çê bibe ku ew heman kirinê bike. Ankû, dema ku ew kirinekê bike, wê heman ancamê bi xwe re werênê. Wê zarok, bihizirê ku ew dema ku çi kirinê bike, wê dê û bav, bi heman şêwayê herina bi ser wê de. Wê lê hêrs bibin. Zarok, wê di xwe de lê bixwezê ku ew kirinan bike. Lê wê ji ber vê rewşê nikaribê bike. Ev jî, wê bi zarokê re bê temenê xwe ne hanîna li ser ziman. Zarok, dema ku ew xwe neyênê ser ziman, wê pirsgirêkê bi derûnî, wê di cih de bijî. Derûnîya zarokê a zîz û tenik, wê ji rewşên şikeştinê re wê pirr zêde vekirî bê. Zarok, ji aliyekî din ve ew hê piçûk a û ji aliyê fîzîkî ve ew bi dêûbavê xwe ve girêdayî ya. Di vê sale xwe ya sêyan de wê zarok, di wê têgihiştinê de bê ku ew piçûk a û mihtacê dê û bavê xwe ya. Û dema ku ew hêrsbûnekê ji dêûbavê xwe dibînê, wê ji gelek aliyan ve bandûra wê li ser zarokê hebe. Wê zarok, xwe bi tenê hîs bike. Wê, xwe di tengesîyekê de bibînê.

Ev rewş û derûnîya zarokê, li vir, divê ku mirov wê baş fahm bike. Divê ku mirov hinekî din jî li ser wê bisekinê. Ev rewşa zarokê wê ji

pêşketina wê re giring bê. Pêşketin û pêşveçûna zarokê, di vê demê de wê bidest çêkirina motiveya xwe bi kirin û rewşan re li pêşketina xwe. Hoyandina zarokê a li ziman jî, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin.

Rewşa zarokê a di vê demê de ku mirov, bi rewşa motiveya wê re baş hilde li dest. Zarok, wê li ser kirinên xwe re wê xwe li rewşên ku ew dibînê wê motive bike. Wê xwe li gotinan motive bike. Wê xwe li kirinê motive bike. Gelek caran, tevî ku dêûbav dibêjina zarokê ´neke´ jî û tevî wê jî zarok ´weke xwe dike´ wê dike jî, wê hinekî bi vê rewşa motiveya zarokê ve girêdayî bê. Zarok, dema ku ew li ser kirinên ku ew dike û ankû dibînê ku ew şikeştinekê bixwe, wê ev şikeştin li motiveya zarokê jî bê weke şikeştinekê.

Motiveyên zarokê ên di vê demê de wê, zarokê li pêşketina wê ya vê demê wê bihûnê. Ev jî, wê bandûra wê li pêşketina zarokê bibê. Zarok, wê li kirin, gotin, dîtin û heta ku ew xwendinên ku ew hin bi hin dike, wê motiveya xweçê bike. Ev motiveya zarokê, wê temenê pêşketina wê ya vê demê jî bê. Zarok, di vê demê de ew, ji sale xwe ya duyem dikeve sale sêyan de wê bidest çêkirina motiveyê bike. Heta ku wê ev motiveya zarokê wê du sale dûyan de jî wê, pêşbikeve. Lê wê di vê salê de wê, zêdetirî pêşbikeve. Wê biheya zarokê a li ser kirin û rewşan re wê bi vîn û xwesteka zarokê re wê temen bistênê û pêşbikeve. Di vê demê de di aslê xwe de ku mirov, vê rastîya motiveya zarokê baş fahm bike, mirov wê bi wê hem hişê wê li ser kirinên û rewşên wê zêdetir bike û hem jî, wê bi wê re bi wê têgîna ´empetîyê´ ku ew di vê demê de bi wê re pêşdikeve re mirov, wê karibê zarokê bide hizirandin û bihişkirin ku ew kirin û rewşa ku wê ew bike, wê çi ancamê bi xwe re wê bênê. Her wusa, li vir, ya bo zarokê giring, ne ew a ku mirov bikirina zarokê re bike bin kontrolê de ya. Ya giring ew a ku mirov zarokê, bi wê kirin û rewşê re wî ji ya ku ew di serê xwe de dizanê zêdetir bi zanebûn bike û bi wê re care pêş li ser kirin û rewşê re têgîna ancamê di mejiyê zarokê de pêşbixe. Her wusa, bi vê yekê, wê zarok, weke ku di kirin û rewşê de ew, çawa ku li vîn û xwestekê motive bûya, wê bi wê re weke gotinek sêyem ku ew li wê zêde bike, wê bi wê jî motiveya xwe li rewş kirinê çê bike. Zarok, bixwe, dema ku hatibû dunyê di hefteyên xwe yên pêşî de, bidest nerînên dirêj li hewirdorê û li kesên ku dibînê dike. Ev rewşa kirina nerînên dirêj, wê piştre jî xwe di sale yekem de li ser pêşxistina hey û baldariyê li rewşan û li wan hoyandinê wê, pêşbixe. Her wusa di sale duyem de jî wê ev rewş bide domê. Lê wê piştre, piştî hiş pêşket û pê de, wê li ser hiş re

motivebûna zarokê li kirin û rewşan wê pêş bikeve. Zarok, wê di vê pêvajoyê de wê nû û nû bidest hevnasîna bi dîtina bi hiş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de ew her tişta ku di mejiyê xwe de ku kifş dike, ku bi kirinê bê û rewşên ku dibînê bê, di xwezê ku ew bike û ankû xwe tevlî bike. Di vê demê de ew xwesteka zarokê, a kirinê û her wusa di nava rewşan de cihgirtinê, wê hinekî jî di temenê wê de ev hebe. Zarok, dema ku dayika wê diçê deverekê, ew jî dixwezê ku ew bi wê re bê. Her wusa, dema ku dayik nava civatekê, wê zarok jî bixwezê ew li wir bi wê re bê. Zarok, van rewşan bi xwe re di çerçoveya pêşketina xwesteka bi hiş re de wê, dike. Xwesteka bihiş, wê di vê çerçoveyê de wê di temenê motiveya zarokê de jî bê. Lê li vir, dema ku mirov bahse motiveyê bike, divê ku mirov gelek rewş û tiştan bi hevdû re hilde li dest. Her wusa, ziman, hey û baldarî û hwd, wê bi motivebûnê re wê hevdû ji hevdû biafirênin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku derûnîya gotinan, li vir, divê ku mirov bahse wê bike. Derûnîya gotinan, wê zarokê, li ser dengên gotinê û hwd re bi hoyendinek giştî re wê motive bike. Zarok, di vê çerçoveyê de weke ku li hiş motive bûbê û ankû li pêşketina bi hiş motive bûbê di mejiyê xwe de wê, rewşek di vê çerçoveyê de wê xwe bi zarokê re bide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov werênê ser ziman ku motivebûn, wê heya zarokê li ser xalan û ankû ´nûqteyan´ bide hevdû. Di vê çerçoveyê de wê zarok, wusa motive bibe ku ew tişta ku ew dibînê û ankû dijî, weke beşek ji xwe jî bibînê. Zarok, bi aqilê di vê çerçoveyê de wê wê xwe bide dîyarkirin.

Di aslê xwe de wê di vê demê de fahmkirina têgîna motivasyonê bo zarokê, wê pirr giring bê. Zarok, di vê demê de wê bidest kirina tiştan bi xwe û bidestê xwe bike. Minaq, zarok, wê bidest çûyîna toeletê bike. Zarok, wê bidest xwarina xwerinê bidestê xwe bixwe bike. Zarok, wê bidest di seate xwe de ew herê navan nivînan û razê û sibehê di seate ku ew rabê de wê, rabê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê motivasyon, bo pêşxistina vê jî wê giring bê. Li vir, dema ku kirinek hat kirin û bi wê re ku li ser wê re hişmendiyek bi zarokê re hat çêkirin, wê zarok bi wê hişmendiyê zanibê ku ew kirin bo çi tê kirin. Piştre jî, wê li ser wê re pirsan ji dê û bavê xwe bike. Her wusa, zarok, dema ku bersiva pirsên xwe bixweşîkatî hilde, wê zarok, bidest hêskirina wê karê bike. Li vir, minaq, dema ku zarok, bi xwe rabû û çû toeletê û toelete xwe kir, wê ev kirineka ku zarokê bi xwe kiribê bê. Mirov, dikarê vê kirinê, weke kirineka zarokê ku ew bi wê serkevtîya werênê ser ziman. Bi wê re, kirinên weke ên ku zarok wê bike, kifş bike û bi zarokê re pêş bike û

piştre ji wê bixwezê ku wê kir. Dema ku wê kir, wê weke serkevtina wê ji wê re werênê ser ziman. Zarok, wê bi wan serkevtinan wê pirr şenaz bê. Wê dilxweş bê.

Her wusa, bi vê rengê, her kirin bo çi tê kirin, mirov divê ku ji wê re werênê ser ziman. Her kirinek, wê sedemeka wê hebe. Wê sedema wê, mirov ji zarokê re werênê ser ziman. Bi wê bide fahmkirin. Hêsta ku zarok xwe serkevtî û serbest hîs bike, bi wê re wê zarok bidest bixe. Bi wê re wê zarok, bidest kirinan bi vîna xwe bike. Vîn û hişmendî, wê têkiliyek di nava wan de hebe. Kirina ku wê bê kirin kifş bike û wê hêzê û qûdretê di xwe de bibînê ku ew zarok wê bike. Zarok, her wusa, di vê demê de vê yekê weke ku bi hîsîyetî ji xwe r weke pêwîstîyekê jî dibînê.

Zarok, di vê dema xwe de wê, bi aqilê xwe re li ser kirinan û rewşan re wê motivebûna xwe pêşbixe. Li vir, mirov jî weke dêûbav, dikarê gelek qadên ku wê zarok di wan de xwe motive bike, wan kifş bike, bi zarokê şêrîn bike û zarokê li wan motive bike. Bi wê re zarok, wê li ser kirinên xwe yên ku ew li wan motive bibe û ankû wan bikê, wê têgihiştinekê bi xwe re bidest bixwe. Wê zanibê ku ew çi dike. Pêşxistina hişmendiyê li ser kirinên mirov re wê bi vê rengê, were pêşxistin. Minaq, dema ku zarokê li çîrokekê hisand û di çîrokê de qarakterek dibûhûrê û ku li pêşîya wê qarakterê armanc heya wê xwe bigihêniyê de. Piştî ku qarakter xwe gihand armanca xwe û ankû devera ku wê heriyê de wê, weke ku çîrok jî bi dawî bibê. Zarok, wê li ser wê çîrokê re weke dewama wê, êdî wê bihizirê ku ew mirov bo çi xwe gihand wir, li wir, wê bimênê û ankû nemênê, wê li wir, çi bijî, wê çawa bijî, ku ew jin bê malbate wê berê kî hebû û piştre kî heya, zarokê wê hena û ankû nîn in, bi heman rengî ku ew mêr bê û hwd jî, wê heman pirs werênina serê zarokê. Zarok, pirr zêde di mejiyê xwe de bi afrînerîyekê dihizirê. Di mejiyê xwe de wê li wê çîrokê wê zêde bike. Dibê ku dêûbav, bersiva van pirsan di serê wan de nebê. Lê wê zarok van pirsan jî ji wan bike. Di aslê xwe de hizirîna zarokê piştî vegotina çîrokê, wê afirînerêya wê werênê ser ziman. Zarok, wê di çerçoveya jîyane ku ew dijî û mirovên ku ew dibînê, ku hebin, andamên din ên malbatê û hwd, jîyane wan jî bi rengê jîyankirina wan di mejiyê xwe de bigirê û li ser wê re jî bihizirê. Zarok, di vê çerçoveyê de ew ku di nava malbatek pirr endamî de bijî, wê jîyane wan andamên malbatê di mejiyê xwe de bicih bike. Ev, wê rewşek berfirehtir a civaknasîya malbatî di mejiyê zarokê de bicih bike.

Zarok, di vê demê de pirr zêde bimêl dibê. Her wusa, zarok çav li mazinên xwe jî dike. Dema ku zarok dibînê ku mazinekî wê, dixwênê û

ankû xabetekê dikê, wê zarok jî herê cem û wê bixwezê ku alî bike. Zarok, wê bi vê rengê wê kirinê di mejiyê xwe de bicih bike. Tişta ku zarok bi xwe re dibînê, wê bi xwe re bike çand. Di vê çerçoveyê de wê di vê demê de temenê motivekirina zarokê zêdetir pêşbikeve. Di vê demê de minaq dana xwendinê a zarokan, mirov dikarê çawa pêşbixe û zarokê li wê motive bike. Zarokê hilde dawa xwe û ji wê re bixwênê û ankû çîrokan ji wê re vebêjê.

Her wusa, zarok, dema ku mirov li wê biaxifê mirov zimanê laş bikarbênê. Dema ku axift, teliya xwe di nîşankirinê de bikarbênê. Zarok, pirr zêde dixwezin û hêsê dikin ku ji dengê dêûbavê xwe bihisênê. Bi dengê dêûbav, dema ku zarok hejandinê laş weke zimanê laş bi dêûbav re kifş dike dema ku ew divebêjin, wê pirr zêde hey û bale wê herê li ser wê xwendina ku ew ji wê re dikin. Di vê demê de xwezin, pirr zêde dixwezê ku bihisênê. Her wusa, pirtûkên  ku li CD´yan hatina xwandin ku ew li zarokê werênina hisandin, wê zarok ji wan pirr tiştê di mejiyê xwe de bigirê. Gelek vegotin û çîrokên ku mirov ji zarokê re vebêjê, dûbare mirov dikarê ji zarokê re werênê ser ziman û lê bide hisandin. Her çîrok û nkû vegotin ji zarokê re hatina vegotin, qarakterên di vegotinê de kirpandina nav, rewş û vegotina wan, wê di fahmkirina zarokê de heya wê bibê li ser wê û qarakterê. Zarokên piçûk ên di vê temenê de pirr zû dikarin xwestina wan ya xwendinê bişikihê û şewka wan winda bibê. Bo vê yekê, ya ku mirov li vir di derbarê wê de jî bibêjê ew a ku bi vegotinên kort, hesanî û xweşik hûnandî mirov dikarê ji zarokê re werênê ser ziman. Vegotinên ku zarokê hês wan kir û li xoşa zarokê çûn di dema xwendinê de wan, binaqênê û piştre dûbare û dûbare werênina vegotin ji zarokê re. Çîrok û çîvanokên gelîrî û ji nava xalkê ên civatî, wê gotinên wan bale bikişênina ser xwe.

Her wusa, di vê demê de tiştên ku zarok wê li xoşa wê herê, ji wê re werina kirin. Minaq, ´albûma´ wêneyan a malbatê ku hatî çêkirin, şanî zarokê bide û derbarê andamên malbatê de bi zimanekî çîrokvanî biaxife. Di derbarê endamên malbatê, xizm û çîranan de bi vegotinî ji zarokê de bi gotinên zelal û xweşik li hevdû hûnayî werêna ser ziman. Dema ku mirov ew hanî ser ziman jî, bale zarokê bikişênê li ser wê û ji wê re bibêjê. Ber ku zarok, pirr zû dikarê hey û bale xwe winda bike. Di dema ku hey û bale zarokê heya de vegotin, wê temenê di mejiyê zarokê de girtin jî bê.

Zarok, bixwe bila rajê wêneyan. Bi teybetî wêneyê ku wê rahiştiyê de ku kî ji endamên malbatê û ankû ku tu nas dike, wê ji zarokê re vebêje.

Bila zarok bixwe, pirtûka wêneyan rûpelên biqûlûbênê. Bila zarok di qûlûbandina rûpelan de ew li pêşîya te bê. Tu wê bşopêna. Her wêneya ku wê vekir, bi zimanekî xweşik û gotinên zelal, çend gotinan ji zarokê re vebêje. Her wêneyê bi çend gotinên kin derbas bikin. Zarok, wê van di hişê xwe de bigirê. Bi heman rengî, pirtûkên ku di wê de wêne zêde hebin jî, bi heman rengî bi vegotinên kin ên li ser wêneyên pirtûkê ji zarokê re werênina ser ziman. Wêneyên sawal û ajalan, di pirtûkê de bi wê bidina nasîn. Her şev, vegotinek û ankû çîrokekê ji zarokê re vebêj. Zarok, wê van tu carî ji bîr nekê. Her şev ku çîrokek pirr kin jî bê ku ji zarokê re werê gotin, wê zarok wê di mejiyê xwe de bigirê.

Her wusa, dayikên kurd, wê bi vê rengê her şev çîrokan bigotan û bi wê zarokên xwe bidan razandin. Lê demên ku zarok piçûk jî ba, dayikên kurd, wê bi ´lolîyan´ ku weke bi navê dayikên kurd re bûya yek lolikên weke ´lolî, lolî, lolîya min´ û hwd, ew dirazandin. Heta ku zarok di hat vê temenê xwe wê zarok, êdî bi çîrokan bihata mazin kirin.Çîrokên weke ´çîrokên keçelok´ çîrokên dayikên kurd ên bi hezaran salan bûn. Li dûv hevdû bi hezaran çîrokên kin ên keçelok dihatina vegotin ji zarokê re û ew bi wê dihat razandin. Çîrokên din ên ku hebûn jî dihatina vegotin. Her şev wê çîrokek kin ji zarokê re biheta vegotin. Dema ku şeva din ya nû dihat, zarok bi bêsabrî li bendî dayika xwe û vegotina çîrokek nû ya ku wê ji wan re bivegotiba bûn. Heta ku zarokan, ji dayika xwe vegotin kin jî ba, ne bihîstiba, wê ne raziha ban. Dema ku zarokan li çîroka xwe dihisand, wê serê xwe danîban ser balgihên xwe û wê lihêfa xwe bikişandan li ser xwe wê birazahan.

Li vir, tiştekî di vegotinên dayikên kurd de bale mirov dikişand. Wê hertimî çîrok û ankû vegotinên ku zarokê hêsê kiriba wê dûbare û dûbare ji zarokê re biheta vegotin. Her ku dayikan çîrokên xwe digotin jî wê gotinên xwe bikirpandan ku ew gotin biketan mejiyê zarok. Zarokan, bi wê kirpandinê di mejî de digirtin. Carna ew çîrok, weke ku jiber dikirin. Wusa jiber dikirin. Çîrokên ku zarokan hêsê dikir, bi dehan caran ji zarokê re dihatina vegotin. Her wusa, ew qaraktherê di çîrokê de weke lehengek ba û ankû weke sawalek mazin û xort ba û ankû weke mirovekî ne baş ba, wê zarokan di derbarê wê de wê zarokan dayikên xwe carna li barana pirsan bigirtan.

Zarokan ji wan çîrok û vegotina têgîna û baş û nebaşbûnê di mejiyê xwe de digirtin. Her wusa, qarakterên baş dibûna minaq û rengê başîyê. Bi wê têgîna baş û tişta baş dihat ser ziman. Qarakterên ne baş jî wê xirabî û ne başî pê biheta pênasa kirin.

Zarokê, hertimî di mejiyê xwe de xwe bi wê ji rewşan re amede dikir. Fahma zarokan bi wê pêş diket. Zarok, di mejiyê xwe de hertimî wê tişta ku ew dema ku hêsê bikin, wê mejiyê xwe bidina li ser wê. Bi vê yekê, xwendin jî wûsa ya. Lê zarok, dema ku ew di mejiyê xwe de ne amedekirî bê, û ankû dema ku ew xwediyê hinek pirsên ku wê ji dayika xwe bipirsê bê û ne pirsî bê, wê ev di mejiyê zarokê de wê, temenê ji hevdû belav kirina hey û bale zarokê. Wê ev rewş karib motiveya zarokê jî xira bike. Di vê demê de dema ku zarokê ev rewş jîya, piştre ku ew mazin jî bû, wê zarok di xewndinên dirêj de zû biwastihê û wê ji zû bi şûn ve gavê biavêjê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê dem bi dem gelek zarok, tevî ne bidil jî bin ji xwendinê re wê bixwênin. Hingî wê tenê dema xwe derbas bikin. Wê ne bo fahmkirinekê û ankû bidestxistina astekê û pîvanekê wê bixwênin. Ev rewşên ku piştre bii zarokê re rû didin, wê temenê wan de di mejiyê wan ê binî ê piçûk de wê ew rewşên wan yên  xwendinê ên ku ew ne serkevtî na, wê hebin.

Zarok, di vê demê de wê hertimî wê bixwezê ku ew wê tiştekî bike. Carna, dema ku dayikê li mitbaxê xwarinê çê dike wê zarok herê cem û wê bixwezê ku ew alî wê bike. Li vir, di aslê xwe de wê tene xwestina alikariyê wê tenê bi vê xwestin û kirina zarokê re wê hebe. Ji wê zêdetirî jî, ew li cem dayika xwe di ewlehiyê de hîs dike û dibînê. Li cem wê rehet a. Ew dayika xwe pirr baş nas dike. Her wusa, weke ku çawa ew dema ku ew hê nû ji dayika xwe re bûya, sê û ankû çar hefteyî ya û wê bi demê re hinek deng hin bi hin wê ji ber xwe zarokê bidina girîyandin, wê ev rewş bi şêwayna din wê xwe bi zarokê re bidina domandin. Zarok, hê di dema ku ew piçûk a û sê û ankû çar hefteyî ya, wê bidest nêzîkatîya xwe ya li deng bide dîyarkirin. Hinek dengên ku dayikê, di destpêka zarokê de ku wê ji wê re dihanîn ser ziman û bi wê zarok dihedinand, wê piştre zarok weke ku ew bikeve farqe hin tiştna di mejiyê xwe de wê ji wan dengan biveciniqê. Dema ku wan dengan dibihîzê, wê bigirî. Wusa dihê fahmkirin ku di temenê vê rewşê de hin rewşna ku zarokê, bi rakendî ji dêûbav weke mîreta hildana, wê di temenê vê rewşê de bin. Di vê demê de wê gelek rewşên ku zarok nû rastî wan tê û ankû wê birakendî ji dayikê û bav hildana, wê di temenê girî û qêrînên zarokê ên vê demê de bin. Zarok, wê piştre van rewşan di xewnên xwe de ku ew mazin bû wê bide domandin. Minaq, dema ku ew tê sêsaliya xwe, wê van rewşan bi xewnên xwe re bijî. Heta ku wê rewşên weke halûsînasyonan tevî ku ew şîyar a, wê bibînê. Lê ev dema zarokê a wek sêsaliya wê, wê bandûra wan xewendinên wê jî wê hebe. Her wusa, ew qarakterên ku

zarok ji nava xwendinên çîrok û vegotinên dê û bav dihilde, wê bandûrê li wê bikin. Wê di meji û xêva zarokê de bicih bibin. Zarok, piştre, dikarê di mejiyê xwe de ew, hin bi hin gelek afrînerîyan li ser wan qarakterîyan re di mejiyê xwe de bike. Her wusa, weke serdema berê ya mîtolojikî ku çawa ku vejînkirina kevir, firîna mirov, axiftina sawal û ajalan û hwd, wê di şêwayekî bi vî rengî de w meji û xêva zarokê wê karakteran biafirênê û ankû qarakterên ku wê ji xwendinan girtina, wê bi teybet bike û xosletên nû bide wan û wan ji nû ve weke ku wê biafirênê. Zarok, di vê demê de wê di mejiyê xwe de pirr zêde wê aktiv û afrîner bê. Çendî ku ew weke zarokekî piçûk a û mazinên wê, wê didina xwandin û fêrkirin û hwd, lê dibê ku mejiyê wê, di hundurê xwe de ne kêmî ya mazinekî di vê çerçoveyê de bixabitê û biafirênê.

Zarok, di aslê xwe de di vê demê de tevî ku ew weke ku ew dihê li berçav ku ew piçûk û ji nû ve fêr dibê, lê ew di mejiyê xwe de xwediyê şêwayekî vacî ya ku ew karîna kirina hertiştî bi xwe re dibînê. Zarok, piştî ku ew bû û pê de, wê li bêhn û dengê dayika xwe û piştre ya bavê xwe wê motive bibe. Piştre jî dema ku zarokê bidest pêşketina xwe kir û pê de, wê zarok, li leyistinê, fêrbûnê bi şêwayên weke nasînê, dengkirinê û bitevgerbûnê motive bûya. Piştre dema ku zarok mazin bû û hat yeksalî, dusalî û heta ku sêsaliya xwe, wê vê motiveya xwe li kirin û tiştên ku ew dixwezê wê pêşbixe. Di vê demê de ya giring bo dêûbav, dibê ew ku ew tiştên u zarok dixwezê û hês wan dike, kifş bike. Her zarok, wê bi rengê pêşketina xwe re wê mêla wê herê li ser tişt, rewş û kirinna. Zarok, piştî dembûhûrîya wê ya li yeksaliya wê re wê, êdî hin bi hin vê bidest dayîna nîşandinê bike. Li vir, bi vir ve girêdayî, ez divê ku vê yekê jî binxat bikim ku zarok, dema ku ev aliyên wê pêşketin û pê de, wê zarok, pirr zêde bixwezê ku ew ji aliyê mazinên xwe ve were hildan li cidiyetê. Her wusa, nêzîkatîya zarok, nerîn û gotinên zarokê, divê ku ew bi cidiyetekê mazin werina hildan li dest. Weke ku çawa ku mirovên mazin, gotin û şîroveyên xwe weke perspektif dihildina li dest û li gorî wê şîroveyê pêş dixin, biheman rengî divê ku ya zarokê jî weke ya mazinekî werê hildina li dest. Her wusa divê ku zarok, perspektifa wê, ne kêmî ya zarokê were hildan li dest. Divê ku newê gotin ku ew zarok a, û hewce nakê ku mirov biwê cidiyeta mazin wê hilde li dest. Dema ku ev hat hizirîn û gotin, wê ev zirerek mazin di serî de wê bide pêşketina zarokê.

Her wusa, dema ku perspektifa zarokê hat hildan li dest, wê zarok wê hîs bike. Weke ku çawa ku du mirovên mazin şîrove û perspektifê didina

hevdû, bi heman rengî divê ku were dayin li ya zarokê jî. Û piştre jî di kirinê de jî bi heman cidiyetê nêzîkatî li xwestina zarokê were kirin û werê hanîn li cih. Dema ku dêûbav planak çêkir ku ew zarok bi hevdû re herina deverekê û dema ku plana wan gûharî û ew neçûn, piştre divê ku wê ji zarokê re bizimanekî cidî werênina ser ziman. Divê ku ew zanibin ku wê zarok, sedem û hêncetên wan fahm bike, çendî ku ew zarok û piçûk jî bê. Zarok, divê ku ew dema ku li nava çavên dêûbavê xwe meyizend, divê ku fahm bike ku ew ji wê nerîna wan ya ji çavên wan ku ew zarokê bi awayekî cidî dihildina li cidiyetê.

Dema ku dêûbav û ankû endamekî din ê malbatê bê, dema ku wê û ankû wî li ser kirinekê re sedem û hêncet ji zarokê re hanî ser ziman, divê ku vegotinek cidî bide zarokê. Dema ku ew wê nedina zarokê, wê hem zarokê ji xwe dûr bikin û hem jî wê xwe di çavê zarokê de xira bikin û ankû weke derewvan jî bidina dîyarkirin. Di rewşek bi vî rengî de wê dê û bav, temenê têkiliyek rast û pak a bi zaroke xwe re jî wê ji dest bidin û winda bikin.

Zarok, di vê dema xwe de wê hertimî bixwezê ku bi mazinên xwe re bê. Dema ku mazinên wê, karek û xabetek kirin, wê zarok bixwezê li cem wan bê û ankû bi wan re karbike û alikariyê bide wan. Dêûbav, vê rewşê dikarin pirr zêde baş bikarbênin. Her wusa, zarokê bixwe re bidina xabitandin. Ev, wê bizarokê re hêsta malbatîtîyê, hevbeşbûnê, aîdîyetê û hwd bi wê re pêşbixe. Wê bi wê re fahm bike ku ew ji aliyê dêûbavê wê ve dihê hildan li cidiyetê. Her wusa, ev rewş xabitîna zarokê bi dêûbav re, wê bixwe bawerbûna zarokê jî wê bi wê re pêşbixe. Wê zarok, bi xwe bawer bê. Wê bawerîya wê bi wê pêşbixe. Dema ku zarok, bi dêûbav re bû hevkarê kirina karekî û ew kar serkevt, wê zarok hingî wê ew jî wê hêsta serkevtinê wê bi xwe re wê bijî. Her wusa piştî serkevtina wê karê û ankû bi dawîbûna wê re dema ku bi zarokê re hat axiftin, biawayekî bicidî bahse serkevtina zarokê û alikariya wê bê kirin. Zarok, dema ku wê his bike û dengê wê herîyê de wê xwe baş hîs bike. Wê serkevtî hîs bike. Bila dêûbav, wê derfetê bidina zarokê ku ew xwe serkevtî hîs bike. Bi wê re kar û xabetên ku wê zarok karibê, bi awayekî bi ewla di wan de serkeve, werina kifşkirin û werina danîn li pêşîya zarokê. Piştre ku zarok bi wê bi tenêserê xwe biserket, wê ew bandûrê li vîn û xwesteka kirinê a zarokê û derûnîya wê bike. Zarok, wê xwediyê derûnîyek serkevtî û bixwe bi bawer bê. Di vê rewşê de jî bi awayekî zelal û vekirî û safî ji zarokê re pêşengî divê ku dêûbav bikin, bo ku zarok serkeve.

.

**Pêvajoya pêşketina zarokê a li dora 4 û 5 salan û rengê pêşveçûna wê.**

Zarok, wê di vê dema xwe ya di nava 4 û 5 salan de wê demek xwe ya teybet bijî. Ku zarok, pêvajoya xwe du nava salên 2 û 3´an bi serkevtî û baş derbas bike û bigihijê vê pêvajoyê wê pirr zêde pêşveçûnên mazin ên giring di vê dema xwe ya jîyanê de wê bijî. Ku mirov ji kûve lê binerê, divê ku mirov bibêjê ku ev dema temenê zarokê a nava 4 û 5´an, wê weke demek giring a temenê jîyane wê bê. Zarok, di vê demê de wê ji gavavêtina jîyanê re wê weke ku wê ew amede bê. Wê di vê demê de wê pirr zêde bi teybet bê. Her wusa, wê di vê demê de zarok, zêdeyî demên xwe bi kirina tiştan re wê derbas bike. Xwendinê, li musikê hisandinê û di nava tevgerê de bûyîna zarokê, wê weke teybetîyên wê yên vê dema wê ya jîyanê bin.

Di vê demê de wê zarok, ji xwendinê re pirr baş wê amedê bê. Di vê demê de serkevtinên zarokê ên xwendinê, wê li ser temenê wê yê di nava salên 2û 3´an bê. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de di aslê xwe de giringîya vê dema zarokê a di nava salên 4´û 5´an, wê bi rengê pêşketina demên salên jîyane zarokê ên 2û 3´an ve girêdayî xwe bide dîyarkirin. Mirov dikarê, bi pêşketina vê dema jîyane zarokê re demên wê yên di nava salên 2´ û 3´an jî bipîvê. Her wusa, di vê demê de çendî ji xwe re derfet standiya ji pêşketina xwe re wê zarok, vê bi pêşketina vê dema di nava salên 4´ û 5´an de bide dîyarkirin.

Mejiyê zarokê ê ku ew di nava salên 2û 3´yan de fêrî kifşkirinê bûya, wê di vê demê de wê asta xwe ya kifşkirinê wê pêşbixe. Di vê demê de wê zêdetirî zarok bixwezê ku ew bijî. Wê bixwezê ku ew li musikê bihisênê. Wê bixwezê ku ew herê derve û bigerihê. Wê bixwezê ku ew bi zarokên di temenê de na, ew bi wan re were cem hevdû. Wê bixwezê ku ew bileyizê û hwd. Her wusa, wê di vê demê de wê gelek şêwayên pêşketinê wê derkevina pêşîya zarokê. Lê herkirina ku wê zarok di vê demê de wê êdî wê bike, wê zarokê li wê bihoyê. Hela ku, zarok, di wê de serkevtinekê bidest bixe, wê lê were girêdan. BO vê yekê, dema ku ew heta girêdan jî, wê tenê bixwezê ku ew wê bijî. Di vê demê de dêûbav, gelek caran hanîya ser ziman ku ew dixwezin ku zaroka wan bixwênê. Lê zarok hemû dema xwe bi leyistinê û hwd re derbas dike. Ev rewş, wê bi serê xwe ji aliyê hoyandina mejiyê zarokê ve wê gelek tiştan û rastîyan bi me bide ravakirin.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê dema xwe bixwezê ku wê ew bijî. Di vê demê de wê xwendin, weke

beşek ji wê jîyane wê bê. Zarok, heta ku tê vê dema temenê xwe, wê hinekî pêşketinê bi xwe re bide çêkirin. Wê ji aliyê hîsên weke dîtinê, tahmkirinê, fahmkirinê, gûhdarkirinê û hwd ve wê pêşketinê bixwe re bijî. Wê karibê bixwênê. Her wusa, ew salên ku di roja me de zarok ji temenê xwe yê yeksalî ku ew êdî li qirêşê derbas dikin, wê temenê pêşketina wan ya dibistanî bê. Her wusa, ji aliyê pedegojîkî ve wê ev dem, pêşketinaka mazin bi zarokê ve bide çêkirin. Zarok, wê zarokên hemtemenê xwe bibînê û bi wan re bê. Wê fêrî nasîna dengên tîpan bibê. Wê di dewama wê de fêrî xwendinê jî bê. Wê karibê, gotinan bi lêv bike. Wê li çîrok û vegotina gûhdar bike. Wê ji wan gotinan di mejiyê xwe de bigirê. Wê ji çîrokan karibê qarakterê wê derxe û bi teybetîyên wê ve girêdayî xwe bibînê û xwe bişibihênê wê. Minaq, vegotineka ku mirov di wê de bahse ´prensesekê´ dike, wê keçzarok, xwe bişibihênina wê. Her wusa bi wê re weke wê, wê kur zaro jî wê xwe bişibihênina wê ´piresî´ ku ew ji wan çîrokan dibihîzin. Di vê rewşê de mejiyê zarokê bi girtina qarakter re wê, gavek giring bi xwe re bide derbas kirin. Zarok, wê di vê dema xwe  ya nava saln 4´ û 5´an, wê bi tevlîbûna xabetên civaknasî û hwd, wê baş bijî. Laşê wê, weke makenizmayekê ji berê pêşketîtira. Her wusa, zarok, bi hêza laşê xwe bi xwe bawer a. Dikarê gelek tiştan bike. Dikê jî. Bi vê yekê xwe serkevtî jî wê hîs bike. Ev hîsa zarokê ya serkevtinê, wê zarokê, bike wê şewkê de ku ew gelek tiştên din bi serê xwe bike. Zarokên nava van salên 4´ û 5an, wê her wusa, wê êdî ji aliyê zayendî ve jî wê hebûna xwe farq bikin. Her wusa, keç wê xwe weke keç kifş bike û wê li teybetîyên wê bigirê û wan di xwe de kifş bike. Biheman rengî zarokên kur jî wê, wê bi wê rengê xwe kifş bikin. Wê laş xwe hin bi hin nas bikin. Nasîna pêşî a zayendî, wê li dêûbavê xwe binerin û wê kifş bikin. Wê piştre li laşê xwe binerin wê kifş bikin ku ew dişibihina bavê xwe bi zayendî û ankû dayika xwe. Piştî ku zarokan ev kifşkirin kir, wê piştre wê temenê wê dagirê. Wê li ser wê re bihizirê. Wê li gorî wê kifşkirina xwe, wê êdî bidest hizirkirinê bike. Ti tiştê bi vî rengî ê ku zarokê bi xwe re kifş kir, wê wê rastîya bi zayendî a ku zarokê kifşkirîya wê di mejiyê wê de bide zelal bke û  bide rûninandin.

Zarok, wê di vê dema xwe de wê pirr aktiv bê. Wê hertimî bi hêt û deveran ve wê hilkişê. Wê xwe zêdetirî, bihêz hîs bike. Di vê dema xwe de zarok, piştî ku gihişt sale xwe ya li dora 5´an, wê xwe ji aliyê hêstîyarî ve zêde di girêdana zarokatiyê de hîsnekê. Wê karibê bi tenê derkeve derve û bi hevalên xwe re bigerihê. Wê xwe bihêz hîs bike. Wê di vê demê de wê zêdetirî bawerîya zarokê bi wê hebe. Wê hevalan ji xwe re

çê bike. Di vê demê de wê ya baş û ya nebaş wê ji hevdû cuda bike. Wê, zanibê ku ew çi ya baş a û çi ya ne baş a. Di vê demê de çendî ku zarok, wê ya baş û ne baş ji hevdû derxe jî, wê di mejiyê xwe de li ser ya baş jî û ya ne baş jî, wê xwediyê pirsan bê. Wê gelek pirsên ku ew nikaribê di wê demê de wê fahm bike, wê di serê wê de biafirin.

Di vê demê de wê zarok, zêdetirî, fahma xwe pêşbixe, wê karibê bi serê xwe tiştan bike, dinanên xwe bixwe firça bike û dest û rûyê xwe bixwe bişûyê. Kirinên bi vê rengê wê zarok karibê wan bike. Di vê demê de jî wê zarok girêdayî bi hêskirina dêûbavê ve bê. Wê mitacê alikariya wan bê. Lê wê ji aliyê fîzîkî ve hinekî din bixwe bawer û serbest bê. Heta ku, wê ji aliyê fîzîkî ve wê hinekî xwe dûr jî bigirê ji dêûbavê xwe. Zarok, di vê demê de ji alikarîya qirêşê xilasbûya û wê xilaskirina wê, bixwe bawerîyek bi zarokê re daya çêkirin.

Di vê demê de wê zarok ji aliyê fîzîkî ve jî di salên 4´ û 5´an de wê hinekî din pêşbikeve. Hinekî din dirêjbûya. Laşê xwe nas dike. Dizanê ku ew keç û yan kur a. Wateya keçitiyê û kuritiyê di serê zarokê re afirîya. Di vê demê de zarok, dikarê bazbide, hilkişê û di pêpelokan de bilind bibê û herê. Dikarê cilên xwe li xwe bike. Pêlav û ankû şekale xwe bike lingê xwe û benên pêlave xwe girê bide. Tiştên dunyeyî ku ew hena, weke arabayan, rojê, şev û rojê, heyvê, mirov, sawal, mal, çiya, av, amûrên weke rojnema, tv û hwd ku mirov di jîyane xwe bikardihênê, wan nas dike û bi nav dike. Di vê demê de peşketina mejiyê zarokê, wê wê asta ku mirov di jîyane xwe êdî bikardihênê wê nêzî sedî notî, wê karibê aktiv bike û bikarbênê. Pêvajoyên pêşketina zarokê ên heta vê demê, wê pêşketina mejî pêşbixin û bidina rûnandin. Pêvajoyên piştî ya sale 6´an û hwd jî, wê çendî ku pêşketinê bidina çêkirin jî, wê weke pêvajoyên pêşketinê û pêşveçûnê ên li ser wê pêşketina mejî a ku ew heta van salên bûya re wê bibê. Her wusa, pêvajoyên pêşketina zarokê, heta vê dema wê, wê ûzwên zarokê ên hundûrînî ên weke kezebê, gurçikê, dil, mîdeyê, ra, muskulatûrên û hwd, wê di wan de jî zêdetir pêşketin wê bibê. Her wusa, wê bi wê re wê laşê zarokê li hemberî nexweşîyan jî wê xorttir bibê di vê demê de.

Di vê demê de divê ku mirov ji bîrnekê ku ew hem zarokek û hem jî zarokekî ku ber bi ciwanîyê ve diçê ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê di vê demê de zarok xwediyê derûnîyek xorttir bê.Wê ji aliyê hiş ve di vê demê de zêdetir bifahm bê.Wê rewşan, di vê demê de zêdetir biaqil li wan bihizirê û binerê. Fahmkirina rewşan, wê bi wê re pêşbikeve.

Di vê demê de weke zarok bi hevalên xwe re dileyizê û dikarê zêdetirî xwe di leyistika xwe de bi vîna xwe ew xwe li ser lingan bigirê. Her wusa, wê vîna xwe bide dîyarkirin. Di vê demê de zarok, bi awayekî vekirî, bivîn a û wê vîna xwe bide dîyarkirin. Dema ku ew bi hevalên xwe re leyistik dileyizê, wê di leyistikê de heta dawî bimênê. Dema ku ew xabetekê dike û heta sêrî bibê. Û ankû dema ku dê û bavê wê ji zarokê re gotin herê deverekê wê herê devere ku jê hatîya xwestin. Zarok, di vê demê de wê têjê û ankû tahmê wê ji kirinên xwe bigirê. Dema ku ew leyistik leyist, wê li xoşa zarokê wê herê. Dema ku ew xabetek kir û serkevt, wê li xoşa wê herê û wê xwe serkevti hîs bike. Di vê demê de zarok, dema ku ew hatibê fêrkirin û motive kirin, wê xwendina pirtûkan bike. Wê pirtûkan bixwênê. Wê ji wan pirtûkan, di fahmkirina xwe de wê hem bi gotinî û hem jî qarakterên wê, wê fahm bike. Di vê çerçoveyê de zarok, êdî di pêvajoyeka ku ew bixwe, serbixwe û bi bawer de ya.

Sale 4´an ya zarok, wê weke pêvajoyek giring a jîyane zarokê bê. Zarok, wê di vê demê de wê bileyizê, fahm dike, wê wêneyê mirov û ankû sawalan xîz bike, wê cudahîya di nava mirovan de wê fahm bike û di pêvajoyan de dikarê kosentreya xwe dirêj pêşbixe, têgîna demê bi wê re pêşketîya, bibîr kirina vegotin û çîrokên ku li wan hisandiya wê bike û wê karibê hijmaran ji yekê destpê bike û bihijmêrê heta dehan û ser dehan re jî. Bi wê re jî wê dengên tîpan hin bi hin wê ji hevdû cuda bike. Wê bidest karhanîna wan dengan bike. Dengên ji hevdû cuda çawa dihên bikarhanîn, wê hin bi hin wê fêr bibê. Di vê demê de zarok, bernemeya zarokê a xewê weke ya mazin a. Her wusa, wê hinekî din zûtirin bikeve nava nivînan û wê heta sibehê ji xewê nerabê. Herî hindik, wê ne bin 10 seatan re wê razihê.

Zarok, di vê demê de wê zêdetirî mazinên xwe bişopênê. Bi teybetî piştî ku gihişt sale xwe ya 5´an, wê zêde mazinên xwe bişopênê. Wê di vê demê de bi wan re herê deveran. Wê herê ´bûttikan´ tiştên xwarinê bi wan re bikirê. Lê di vê demê de jî zarok, wê êdî wê fêrî bidest bikarhanîna pereyan bike. Wê bidest xwestina pereyan ji mazinên xwe bike, bo ku tiştên xwarinên ên weke şekir û hwd bikirê û bixwê.

Zarok, di vê demê de wê bi vê rengê, hinekî din wê bi ser xwe ve herê. Wê hinekî din, zêdetirî pêşbikeve. Zarok, di vê demê de mejiyê wê, dema ku dibînê di cih de dikarê di xwe de qayd bike. Xwestina dîtina deverên nû û çûyîna cihên ku zarokên di temenê wê de li wan digihijina hevdû û hwd, wê bizarokê re çê bibê. Di vê demê de wê bidest çêkirina hevalan

bike. Her wusa, piştî wê re wê bixwezê ku hevdîtinê bi wan re bike. Wê bixwezê herê û bi zarokên din re bileyizê.

Zarok, dema ku gihişt sale xwe ya pêncan, wê bizarokê re hêza kifşkirina hêstan wê zêdetirî derkeve li pêş. Her wusa dema ku zarokê, mirovekî xamgin dît, wê fahm bike ku ew xamgîn a. Her wusa wê bi wê re jî, zarok, wê fêrî pêşxistina ´empetîyê´ wê bike. Ev jî, wê nîşanaka pêşketinek mazin ya bi zarokê re bê. Zarok, dema ku ew karibê empetîyê´ pêşbixe, wê çaxê wê zarok, karibê fahm bike ku mirovên hemberê wê çendî di êşê de na. Her wusa, wê zarok di vê temenê de karibê fahmkirina keseyetîyên dervî xwe fahm bike. Di aslê xwe de kirina empetîyê, wê hinekî jî werê vê wateyê ku ew karibê xwe bike dewsa mirovên din de û fahm bike ku ew di hundurê xwe de çendî xamgîn û ankû ew êşê dikişênin fahm bikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok, wê bidest pêşxistina wê bike. Zarok, di vê demê de dema ku ew yekî xamgîn dibînê û li ser wê re ku ew pirsan dibê, wê pirr baş û giring bibê ku ew bi cidiyetekê û pirr baş bersivê ji pirsên ku ew dikê re hilde ji mazinên xwe. Di vê demê de maiznên zarokê wê hildina cidiyetê û weke mazinekî bersivê bidinê de. Wê ev zarokê, hertimî zû bide pêşketin. Ber ku zarok, di vê demê de ew li wê rewşan xamgîn û ankû ya hêstîyarî, xwe hoyandîya û lê motive bûya. Di vê çerçoveyê de pirsên ku zarok dike, wê çerçoveya wê rewşê bigiştî, wê di mejiyê zarokê de bide afirandin. Di vê demê de dema ku zarok, bersivan ji pirsên xwe digirê, wê bi wê re ne tenê wê hêza empetîyê a zarokê bi wê rewşa hêstî re wê pêşbikeve. Bi wê re jî wê bi gotinên ku re ew dibihîzê û dengên wan tê gûhê zarokê, wê bi wateya wan ya wê demê ku ew bi wê dihên ser ziman re jî wê bigirê. Ev jî, wê hêza çareserîya pirsgirêkan bi zarokê bide qizinckirin li ser zimên re.Di vê çerçoveyê de zarok,wê fêrî çareserkirinan bi aqilê xwe bibê. Zarokê, dema ku pirsgirêkekê di nava du mirovan û ankû di zarokên di temenê xwe de dît, wê zanibê ku pirsgirêkan çîya û heta ku wê têbigihê ku çareserîya wê pirsgirkê jî çî ya. Di vê demê de wê zarok, wê êdî wê fêrî bikarhanîna hişê xwe bibê. Hişê zarokê, wê bi aqil û zanîna zarokê a li ser rewşan re wê derkeve li pêş. Di vê demê de wê zarok, hin bi hin hêza çareserîyê bi xwe re biafirênê. Bi wê re jî, zarok, ew dema ku ew çû deverna, di dîtina navnîşanan û ankû kifşkirina cih di cih de piştî ku ew çû wir, wê bi wê re pêşbikeve. Xêva zarokê, êdî pêşketîya û dide dîyarkirin. Zarok, di vê çerçoveyê de wê, zêdetirî jî karibê xêva xwe bidest karînê bike. Bîrkirina cihan, navan û her wusa kesan û navê kesan, wê bizarokê re pêşbikeve. Zarok, xizmên

xwe ku ew bi dêûbavê xwe re herê male wan çend caran, wê êdî wê di mejiyê xwe de jiberkê di mejiyê xwe de. Li vir, ew hêsta hevnasînê a xizmtiyê ku zarok di mejiyê xwe de bi wê re haşîrûneşîr bûya, wê li ser wê re zûtirî naskirinê bike bi xwe re. Her wusa, mêhvandarîyên bi vî rengî di dema çûyînê û vegerînê de wê şîyarîyekê di mejiyê zarokê de jî bidina çêkirin.Bo vê yekê zarok, dikarê hertimî were derxistin ji malê û bê birin li mêhvandarîyên malbatî ên bizarok û xizm û hwd. ..

Zarok, di vê demê de zêdetirî gihiştîya hişmendiyekê. Her wusa zarok, tişta dibînê, nas dike, nav wan dizanê û ew tişt kêrî çi tên, wê êdî wê jî zanibê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok hinekî din li pêştir bê.

Zarok, di vê dema xwe ya zarokatiyê de wê bi mazinên xwe re bixwezê ku ew baş dema xwe derbas bike. Her wusa, wê hertimî bixwezê navbera wan xweş bê û pirsgirêk ne di nava wan û mazinan de hebe û ne jî wê bixwezê ku pirsgirêkên nava mazin bibînê. Wê hertimî bixwezê ku rewşek aram bibînê di dîtina xwe de. Wê di vê demê de tiştên xweşik di mejiyê xwe de bihzirê. Zarok, di vê demê de ew hîs û hêsta wan ya ku heya, pirr hesanî mirov dikarê têkiliyê bi wê re dênê. Lê bi heman rengî dema ku pirsgirêk çêbûn jî, wê ew hêst pirr hesan vegerîyê dijberîyê û dûrketinê bi xwe re bide çêkirin.

Aramiya di malê de wê hertimî bandûra wê li ser zarokê wê zêde hebe. Lê di vê demê de wê, bi teybetî zêdetir giringîya wê hebe. Ev dema zarokê, weke demeka ku ew di wê de bidest hevnasîna bi dûnyê re dike. Dunya derve ku ew kifş dike, wê ji wê re xarib were  û car bi car xwe di wê de di ewlehiyê de hîs nekê. Di wê dunyê de zarok, devera ku ew xwe di wê de di ewlehiyê de dibînê malbat a. Her wusa malbat û aramiya malbatê, wê temenê zarokê ê jîyankirina wê ya di vê demê de bê.

Aramiya malê a vê demê, wê aramiya zarokê a ku ew li ser temenê xwe bijî jî bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê zarok, wê xwe bi wê re bijî. Lê dema ku ew di malê de jî wê aramiyê winda bike, wê zarok êdî wê xwe zêde li ti deverê di aramiyê de nebînê. Ev rewş, wê di serî de derûnîya zarokê xira bike. Zarok, derûnîya wê, di salên weke ên pêncan de wê, zêdetirî ji xirabûnê re vekirî bê. Ber ku zarok, wê êdî ji dunya derve xwe vekirîya û wê kifş dike. Devereka ku ew pişta xwe bidiyê de û ew xwe di wê de ew di ewlehiyê de bibînê wê tenê malbat û navenda malbatê bê. Her dema ku ew li derve tirsiha û ankû ket gûmanan û xwe bêhêz hîs kir, wê bibazê malê û wê xwe xort bike û cardin wê derkeve derve û wê ji devera ku ew mayî wê bidest kifşkirina xwe ya derve bikê.

Zarok, pêwîstî bi wê ji xwe re dibînê ku ew dema ku ew berê xwe dide dunya derve ew li pişt xwe xwediyê parastgehek weke ya malê û malbatîyê bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de mejiyê zarokê, li malê dihizirê. Çendî ku wê zarok, di vê demê de bidest derketina li derve bike û bigerihê jî, lê wê di vê çerçoveyê de bi mal û malbatê ve girêdayî bê. Mal û malbat, wê xal û nûqteya zarokê a ji xwe ewlebûnê bê.

Di vê demê de wê weke ku çawa ku zarok, di jîyane dayika xwe û bavê xwe de ya û ya mirovn li dora xwe de ya, wê hin bi hin cih bide wan di mejiyê xwe de ku ew bikevina jîyane wê de. Bi hevaltiyê, xizmtiyê, her wusa rewşên têkilîdanînê û hwd, wê bi wê re bikarbênê. Zarok, wê di vê demê de bidest, ne wekhevî hizirina bi zarokên di temenê xwe de jî bike. Her wusa, pevçûnên piçûk ên zarokî ku wê zarok di vê demê de wê bijî, her wusa di vê çerçoveyê de wê derkevina li holê. Zarok, di temenê wan pevçûnên wê ên bi zarokên din de wê, ne hizirîna weke wan hebe. Di vê çerçoveyê de wê, zarok, bixwezê ku ya ku ew rast dibînê li gorî xwe wê werênê li cih. Dema ku mudahele li wê dît, wê her wusa bertekê li dijî wê mudahaleyê bide nîşandin. Di vê demê de zarok, wê di leyistik û hwd de wê, weke navendekê bê. Wê wusa xwe hîs bike. Zarok, di vê çerçoveyê de wê, tişta ku fêrkiriya wê li ser wê re bixwe êminbûnê û ewlebûnê pêşbixe. Her wusa, dema ku ew kirinên di leyistika bi zarokê re bê û ankûaxiftina bi wê re û an jî kû ew dizaynkirinên bi leyistikan di dema ku ew bi hevdû re dilyizin de ku ew zarok ne di heman nerînê de bê, wê berteka xwe ya navendî a ji keseyetîya xwe wê bide nîşandin. Bertekên vê demê ên zarokê, wê weke bertekna demkort bin. Di demên kin de wê zarok, wê bijî û piştre wê, weke ku wê ji bîr bike. Zarok, vê rewşê li ser wê rastbûna xwe re wê dijî. Li şûna ku wê bertekê, bihizirê, wê li rastîya xwe bihizirê. Di vê rewşa berteka zarokê de kin domayîna berteka zarokê, sedema wê ew a ku ew li wê rastîya xwe ya ku ew rast dibînê li wê motive bûya û li wê dihizirê. Wê zarok, ti bertekê dernexe li pêşîya wê. Ber vê yekê ya ku wê zarok, piştre bi demekê, weke ku tiştek nebûyî wê tevbigerihê û wê tevbigerihê û wê bi zarokên li dora xwe re wê bileyizê. Lê dema ku cardin zarokê, bidest leyistinê kir, wî dîsa li gorî wê rastîya xwe ya wê bijî û wê ava dike. Dîsa ku mudahale li wê bû, wê dîsa heman bertekê bide nîşandin. Lê wê dîsa ew bertek, weke ya berê wê, wê demkort bê. Zarok, di vê demê de wê bi zimanê xwe re jî wê pêşbikeve. Zarok, wê karibê, dema ku dêûbav gotinek xelat û ankû ne li gorî ew dengê wê bikarhanîn, wê kifş bike. Lê zarok, wê ya kifş nekê. ..

Zarok, salên xwe yên li dora 4´ û 5´an, dibê ku ew pirsgirêkan bi tîpên bideng û bêdeng re bijî. Zarok, dema ku ew deng bi gotina re ji mirovên dervî ku bihîst dikarê wê kifş bike ku ew li gorî wê dengê wê yê ku w fêrbûya û ankû na. Di van salan de zarokên ku ew hin bi hin li qirêşê bê û ankû li malê bê, ku ew bi şêwayekê tên fêrkirin û perwerdekirin, wê vê rewşê bi xwe re bijî. Zarok, ya dervî xwe kifş dike.

Di aslê xwe de ev hewdana kifşkirina zarokê kêmesîyên dengî ên ku mirovên dervî wê derxistina wê kifşkiirîya, wê rewşa bi xwe bawerbûna zarokê re werênê ser ziman. Bo vê yekê, pirr giringa ku mirov, dema ku nêzî zarokê bû, di vê têgihiştinê bê. Zarok, lê dema ku ew çendî ku wê kêmesîyek di dengê mirovên li dora xwe de dît û hanî ser ziman, ku çendî ku ev wê bi zarokê re bixwe bawerbûnê bide pêşxistin, bi heman rengî, dema ku zarokê dengek derxist û ku ev deng ne rast bê û dengê zarokê piştî ku wê hanî ser ziman ku ew were rastkirin, wê bi wê re şikeştin û bi şûn ve gavavêtinê bide çêkirin.

Zarok, di vê demê de wê li ser gotinên ziman re wê weke ku ew wê ´zimanekê xwe yê zarokatiyê´ w biafirênê. Bi şêwayê ku ew bikardihênê û bideng dikê, mirov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman. Li vir, pirr giring a ku mirov dengkirina zarokê a gotinên zimên baş fahm bike. Li vir, kêmnêzîbûn û ankû xelat nêzîkbûn, wê karibê bi zarokê re pirsgirêkên mazin ên zêhnî û pêşketinê bide çêkirin. Bo vê yekê, zarok, di vê demê de bigotinên hesanî ku bi dengê ew ku dikarê wan derxe re pêşî bike ku ew gotinan bibêjê. De ne, zarok, dengê tîpna bi hesanî dibêjê û derdixe û dengê hinekan jî wê di wan de û di derxistina wan bikeve zorê de. Ev jî, zarok, dema ku ew diaxifê mirov kifş dike. Dema ku zarok diafirê, zêdetirî mêyla xwe dide ser kîjan cûre gotinan û çawa dihênê ser ziman û bi teybetî bi pirranî zarok bi kîjan dengan wan dihênê ser ziman, wê vê rewşê biawayekî vekirî bide dîyarkirin.

Zarok, vê rewşa dengî, li gorî ku ew mejiyê wê dike, mirov kifş dike ku zarok, pêşî dengê ku ew dikar wan bihesanî derxe giraniyê dide ser wan. Wan derdixe. Wan bi gotin dike. Gotinên ku ew dibjê, yan bi wan tîpên ku ew dikarê destpê dike û yan jî biwan tîpan hatina hûnandin. Zarok, wê li ser wan tîpan re wê di mejiyê xwe de pirr zêde wê gotinan biafirênê. Divê ku mirov nebêjê ku wê mejiyê zarokê wê çawa karibê, kifş bike ku kîjan gotin bi wan tîpan a. mejiyê zarokê li wan dengan motîve dibê û ew jî bi wê re êdî wê bi wan dengan re wê bidest kifşkirinê bike. Her wusa, zarok, dema ku ew axiftina dêûbavê xwe û ankû hinek mirovên mazin ên li dora xwe ku ew li wan dihisênê û ku di nava axiftina

wan de hinek gotinên bi wan dengên hesanî ku ew dikarê wan bibêjê ku hatina ser ziman, ew mejiyê zarokê ku ew li wan dengan motive bûya, wê di cih de bi wan deng û wan gotinan re wê şîyar bibê û wê wan bigirê ji nava wê gotinê. Bi vê rengê zarok, wê hema bêja her roj wê gotinan bigirê. Zarok li dora 4´ û 5 salan, li gorî taxmîna ku mirov dikarê bibêjê, wê ne bin hivdeh-hezar gotinan re wê di mejiyê xwe de ku zarokê ew girtina wê karibê wan hin bi hin bidest xabitandinê bike.

Zarok, li vir, dema ku ew ji aliyê dêûbav û ankû mirovên mazinên wê ve were zorkirin ku ew dengên ku ew li wê zor jî tê bikarbênê, wê bi wê re di wê demê de pirsgirêkên weke deng aliqînê, nekarîna derxistina gotinê ji dev, sekinîn, jibîrkirin û hwd, wê weke van gelek pirsgirêkên ziman ên pedegojikî wê bijî. Her wusa zarok, dema ku wê bidest jîyankirina van pirsgirêkan kir û mejî ew pirsgirêk bi jîyankirina wan ya bi zarokê re ku wê di xwe de qaydkir û pê de, wê êdî zarok, wê dayimî wê bidest jîyankirina van pirsgirêkan bijî. Li vir, bo vê yekê, giring a ku mirov li vir, dengan kifş bike ku zarok çawa wan bikardihênê û bi çi şêwayê wan baş bikardihênê. Zarok, mejiyê wê bi awayekî xwezayî xwe bi bernema dike ku ew ji ya hesanî bi ber ya zor ve herê. Her wusa bi demê re weke ku ew ji xwe re dike armanc ku ew hin bi hin kaeribê hemû dengan derxe. Bo vê yekê, weke ku mejiyê zarokê ji wê re dike, divê ku mirov jî li gorî wê bernemaya mejiyê zarokê tevbigerihê û bi wê re di ahenge de bê. Wê bi demê re ti deng nemênin ku wê zarok nikaribê wan derxe. Lê divê ku mirov li vir, li gorî wê rewş û bernemaya mejiyê zarokê bi wê de herê. Wê zarok, mejiyê wê, pêşî yên hesanî wê bibêjê. Piştre hin bi hin bi gotinên ku ew li ser tîpên hesanî re dibêjê, wê lib bi lib wê tîpên zor di wan de bicihkirî wê werina bi karhanîn. Mejiyê zarokê, wê bi demê re wê jî di xwe de kifş bike. Lê çendî ku mejiyê zarokê serdestî li wan dengên hesan kir bi gotinan re wê êdî bi hesanî wê bidest hanîna ser ziman a dengên din ên ku wê didestpêkê de nedikarî bikarbênê. Li vir divê ku mirov vê yekê jî ji bîr nekê ku wê laşê zarokê, minaq weke qirikê û hwd, çendî ku ew deng bikarhanîn, wê li gorî wan qays bigirê. Her çendî ku qirikê bidest qays girtinê kir, wê êdî wê derxistina dengan ji xwe re hesantir bike.

Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku mirov, bo ku bidestê xwe zarokê neavêjê nava pirsgirêkên pedegojikî ên zimanî, di vê çerçoveyê de û bi teybetî di van salên zarokê de divê ku mirov bi awayekî heyîder û baldar li zarokê û pêşketina wê biponijê û hişê xwe bide li ser wê. Her wusa, zarok, wê li bendî fêrbûna hemû

dengan nebê. Wê dem bi dem wê gotinan di xwe de fêr bibê. Wê gotinan bikarbênê. Di vê demê de ya giring ew a ku mirov dema ku zarokê dengek bi gotinî derxist ku ew deng li gorî wê gotina ku em dizanin xelat jî bê, li şûna ku mirov zarokê rast bike, mirov xwe bixwe wê li ber zarokê û bi zimanekî zelal rast bikarbênê. Ya ku wê bê alikariyek mazin ji zarokê jî wê ev bê.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku weke pirsgirêkek zimanî ku di her demê de di nava kurdan de jî min bixwe jî kifşkirîya û bûna şahidê wê jî, zarokan zimanê xwe afirandina. Her wusa, teybetîyek zarokan heya ku zarok, dengan di mejiyê xwe de bi zêhnê xwe re digirê. Wan di mejiyê xwe de li ser rewşên ku ew dibînê, deng dike û dibihîzê re salix dike. Her wusa, Gelek zarokên ku ew heta ku dihên vê temenê xwe, wê bi zêhnê xwe re wê pêşketinek pirr zêde mazin wê bidina çêkirin. Zarok, wilqasî zêde bi zêhnê xwe re pêşketinek mazin çê dike, wê zarok, bixwe wê dengan bigirê, dengên tîpan wê li gorî xwe salix bike û wê wan bixwe werênê ser ziman. Zarok, wê wan dengan weke ku wê di mejiyê xwe de salix kiriya wê werênê ser ziman. Gelek dêûbav, ev rewşa salixkirina dengan a destpêkê a zarokê, di destpêkê de weke ´pirsgirêkek zimanî a rast axiftinê´ hanîna ser ziman. Lê bi demê re derketîya li holê, ku zarok di mejiyê xwe de ne xwediyê ti pirsgirêkên zimanî ên rast axiftinê ya. Zarokê, di mejiyê xwe de ew gotin bi wê rengê salixkirina. Bi vê rengê, weke ku zarok zimanê xwe yê teybet biafirênê, wê rewşek zimanî wê bi xwe re wê biafirênê. Ev salixkirinên zimanî ên wê zarokê, wê ne şibihina li ya dêûbavê. Wê ne şibihina rêzimaniya zimanê gelemper ku ew bikardihênin. ..

Zarok, di vê demê de piştî ku ew het û gihişt sale xwe ya 4 ´ û 5´an, wê hingî wê cihrengîya zimanê xwe wê bide dîyarkirin. Zarokê, bi zêhnekê xwe yê teybet, weke ku çend gotin di mejiyê xwe de girtina, wê li gorî xwe ew salixkirina û wateyên teybet ji ya ku ew girsa dizanê cûdatir wate daya gotinê. Dema ku zarok, wê gotinê bikardihênê, wê ne li gorî wê wateya ku mirovan ew gotin biwate kirîya bê. Wê zarok li gorî wateya xwe ya teybet bikarbênê. Di vê rewşê de dema ku mirov mirovekî mazin ê ku ew wê gotinê bikardihênê bênê û dênê berzarokê, û zarokê li ber wê bicih bike, herdû jî wê heman gotinê bikarbênin. Mirovê mazin, wê li gorî ya ku ew dizanê, wê bikarbênê. Zarok jî, wê li gorî ya ku ew dizanê wê bikarbênê. Her wusa di vê çerçoveyê de rewşek ziman ya teybet bi zarokê re xwe dide dîyarkirin. Ev rewşa afirandina zimanê xwe yê teybet

wê bi hemû zarokan re wê, dernekeve li pêş. Wê bi hinek zarokna re derkeve li holê û li pêş.

Ez bixwe jî, li kurdistanê bûma şahidê wê, ku dema ku zarokna bi vî rengî ku xwediyê zêhnekê teybet in û zimanê xwe yê teybet afirandina û gotin li gorî xwe afirandina, pêşî ev rewş fahm nekirina û li rê û deveran gerîyana ku zimanê zarokên xwe rast bikin. Ber ku zimanê kurdî li kurdistanê ji civate kurd re ji aliyê rejimên herêmê ên weke rejima tirk ve hatîya qadaxakirin û bo ku herkesekî bikina tirk, tenê derfetê didina zimanê tirkî bo herkesekî asîmle bikin, êdî saziyên pedegojikî ên zimanî bi zimanê kurdî ku ew karibin li ser van rewşên zimanî lêkolînê bikin, ne hiştina ku ew werina vekirin. Bo vê yekê, wan mirovan jî bi derfetên xwe yên navxweyî ên di nava civatê de kirina ku wê rewşê li gorî xwe çareser bikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, dema ku bi vê rengê zimanê xwe yê teybet afirandibê, wê ew ne pirsgirêkêk bê. Lê dema ku ew rewşa zarokê a teybet, ku dêûbav û ankû mirovên mazin ên li dorê di dema wê de wê rewşê kifş nekin û li gorî wê rêyên pêşketinê ne dênina li pêşîya zarokê, wê hingî ew bibê temenê pirsgirêkên zimanî ên bingihînî bi zarokê re.Ev rewş,ancama wê ya ku zarok,xwediyê jîr û zêhnekê pirr zêde pêşketî ya.Bo vê yekê, ev rewş di serî de bi vê rengê, weke nîşanaka jîrbûna zarokê a weke pirrzane (´genius´) û bilîmetîya wê ya.

Ev rewşa zarokê, wê karibê xwe di gelek rewşan de bide dîyarkirin. Zarok, li ser wan rewşên ku bi wê re rûdidin re dike ku ew xwe werênê ser ziman. Di aslê xwe de li vir, di dewama vê mijarê de mirov dikarê mijara xîyalkirin û rastitiya zarokê li ser wê bisekinê û wê werênê ser ziman. Zarok, wê di vê demê de xîyalkirina wê, êdî wê pêşbixe. Wê li vir, zarok, ya rast di jîyanê de û ya xîyal, wê ji hevdû cuda bike. Xîyalkirina zarokê, bi teybetî divê ku mirov hilde li dest. Xîyakirineka teybet a zarokê heya. Xîyalkirina zarokê, bi asopîda(´fantezî´)yeka zarokê a ku ew bi gotinên rastiyê re dihûnê heya. Di vê çerçoveyê de xîyalkirina zarokê re wê bi gotinên fanteziyê û ên rastiyê re li hevdû hûnandî bê. Wê şêwayê mazinkirin(´anîbê´)ê zarokê, wê derkeve li pêş. Zarok, bo ku tişta ku ew dihênê ser ziman, wê hewl bide ku ew mazin bênê ser ziman. Minaq, weke gotinaka ku zarokê ku ew di vê çerçoveyê de dibêjê ”bavê min, mêrê herî bihêz ê cihanê ya”, wê weke gotinna ku wê şêwayê mazinkirina xîyalî zarokê dihê ser ziman a. Gotina, weke ´ya herî mazin´ , wê şêwayê dîtina zarokê jî werênê ser ziman. Zarok, ji mazinên xwe dibînê ku ew çendî carna ji hevdû re mazin dikin. Ew jî, her

wusa, wê li gorî xwe wê mazinkirinê bike. Wê bêjê ´bavê min, mêrê herî bihêz a ê cihanê´, Dûhû em çûna masîgirtinê û me bi hezaran masîgirtin, hinek ji wan gelek mazin bûn û pirr kolîyî bûn.´ Ez, hilkişîya ma devereka weke çîya bilind´. ´Min hemû xwarin xwar.´..

Bi gotinên bi vî rengî wê zarok, wê mazinkirinê bike. Tişta ku ew dihê dihênê ser ziman, wê bike ku ew pirr mazin bide nîşandin. Ev rewşa zarokê ku em weke xîyalkirina zarokê werênina ser ziman, wê zarok, wê bi têgîna gotina rastiyê re wê werênê ser ziman. Wê weke rastiyekê bide nîşandin. Zarok, bi wê şîwayê ku ew dibêjê, dixwezê bi wê heybetê di nerîna zarokan de li xwe bide çêkirin. Bi vê rengê wê gotinê bilêv bike.

Zarok, çendî ku ew piçûk a jî ji aliyê fizyolojikî ve wê zarok, mazinên xwe di wê mazinkirina xwe de wê minaq bigirê û wê werênê ser ziman. Gotinên zarokê, di vê çerçoveyê de bi wate na. Zarok, wê dema ku ew fincanak av divexwe û dema ku wê ew fincana avê bi vexwartinê xilas kir, wê weke ku wê serkevtinek mazin bidest xistî wê lê were. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê bikêf bê. Wê weke ku bawerîya wê were wê. Wê xwe bihêz hîs bike. Wê wusa hîs bike ku ew tenê dikarê wê fincana tişî av hemû vexwe û xilas bike.

Ev rewşa zarokê a mazinkirinê di nerînê de mirov dikarê bi rewşên fantazî ên weke mîtolojikî û xîyalkirina wê re werênê ser ziman. Zarok, wê gotinên bi şêwayek nerînî a bi vî rengî re wê li hevdû ava bike û werênê ser ziman. Ew fantazîya zarok, wê her wusa rastiya hizirkirina wê bide dîyarkirin. Li vir, ya giring ew a ku mirov, bi zarokê re bixwênê, kirinê bike, pirtûkan bi hevdû re bixwênê û hwd. Bi wê re rastîya jîyanê bi wê re bidina hevnasîn. Zarok, çendî ku ew rastiya li dunyê dît, wê xîyalkirina cihane xwe bi wê re bide gûharandin. Li vir, zarok, bi ziman re pêwîstîya wê bi fahmkirina di kirinê de heya. Ya ku wê zarokê ji wê xîyalkirina wê, derbasî dunya mirov bike, wê axiftinên mirov ên bi wê re, pirtûkan ji wê re bixwênê û di kirinê de weke ku di pirtûkê de dibûhûrê bide nîşandin û her wusa çîrokan ji wê re bixwênê û wê di jîyanê de çawa fahm bike, bide nîşandin. Zarok, vê vê yekê, hin bi hin fahm bike. Zarok, divê ku mirov zanibê ku ew di vê demê de bi wateya gotinan re hevnasînê dike û hişê w bixwe re êdî pêşbixe. Li ser wê re dihizirê. Li vir, divê ku mirov di dewama wê de werênê ser ziman ku aqilê zarokê sînorê wê yê vacê ne li gorî ya mazinan a. Her wusa, zarok, bi gotinên xwe re di mejiyê xwe de dikarê kirina hertiştî pêşbixe. Her wusa, mirovekî mazin ku ew dihizirê ku ew nikarê bifirê, lê zarok wê karibê bihizirê ku ew difirê weke teyrikekê. Mirovek, wê bi vace xwe bihizirê û

zanibê ku ew nikaribê li ser awran rûnihê li azmana. Lê zarokek, wê bi vace xwe wê bihizirê ku ew karê herê azmana û li ser awran rûnihê. Her wusa, şêwayê jîyane biafsûn ku wê hertişt mirov karibê biafirênê û bibînê û bike, wê zarok, bi têgîn û şwayekî hizirkirinê ê wê rengê wê bihizirê. Dema ku zarok, dibînê ku teyrikek çeng û pirrên wê hena û ew difirê, wê ji dêûbavê xwe heya ku ew bipirsê ku ´yadê, çima pirrên van teyrikan heya û yê te tûna ya.´ Yan jî, wê bipirsê, ´yadê, tû karê weke wan bifirê li azmana.´ Wê zarok, wê gelek gotinên bi vê şêwayê wê bike. Ev şêwayê hizirîna zarokê, ew dikarê hertiştî bike di nerîna xwe de wê zarok, li gorî wê bihizirê.

Zarok, wê hem bi zimanê xwe re û hem jî bi xîyalkirina xwe re wê bi demê re adilandinan bike. Zimanê xwe re jî zarok, xwediyê zêhhnekê teybet a. Her wusa, zarok, ku hinek zarok hindik û hinek pirr zêde dikarin wateyê li gorî xwe bidina gotinê, wê weke teybetîyek vê dema zarokatiyê bê. Lê li dunya derve jî zarok, dema ku ew çendî ku hevnasînê bi wê re dike, kifş dike ku we li wê dunyê we zimanek din û bi wateyên hevbeş ên ku ew bikardihênin heya. Zarok, wê bi wê re jî, weke ku ew ji nû ve ziman fêr bibê wê bidest rastkirina gotinên xwe bi wateyên wan re li gorî ên wê dunya derve ku ew wê bi wê re bijî di jîyane xwe ya piştre de.

Ev rewş, wê her wusa, temenê wê jî bê ku zarok wê zêhnê xwe yê teybet jî ji dest bide. Wê, êdî weke giştîya civatê bihizirê û werênê ser ziman. Bi wateyên wê yên ku ew hatina kifşkirin, wê bijî û fahm bike. Wê zarok, di vê çerçoveyê de ew, çendî ku di vê rewşê de serkevtî bê, wê li gorî wê rewşa zimanê civatê ê giştî jî wê serkevtî bê. Hinek zarok, di vê çerçoveyê de ew bi teybetî wê ji salên xwe yên 6 û´ 7´an û pê de, wê weke ku ew bikevina rewşek fahmkorî û ankû şevekorî de. Wê di temenê wê de jî ev rewşa dûrketin û ankû ji destberdana wê zêhnê xwe yê teybet a. Zarok, ev dema wê ya ku wê piştre bidest dibistanê bike û bixwênê, wê bi wê re perwerdeyê li gorî zimanê giştî ê civatê û watekirina wê bibînê. Ev jî, wê bi vê dema zarokê re wê zarok wê zêhnê xwe yê teybet jî wê weke ku ew li şûn xwe bihêlê wê bikeve rewşekê de. Di aslê xwe de wê piştre ku ew zarok mazin dibin û dibina ciwan jî ku ew di rewşna weke zarokna ciwanin, wê weke ancama vê rewşê bê. Zarok, wê di vê rewşê de wê gelek rewşan ji xwe ji dest berdê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ev dema zarokê wê nava 4´ û 5´salan wê weke demek zarokê a teybet bê. Piştî ku zarokê bidest dibistanê kir, wê di vê rewşê de wê rewşek teybet bijî. Dibistan, wê tenê zarokê di qalikekê û qalibekê de wê bi şekl û awa bike. Ya ku ew

zêhnê zarokê ê teybet ku wê mafê jîyanê ji xwe re di wê de nebînê jî wê ev rewşa dibistanê bê.

Zarok, di vê demê de wê weke ku pêvajoyeka pêşketina wê, lê were birrîn wê lê were. Zarok, bo vê yekê, bi pêşketina xwe ya aqilî a ku wê heta vê demê bixwe re çêkiriya wê bi wê bike û bixwezê ku li gorî pêvajoya nû a dibistanî û hwd, xwe ji nû ve birêxistin bike û pêşbixe. Ya ku wê zarok, di wê de bikeve zorê de wê ev bê. Li vir, divê ku mirov binxat bike ku zarokê nejîr û neserkevtî tûna ya. Zaroka ku nikarê xwe li gorî wê qalibê û qalikê dibistanî bijî heya. Ev bo dema zaroktiyê û piştre ya ciwantiyê jî wusa ya. Piştî ku zarokê, bidest dibistanê kir û pê de û hinekî pêde çû, wê zor bê ji wê re ku vegerihê rewşa pêşketina xwe ya berê jî. Lê wê bikeve zorê de ku ew wê rewşa nû jî bijî.

Rewşa pêşketina zarokê, li vir, divê ku mirov bi teybetî wê werênê ser ziman ku ew gelek pêvajoyên weke mudaheleyê ku ew li wê pêşketina xwe bijî. Rewşa dibistanê, weke rewşeka mudahaleyî ya. Di aslê xwe de ew rewşa qirêşê, bi şêwayê xwe yê baş, wê ji ya dibistanê pêşketîtir bê. Zarok, li wir, ne di nava sînoran de dijî di mejiyê xwe de. Lê kengî zarokê sînor kifşkirin, wê êdî bidest jîyankirina wê zorê di jîyane xwe de û di mejiyê xwe de bike. Rewşa xîyalkirina zarokê a bi şêwayê weke fantezî ew mazin dike, wê hinekî jî rengê afrênerîya zarokê a aqilî jî bixwe re werênê ser ziman. Zarok, wê bi wê re bizêhnê xwe re wê di rewşek bêsînor de wê bidest afirandinê bike. Her wusa, rastkirinên li ser ziman û gotinên ziman re ku mirov, di mejiyê zarokê de dike, wê her wusa wê vê şêwaya xîyalkirinê û afrînerîya wê ji mejiyê zarokê dûr bike. Ev dema zarokê a li nava saln 4´ û 5´an, wê weke demek û serdemek giring a jîyane zarokê bê. Zarok, wê di vê demê de wê rewşên nû ên jîyanê wê fêr bibê. Wê zimanê zarokê pêşbikeve. Di vê demê de wê zarok, bigihê wate û têgîna gotin û ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê zarok, di vê demê de wê bidest bikarhanîna wateyê bi gotinan re bike. Salixkirina gotina li ser wateyê re wê zarok, di vê demê de wê bi xwe re zêdetirî pêş bixe. Wê bi wê re jî dunya derve bijî. Di gotinê de mazinkirina zarokê, wê hinekî jî li ser vê rewşa biwatekirinê re bê.

.

**Pêvajoya 6 û 7 salîya zarokê wê ji wê re weke pêvajoyek nû û destpêkêk bê**.

Ev dema zarokê ku mirov ji kîjan aliyê ve lê binerê, divê ku mirov wê vê demê weke demek nû di jîyane zarokê de wê werênê ser ziman. Zarok, wê di vê demê de wê derkeve ser asta zarokatiya xwe. Wê hewirdora nas

bike. Wê zimanê xwe baş bikarbênê. Wê biaxifê û wê bi wê re bidest nivîsandinê jî bike. Her wusa, zarok, wê di vê çerçoveyê de wê pêşveçûnên wê di jîyane wê de bi wê re bibin.

Heta vê demê wê zarok, di nava malbata xwe ji dêûbavê xwe wê şêwayekî pêşketinê wê li ser wê pêşketina xwe re bijî. Ji dêûbavê xwe ziman, axiftin, bikarhanîna gotinan û ziman û nasîna hewirdorê kirîya. Her wusa, dêûbavê zarokê li cem wê na û zarok xwe bi wan bihêz dibînê. Di vê demê de wê ji wan dûrkeve. Di aslê xwe de dema ku zarok di vê demê de ji malê derdikeve, wê bitirsihê. Her wusa, ew hêsta ku wê bi zarokê re çêbibê a li şûn xwe hiştina dêûbavê xwe û ji malê derketinê wê di vê demê de wê bizarokê re biafirê, dema ku zarokê ji malê derdikeve û ku ew diçê dibistanê û hwd.

Di vê demê de wê zarok, hevalên nû ji xwe re çê bike. Wê demê bi wan re wê derbas bike. Wê ew qarakterê hevalên xwe nas bike û hevalên wê jî wê qarakterê wê nas bike. Ev jî, wê temenê hevnasîna wan ya bihevaltî bê. Hevaltî, wê weke mijarekê bikeve jîyane zarokê de. Lê zarok, li vir, wê di destpêkê de nexwezê ku ew wê hevaltiyê bike. Ji ber ku ew naxwezê ku ti tişt li dewsa dêûbavê wê bi wê re di têkiliyê de bê. Zarok, wê têkiliya hevaltiyê, wê weke têkiliya li şûna dêûbav wê fahm bike. Bo vê yekê, wê ji wê xwe dûrbigirê. Di demên ku dibûhûrin ên zarokatiyê de wê zarok, hinekî hevaltiyê fahm bike, lê vêvacê jî wê nikaribê, wê ahengê di nava jîyane malê û ya derve a bi hevalan re wê çê bike.

Li vir, divê ku mirov werênê ser ziman ku zarok, wê di van salên xwe yên di nava 6 û7´an de wê derûnîya zarokê wê hinekî din pêşketitîr bê. Lê ev sal, wê weke salên ku bandûra hewirdorê ku wê zêdetirî li derûnîya zarokê bibê bê. Zarok, wê nas bike. Wê fahm bike. Derûnîya gotinan, wê bi zarokê re çê bibê. Zarok, wê carna gotinekê ji dê û ankû bavê xwe bibîhîzê û wê li ser gotinê re wê ji wan bixayidê. Her wusa, di vê çerçoveyê de zarok, di mejiyê xwe de xwediyê zimanekî ku wê gotinên wê di mejiyê xwe de bi wateya ku wê daya wan re derxistîya têgînê. Û zarokê, weke ku ew gotin, bi derûnîya xwe re ew zindî kirina. BI wê rengê zarok wan gotinan dijî. Bi vê yekê ya, zarok, bandûra gotinan bihêzî dijî.

Di vê demê de wê zarok, bi qarakterê xwe gûharînan li ser jîyankirinên ku ew dijî re wê bi xwe re bijî. Wê di vê demê de wê bi derûnîyê wê bi xwe re hîs bike. Zarok, wê di vê demê de wê li bin xwe re zarokên ji xwe piçûktir bibînê. Yan wê xweşka wê hebin û yan jî wê

birayên wê yên piçûk wê hebin. Ev jî, wê têginekê bi zarokê re wê çê bike. Zarok, wê xwe mazin bibînê. Her wusa li ser wan dîtînên xwe re wê zarok, xwe mazin bibînê. Wê zarokên yek salê û piçûk bibînê. Wê zarokên du salî bibînê. Wê zarokên sê salî bibînê. Wê zarokên çar salî bibînê. Wê zarokên pêncsalî bibînê. Û wê zarok wusa dewam bike. Her wusa, dema ku zarok li wan zarokên bin xwe re dibînê ku hinek ji wan digirin, hinek nikarin tişta ku ew dike wê bikin. Hinek di hinek rewşên din ên ku ew bi wê piçûkatîya xwe didina dîyarkirin. Dema ku zaroka şeşsalî li wan zarokan meyizend, wê her wusa, wê xwe jî bi wan re li berçav derbas bike. Ev jî, wê bi zarokê re rewşekê xwenasînê a bi wê demê re bi zarokê re bide çêkirin. Ev rewşên ku wê zarok wan bijî, wê hinekî din ji aliyê aqilê wê ve zarokê pêşbixin û li ser temenê wê rûnênin. Dayikên kurd, zarokên wan ên şeşsalî, bi teybetî carna weke zarokên ku li xwûşk û birayên xwe yên piçûk binerin bierk dikirin. Her wusa wê wan jî li xwûşk û birayên xwe yên piçûk binerîyan. Wê wan weke birayê mazin, wê li cem wan bisekinîya û meyizendiba. Vê rewş jî, hêstek bi zarokan re dida çêkirin. Zarokan bi wê xwe weke mazin didin. Wan didît ku xwûşk û birayên wan ên piçûk digirîn. Weke ku ew hîc negirîna, wê li wan binerîyan. Wê carna jî ji wê girîna wan acizbûban.

Ev rewşa vê demê a zarokê pêwîstî bi wê dide dîtin ku mirov ji nûve ji destpêka bûyîna zarokê li ser gotina derûnîyê re wê hilde li dest û werênê ser ziman. Zarok, di destpêka xwe de ew, bi tevgerên xwe re wê bi xwe labitandinê re wê werênina ser ziman. Piştî bûn, wê bi bêhn û deng wê têkiliyê bi dayikê re dênin. Di vê demê de zarok, tenê ji singa dayika xwe sîr divexwe. Ev rewşa zarokê wê heta dawîya sale wê ya wê ya pêşî, wê bidomê. Di vê demê de zarok, tevgerên dê û bav dibînê û wan di mejiyê xwe de qayd dike. Weke wan dike. Zarok, di vê demê de pirr zû dikarê di mejiyê xwe de qayd bike. Minaq û nîşanaka vê jî, ew a ku dema ku zarok hê di hefteyên xwe yên pêşî de ya wê zarok, ji singa dayik xwe bi şîrdayinê şîr bixwe. Lê carna hinek dayik, wê li şûna ku ew zarokên ji singa xwe şîr bidin û wê têr bikin, wê bi mijînkê û ankû bi navê wê yê din bi ´bîberonê´ wê bikin ku zaroka xwe têr bikin. Zaroka ku ev çend rojan girt û fêrî wê bû, wê piştre singa dayika negirê. Bi wê rengê, çendî ku dayika wê singa xwe bike devê wê de jî wê zarok, ji singê negirê. Bi wê rengê zarok, dikeve rewşek cuda de.

Ev rewşa zarokê, wê weke rewşek teybet bê. Carna di pêvajoya şîrdayina zarokê ji singê de jî hinek dayik, wê li rex şîrdayina xwe, wê

bîberonê bidina zarokê. Zarok, wê piştre singa dayika xwe berdê. Çendî ku dayik bike ku ew ji singa xwe wê şîr bide jî, wê zarok nexwezê.

Ev rewşa zarokê ne ku ew fêrî bîberonê bû û piştre dev ji şîrdayina ji singa dê dibê, wê weke rewşek ku mirov dikarê wê bi fêrbûna zarokê a vê demê re werênê ser ziman bê. Ev rewşa zarokê, di heyve wê ya pêşî de jî dibê. Piştre jî, zarok, dema ku ew hat heyva sê û ankû çaran û hinekî din jî dibêt ku ji wê zêdetir, wê zarok, wê piştre wê fêrbûna ji singa dayika xwe ya ku wê, bi awayekî ahengî hanîya heta wê demê wê ji wê neqarihê. Heta ku wê di vê demê de dibê ku dayik bixwezê ku wê ji şîr bike jî lê wê zarok, nexwezê. Ji ber ku wê ji zarokê re ev hesanî werê, weke ku çawa ku dema ku zarok yekheyvîya û dema ku ew ji bîberonê şîrê dayikê û ankû ´mamayê´ dixwe û piştre nexwezê ku singa dayika xwe bigirê. Ber ku wê di wê demê de jî bîberon û ji wê vexwartin, wê ji zarokê re hesantir were ji girtina singê û ji wê kişandina şîr.

Ev rewşa zarokê, w heta sale wê ya pêşî wê bidomê. Piştre jî wê zarok, tevgerên xwe bigûharênê. Zarok, wê di vê demê de zêdetirî di vê demê de bidest xwarina xwarinê bike. Wê bidestê xwe rajê fincanê û ji wê avê vexwe. Wê fêrî li xwekirina cilên xwe bike. Ev rewş û gelek rewşên din, wê gûharînê di qaraktere zarokê de wê bide çêkirin. Wê zarok, wê êdî wusa zêde new ew zarokê şîr bê. Wê ji vê demê û pê de, wê êdî zêdetirî xwarinê bixwe. Wê êdî bi wê re wê zarok, bide nîşandin ku ew, dema wê ya ji şîrkirinê a ji singê hatîya. Ji vê demê û pê de, wê zarok, êdî wê ji şîr were kirin ku ew êdî ji singa dayikê newê şîrdayîn.

Ev rewşa zarokê wê sale wê ya duyem bike sale wê ku ew êdî weke zarokek ku ew xwarinê dixwe, divexwe, cilên xwe li xwe dike, dibînê, dileyizê û hwd.Herwusa, ew fahm dike. Bidest bikarhanîna gotinan dike. Ev rewşên zarokê wê weke rewşna teybet ên zarokê bin. Zarok, wê tevgerên xwe di vê çerçoveyê de wê bide dîyarkirin.Zarok, wê di vê demê de wê, bidest naskirina tiştan, fahmkirina gotinan û her wusa dîtina rewşan bike. Wê rewşên ku bi herênî û ankû ´pozitiv´ bin û ankû nerênî û an jî ku ´nagativ´ bin, wê ji hevdû cuda bike. Vê jî wê zarok li ser kirin, tevger û her wusa pêşveçûna rewşê re wê bibînê. Ji hevdû hêrsbûna dêûbav, wê zarok, weke zindiyê pêşî malê bê ku wê fahm bike bê. Her wusa, di vê demê de derûnîya dê û bav jî, wê rastrast wê bandûra wê li ya zarokê wê bibê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê zarok, pêvajoyek teybet bijî. Di vê demê de wê zarok bi çapka wê herê. Wê xwe bi hêtan bigirê ku ew rabê ser lingên xwe. Bialikariyê wê zarok, xwe li ser lingan bigirê. Ev sale zarokê, wê qaraktere wê li ser van rewşan û rewşên weke wan bê.

Di sale sêyan de wê zarok, êdî biaxifê, wê rabê ser lingan û bimeşê, wê fahm bike û bibînê. Wê zarok, karibê bersivê bide dêûbavê xwe. Wê ji gotinên wan ên ji zarokê re wê yan wê fêz bigirê û li xoşa wê herê û yan jî wê bixayidê. Wê di vê demê de wê jî bijî. Qarakterê zarokê ê vê demê wê di vê çerçoveyê de li ser rewşên ku ew bijî re wê biafirê. Heta salên çaran wê zarok, di vê çerçoveyê de wê pêvajoyek pêşketinê a giring bi xwe re wê derbas bike. Di salê çaran de wê zarok, biaxifê, fahm bike, gotinên xwe şîrove bike. Wê karibê hevokên dirêj herî hindik ji du û ankû sê gotinan pêktê wê ava bike. Wê hevokên xwe piştre dirêj bike û bibêjê. Wê vegotin û ankû çîrokên kin wê vebêjê. Dema ku ew herê qirêşê, wê di derbarê wê roja xwe ku wan çi kir û ankû dît weke fêrê, wê bi gotinan wan ji dêûbavê xwe re vebêjê. Ku zarok tê salê xwe ya pêncan, wê êdî li van rewşên ku ew di wê de dijî wê serwaxt bê. Her wusa, wê di vê demê de wê êdî dilê zarokê ji qirêşê sar jî bibê. Ber ku ew xwe mazin dibînê. Ew dema ku zarokên bin xwe re dibînê û xwe ji wan maztir dibînê, êdî ew bi wê rengê xwe ji wan zanetir jî dibînê.  Di vê demê de wê qarakterê zarokê, wê vegûherê li rengê ku ew êdî ji xwendinê û hwd fêr bibê. Ew bixwendinê fêr bibê. Di vê demê de wê zêdetirî mêyla xwe bide ser wê. Wê lehengên xwe di mejiyê xwe de weke dager biafirênê û wê li ser wan re bihizirê.

Ev dema zarokê wê weke demeka zarokê bê ku zarok, di wê de bidest fêrbûna xwe bixwe jî dike. Her wusa, wê tevger, kirin û nêzîkatîyên nû wê zarok bide nîşandin. Wê zarok, heta wê demê de çi kirin, tevger û nêzîkatî kiriya û daya nîşandin, wê li wan yên din zêdetir bike. Bizêdeyî zarok, wê di vê demê de wê hindûrê xwe wê kifş bike. Wê di hundurê xwe de wê fêrî hizirkirinê bibê. Wê zarok, berê nerîna xwe di vê çerçoveyê de wê bide hundurê xwe. Bi wê re wê ji xwe re bihizirê. Wê ji xwe re dunyeyekê ava bike. Ji xwe dunyeya zarokê a ku wê hin bi hin ji yeksalîya xwe û pê de bidest pêşxistina wê kirîya, wê di vê demê de wê zêdetirî pêşbikeve. Zarok, di vê demê de wê aqilê xwe bidest hanîna li ser ziman bike. Ev dema zarokê, weke demeka ku zarok, wê xwe di destpêkê de ji aliyê xwe hanîna li ser ziman ve wê bi sînor nekê di wê de. Lê dema ku zarokê, mudahale li xwe dît û nerînên ne baş, piştî hizirkirina xwe û xwe hanîna li ser ziman ku wê li xwe dît, wê êdî zarok, bidest ji xwe hanîna li ser ziman wê bi şûn ve wê gavê biavêjê. Wê zêde xwe li hundûrê xwe girtî bigirê. Wê bistirsihê ku ew xwe werênê ser ziman. Zarok, di vê demê de di nêzîkatîya li xwe a bi zimanê hêskirinê û destê xwe li ser serê wê wê û piştre wê re birin û bi wê re danîşandina

hêskirina xwe ya li zarokê, wê zarokê zêdetir wêre bike û bivîn bike. Di vê demê de wê zarok, li ser tiştan, zindîya û heyînên din ên li jîyanê bi teybetîyên wan re li wan bihizirê. Minaq, wê bibêjê ´teyrik, perên wan hena û difirin´, ´taksî çar deriyên wan hena´, mirov, du destê wan hena.´ ´mirov, du çavên wan hena´, ´mirov, du lingên wan hena´, ´çêlek, şîr dide mirov´, `şêr, lapên wê hena û neparûşkan bi wan dike´,´masî, weke ajalek ku di ew di avê de dijî´, ´kitik(´pisîk`), naparûşkan dike´, ´ mar, bi mirov ve dide´, ´genim dibê hevîr´, ´ hevîr, dibê nan´, ´nan, ku mirov birçîya wê dixwe´. Zarok, wê bi vê rengê li ser rewşn gotinan ên ku ew dihênina ser ziman re wê fahm bike. Wê li ser pêwîstî û pêdîvîyê re wê fahm bike. Minaq, weke ”mirov nan, dixwe”, ”mirov, avê dixwe”, ”mirov, dijî”, û hwd, zarok wê bi rengê fahm bike. Wê fêr bibê ku mirov ber çi xwarinê dixwe. Wê fêr bibê ku ”mirov, tîya avê dixwe.” Her wusa, li vir, gotinên temen ên ên weke xoslet, wê bi hevdû re zarok, wê pêşî li wan bigerihê di mejiyê xwe de. Gotinên temen weke ´nav´ wan dihilde. Gotinên ´xoslet´ jî wê weke tişta ku mirov dike û ankû ya pêdîvîya wê hilde li dest û fêr **bibê**. Bi vê rengê wê gotinan bi teybetîyên wê re wê kifş bike. Her tişt, wê di jîyanê de wê bivê rengê teybetîyek wê ya ji wasifîya wê tê heya. Li vir, tişta ku balê mirov divê ku mirov bikişênê wê, kirdeya di gotinê de ku ew binivîskî dihê nîşandin a. Minaq, di gotina ´mar, bi mirov ve dide´, ya ku vê dike ´mar´ a. ´Şêr, bilap a´ Şêr, ku lapên wê nebin, wê nikaribê naparûşka bike. Ankû wê nikaribê tiştan bi wê ji hevdû bike. Li vir, weke kirde destnîşanî gotina ´şer´ a. Gotina duyem jî wê ´lapên şer´ bê. Dema ku bo gotina ´mar´ jî werê ser ziman, wê gotina ´pêvedan´ wê weke gotina xosletê bê. Zarok, li vir, wê her tiştê bi xosletê re wê di vê demê de wê hilde li dest. ´Mirov, dihizirê´. Li vir, di gotina ´mirov, dihizirê´ de gotina ´dihizirê´ ku weke ya xoslet a, wê bi gotina ´mirov´ ve girêdayî wê xwe bide dîyarkirin. Zarok, di vê demê de wê li ser gotinên ziman re wê, fêrî van rewşan bê. Her gotinek, wê xosletekê bi xwe ve werênê ser ziman. Gotina mirov, wê gotina ´hizirkirinê´ weke xoslet bide dîyarkirin. Gotina ´mar´ w gotina ´pêvedanê´ wê bide dîyarkirin. Gotina ´nan´, wê gotina ´xwarinnê´ wê weke xoslet hilde li rex xwe li ber xwe. Zarok, di vê demê de wê kirin, tevger û nêzîkatîyên ku wê bigotin kirina, wê bi vê rengê wê xosletê jî bi wan ve bike. Wê li wan bihizirê. Ev rengê, hizirkirina zarokê, ku weke gotinek û gotina wê ya duyem weke xosletê wê, wê bi wê re di mejiyê xwe de wê li dûv hevdû bi pêvajoyên pêşketina xwe re wê pêşbixe. Gotinên ku zarok, weke ´nav´ bikardihênê, wê baştirîn di mejiyê zarokê de bimênê. Ber vê yekê, wê mejiyê zarokê,

zêdetirî weke nav, wê pêvajoya pêşî de li wan bihizirê. Piştre jî, wê xosletê wan gotinan bidest kifşkirina wan bike. Vê jî, wê bi dîtin û jîyankirinê re wê bike.

Bi heman rengî zarok gotinên bertekê diafirênê. Her wusa, dema ku zarokê tiştek û ankû lîstokek hilde li dest û got ´ev ya min a´ û piştre zarokek din a di temenê wê de ku ew were û rajê wê lîstokê, wê zaroka pêşî a xwediyê lîstokê wê ji destê zaroka duyem wê tiştê û ankû lîstokê derve, lê xwedî derkeve û wê nediyê de. Vê vê yekê jî bi hêsta ´xwedîyê wê bûnê´ wê bike. Zarok, li vir, mirov kifş dike ku ew vê rewşa bi têgîna xwedî derketinê, wê hê di sale xwe ya duyem de wê pêşbixe. Heta ku ew tê sale xwe ya pêncem, wê êdî wê derxe têgihiştinê.

Li vir, zarok, weke ku mirov fahm dike, têgîhiştina ´xwedî bûnê´ bi xwe re pêşxistîya. Li vir, zarokê, dema ku berê bi wê lîstokê re leyistiya, piştre jî ku ew bi wê re maya, êdî ew lîstok, weke ´ya wê´ maya. Di mejiyê zarokê de jî ew wusa maya. Li vir, divê ku mirov vê yekê fahm bike ku wê hêsta xwedî derketinê, bi zarokê re wê di du şêwayan de wê xwe bide dîyarkirin. Şêwaya pêşî, bi vê rengê weke ku me hanî ser ziman bi leyistinê û bi wê re bûûhûrandina demê ya. Şêwaya din a duyem jî, wê bi têgîna acîbandinê û ya farqkirinê re wê bi têgîna xwedîbûnê re wê destê xwe biavêjiyê de. Zarok, têgîna xweşikatiyê, wê bi biriqîna wê re wê kifş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê mêyla xwe bide li ser wê. Hertimî wê mêyla zarokê wê li ser ya ku wê acibandî û ankû bi wê re li ser biriqîna wê bê. Lê li vir, wê mejiyê zarokê, wê hertimî li rewş û dîtinên şenber ên ku ew dike ve girdayî bê. Wê li ser şenberîya li berçav re wê bijî. Tişta ku zarok wê bi çavê xwe dibînê, wê temenê helwest û berteka wê bê.

Zarok, li vir, di vê demê de wê bidest girêdana rewş û gotina bi hevdû re bike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ew rewşa zarok, ku ew karibê, zû gûharandinê di hizrê de bike, wê hinekî jî di temenê wê de ev hebe. Ev gûharandin, carna dibê ku rastî hizrên vajî hevdû jî were. Zarok, li vir, li ya şenber, biriqîna wê û her wusa dîtbarîya wê dinerê. Mejiyê zarokê, h ne gihiştîya wê astê ku darazê bi başî û nebaşî bike û vê bike temenê helwestê de ku ew li dijî wê ya. Têgîna ´li dijî bûnê´ wê bo zarokê, dîtbar bê. Her wusa zarok, wê vê wusa bidijwarî nejî. Zarok, vê yekê nakê.

Di warê zimanî de wê zarok pêşveçûnên mazin bi xwe re wê bijî. Tevî ku di pêşketina bihêz ya li qada zimanî hîn jî hin sînorkirinên li ser pêşveçûna zêhnî ya. Çi di serî de weke qarakterîzekirinî di rê de zarokê ji

xwe dihizirê, wê bi vac û ankû ´mantiqe´ hundurîn bê. Ev jî dihêlê ku zarok di wê rêya xwe ya ku ew bi pêşveçûna xwe re di wê re diçê de li mazinên xwe jî muxalefetê bikê. Zarok, bi hesanî diçe ji yek têgihê li ya din bêî ku ew hizara(´fikara´) bi çi wateyê ji berê û çawa ew hizra xwe gûharanda. Raman, ji nêz ve ji tecrûbe û çalakiyên berbiçav ve girêdayî ya. Zarok, bi tenê bi awayekî sînordar û ji bo xîyale tiştên ku ew qast dikê, ji wê re amede ya. Ya ku zarok herî zêde bo wê maqul a, wê weke tiştek şenber-raman wê bi wê bijî. Zarok, wê di vê demê de hin bi hin tiştên ku ew berê dîtîya, wê bibîr bênê. Wê vê jî, bi vê rengî ji xwe re bikar bênê.

Zarok, lê wê bi demê re hizra xwe hin bi hin pêşbixe. Bi demê re weke ku çawa ku zarok, dihizirê, wê her wusa bibînê. Di dema 5 û 6 saliya xwe de wê ji devera ku ew li wê dinerê, wê karibê nerîna xwe ya li dunyê biafirênê û pêşbixe. Di vê demê de zarok, wê karibê, were ser hizrekê û ji w biçe ser hizra din. Ji vê rewşê re vekirîya. Çendî ku ew di vê demê de wê karibê nerîna xwe li dunyê pêşbixe jî, ji wê rewşa zarokê ku ew ji hevalên xwe digirê û bi wan re dikarê bigihijê têgînekê bi hevdû re wê, ev rewş bide nîşandin ku zarok, ji girtinê re di vê demê de jî ew vekirîya. Lê xosleta vê demê bo zarokê ew a ku zarok, dikarê bi hiş li dunyê binerê binerînekê û hizrekê. Her wusa, ew dikarê dunyê fahm bike. Aqilê zarokê û pêşketina wê, her wusa wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Zarok, wê di vê demê de dunyê weke xwe bibînê. Lê piştre hin bi hin, dema ku ew di nava jîyanê de bi hizir û nerînên cuda hevnasînê dike, wê li vir w di mejiyê xwe de wê hinek nakokîyan jî wê bijî. Lê zarok, di vê demê de herî hindik, mirov dikarê bibêjê ku ew binerîneka li dunyê ya. Di vê demê de wê çavdêrîya zarokê wê pêşbikeve. Her wua, mazinên wê çawa pirsgirêkan çareser dikin, û li hevdû nêzîkatîyê dikin û dinerin, wê ew jî bi wê re wê fahm bike. Wê wê kirina ku dibînê, bi piretîka wê re hem wê rast bibînê û hem jî wê ji wê bikeve gûmanê. Kirinên ku zarok, di wê demê de wan nacibênê, wê temenê gûmana wê ya li wê têgînê û ankû kirina ji mazinan bê.

Zarok, çendî ku ew di vê demê de di mejiyê xwe de pirr aktiva û xwediyê adranaliyekê ya, bi heman rengî wê di jîyane xwe de aramiyekê pêwîstîya wê hîs bike. Di vê çerçoveyê de ew, vê yekê, bi xwe re hinekî di hundurîna xwe de dijî. Hundûrê zarokê, wê aramiyê dixwezê. Ew aramî, bi nasîna wê ya li ser dêûbav û hwd re wê temenê wê tevger û ankû ´aktivîya´ zarokê wê mazin jî bê. Ber ku ew bi wê piştewle ya. Ew bi wê rewşa malbatî re xwe ew ewle hîs dike.

Zarok, di vê demê de wê, weke ku ew çawa di dema xwe yên ji yeksaliyê û pê de ji pêşketina zarokatiyê re vekirîya û gav bi gav zû pêşkeve, wê bi heman rengî di vê dema xwe de jî wê vebûna li derve û pêşveçûnên wê ên ku wê ew bijî re ew xwe amede dike. Mejiyê zarokê, wê di vê demê de ji gelek pêşveçûnan re wê amedê bê. Fahmkirina salên zarokên nava 6 û 7´an wê pir giring bê. Ev dema zarok, wê weke demeka zarokê bê ku ew ji malê derketiya. Bi serê xwe kirina dike. Xwe mazin dibînê û ew dihizirê ku ew dikarê bitenê biserê xwe tişt û kirinan bike. Bo vê yekê zarok, di vê demê de wê demek xwe ya teybet wê bijî. Zarok, di vê demê de wê ew dunya derve ku ew dikeve nava wê de wê zarok, wê bi demê re wê nas bike. Wê kifş bike. Ev dema zarokê, weke demeka kifşkirinê jî ya.

Zarok, hema bêja wê di mejiyê xwe de xwe weke mazinên xwe mazin bibînê. Wê weke zarokeka fahm dike wê bibînê. Wê heta ku ew zêde xwe zarok jî nebînê. Bi teybetî jî ku di malê de zarokên ên ji wê piçûktir hebin wê zarok, li ser wan re xwe baştir wê mazin bibînê.

Zarok, wê di vê dema xwe wê karibê hin bi hin hinekî ji demên xwe yên bûhûrî jî wê bîr bike. Gotinên ku ew ji dêûbavê xwe dibihîzê diderbarê demên xwe yên bûhûrî wê de di mejiyê zarokê de wê bimênin. Dema ku zarokê di pêncsaliya xwe de dêûbavê wê, lîstokek û ankû cilek ji wê re kirî bin û ew cil heta wê demê ku ew mabê, dema ku ew were ber zarokê û ji zarokê werê pirsîn ku ew kengî kirîya, wê zarok alaqayê bide nîşandin û bibêjê ku ´ew di pêncsalîya min de dêûbavê min ji min re kirîbûn.´ Bi ser wê ve jî, dema ku bi çend gotinên hêskirinê bahse wê hatkirin, wê ev bala zarokê zêdetirî bide ser. Minaq, dema ku yekî din weke mirov duyem çû berzaokê û rahişta cilê û got ´ev çi xweşika û çi xweşik li te tê, te kengî kirî´, wê zarok bersiva wê bide. Zarok, di vê rewşê de mirovên ku ew baş nas dike, wê di bersivdayîna li wan de wê zêdetir biwêre ûû xwestek bê. Lê mirovên ku ew nasnekê, wê wusa ne bi wêre û xwestek bê. Heta ku zarok dibê ku bersivê jî nedê wan. Bi vê rengê zarok, wê rewşekê di vê demê de wê bijî.

Ev dema zaroka zarokê, wê temenê wê li ser demên wê yên bûhûrî bê. Çendî ku ew demên wê yên bûhûrî baş hatina bûhûrandin û di wan de pêşveçûnek baş dem bi dem ku hatibê çêkirin, wê zarok, wê li ser wê pêşveçûnek mazin bijî. Ev dema zarokê, weke demek teybet bê. Zarok, di vê demê de wê li dunya derve vebê. Her wusa, heta wê demê zarok, zêde derneketiya derve. Bo vê yekê, dema ku ew derdikeve derve, wê weke ku ew hinekî ji xwe li şûna xwe dihêlê wê lê werê. Zarok, vê hîsê dijî. Lê

dema ku ew bi mazinên xwe re bê, wê zarok, weke ku ew li malê bê û ankû ne tenê bê, wê di derûnîyekê de tevbigerihê û wê xwe rehet hîs bike. Wê rehet gavên xwe biavêjê.

Zarok, di vê demê de wê dest bi dibistanê jî bike. Di roja me de her wusa ev temenê zarokê weke ku hatîya herê kirin jî wê, temenekî zarokê wê bê. Lê di aslê xwe de zarok, hê zû de ew pêvajoya dibistanî dijî. Lê teybetîya jîyankirina vê demê, ew a ku zarok, êdî bi tenê wê kirinan bike. Wê derkeve derve. Wê herê û werê. Zaroka vê demê, çendî ku biaqilê xwe weke ku pêşketîtir jî bê, wê li ser kirin û tevger û nêzîkatîyên xwe zêde sehêt(´kontrol´)a wê jî tûna bê. Her wusa, dema ku bûyarek ku ew ne li bendê bê û derkeve li ber wê, wê di cih de di cihê xwe de bimênê sekinî. Rewşên ku zarok ji wê re ne hatîya amede kirin, wê weke rewşên ku zarok bi wan, di vê demê de wê dem bi dem wê şokan´ bijî. Wê tirs û gûmanan pirr zêde bijî. Lê wê zaroka vê demê, wê zûtirînî jî wê karibê xwe li hevdû bide hevdû û jîyane xwe bide domandin. Lê divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zaroka vê demê, her kirina biêş û ankû feleketa ku wê dît, wê bandûrek mazin li wê û derûnîya wê bike. Wê şikeştinên mazin bixwê. Çendî ku zaroka vê demê de ew hinekî bi xwe bawer û wêre ya. Lê ev bawerî û wêrebûna wê, weke ku ew bi ´tayê pambû´ ve girêdayî ya. Dikarê zû biqatihê. Her wusa derûnîya zarokê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rewşek giran bê, dema ku ew bijî. ..

Lê zaroka vê demê a nava 6´ û 7 salîyê jî, hertimî dixwezê ew herê hewirdorê û bigerihê. Weke ku ew dicihê xwe de naseknê. Di rewşek bi vî rengî de ew dijî. Zarok, wê vê yekê bi wê hêza xwe ya aktivî wê bike. Sibehan zû rabê û êvaran zû razihê. Lê wê hertimî çavên wê li ser ya mazinên wê bê. Wê bixwezê ku ew çi dikin ew jî bike. Di vê çerçoveyê de ew, wê xwediyê mêyla li ser wan bê.

Lê di vê demê de zarok, gavek giring diavêjê li jîyanê. Çendî wê di vê demê de gelek telûke di jîyanê de li pêşîya wê hebin jî, lê dîsa giring a ku ew kirin, tevger û nêzîkatîyan karibê bi xwe û hêza xwe û aqilê xwe pêşbixe û bide nîşandin. Ya ku wê zarokê, ji vê dema wê re û heta ku wê ji demên wê yên piştre jî bide amede kirin wê ev bê. Di vê demê de hinekî zêdetirî, wê zarok biserê xwe bê. Lê di vê demê de wê hinekî din jî berpirsîyarîya dêûbav li zarokê bizanebûntir bê. Divê ku wusa jî bibê. Zarok, wê di vê demê de wê xwe biavêjê nava dunyeyek ew nasnek û ankû wê nûka nas bike. Bo vê yekê, di vê demê de wê her tişta ku derket ber wê, wê bike pirs û li mazinên xwe bike. Dema ku ew li dibistanê bê û di hola xwe de jî bê, dema ku mamosteyên wê axifîn û bahse tiştna kirin,

wê zarok, li ser gotinê re wê fahm bike. Tişta ku zarokê ew nejîyaya, wê nikaribê wê di mejiyê xwe de bi mînaqek şenber bi bîr bike. Bo vê yekê, wê li ser wê re wê pirsê bike bo ku ew karibê wê minaqa şenber di mejiyê xwe de çê bike.

Di vê demê de wê pirsgirêka zarokê, di dibistanê de wê ew bê ku ew gotinên ku ew nûka bi wanre hevnasînê dike û ku ew di mejiyê xwe de ne xwedîyê têgih, zanîn û kirina wan ya rewşî a jîyanî ya. Her wusa zarok, wê bi vê yekê re wê êdî weke ku wê bidest pirsgirêkê bijî. Dema ku zarok, tişta ku ew nizanibê û di xwe de wê hîs dike ku ew divê ku ew wê zanibê, wê xwe di bin giraniyekê de hîs bike. Bi wê re jî dema ku zarok, bi vê rengê bidest jîyanê bike û di vê dema xwe de alikariyê nestênê ji mazinên xwe, wê ew hey û bale xwe ji dunyaya derve bibê dunya xwe ya hundûr ku ew di xwe de diafirênê û wê dijî. Her wusa, dunyaya hundur a zarokê, wê wê di vê demê de ji wê re weke dunyeyek biafsûn ji wê re were. Wê di her dema ku ew li dunya derve ket zorê de û ankû şikeştin xwar, wê xwe li wê dunyaye xwe ya hundûr wê bigirê. Ev wê bike ku zarok, xwe li dunya derve bigirê bi demê re. Di vê dema zarokê de zarok, çendî ku êdî ew li dunya derve divebê û wê bike ku ew wê bijî bi tenê, bi heman rengî jî wê beremberê wê, wê zarok di hundurê xwe de dunyaye xwe ya teybet û ankû dunyaye hundurînî a xwe wê biafirênê û pêşbixe. Wê her dema ku ew bitenê ma, wê êdî wê di wê de bijî. Di vê demê de ev rewş, dema ku baş ji aliyê dêûbav ve baş û rast newê fahmkirin, wê karibê bibê rewşek ku jîyane zarokê a li dunya derve hin bi hin ji holê dirakê bê. Li vir, her dema ku zarokê xwe di dunyaye derve de bi tenê ne dît û wê hertimî alikarî ji dêûbav û ankû mazinên xwe dît, wê êdî ew xwe bitenê nebînê wê xwe hertimî li wê dunya xwe ya hundûrînî negirê. Ev dem, wê weke demeka ku dunya hundurînî hertimî xwe pêşdixe û dike ku ew xwe li zarokê serdest bike. Zarok, wê bi wê afsûnîya wê ya ku ew di wê de karê hertiştî bike û dike jî, wê êdî mêyla ji ya dunya derve wê bibirrê. Wê ev jî, hin bi hin temenê wê bê ku zarokê ji jîyanê qût bike. Zarok, di vê demê de wê, bo jîyankirin û kifşkirina dunya derve, wê pêwîstîyê bi alikariyê bibînê. Ya ku wê zarokê, her wusa li ser lingê wê bizexm bide sekinandin jî wê ev bê. Zarok, çendî ku wê berê xwe da dunya derve, wê hêsteka ku wê bi şûn ve dikişênê wê bi wê re biafirê. Hinek, wê vê hêstê, weke tirsê binav bikin, hinek wê weke gûmanê binav bikin û hinek jî wê weke nezanînê binv bikin. Lê çendî ku ev hersê rewş bihevdû re jî di wê vekişêna bi şûn ve de hebin jî, wê di temen de fêrnebûna zarokê a li dûnya derve û ne nasîna wê, wê hebe. Zarok, wê vê

yekê bxwe re wê hîs bike. Lê tevî van pirsgirêkan jî, wê zarok, bi wêre bê û wê bixwezê kifş bike. Wê bixwezê herê derve, hevalan ji xwe re çê bike û bi wan re bileyizê, bigerihê û tişta ku ew dixwezê bike. Ya ku wê, li vir, bixwe baweriyekê bide zarokê, wê xwe bitenê ne hîskirina wê ya.

Di aslê xwe de şêwayê pêşketin, pêşveçûn û mazinbûna zarokê wê di temen de kifşkar bê. Zarok, wê hertimî pişta xwe bide wê. Wê bi wê re wê, bijî. Bo vê yekê, alikarîya herî mazin, di gavên zarokê ên bi ber pêşaroja w de wê ji destpêka wê, bi wê re dem bi dem çêkirin û afirandin pêşketinek baş ku ew karibê li ser wê re biewla xwe bijî bê.

Zarok, di vê demê de weke fîlosofê ku ew çavê xwe li dunyê nû divekê ya. Her wusa, bi rewşek bi vî rengî mirov dikarê zarokê werênê ser ziman. Zarok, dunyê dike ku ew kifş bike. Ew çendî ku kifş dike û wê dijî û fahm dike, wê zarok, bi wê re xwe baştirîn hîs bike. Zarok, di dema xwe de weke rastiyeka ku ew dike ku dûnyê nû fahm bike.

Di qonaxa pêş de ji aliyê zarokê ve biawayîkî dibê, ji bo xabetê li ser pirsgirêkan û bi yên din. Ev hinekî jî bi saya hînkirina bi awayekî pergalkî(´sîstemetîk´) li dibistanê pêk tê. Bi komn civatê yên din re jî weke şêwayê pêşketinê bi nûmeneyî pêşbikeve. Zarok, dikarin bingeha ji bo wateya baş û yên pilê bi mirovên din re li gorî daxwezên dordorê pêşbixe. Zarok, di vê demê de ew, hêdî hêdî baştir bi şehrazayî ku dikarê xwe bi yên din û aliyên din ve bide dîtin, ji wê xwe di cih de dibînin, û ku ew yek mimkun e ku ew xwedî nerînên cuda ya li ser hewirdora xwe. Ku zarok civakî de zêdetir bibe, û qanûn, rêbaz û normên bi wek guncaw dît ku heye û ku divê bê şopandin. Ev ezmûnên civakî ku navendî in e, û zarok kêmtir ji çima wusa ye, ev tişt e dihizire. Ji ber vê yekê ji axaftinên bi zarokan li ser karên baş û xerab, divê li ser ezmûnên civakî nêzîkî wî an wê bê avakirin. Di beşa yekem a vê astê de ye, ev misogerî pêwîst e. Lê di vir de jî, divê em destnîşan dikin ku cudahiyên şexsî mezin di nav zarokan de heye. Hin xwe di neh deh salîyê de wê, roniyê dê li ser tecrûbeyên wan ên civakî.

Zarok, divê ku mirov werênê ser ziman ku ew demên xwe yên ku wê bûhûrandina, wê weke tecrûbe û ezmûnan wê hilde li dest. Zarok, di vê demê de ew heta ku hatîya wê demê, wî di xwe de gelek tecrûbe û ezmûn dana çêkirin. Her wusa, zarok, di vê demê de wê van tecrûbe û ezmûn xwe jî bifêr bike di kirinê de. Li vir, fêrbûna zarokê a ji tecrûbe û ezmûnan sûdwergirtin, wê di vê demê de pêşbikeve. Ev dema zarokê ku weke demeka wê ya biaqil wê êdî pêşbikeve, wê tecrûbe, ezmûn û fêrên xwe bike temenê xwe de. Wê pişta xwe bide wan. Her wusa, zarok, dema

ku bidest dibistanê dike jî wê, dîsa li ser wan tecrûbe, ezmûn û fêran wê herê û bimeşê. Bi vê yekê zarok, wê naskirin û fêrkirinê bi xwe re çê bike.

Lê bi teybetî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ev dema zarokê, wê ji hinek aliyên din ve jî wê zarok, pêşketina xwe bijî. Refleksên zarokê, di vê demê de wê zêdetir pêşbikevin. Pêşketina refleksên zarokê, wê di vê demê de bi asta pêşveçûna zarokê û her wusa demê re wê zêdetir xwe bide dîyarkirin. Di vê astê de, di ciwanên di vê temenê de û di demekê gelekî kort bê ku ev yek diqawimê û gûhartinên laşî û derûnî giring. Nûha, tevgerên civatî pêş dikeve û zarok di vê demê de dikarin bihizirin, bi awayekî matinqî li ser rewşên razber û ankû çêkirina hizran û hwd, li ser hemû cûreyên tişt û hizran bihizirê û li ser tişt û rewşan ´gûman´ kirin, weke aliyekî hizrî ê zarokê ku pêş dikeve bê. Ev jî tê wê wateyê ku zarok dikarin sûdê ji têkiliyên civatî ku ew dibînê û ankû çê dike di çerçoveyek fireh de bigirê û eger tiştekî yan ji kesekî dijî, bi wan bawer dike û dijî. Ku ew bi xwe û yekî din re tesrifê wek ku tu dixwazî yên din ji bo li hemberî we, tevger, ew bê fêhmkirin di pir bi awayekî cuda ji berê dibe. Zarok fêm dike nûha çima qaîdeyên û normên pêwîst in û diyar li ser rolên re têkildar bi wan re. Di vê rewşê de, di serî de bi çawa ku ew li ber çavên yên din va eleqeder, li gorî ku ew çawa hîs dikin ew in. De, ji bo pirsa rol û zanîna ku ew çawa berê kirîbû, divê bi roleke nûha ve girêdayî ye. Çawa dibe ku ew li ser rola têkiliyê re alîkar bê û dema ji wê re pêwîst e, yek ji rewşên ku dijwar be.

Li vir, di dewama wê de divê ku mirov werênê ser ziman ku zarok, wê di vê demê de li ser bixwe bawerbûnê re wê alikariyê bike. Wê bixwe bixwezê çê bike. Her wusa, wê li ser ziman re wê her wusa rewşek fahmkirinê ji xwe re derxe li holê. Zarok, di vê demê de wê bii têkilî, kirin, nêzîkatî, ziman û hwd re wê weyn û rola xwe ya di jîyanê de wê rengê wê bide dîyarkirin. Wê li ser kirin û tevgeran re wê nêzîkatîya xwe ya nasnemeyî ya jîyanî wê bide dîyarkirin. Her wusa wê bi wê re jî wê zarok, zimanê xwe derxê astek bi şêwayê wê re bide dîyarkirin. Zarok, wê di vê demê de li ser ziman û jîyane xwe re wê rola xwe bide dîyarkirin û nasnema xwe bide pêşxistin. Rengê jîyane zarokê, bi zimanê wê re wê nasnema wê û têgîna wê ya nasnemayî wê bide pêşxistin.

Bi vê dema zarokê de divê ku mirov li ser ziman re nasnemê, li ser jîyanê û jîyankirina wê re wê rol û lefleksa xwe ya jîyanî pêşbixe û wê li ser wê re xwe bide nîşandin.

Pêşveçûna zarokê a salên 6´an, wê weke pêşveçûneka ku ew bi xwe re dikarê gelek tiştan biserê xwe bike bê. Lê di vê demê de zarok, wê di vê salê wê nikaribê bi tememî çeng û destên xwe bi rehetî bikarbênê. Wê hinelek astengî li pêşîya wê bi wê re hebin. Lê ev rewş, wê di dema bûhûrî sale xwe ya 7´an û hwd, derbas bibê. Di vê sale 7 û 8´an de wê zarok, zêdetirî bixwe wê derkeve li holê. Wê lefleksên zarokê xort bibin. Bi wê re jî, wê karibê, di gelek waran de wê lefleksa xwe bikarbênê. Zarok, wê hem ji aliyê laşî ve û hem ji aliyê aqilî ve wê karibê lefleksên xwe bide xabitandin. Wê bidest dayina bersivan di cih de bike. Her wusa, w car bi car bi dayika xwe re, bi bavê xwe re û bi hinek mazinên din ên li dora wê re wê karibê were berhevdû û bi wan re bikeve nîîqaşê û bide berwan. Zarok, wê xwe di bin gotinên ku ew ji wê bikin de wê nehêlê.

Wê zarok, di heftsalîya xwe de wê bidest bikarhanîna telefona destan bike, wê lîstokên nû ên ku ew di wê demê de bi wan dileyizê wê ji xwe re peyde bike. Lê di vê demê de lîstokên wê, wê bi teybetî bina lîstokên xîyalî. Di vê demê wê lehengên xwe yên xîyalî wê biafirênê. Wê keseyetîyên ku ew ji xwe re weke mînaq bigirê, wê kifşbike û bihilbijêrê. Zarok, wê di vê demê de wê bidest kifşkirina xosletên baş û ne baş bike. Wê kîjan xoslet bi wê re hebe, wê bidest hizirkirina li wê bike. Bo vê yekê ya ku ew bi mereqî di mejiyê xwe de wê hewl bide ku ew kifş bike.

Dema ku zarok, ji yeksalî, dûsalî û heta sêsalî jî, wê di qirêşê û hwd de wê keçzaroyan bikarîya di gelek rewşan zêdetirî heya xwe biafiranda. Lê di vê demê de wê keçzaro, weke ku zêdetirî wê mêyla wê li dunya hundûrê wê bê. Wê pirr zêde di hundurê xwe de wê xwediyê hizirkirin û dunyeyek kûr û pirr zêde ku ew li wê dihizirê bê. Kûrzaro jî, wê zêdetirî li derve bin, rewşên weke leyistina bi hevalên xwe re, leyistina bigogê, bi bazdanê û hwd re wê zêdetirî derkeve li pêş.

Zarok, di vê demê de wê karibê bixwênê û binivîsênê. Wê karibê çîrokan bixwênê û li wan bihisênê. Qarakterê ji nava çîrok û vegotinan kifş bike bi xosletên wê re. Bo vê yekê, di vê demê de zarok, xwandinê bike û her wusa pirtûkên ku ew di CD´yan de dihên xwendin ku ew li wan dihênê, wê baş fêrbûnê ji wan bigirê. Zaroka vê demê de zêdetirî bidest fêrbûna hisandinê kirîya û ev teybetî jî, weke teybetîyeka giring a vê salê ya ku ew bi zarokê re pêşbikeve. Di vê demê de wê zarok, demekê di jîyane xwe de vekê. Lê wê bi wê re demekê bide girtin jî. Nîşanaka vê jî, ew a ku zarok, wê di vê demê de bidest lîstokên xwe yên salên bûhûrî wê bidest ji dest derxistina wan bike. Wê êdî wan weke ku ew nexwezê. Wê leyistên berê ku ew bi wan dileyist, wê êdî ew bi wan

ne leyizê. Wê leyistikên nû, wê ji xwe re kifş bike. Wê zêdetirî bixwezê ku demê ib hevalên xwe yên ku ew bi wan re di heman temenê de ya bi bûhûrênê. Wê biaxifê û wê dema ku axift jî wê, carna bi dengê bilind û carna jî bi dengê nizm wê biaxifê. Dema ku ew dileyizê, wê di leyistikê de wê rol û ankû qarakteran jî bileyizê.

Di vî salî de, gelek caran em dibînin ku keçên bi kurikan bixwezê bileyizê, û kur jî wê bixwezê ku bikeçikan re bileyizê. Zarokên piçûk gelek caran dibêje dema ku pêlîstokên ku bi wan bilîze "e bi awayekî" kevn bûna. Zaroka heftsalî, wê lîstokên xwe dibijêrê. Hevalên xwe dibijêrê. Ew, xwe di nava çalakiyê de û bi hevalên xwe re xwe bibînê. Zarok, êdî heftsalîya û nûha di pêvajoya ku ew nas bike û bi komeke ji derveyî malê re ya di heman temenê de ya xwe bicih dike û bi wê re xwe dijî. Di dawiya dawî de zarok, ew dê cihê xwe di nav vê komê (´xwe aîdî wê´) de bibîne.

Zarok, di vê demê de ew êdî wê weke zarokek mazin bê. Wê heta ku wê pereyan jî weke pereyên berîkê wê bixwezê ji dêûbav. Wê ew, bidest hanîna li ser ziman a pêdivî, xwestek, tercîh û xweşikatîyên xwe. Zarok, di vê demê de wê di asta dawî de wê xwe bi zanebûn bike. Ew êdî miroveke ku wê bidest perwerde kirîya û di wê re wê êdî xwe pêşbixe û jîyane xwe zêdetirî bi aqilê xwe bijî.

.

**Zaroka ku ew gihiştîya salên xwe yên 8, 9 û 10 û ji zarokatîyê derbasbûna li dema ciwaniyê.**

Ji sale 8´an û pê de wê zarok, êdî wê di pêvajoyek teybet a xwe de bê. Wê zarok, êdî wê êdî mazin bibê. Wê bi aqilê xwe re wê bidest nerîna li dunyê bike. Di vê demê de wê zarok, xwediyê alaqayên mazin bê. Wê hobiyên xwe biafirênê. Wê bidest birengkirina jîyane xwe bike. Wê hewirdora xwe nas bike. Zimanê zarokê di vê demê de ji aliyê rêzimanî ve bê û ankû ji aliyê pêşketinên xwe yên zimanî ve wê xwe bi awayekî pergalî bide dîyarkirin.

Zarok, wê di vê demê de wê ji aliyê fîzîkî ve wê di nava aktiveteyekê de bê. Wê zarok, hertimî, bi tevger bê. Wê bidest leyistina gogê bike, bibazê û wê aktiviteyên bi vî rengî ên ku hena wê zarok di vê demê de wê bike. Di vê dema xwe de wê zarok, zêde bi tevger û bazdanê de bê. Wê weke berê ji aliyê dêûbavê xwe ve ne xwediyê wê alaqaya mazin bê. Ew, êdî zarokekî ku dikarê xwe li ser lingê xwe bigirê. Bi tenê serê xwe dikarê rêwîtîyan bike. Herê dibistanê û werê malê.

Di vê demê de wê zarok, wê bidest nîqaşkirin û dana berhevdû bi dêûbav û ahlên din ên malê re. Wê pirsan zêdetir bipirsê.

Ev dema zarokê wê weke demek teybet bê. Zarok, wê di vê demê de wê çûnûhatinê li ser têkiliyên dêûbav re wê bijî. Gelo dêûbav, baş hêsê dikin û ankû na. Zarok, wê pirsên bi vî rengî wê ji xwe bike li ser kirin û nêzîkatiyên dêûbav re. Li vir, kêm nêzîkatî nîşandina li zarokê di vê demê de wê karibê zarokê bihesanî ji malê jî bide dûrkirin. Wê, ji aliyê derûnî û hêstîyarî ve navberê bike nava wan de. Her wusa, di vê demê de wê weke ku du rengên jîyanê bi zarokê re wê hebin. Yek, jîyane li malê ya. Ya din, ku jîyane li dibistanê jî di nav de ew jîyane li derve ya. Her wusa, wê zarok, di nava wan herdûyan de wê ahengekê di jîyane xwe de ew dema ku dest bi dibistanê dike wê bide çêkirin. Lê ev aheng, hertimî bi mêl a ku w carna bi aliyê dê û bav de giraniya xwe bide nîşandin. Û wê ji demna jî wê bi aliyê jîyane derve ve wê mêla xwe bi zarokê û bûhûrandina demê li derve ve wê bide nîşandin. Her wusa, zarok, wê di vê demê de bizarokê ku ew zêdetirî demê li derve derbas bike. Lê wê wusa car bi car destûrê jî ji dê û bavê xwe nestênê. Li ser wê, wê bi wan re bikeve qirika hevdû de jî. Wê, ji wan re bibêjê ku ´ez dixwezim ku ez herim û bi hevalên xwe re werima cem hevdû. ´Û ankû, wê bibêjê´ ezê herim û bi hevalên xwe re bileyizim. ´ Ev jî wê, carna bersiva ´na´ ji dê û bavê xwe bo wê bigirê. Zarok, wê bi vê re wê vê rewşê weke ´mudahaleyekê´ li vîna xwe bibînê. Zarokê, hin bi hin vîna xwe kifşkiriya û ew di bin bandûra wê azadîya ku ew bi wê re dijî de bê. Bo vê yekê, wê ew qadaka jîyanê di mejiyê xwe de wê ji xwe re bide çêkirin û wê nexwezê ku ti kesek zêde mudaheleyê li wê bike. Ev rewşa zarokê, wê weke rewşek teybet a ku mirov divê ku wê bi teybet hilde li dest a. Li vir, baş fahmkirina zarokê, di vê temenê wê de, wê temenê baş têkilî danîna bi wê re jî bê. Bi vê yekê, li vir, divê ku mrov hinekî baş li ser vê rewşa zarokê bisekinê.

Zarok, wê di vê dema xwe de wê destûrn xwe yên jîyanî wê bidest afirandinê bike. Wê sînorê xwe yê keseyetî biafirênê û wê bixwezê ku tu kesek ji wê sînorê derbas nebê. Di vê çerçoveyê de wê têkiliyê bi hewirdorê re wê dênê. Di aslê xwe de têkiliya bi zaroka di vê temenê de wê ji ya zaroka yeksalî, dusalî û sêsalî ji gelek aliyan ve ne cudatir bê. Çawa ku wê ji hinek aliyan ve zor ku dêûbav têkiliyê di wan deman de bi pêşketina zarokê re dênin, wê biheman rengê û şêwayê wê di vê demê de wê wusa zor bê.

D vê demê de wê zarok, pirsgirêkên keseyetîyê wê zêdetir bijî. Wê zaroka ku ew ketîya sale xwe ya heştsalî û piştre jî dijî, wê bixwezê ku ew weke mazinan nêzîkatî û muamele lê were kirin.

Di vê demê de wê dêûbav, wê hertimî, bi pirsgirêka ku zaroka wan li wan ne hisênê re wê alaqadar bibin. Wê hertimî jî vê pirsgirêkê werênina ser ziman. Pirsgirêka dêûbavê a xwe dana hisandinê, wê di vê demê de wê bi zarokê re pirr zêde wê hebe. Zarok, wê di vê demê demê de wê, vê rewşê jî bijî. Zaroka heştsalî û ankû ji wê temen dirêjtir, wê xwestina nêzîkatîya weke ya mazinan li xwe wê bixwezê. Lê dema ku ew vê nebînê jî, wê ji gelek aliyan ve wê xwe ji têkiliyê bigirê. Wê dunya hundûrê xwe ji têkiliyê re bigirê.

Di vê demê de zarok, têkilî bi wê re danîn, wê di aslê xwe de pirr zêde giring bê. Wê pirr zêde xesas bê. Gelek dêûbav, wê bi pirsgirêkên têkilîdanînê û fahmkirina zaroka xwe re alaqadar bibin di vê demê de. Di vê demê de gelek dêûbav, ev gotin hanîna li ser ziman. Bo zaroka xwe ya vê temenê gotina ku ”ez êdî wê nas nasnekim.” Di wate ya ku ew nikarê têkiliyê bi zarokê re dênê, zarok li wan nehisênê û hwd de vê dibêjê. Zarok, di vê demê û temenê de ew, heta ku mirov bi hêst û temenê wê re têkiliyê nedênê, mirov wê nikaribê bi wê re jî têkiliyê dênê. Ji aliyê têkiliya hêstîyarî ve ya ku em qast dikin ew a ku weke dêûbav, ku mirov zarokê fahm bike. Dema ku ew xamgîn bû û ankû ji xwe biêş bû, mirov li cem wê bê. Her wusa, dema ku ew li xwe hat girtin, hertimî mirov herê cem û biwê bide nîşandin û fahmkirin ku weke dêûbav, mirov hertimî li wê dihizirê û ew di aqilê mirov de ya û li cem wê ya. Zarok, wê van peyaman baş û di cih de hîs bike. Ber ku zarok, pêwîstîya wê ya bi alaqayê û fahmkirinê heya. Di vê demê de wê zarok jî hertimî bihizirê ku ew nayê fahmkirin. Bi wê re wê dem bi dem bihizirê û bikeve fikaran de ku ew ji aliyê dêûbavê ve û ankû mazinên xwe ve weke berê nayê hêskirin. Wê vê jî kû derxe? Wê ji şêwayê têkiliyê û alaqaya wan ya li xwe ku ew didina nîşandin, wê ji wê derxe. Dema ku demekê alaqa baş bê, wê vê weke nîşanaka başbûnê fahm bike. Lê dema ku weke dêûbav, demekê mirov ne li xwe bê û di nava kar û xabatê de xwe winda kiribê û zarok ji bîrkiribê, wê zarok, vê weke rewşa jibîrkirin û ne hêskirinê wê bixwênê û hilde li dest ji aliyê xwe ve.

Dema ku zarokê bi vê rengê nêzîkatîya dêûbav di mejiyê xwe de xwend, wê êdî xwe dûr bigirê. Wê ew jî, êdî bertekan li wê rengê xwendina xwe bide dîyarkirin. Gelek ne hisandinên li dêûbav, û her wusa xwe ji wan dûrkirina zarokê, wê weke berteka li xwendineka bi vî rengî a

li ser dêûbavê re bê. Di aslê xwe de ev nêzîkatîya zarokê a weke ku ew nehisênê û ankû gûhdar nakê, wê weke bertekek zarokê bê. Weke ku çawa ku zaroka yeksalî, dema ku ew birçî dibê, binxwe di lewitênê û hwd, digirî û bi wê girîyê xwe dike û dixwezê ku wan xwestekên xwe bi wan werênê li cih, wê bi heman rengî ev berteka zaroka di vê temenê piştî heştsalîyê de jî wê bo kişandina wê alaqayê li ser xwe bê. Wê zarok, bi wê bertekê re ji dêûbavê xwe re bixwezê bibêjê ku ew, win di vê demê de ji min dûrketina û we ez ji bîr kirima´, ez jî vê dibînim û dixwezim ku wê ji nêzîkatîya xwe derbas bikin. Zaroka, vê demê, çendî ku ew êdî wê êdî bi serê xwe ji malê derkeve, li derve bi hevalên xwe re bileyizê û jîyane xwe li derve derbas bikê jî, wê hertimî mihtacê alaqaya dêûbav bê. Alaqaya dêûbav a vê demê de wê weke hêzeka bixwe bawerbûnê, wê bide zarokê. Dema ku zarok, bi van pirsgirêkan re ket nava gengêşîyê, wê di serî de wê ji aliyê vîna xwe ve şikeştinê bixwe. Wê bixwe bawerbûna xwe winda bike. Wê xwe bi tenê hîs bike. Wê tevger, kirin û nêzîkatîyên bertek û hêrsbûnê bide nîşandin. Hêrsbûnên zarokê, di aslê xwe de nîşanaka ku ew xwe bi tenê hîs dike ya. Divê ku mirov hêrsbûn û bertekên zarokê di vê çerçoveyê de wan hilde li dest.

Dema ku zarok li derve ya û ankû li dibistanê ya, wê wê valahiya xwe ya ku ew ne li cem dêûbavê xwe ya wê bi hevalên xwe yên dibistanê re wê bike ku dagirê. Her wusa, zarok, heta ku ew tê nava salên xwe yên 5 û 6´an jî wê, karibê xwe biavêjê dawa dêûbavê xwe. Wê her dema ku wê pêwîstî bi wê dît, wê herê cem wan. Wê, alaqaya wan bixwezê. Lê zaroka heştsalî, w ne wusa bê. Wê xwedî keseyet bê. Û wê di çerçoveya wê keseyetîya xwe de wê, nêzîkatiyê bixwezê. Zaroka heştsalî wê hem nêzîkatîyê û hêskirnê weke ya zarokek 5 û 6 salî wê bixwezê ji dêûbav û hem jî wê keseyetîya xwe derxe li pêş. Her wusa, ji ber wan destûrên ku zarokê di vê temenê de ji xwe re çêkiriya, wê ew jî rehetî tevnegerê. Bo vê yekê, wê hertimî gava pêşî ji dêûbav bixwezê. Ew, zarokek bi heval a. Ew weke zarokek piçûk naxwezê ku ew were pêşwazî kirin. Heta ku wê carna, ne xwezê ku ew di nava xalkê de dêûbavê wê, destê xwe dênina ser serê wê û wê hês bikin. Ber ku ew, di vê demê de dixwezê ku xatekê di nava keseyetîya xwe û wê dema xwe û zarokatîya berê de xîz bike. Heta ku gelek caran, dema ku zaroka di vê temenê de ku ew bi dêûbavê xwe re ketîya nîqaşê de wê, ji wan re gotîya ´ez, êdî ne zarok im.´ Bi vê rengê berteka xwe daya dibê ku li devê dêrî dabê û derketê jî bûbê.

Lê piştî ku zarokê berteka xwe da nîşandin û li devê dêrî da û derket jî, wê hêstaka wî li hûmdûr bi dêûbavê wê re bimênê. Dema ku ew li devê

dêrî dide û derdikeve derve jî bixayd, wê bi hêstekê bixwezê dêûbavê wê li şûn wê derkevin û werin û wê pêşwazî bikin. Dilê wê hildin. Dilê wê xweş kin. Bidina nîşandin ku ew çendî hêsê wê dikin. Çendî dilê wan bi wê ve ya. Zarok, wê pirr bixwezê ku van hêstan ji dêûbav û nêzîkatîya wan hîs bike.

Di vê demê de weke dêûbav, çendî ku mirov herê bike ku zaroka mirov maziya bû û hatîya sînorê ciwaniya xwe jî, lê divê ku mirov jibîr nekê ku ew hê hinekî zaroka û wê alaqaya dêûbav ji dil dixwezê. Bi vê yekê re mirov dilê xwe ji wê re bide nîşandin. Çendî ku zaroka vê demê, weke ku ji derve wê dem bi dem girtîbê, lê dema ku ew nêzîkatîya dêûbav dît, wê di cih de xwe ji wan re vekê.

Lê wê di vê demê de serbilindîyek bi zarokê re wê çê bibê. Her çendî ku ew keseyetîya xwe pêşdixe, wê ev serbilindî bi wê re zêdetir pêşbikeve û derkeve li pêş. Zarok, wê hertimî bi wê û bandûra wê re carna wê, nikaribê xwe bi tememî baş werênê ser ziman. Hinek nêzîkatîyên ku ew dixwezê bide nîşandin, wê nikaribê bide nîşandin. Wê hinek hêst li pêşîya wê asteng bin. Hinek hêstên weke ku wê hertimî di mejiyê zarokê de wê ji wê re bibêjin ku ´tu êdî ne zarok î. Xwe ne berde. Bihêlê ku ew te weke mazinekî herê bikin. Dema ku ew wusa weke mazinekî nêzî tê nebin, ew te fahm nakin û hês te nakin.´ Ev gotinên ku wê rastîya hêstarîya zarokê a vê demê werênina ser ziman, wê hinekî rastîya temenê pirsgirên ku ew dijî jî wê bixwe re werênina ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê di vê demê de wê van pirsgirêkan bijî. Dema ku zarok, ji aliyê mazinên xwe ve ew fahmkirina ku ew dixwezê ku ew bikin ku ew nekin, wê ev temenê zirerekê jî bê ji pêşketina zarokê a mejî û keseyetîyê re jî. Wê bandûrê li qarakterê wê jî bike. Ev hêstên ku zarok, bi herdû aliyan ve dijî, wê bi zarokê re xwe di vê demê de bidina nîşandin. Minaq, wê demna bixwezê ku ew li malê bi tenêserê xwe bê. Lê bi wê re jî wê bixwezê ku ew hêskirina dêûbavê xwe hîs bike ji wan. Dema ku dêûbavê zarokê ne li mal bin, wê li malê bi tenê bê. Wê vê ji xwe re baş jî bibînê. Her çendî ku zarok, bi tenê di xwe de ma, wê li dunya hundurê xwe biponijê. Wê di wê de bijî. Ev jî, wê dem bi dem, wê têkiliya wê ji dunya derve jî bi birrê. Bi wê re jî lê zarok, dema ku ew bitenê li malê dimênê, ew dixwezê ku wê keseyetîya xwe bitenê hîs bike. Weke ku ew dixwezê ku ew keseyetîya xwe di ezmûnan de derbas bike. Bi vê rengê, ew di aslê xwe de wê, bi keseyetîya xwe re di nava çûnûhatinê de bê. Ji xwe hemû pirsgirêkên ku ew di vê demê de ew dijî, wê pirsgirêkên keseyetîyê bin. Wê pirsgirêkên

ji keseyetîyê bin. Her wusa, zarok, keseyetîya wê bidest afirîna xwe kirîya. Qarakterê xwe daya li derve. Dide nîşandin. Lê hê bi xwe ne bawer a ku ew dikarê bi tenê biserê xwe biserkeve û ankû na. Di vê demê de dema ku ew pirsgirêkan dijî û dibînê ku ew nikarê biserkeve li hemberê wan, wê ev vîna zarokê a keseyetîyê jî bi xwe re weke ku wê bişikênê. Bo ku zarok vê nejî, di serî de hertimî li cem wê xwe dana hîskirinê a dêûbav, wê ji zarokê re jîyanî bê.

Di vê demê de wê aqilê xwe di dahûrkirin, şîrovekirin, fahmkirin û salixkirinê de wê bikarbênê. Zarok, wê dîmenekî xwe bi aqil biafirênê. Her wusa, wê ew keseyetîya xwe ya ku ew di mejiyê xwe de afirandîya, wê bixwezê ku ew bi wê ji aliyê mazinên wê ve werê herê kirin. Di vê demê de pirr giring a ku mirov weke mazinên zarokê, bi zimanekî çêker têkiliyê bi wê re dênê. Dema ku mirov rexne jî li zarokê bigirê, mirov bi gotinên dijwar neçê ser. Çendî ku mirov wê rexne bike jî, lê bi wê re hertimî divê ku mirov bide nîşandin û hîs kirin ku ew bo dêûbavê xwe pirr hêja ya. Qadrê wê pirr zêde heya. Dema ku mirov ew rexne kir jî wê zarok, bi wê êdî wê xwe bi tememî xirab hîs nekê. Hertimî, kirinên ku ew dikarê wê bike û wê bi wê serbikeve bi wê bide kirin û li ser wê re ji wê re werênê ser ziman ku re çendî serkevtî ya. Wê heyraniya xwe bo wê serkevtina wê û wê werênê ser ziman. Li vir, jî di vê xalê de divê ku mirov heyîder bê. Divê ku mirov nedê nîşandin ku ew tenê dema ku ew serkevtîya bo mirov hêja ya. Divê ku ew bê dayîn hîskirin li zarokê ku ew bêî wê jî çendî hêja ya. Dema ku zarokê ev hîs kir, wê bi wê re wê di vê dema xwe de wê vîneka qayîm wê bi xwe re karibê biafirênê û bide nîşandin.

Ev dema zarokê, wê weke demek giring bê. Dema zarokê a heştsalîya wê, wê weke demeka zarokê bê ku zarok di wê de karê aqilê xwe û laşê xwe baş bikarbênê. Di vê demê de wê laşê zarokê wê xwe pêşbixe, wê muskuletûrên zarokê, wê pêşketî bin. Wê di meşa xwe de wê lingê xwe û wê di bikarhanîna destê xwe de wê destê êdî wê baş bikarbênê.

Ev dema zarokê, wê weke dema ku ew êdî bi vîn a. Wê vîna wê derkeve li pêş bi wê re zarok, wê jî bi xwe re bide nîşandin. Her wusa, zarok, dema ku wê vîna xwe bi xwe re kifş dike, wê xwe bi wê re mazin bibînê û hîs bike. Bo vê yekê ya ku wê zarok, dem bi dem wê bikeve rik û li dijê hevalê xwe de û wê bi wan re pevçûnan jî bike. Pevçûnên zarokê ên vê dema wê, wê her wusa, wê pirr zêde hebin. Pevçûûnên zarokê, wê bi zêdeyî li ser nelevkirina di leyistikê de bê, li ser gotinaka nebaş ku ew ji hevalekê xwe his bike bê û ji ber rewşeka ku ew bi wê re bi zarokê re

ne di heman nerînê de ya, wê bikeve ber, rik û bi wê re pevçûnan bike. Zaroka heştsalî, wê ji aliyê hişê xwe ve jî pêşketî bê. Her wusa, mejiyê wê yê ciwan ê zarokî, wê pirr zêde aktiv bê. Zarok, di vê demê de wê ji aliyê rewşa fahmkirina  ji rûdêna mirovên li hemberî xwe ve jî wê pirr baş bê. Ew, di vê demê de wê qasî derûnvanekê hosta bê ku ew dema ku li rûdêna mirovekî dinerê ku ew bihêrsa û ankû ne bihêrsa.

Ev dema zarokê, weke demek serûbinkirin û qolaşankirinê bê. Wê di vê demê de zarok, wê di cihê xwe de nesekinê. Her wusa bi wê re dilê dêûbavê xwe jî hilde û dênê. Zarok, wê di vê demê de derkeve derve û wê û newê malê. Dêûbav, wê pirr mereq bikin. Dema ku zarok, hat malê wê dêûbav wê êdî wê hildina hemberê xwe û wê bipirsin ku ew li kûderê bû. Ew jî, wê bibêjê ´ez, bi hevalê xwe re bûm´ Yan jî, wê bibêjê ku ´ez bi hevalên xwe re gog dileyistim.´. Yan jî wê bibêjê ku ´ez li dibistanê bi hevalên xwe re mam.´ .. Bi vê rengê wê zarok, wê gelek hêncetan ji ne hatina xwe re wê werênê ser ziman. Dêûbav jî, wê jê bixwezim ku ew hertimî zû were malê. Heta ku wê ew bihevdû re li ser vê rewşê bikevina qirika hevdû de û wê bihevdû re nîqaş bikin û wê car bi car gotinên xirab jî ji hevdû re bibêjin. Ev jî, wê bi xwe re hem şikeştinê hem bo zarokê werênê û hem jî bo dêûûbav. Hevdû di serê hevdû de bi vê rengê dişikênin. Dema ku wan hevdû di serê hevdû de şikand, wê zarok li dêûbavê xwe ne hisênê. Wê zarok jî dibê ku ew li berçav dêûbavê xwe ji ber kirinên xwe yê ku ew neacibênin, wê di çavê wan re reş bibê. Her wusa, di serî de ya ku divê ku dêûbav li wê heyîder bin wê ev bê. Li vir, wê baş bibê ku mirov hinekî li ser têkiliya bi zarokê re kûrtir bisekinê û wê baştir wê fahm bike. Bo zaroka vê demê de jî wê ev pirr zêde giring bê. Tevî ku zarokê xirabî kirin,  nexûrîna dêûbav biser zarokê de wê pirr baş bê. Zarok, di vê dema xwe de wê di demek teybet de wê derbas bibê û divê ku ew bi wê dema wê re werê fahmkirin. Hertimî têkiliyek baş ku zarok xwe bi wê hêja dibînê bi wê re dênin. Ya ku di aslê xwe de zarok, di vê demê de ew mihtacê wê jî wê ev bê. ..

Zarokê ji salên xwe yên 4 û 5´an ve ew êdî di wê têgîna zayendî de ya. Ew ku kûrik bê, dizanê ku ew kûr a. Û ku ew keçik bê, ew dîsa dizanê ku ew keçik a. Di vê çerçoveyê de wê zarok ji vê demê û pê de, wê çendî ku heya wê li ser zayendîtîya wê bê jî, wê bi wê re ew zayenda duyem ku dervî xwe ku keç bê û ankû kûr ku kifş kiriya wê li wê bihizirê. Wê hewl bide ku wê jî tefkîr bike. Wê hewl bide ku wê fahm bike. Ev jî, wê dem bi dem heya zarokê bênê ser zayenda din a din. Ku ew bixwe keç bê, wê heya wê herê ser kûrikan û wê heta ku ew bixwezê ku ew lîstikê jî bi

kûrikan re leyizê. Bi heman rengî ku ew kûr jî bê, wê heya wê herê ji keçikan wê hizra hevaltiyê wê di serê de çê bibê. Lê di vê demê de zarok, ew demên xwe yên ku bi hemzayendên xwe re bûhûrandina, têgîneka zayendî a baş û xort li ser rewşa wî bixwe bi zarokê re daya çêkirin. Êdî di wê rewşê de ew bifahm a. Bi vê re jî, ew dixwezê ku ew zayenda din jî, wê fahm bike. Ev rewşa zarokê, ji salên wê yên ji 5´an û pê de wê, zêdetirî bi wê re pêşbieve, Heta ku heştsalîya xwe, wê bi vê rengê, êdî wê rastîya zayendî a keçik û kûrik, wê di serê wê de bifahm bibê. Li ser vê re jî, wê êdî hizra xwe gihandina cem zayenda din a ku ew li hemberê wê heya, wê bi zarokê re çê bibê. Zarok, wê pêşî pirr bixwezê ku ew, ku ew kûr bê wê bixwezê ku bi keçikan re leyistikan bileyizê. Vajî wê jî, wê keçikan re çê bibê. Ev mêyla wan ya wê bi leyistikê wê çê bibê, wê piştre di salên 8´, 9´ û 10´an û hwd ve, wê hin bi hin reng bigûharênê.Wê di vê demê de wusa bizêdeyî hizrên ´evînatiyê´ û ´maçkirinê´ û hwd, wê bi zarokê re wê pêşnekeve û dernekevê li pêş. Zarok, di vê demê de ew tenê bi têkiliya hevalîyê re alaqadar dibê di mejiyê xwe de. Di vê dema zarokê de wê pêşketina laşê zarokê ê ji aliyê fizîkî ve wê xwe baş bike. Lê hemû aliyên ku pêş dikevin jî, wê di pêvajoyên piştre de wê ezmûna xwe çê bikin. Heta vê demê jîyane zarokê a salên 8´, 9´, û 10´an jî wê hê pêşveçûnên laşê zarokê wê bibin û xwe temem bikin. Ev pêşveçûn, wê hem ji aliyê fîzîkî ve bin û hem jî wê ji aliyê aqlî ve bin. Zarok, di vê demê de ew hem ji aliyê fîzîkîya laşê xwe ve û hem jî ji aliyê pêvajoyên pêşketina mejîyê xwe û aqilê xwe û her wusa hişmendiya xwe ve ew hê zarok a. Lê divê ku mirov di dewama wê de vê jî bibêjê ku zarok, heta vê salê, wê ji aliyê fîzîkî ve ku ew qaramên wê pêşketina, ji aliyê fîzîkî ve wê ji gelek aliya ve wê xwe temem bike û her wusa ji aliyê mejî û pêşketina mejî a aqlî ve wê bidest kifşkirina dunya derve bihişmendiya xwe bike. Wê xwe ji dunya derve wê vekê. Wê dunya derve wê kifş bike. Ew, w afsûna kifşkirina dunya derve wê di vê demê de wê kifş bike û hîs bike bixwe re. Ya ku wê bike ku zarok, bixwezê ku ew hertimî li derve bê jî wê ev rastî bê. Zarok, di vê demê de wê weke mirovê dema ku ew di şikeftê de dijî û ku ew êdî wê derve kifş bike û ew êdî naxwezê ku vegerihê wê şikefta xwe. Roj ku 24 seat bê, wê nêvîyê wê zarok wê li derve derbas bike. Bi vê yekê, ew zaroka ku heta wê demê weke pisîka malê kedî ya, wê piştre ku dunya derve kifşkir wê barrî bibê. Zarok, pêvajoyên pêşketina hişmendiya xwe, wê bi vê rengê bijî ku ew pêşî di malê de xwe kifş dike û malê weke dunya xwe wê kifş dike û dijî. Piştre, wê weke pêvajoya duyem, wê dunya derve kifş bike û wê derkeve dervî

malê wê êdî li derve bê. Piştî ku wê bi mejiyê xwe re dunya kifş kir û pê de, wê derkeve li ser wê re û wê gerdûnê kifş bike. Bi vê rengê, wê gav bi gav, bi xwe re wê pêvajoyên pêşketinê û pêşveçûnê wê bijî. Piştî ku zarokê, dunya derve kifş kir, wê zor bê bo wê ku ew di malê û hundurê wê de bisînor xwe bihêlê. Lê piştî ku wê dervî dunya derve jî ku gerdûn jî kifşkir, wê bi aqlê xwe wê derkeve dervî dunyê li fezeyê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê pêvajoyna bi aqlî wê bijî. Zarok, di serî de divê ku mirov wateya w baş fahm bike. Di serî de gav bi gav vejînîya jîyanê ku ew pêş dikeve, wê dîmenekî xwe bi jîyane zarokê re bide dîyarkirin. Zarok, çawa ku ew pêşî tirhikek di zikê dayika xwe de dibê û piştre piç bi piç mazin dibê û tê dunyê. Piştre jî, wê li gorî şert û mercên dunyê wê xwe pêşbixe û bijî û bi wê re wê mazin bibê. Hin bi hin, wê mazin bibê. Roj bi roj, hefte bi hefte û sal bi sal wê mazin **bibê**. Wê şêwayê mazin dibê û heta ku ew tê wê dema xwe ya jîyanê û wê wusa jî ji wê demê bi bûhûrê. Ev dema zarokê a nava salên 8´, 9´ û 10´an, wê weke pvajoyek zarokê wê teybet a. Ev pêvajo, wê hem tirhikên dema ciwaniyê a zarokê wê di xwe de bide pêşxistin û bi wê re wê weke demeka zarokatiyê a pêşketî bê. Bi pêşketina xwe re wê heta vê demê de ew zarokatî, wê weke pêşketinek mazin di jîyanê de wê bi xwe re wê bijî. Zarok, hebûna mirovatiyê a ku ew xwe bi wê re li ser fîzyolojikî û aqilî û hwd re ku ew xwe dide domandin a. Zarok, bi rastî, pêvajoyên vê pêşketinê û domandina wê na. Ev dema zarokê a nava van salan, wê demek teybet a vê pêşketinê û rastîya wê bê. Wê di vê demê de zarok, di hundûrê salên weke salên 8´, 9 û 10´an de wê,  têgîna hevalîyê wê bi wate bike û wê bixwezin ku ew bi hevdû re wê bijîn.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê di her temenê û demê de wê rewşa her zarokê wê ne weke hevdû bê. Wê hertimî, cudahîyên teybet ên zarokatiyê wê bi wan re hebin. Ev, heta ku ew mazin dibin jî, wê bi wan re hebe. Ev jî, tiştekî wê bi me bide fahmkirin ku wê her zarok, nêzîkatîyek teybet ya li gorî rastîya xwe wê ji mazinên xwe bixwezê. Ti rastiyên zarokan wê nebina weke hevdû. Ev rastî, wê di vê dema zarokê de jî wusa bê. Zarok, di vê demê de wê bi xosletên xwe re bijî. Sal bi sal w zarok hinekî din mazin bibê. Ji sale heştan û heta ku ew dibûhûr sale nehan, wê zarok, bi bûhûrê li demek xwe ya nû a teybet. Di sale xwe ya nehan de wê zarok, hinekî din wê, bixwe bê. Wê çavên wê li dunyê vebin. Wê hinekî din zêdetir tiştan û zanebûnê fêr bibê. Wê hinek mirovên din li dora xwe wê nas bike û wê têkiliyê bi wan re dênê. Sale

nehan a zarokê wê weke salek teybet ku em dikarin weke salek **zêr** jî bo zarokê jî bi nav bikin û werênina ser ziman a.

Di sale nehan de zarok, wê zêdetir li derve wê dema xwe derbas bike. Wê bixwezê ku ew bi hevalên xwe re demê derbas bike. Wê zarok, hevalên xwe dênê aliyekê û dêûbav û malbatê dênê aliyekê. Her wusa, ji herdû aliyan jî tevger, kirin û nêzîkayên baş wê zarokê bi aliyê xwe ve bidina kişandin. Zarok, çendî ku herdû aliyan jî dixwezê ku ew bijî, wê bi wê re wê pirsgirêkan jî wê bijî. Pirsgirêk, wê çawa ahengê di nava herdû aliyan de dênê. Zarok, di aslê xwe de ew di mejiyê xwe de weke ku ew dixwezê, ew dixwezê ku ew bijî. Bo vê yekê, ew dema ku demê bi hevalên xwe re derbas dike û ankû ew dema ku bi dêûbav û malbate xwe re ew li demê nanerê ku ew dem çawa di bûhûrê. Tenê tiştek, wê karibê demê bibîra zarokê bixe wê aciz bike. Ew jî, pirsgirêkên ku ew di xwe de dijî na. Her wusa, di vê demê de wê ew destûrên ku weke bo ´bisînorkirina zarokê´ li derve ku dêûbav bo ku ew zêdetir dema xwe li malê derbas bike, wê hertimî weke rengekê pirsgirêkê bê di nava zarok û dêûbav de. Zarok, di vê demê de ew di dema xwe ya ku ew li destûrên sînorkirinê nehisênê ya. Vêca dema ku ew derdikevina li pêşîyê, wê weke ´pirsgirêkê´ bin. Wê zarok û dêûbav, li ser wan rewşan re dikarin werina berhevdû. Zarok, di vê demê de ew çendî ku ew pirsgirêkan bi vê rengê bi dêûbav re bijî jî, lê di hundûrê zarokê de wê hertimî dêûbav bo zarokê weke lehengên wê bin. Ev wê weke rastiyekê bê. Dêûbav, divê ku ew di farqê fê rastiyê de bin. Bo vê yekê, tevî ku hertimî ew carna ji hevdû weke ku xayîdî jî bin, hertimî dêûbav li cem zarokê bin. Di fêr û sipartekên zarokê ên malê de ji wê re alikaribin. Bi zarokê re li ser mijarên cidî biaxifin û zarokê bidina ponijin. Hertimî dêûbav, weke rêhevalna zarokê ên pirr biaqil, li cem wê xwe bidina hîskirin. Xwe dana hîskirin jî, wê ne bes bê. Ya giring, wê ew bê ku zarok wê hîs bike.

Zarokên nehsalî, weke zarokna aktiv û bikarîger in. Pirr bi tevger in. Hêz û vejena zarokên vê demê wê pirr bê. Car bi car, hinek dêûbav, di wê xemê de na ku zaroka wan, pirr zêde ne biçalak û ne bi tevger a. Hetimî di cihê xwe de sekinî ya. Bo vê yekê jî, wê zarokê hildin û li pêşîya tv´yan bidina rûnandin ku ew tv´yan temaşa bike. Li vir, weke ku çawa ku divê ku mirov weke dêûbav heyîder bê ku zarok çi temaşa dike, bi heman rengî jî li şûna wê, weke dêûbav bi zarokê re di nava tevger, kirin û aktivîteyan de bê. Bi hevdû re wê bikin. Bi vê rengê zarokê teşwîq bike. Di nehsalîya zarokê de wê, gelek kirinên weke bi zanebûnê re alaqadarbûn, li musîkê û ankû helbest hisandin, ji aliyê fîzîkîya laş ve di

nava aktiviteyê de bûn, li kompûterê rûniştin û ankû bi wê re bûhûrandina dema xwe û hwd, wê gelek qadên alaqa, çêkirina meşkeleyan û biçalakbûnê wê biafirin. Zarok, di vê demê de wê karibê, kirinekê bixwe ji xwe re bibînê. Lê li vir, weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman weke dêûbavek bizane ku dêûbav bi zaroka xwe re têkiliyê dênin, wê karibin, berê mêla wê bidina bi ser kirin û alaqayên baş ên bo wê. Lê bo vê jî, giring a ku ew her kirinê bo zarokê bidina fahmkirinê. Zarok, dema ku ew fahmkirin û di wê de xwe dît, wê êdî ew ji zarokê re balkêş werê. Dema ku ew ji zarokê re balkêş hat, wê êdî wê zarokê wê bê kirineka ku ew bikê. Lê li vir, ya herî giring ew a ku hertimî dêûbav di vê demê de karibin, ji zarokê re bibina weke rêheval.

Lê weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman, di vê demê de wê sal bi sal gûharîn di keseyetîyêû pêşketina zarokê a fîzîkî û gîyanî de wê çê bibê. Zarok, wê di vê demê de wê xwe baş bijî.. karê fahm bike. Karê xwe werênê ser ziman. Karê şîroveyan bikê. Dikarê planan çê bike. Dikarê herê ji xwe re bigerîhê bi hevalên xwe re. Di hundurê van hersê salên ku em di vê beşê de dihênina ser ziman de wê zarok, pirr zêde pêşveçûna bi xwe re bide çêkirin. Zarok ku ew gihişt sale 8´an wê zêdetirî şêwayek pêşketinê bi keseyetîya xwe re bide dîyarkirin. Di vê demê de wê zarok, zêdetirî kifşn bi keseyetîya xwe re bikê û wê wan bijî. Di vê çerçoveyê de wê êdî xwe weke zarok nebînê û wê bixwezê ku ew weke mazinan werê pêşwazî kirin. Têkiliya zarokê ya bi dêûûbav re wê di vê demê de wê, zarok, bidest kirina berlêpirsînê de bike. Wê li dibistanê wê hevalên wê çê bibin. Wê ew jî bikevina jîyane zarokê de. Zarok, di vê çerçoveyê de wê pêvajoyek bi keseyetîyê re di sale 8´an de wê bijî. Zarok, dema ku ew di bûhûrê li sala 9´an, wê li ser vê pêşketina xwe ya bi keseyetîyê re wê xwe bijî û werênê ser ziman. Wê tercîh û alaqayên xwe kifş bike. Wê zêdetirî heya zarokê di vê demê de wê herê ser fêrbûnê. Ber ku wê gelek rewş û tiştên ku ew fahm nekê wê derkevina pêşîyê. Heta ku wê bi wê re wê bidest jîyankirina pirsgirêkên fahmkirinê jî bike. Û wê li ser wê re têkiliyên zarokên ên bi dêûbav re jî wê pirsgirêk di nava wê de rû bidin. Zarok, di vê demê de ew naxwezê ku ew bi sînoran bijî. Ew dixwezê ku derkeve dervî sînorê malê. Lê derve jî nûka kifş dike û hê ne wilqasî bi fahm a di derbarê jîyane derve de. Dêûbav, wê di vê demê de dema ku zarokê bidest nîşandina keseyetîya xwe kir li ber wan û bahse rêzikên xwe kir û çû derve û dirêj ma, wê bidest danîna destûrên bisînorkirinê bikin. Ev jî, wê aliyekî ku wê ew bi zarokê re werina berhevdû bê. Zarok, wê bi wan destûrên dêûbav re wê têkiliya

wan û şêwayê wê jî bike berlêpirsînê de di mejiyê xwe de. Wê êdî bixwezê ku ew weke xwe bike. Ber ku ew jî êdî mirovek bi keseyet a. Lê zarok, dema ku ew tê û digihijê sale xwe ya 10an, wê tevlîheviyên jîyanê û têkiliyan wê bidest kifşkirina wan bike. Wê di vê demê de bi teybetî di sale xwe ya 10an de wê bidest jîyankirina pirsgirêkên ciwanîyê bike. Wê di vê demê de rewşa gîyane wê, wê di vê demê de wê di demên pirr kort de wê bidest gûharînê bike. Zarok, di sale xwe ya 10an de wê rojekê xwe pirr xort û bixwe bi bawer hîs bike. Lê dikarê roja din a duyem, xwe pirr piçûk, kêm û di rewşek windakirî de bibînê.

Wê di vê demê de wê zarok, ev gûharînên ku wê bi keseyetîya wê re zû bibin, wê dêûbavê wê jî hem dem bi dem dibê ku şaş bikin û wan jî biêşênê. Ew zaroka ku di sale 8´an de bidest kifşkirina keseyetîya xwe dike û di sale 9´an de bidest li gorî xwestek û keseyetîya xwe dijî, wê di vê demê de wê weke ku wê êdî wê bikeve zorê de. Wê bidest jîyankirina tangezerîyan bike. Wê keseyetîya wê, weke ku wê di vê demê de wê êdî bixitimê wê lê werê. Zarok, wê gelek rewşên ciwanî ku ew bi wan re hê nûka hevnasînê di vê demê de yanî di sale 10´an de wê, bi wan re rû bi rû hatina wê weke ku zarok  bike tengezerîyê de. Ev dema sale 10an, wê demek pirr giring bê. Zarok, di vê demê de wê demek navberê bijî. Ji sale 8´ û´ 9´an ve wê ew demek bûhûrîner a ji zaroktiyê û ku ew keseyetiya xwe kifş dike dijî. Her wusa, di vê demê de zarok, divê ku di vê sale xwe ya 10an de serkevtî bê. Her şikeştin, wê di gîyane zarokê de wê di vê demê de w birînên mayînde bide vekirin û wê piştre jî nîşanaka wan  xwe bide domandin. Her wusa, wê di vê salê û ankû demê de wê bidest hîskirna hêstên evîndariyê bike. Heta ku wê hês jî bike. Li vir, divê ku mirov nebêjê hêskirinên dema zarokatiyê û lê ne bûhûrê. Ancamên wê pirr zêde kûr û mayinda na. Wê di vê pêvajoyê de di sale xwe ya 10an de wê zarok van bijî. Zarok, di vê sale 10an de ji aliyê fîzîkî ve xwe pêşketina xwe temem kirîya û li ser wê re pêşveçûnê êdî wê bijî. Ji aliyê gîyanî û hêstî ve, ew êdî pirr baş hîs dike. Hêstîyarîya bi zarokê re wê di sale 10an de wê, zêdetirî pêşbikeve. Wê bandûra wê jî li zarokê, wê pirr zêde bibê. Her wusa wê zarok, vê pirr zêde mazin bijî. Lê di vê demê de wê zarok, wê di sale 110an de wê hinek gûharînn giring ên fîzîkî jî wê bi laşê xwe re derbas bike.

Zaroka dehsalî, weke zarokeka ku ew zêdetir bi hêstiyarî ya û pirsgirêkên ku ew kifş dike, ji wan re dikarê bo çareserîya wan bihizirê. Her wusa bi wê re jî zaroka dehsalî wê weke zarokeka bi aqil û zane bê. Ji xwe, ya ku wê di nava dêûbav zarokê de wê bê temenê pirsgirêkê wê

ev jî bê. Zarok, bi aqilê xwe dibînê. Ew çawa dibînê û hîs dike, dixwezê ku ew wusa were herê kirin. Heta ku ew dema ku dihizirê dimejiyê xwe de ew di têgihiştineka wusa de ya ku ew dihizirê ku ew dikarê her tiştî bike bê. Zaroka dehsalî, wê baştir bê ku ew êdî karibê stretejîyan bo çareserkirina pêşbixe. Her wusa, wê planan di serê xwe de çê bike û wê hewl bide ku wê bênê li cih. Di vê çerçoveyê de wê çawa wê planê werênê li cih jî, wê li ser wê bihizirê û wê hûrgilên wê di mejiyê xwe de wê biserekeyî wê kifş bike. Zaroka dehsalî, wê baştir bê ku ew hûrgilên rewşan di mejiyê xwe de bigirê û jibîr nekê. Pirsgirêkên ku ew derdikevina pêşîyê, ku ew bi hêza xwe ya fîzîkî nikaribê wan çareser bike, herî hindik, wê di mejiyê xwe de wê karibê kifş bike ku ew pirsgirêk çareserîya wê çî ya. Her wusa, zaroka dehsalî wê dema ku ew li ser çareserîyê dihizirê, wê gotina mifte ya çareserîyê wê kifş bike. Di dewama wê de wê, plangerîyê çê bike bo çareserkirina pirsgirêkê.

Zarok, di vê sale xwe ya dehan de baştir û jîrtir dibê ku ew dikarê cûdahiyên di nava hevdû de ku ew karibê kifş bike. Her wusa, dema ku çend zarok, weke heval li hemberî hevdû bin, wê zarok, wê karibê li ser rewş, qarakter û nêzîkatîya wan hevalê xwe kifşkirinan di mejiyê xwe de bike. Ev rewşa zarokê, wê weke ku ew baştir li ser rewş û pozisyona wî û ya hevalên wî ên ku ew bi hevdû re na, wê bê xwediyê fahm kirinê. Bi wê re jî, zarok, wê di vê sale xwe de wê hin bi hin wê tgihê di mejiyê xwe de pêşbixe ku ew ji kîjan aliyê ve kêm a û ji aliyê ve têr a. W zarok aliyên xwe yên bihêz û ên qals, wê bidest kifşkirina wê bike. Ev jî, wê bi zarokê re wê bê temenê wê ku ew bihêz û ankû bêhêz a. Li vir, dema ku zarok van aliyên xwe yên fîzîkî û keseyetî ên biqals kifş dike, wê li ser xwe re bikevê bêhêvîbûnê de di dema domandina jîyane xwe de. Her wusa, wê hizra neserkevtinê û ankû zayîfîyê wê bi wê re çê bibê. Li vir, dema ku zarok, wê pirr zêde mihtacê fahmkirinê bê. Dêûbav, karê wan li vir wê bê ew a ku ew bi zarokê re rûnihin û sedema neserkevtinê û serkevtinê ji wê re werênina ser ziman bi wateya wê re. Ji zarokê re divê ku werênina ser ziman ku miirov di jîyanê de wê rastî rewşên ku ew di wan de serbikeve wê werê û wê rastî rewşên ku ew di wan de sernekevê jî wê werê. Dema ku zarok rastî wan hat, divê ku ew çawa bê û her wusa, divê ku ew çi bike, di serî de zarok, wê ji van aliyan ve wêmihtacê fahmkirinê û têgihiştinê bê. Mazinek jî, dema ku ew carna têkçûnekê di jîyane xwe de dixwe, weke ku ew dunya bi serê wî de werê û bixûrixê wê lê werê. Vêca ev rewş wê bizarokê re bi gelek şêwayan wê zêdetir wê xwe bide dîyarkirin. Bo vê yekê zarok, wê mihtacê fahmkirineka rast a di

derbarê wan rewşan de bê. Dema ku zarok rastî rewşên bi vî rengî bo ku ew ancam û wateya rast ji wê derxe û ew xwe bi tememî di jîyane xwe de ne berdê, ev ji zarokê re pêwîsta ku ew fahm bike. Di jîyane xwe de wê dem bi dem, ji aliyê hêstî ve wê şikeştinê bixwe, wê di rewşna de wê sernekevê û di hinek rewşna wê têk jî herê. Ev rewş, wê weke rewşek teybet a ku em divê ku mirov bi zarokê re fahm bikin û werênina ser ziman. Ev rewşa zarokê a di hinek aliyên xwe de serkevtî bê û di hinek aliyan de wê ne serkevti bê, wê di fêrbûna dersên li dibistanê de jî wê rewş wusa bê. Minaq, carna zarok wê di mijarên felsefeyê û civaknasiyê de wê serkevtî bê. Lê hinekî jî wê zêdetirî di mijarên weke ´matamatîkê´û hwd re wê serkevtî bin.Hinek jî wê di dersên xwezayê de wê serkevtî bin. Hinek jî wê di hinek mijarên din de jî wê serkevti bin. Zarok, wê van rewşan bi xwe re di dema xwandina xwe de wê kifş bikin û wê di mejiyê xwe de wê li ser wê bihizirin. Heta ku wê dem bi dem wê ji xwe bi pirsin ku ew çima di hinek dersan de serkevtî na û çima di hinekan de ne serkevtî na.

Hinek zarok jî di vê demê de wê bixwezin ku ew hertimî serkevtî bin ji yên din. Di holên xwe de wê zarok, wê karibin ahengekê bi hevdû re di çerçoveya wê holê de bi hevdû re çê bikin. Yan jî, wê hertimî çavên wan li ser hevdû bê ku ew çawa tevdigerihin. Zarok, wê di mejiyê xwe de wê dîmenekê li ser wê çê bike. Heta ku ev dîmen hat çêkirin, wê li ser wê re êdî wê bidest girtina hûrgilên biaxiftin, tevger, nêzîkatî û hwd re ji andamên din ên wê holê bigirê. Minaq, dema ku zarokekê li berçavê hemû zarokan tiştekê ku ew hemû li wê bikenin bikê, wê zarok, wê di mejiyê xwe de bigirê. Heta ku ew dema ku hat malê, wê vê ji dê û ankû bavê xwe re bibêjê. Di vê demê de zarok, wê bidest ji hevdû cuda hizirkirina dê û bavê xwe jî bike weke ku çawa ku ew li andamên din ên malbatê, xizm û ankû hevalên xwe yên li holê xwe ku ew bi wan re dixwênê wê bike. Ev rewş, dide nîşandin ku zarok, di vê demê de mejiyê wê, zêdetirî hûrgilan kifş dike û di mejiyê xwe de dihêlê. Jibîrnakê.

Di vê demê de wê zarok, planan di mejiyê xwe de çê bike. Dema ku zarok, di vê dema wê de mamosteyê de gotinek weke ´gotina mifte´ ji wê hanî ser ziman û ji zarokê xwest ku ew li ser vê binivîsênê û ankû wê li ser wê li pêşîya hevalên wê yên din ên li holê ku ew wê bi axiftinê werênê ser ziman, wê zarok, wê vê jî bike. Wê di mejiyê xwe de wê, vekirina vê gotinê û ankû mijarê wê bikê. Wê zarok, karibê, gelek hûrgil, qarakter û rewşên bi wê re bi hûrgilên wê re werênê ser ziman. Di vê demê de zarok, dema ku ew li nava çavên hevalê xwe dinerê, wê ji wan

hêstê bi başî û ankû nebaşî wê bigirê. Di gelek rewşan de wê, di rewşeka ku ew dema ku pêşî dinerê, weke ku ew carna di vê demê de dihênê ser ziman, ”min dema ku lê nerî min hêsê nekir, bo vê yekê jî ez nêzî wî û ankû wê nebûm.” Wê bibêjê ”xwûna wî li min germ nehat.” Bi vê rengê wê gelek gotinan bibêjê. Ev wê bi xwe re tiştekî din jî wê ji aliyê zarokê ve wê werênê ser ziman. Ew jî, wê ew bê ku zarok, bi keseyetîya xwe re bi destûr, rêgez û ankû ´prensîb´ a. Ew, di vê çerçoveyê de wê, bi çerçoveya nerîna xwe re wê binerê.

Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku zarok, wê di vê çerçoveyê de wê di nerîna xwe de wê xwediyê bijartinekê bê. Ew, mirovê ku ew bi wan re tevbigerê û bi wan re hevaltiyê bike, wê binaqênê. Mirovên ku zarokê naqand jî, wê zarokna ku weke wê, ku herî hindik ew zaroka ku wê naqandî hinek tiştên ku ew hêsê dike ku ew hî hêsê bike. Karibê, bi wê re di rewşna de weke hevdû binerin. Di hinek mijarna de xwedîyê nerînna hevpar bin. Di vê çerçoveyê de wê zarok di wan xosletên zarokê ên ku ew xwe bi wan re di zaroka din de dibînê, wê li ser wê re hevaltiyê jî pêşbixe. Her wusa, wê vê wan bikişênê li hevdû. Zarok, di vê çerçoveyê de wê xwe xarîb û beyenî hîs nekê bi wê zaroka ku ew dihilbijêrê ku ew bi wê re hevaltiyê nekê. Di vê demê de wê zarok di vê demê de wê zêdetirî li ser nerîna hevbeş û her wusa ya rast çiya wê binerê û wê bi wê re alaqadar bibê. Her wusa, zarok, wê di vê çerçoveyê de wê di vê demê de wê li ser ´ya rast´ û ya ´ne rast´ re wê têgihiştinekê bi xwe re çê bike. Wê vê derxê têgihiştinê jî. Bi wê rengê, dema ku ew li rewşekê û ankû bûyareka ku di nava du mirovan de bû, wê li ya ´rast´ û ´bimaf´ wê bihizirê û wê hewl bide ku kîjan ji wan mirovan bimaf a û xwediyê maf a di wê rewşê de. Zarok, di vê çerçoveyê de heta ku wê ew nêzî dêûbavê xwe jî bibê. Her wusa, zarok dema ku ji aliyê dêûbavê xwe ve ku ew rastî rewşeka û ankû kirineka ku ew neacibênê ku ew were, wê li hemberê wê berteke dênê û wê gotinên ku ew bikarbênê wê gotinên weke ´ev ne rast a´ û ankû ´ win ne rastiyê li min dikin´ wê bê. Ev dide nîşandin ku wê zarok, xwediyê têgîna ´rastîtîyê´ û ´ne rastitîyê´ bê. Wê di vê çerçoveyê de wê nerîna xwe biafirênê. Ev rewşa zarokê wê rewşek giring bê. Gotina ´rastitiyê´ wê di vê demê de wê ji gelek aliyan ve wê bikeve jîyane zarokê de. Her wusa, dema ku ew cileka li xwekirinê jî bike ku ew kifş bike, wê li vir, wê li gorî gotin û têgîna ´rastîtîyê´ wê tevbigerihê. Wê, çend cilên xwe dênê berxwe(´pêşîya xwe´) xwe û wê ji xwe bi pirsê ku ´wê kîjan ji van rast bê ku ez li xwebikim.´ Ankû, wê di vê çerçoveyê de wê mirovên ku ew bi wan re têkiliyê dênê wê bike ku ew

hilbijêrê. Lê li vir, bijartina hevalan, wê di çerçoveya kifşkirina heman xosletên ku ew di xwe de kifş dike û ku ew wan di yê li hemberê xwe de jî kifş bike, wê li ser wan re têkiliyê dênê û hevaltiyê bike.

.

**Zarok, di nava salên xwe yên 11, 12 û 13´an de wê ji nû ve ji aliyê fizîkî ve biadilê, wê balix bibê û wê bi ber mazinbûnîyê ve herê**.

Ji sala yazdahan û pê de wê zarok bikeve pêvejoyek xwe ya nû û giring de. Ev pêvajoya zarok, wê di wê de destpêka balixbûna zarokê jî wê bibê. Zarok, di vê demê de wê balix bibê. Balixbûna zarokê, wê ji sale 11´an û heta sale duwanzdehen, wê destpê bike. Bi teybetî balixbûna keçikan di sale yazdanhan û sala duwanzdehen de destpê dike û dibê. Balixbûna kûrzaroyan wê hinekî cuda bê. Wê balixbûna kûrzarokan ji sale yazdanhan û heta sala sêzdehen û sale panzdehen wê bibê.

Zarok, wê piştî sale dehan ku ew dikeve sale xwe ya yazdahan wê balixbûna zarokê wê destpê bike. Pêvajoya balixbûnê, mirov nikarê tenê weke pêvajoyek ku zarok ji salekê di bûhûre li salek din şîrove bike. Ji wê zêdetirî, wê gûharîn di laşê zarokê û fizyolojîya wê de rûbidin. Zarok, bi pirranî, wê di pêvajoya van gûharînan de wê bitirsihê jî. Wê bihizirê ku çi ji wê tê. Wê, bersive vê pirsê di destpêkê de di serê wê de nebê. Zarok, bi carekê re dema ku ew rastî wê pêvajoya balixbûnê tê, wê gelek tirs ji laşê wê bi wê re çi bibin.

Li vir, pêvajoya balixbûnê, wê weke pêvajoyeka ku wê di vê de gûharînên fizyolojikî û gîyanî û ankû derûnî wê di wê de bi zarokê re bibê bê. Balixbûn, weke gotinaka ku di kurdî de ku wateya wê, ew a ku dema ku tiştek gihayî bê. Gihabûn, wê navê din ê balixbûnê bê. Gihabûn, yanî dema ku tiştek, rewşek û ankû zindiyek dibê, bidest mazinbûna xwe dike û balix dibê. Balixbûn, serdema gihayîbûnê ya. Gihayîbûn, di afirînê de tişta ku têr afirî ya. Bi gotinaka din, tişt, rewş û ankû zindî, bi pêşveçûna xwe re êdî têrpêşveçûn û ankû têrpêşketin bi wê re bûya ya. Êdî mirov dikarê bahse rewşa wê ya bûyî bike.

Darek jî, dema ku ew tê çandin, heta ku ew fêkiyê xwe bidest dayînê nekê, di nava kurdan de bahse gihayîbûna wê û ankû balixbûna wê nayê kirin. Gihayîbûn, bi demê re bûya gotinaka balixbûnê ku tenê bo tiştên weke çandiniyê û ku ew mazin bûna û gihana ji wan re hatîya gotin a. Lê gotina balixbûnê, tenê weke gotinaka ku ew tenê ji zindiyên weke mirovan re hatîya gotin a. Bi wê re beremberê wê gotina ´gihayîbûnê´, wê bê weke gotinaka ku ji tiştên ku ew tn çandin, ji keçikên ku ew gihana dema zawaca xwe, ji rewşên ku ew êdî gihiştina wê astê ku ew têrbûna re

dihê gotin. Keçikek ku ew gihişt dema zawaca xwe, wê ji wê re bihata gotin ku ew ´ew êdî giha ya´. Ev gotin, wê weke gotinaka nava xalkê bê ku ew di nava civate kurd de wê, bo keçikan bihata gotin. Bo kûrzaroyan jî wê dem bi dem gotina gihabûnê wê biheta ser ziman. Wê biheta gotin ku ´ew gihaya dema zaawacê.´ Her wusa, bi gotinaka din jî, dema ku ji mirovekê re gotina gihabûnê bihata bikarhanîn, êdî ew mirov balixbûya. Ew mirovê ku gotina gihabûnê ji bo wê dihat bikarhanîn, wê bûba weke miroveke ku ew hem bi fizyolojiya xwe gihiştîya û hem jî ji aliyê gîyan û ankû derûnîya xwe ew gihiştîya. Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ew mirovê gihayî, wê weke mirovekê ku ew bi aqilê xwe jî ew balixbûyî bê. Wê wusa ji wê biheta bahs kirin. Piştî salên 11 û 12´an, wê êdî hêvîya balixbûnê ji mirov biheta kirin. Wê li gotinên mirov biheta nerîn, ku mirov çendî dikarî gotinên xwe re bi hevdû re diahengekê de bikar dihanî. Her wusa, wê li aqilê mirov biheta nerîn ku mirov çendî bi aqil xwe pêşketîya û biaqil a. Wê li gotinên mirov biheta nerîn ku mirov çendî dikarî gotinên xwe re bi hevdû re di ahengekê de biwate, zanebûn û bihiş bihanîya ser ziman. Bi wê re wê ji aliyekî din ve jî li gotinên mirov heta nerîn ku mirov çendî di farqê û ankû di hişê gotinên xwe yên ku mirov ew bikardihanî de bû. Ew mirov, wê hişê wê ji mirov biheta pirsîn. Her wusa, di vê çerçoveyê de gotina balixbûnê, wê weke gotineka ku mirov ji vê aliyê ve wê gelek wasif, wê li wê biheta lêkirin. Lê her lêkirinên ku mirov li wê dikir jî, wê lêkirinên ku mirov bi wê biaqil, bizanebûn, ji aliyê fizyolojiîya mirov ve ku mirov pêşketîya, bi wê re ji aliyê gîyanî û derûnî ve jî ku mirov têrmirov bûya ya. Di vê çerçoveyê de weke ku mirov di nava xalkê de li kurdistanê dihênina ser ziman ku ´mirov giha ya.´ Wateyên gihabûnê, wê gelek bin. Ji aliyê xweza ve, ji aliyê jîyanê ve û ji aliyê hebûnê ve wê gelek wateyên wê yên ji hev cuda wê hebin ku mirovan ew bikardihanîn.

Gihabûna zarokê, wê zarokê bi xwe re ji aliyê fîzîkî û gîyanî û derûnî ve jî bide gûharandin. Her wusa, divê ku mirov gotina gihabûnê û ankû balixbûnê, ji aliyên gûharînên fizyolojikî, gîyanî û derûnî ve wê hilde li dest û fahm bike.

Zarok, wê di vê demê de wê bicarekê re wê rastî rewşek nû ya laşê xwe wê were. Her wusa wê bi wê re keseyetîya zarokê wê di xwe de bigûharê û wê xoslet û teybetîyên nû wê bi xwe re biafirênê.Pêvajoya salên nava 11´ û ´12´an wê weke pêvajoyeke destpêka gihabûnê û ankû balixbûnê bê. Bo vê yekê, ev destpêk, wê ji zarokê û heta zarokê wê bigûharê. Bi teybetî li vir, divê ku em binxat bikin û bibêjin ku wê hinek

zarok, zû balix bibin û gavên xwe bi ber balixbûnê ve bidest avêtinê bikin. Lê divê ku mirov werênê ser ziman ku wê ji salên 11´, û 12´an û heta salên 15 û 16an, wê ev pêvajoya balixbûnê wê bi zarokan re wê xwe bide domandin.

Di aslê xwe de zaroka ku piştî ku ew ket sale xwe ya 11´an de mirov dikarê, jê re bibêjê ku ew zaroka ciwan a. Ev pêvajoya zaroka ciwan û ankû ciwaniya zarokê wê heta salên 13´an wê xwe bide domanin. Piştî salên 13´an jî, mirov, dibêt ku wê êdî gotina zaroktiyê zêde bikarneyênê û mirov wê gotina ´ciwaniyê´ bikarbênê. Wê êdî zarok, ji zaroktiyê biqavizê li ciwantiyê. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyekê bi xwe re wê bijî. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zarok, wê di vê demê de wê ew bixwe jî gûharînên di laşê xwe de ên ji aliyê fizyolojikî ve û gûharînên ji aliyê gîyanî û keseyetîyê ve û her wusa gûharînên biderûnî ku wê bi zarokê re bibin, wê zarok wan pirr baş wê di xwe de wê hîs bike. Her wusa, zarok, wê van gûharînan wê di laşê xwe de wê kifş bike.

Gelek zarok, dema ku van gûharînan bilaşê xwe re kifş dikin, nikarin zû wateyê bidinê de. Wê heta ku wê dema ku ew gûharînan dibînin, wê tirs jî bi wan re wê çê bibê. Wê carna bixwezin ku ew wan gûharînan ji laşên xwe derxin û xwe weke ber ku wan heta wê demê jîyan, hema wusa bijîn. Yanî, wê herê nekin wan gûharînan. Minaq, wê ji aliyê zayendî ve wê bizarokê re wê gûharîn wê çê bibin. Gûharînên ku wê çê bibin bi fizyolojikî, wê di keçzaroyê de wê cuda bin û bi kûrzaro re jî wê cudab bin ji hevdû.

Bi keçzaroyan re wê singa derkeve li pêş û mazin bibê. Lê ranê wan fireh bibê ji laşê wan. Wê di bin çengê wan de wê mû werin. Her wusa, wê li xwerêya wan jî wê mû û ankû rûvê wan wê werê. Wê zikê wan gilover bibê. Bi wê re wê hormonên wan wê pêşbikevin. Wê laşê wê hem di hundûrê xwe de û bi awayê xwe yê derve bi hevdû re di ahengekê de wê xwe ji bûyîna jineka gihayî a ciwan de bidest amedebûnê bike. Ev pêvajoya balixbûnê a bi keçzaroyan re wê bi hinekan re zûtir xwe pêşbixe. Lê bi henekan re jî wê heta salên li dora 16´an wê xwe temem bike. Piştre jî wê li ser wê re pêvajoyên pêşketinê ên wê pêşveçûna balixbûnê wê bidest jîyankirinê wê bike.

Her wusa bi heman rengî wê kûrzaroyan re jî wê ev pêvajoya balixbûnê wê xwe bide dîyar kirin. Weke ku çawa ku wê keçzaroyan re wê bibê, wê kûrzaroyan re jî, dema ku ket destpêka vê pêvajoya balixbûnê de wê kûrzaro, wê gûharînên mazin di deng û gûharîna deng

de wê bijî. Wê wê rûyê kûrzaro wê fireh bibê.Wê muskulatûrên laşê kûrzaro wê zêdetir bibin. Kûrzaro, wê bikeve pêvajoya ku ew hê zêdetir dirêj dibê û dengê kûr zaroyê wê zêdetirî kûr û ji hundur wê werê. Kûrzaro, wê zêdetirî, bi derxistina deng re wê qirik û zikê xwe bi warimandinê re wê bikarbênê. Bi tişî zik kirina hewayê û berdenê re wê di dema deng derxistine xwe re wê bike. Wê gunikên zarokê û kîrê zarokê wê mazin bibê û wê bidest afirandina xwe ya bizayendî bike. Çermê laşê zarokê di vê demê wê de wê zêdetir stûr û bişûn bibê. Wê çermê laşê keçzaroyê jî û yê kûrzaroyê jî wê wusa bibê. Uzwên hundûr ên zarokê, weke madê, zik, gezebe reş û sipî, gûrçik û hemû beşên din ên laşê zarokê ê hundûr, wê di vê demê de bi awayekî li berçav wê pêşbikevin û wê xwe bidina dîyarkirin. Çav, gûh, bêhvil û hwd, wê têkiliya wan bixêvê û beşên mejiyê mirov ê bihiş re wê zêdetir bibê û wê girtinên xwe yên ku ew dikin, wê bi wê re ku salixkirî wê bikin. Laşê mirov weke ku wê çawa li hundûrê wê, wusa pêşbikeve, wê bi heman rengê di derveyîya wê jî wê, bi heman rengê wê pêşveçûnên nû w bibin. Weke ku çawa ku bi keçzaroyan re wê singa wan mazin bibê û derkeve li pêş. Bi kûrzaroyan re wê mûyên rûyê wan jî wê hin bi hin bidest derketina xwe bikin. Weke van pêşveçûnên ku li derveyîya laş tên dîtin, wê gelek pêşveçûnên din ên di laş de ku wê bibin, wê bi gûharînên laş bi zarokê bide fahmkirin.

Di vê demê de wê ev pêvajoya laşê zarokê wê, zarokê, pirr zêde werênina li berçav. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê, laşê zarokê vê bi wan pêşketina re wê bide nîşandin ku ew balix bûya. Ew giha ya. Gihabûna zarokê û laşê wê, wê bi vê rengê bipêşveçûnên di laşê wê de re w xwe bide nîşandin.

Zarok, van rewşan zêde fahm nakê. Tenê, ew pêşveçûnên weke van ku ew di pêvajoya mazinbûna xwe ya heta wê demê de ku wê di bira û ankû xwûkn xwe de dîtîya, wê di hişê wê de bê. Wê li ser gotinên weke ev rewş nîşanaka balixbûnê na, wê dimejiyê zarokê de wê xwe werênina li bîra wê. Ev têgîn û hizirên ku wê ji gûh ji derve bihîstina ku wê çendî têgînekê û têgihiştinekê di derbarê wan gûharînên ku ew baş kifş dike de wê di serê wê de çê bike jî, lê dema ku ew bixwe dijî, wê weke ku ew bihejê wê lê were. Zarok, bi fahmkirina xwe re weke ku ew ji wê re ne amede ya. Ji xwe dêûbavekî zarokê ê ku ew heta ku hatîya vê demê mazinbûya ku ji wê re bahse van rewşan nekiribê ku hebe, wê êdî ev rewşa zarokê zortir bike. Zarok, wê xwe bixwe wê fêrî van rewşan bibe ku ew jî çendî ew karibê.

Li vir, ya ku em bibêjin ew a ku hertimî weke berpirsîyerîyeka dêûbav a ku ew li ser pêşveçûnên bi zarokê re bi wê re biaxifin û ji wê re werênina ser ziman ku ew pêşveçûn tên çi wateyê. Dema ku zarokê ji dêûbavê re fêrbûn, wê rehetîyê bi wê re çê bike. Carna zarok, çendî ku ew ji mirovna dervî dêûbavê xwe di derbarê wan rewşan de fêrbibê jî, wê di mejiyê zarokê de ya ku wê rehetiyê bidiyê de wê ew bê ku ew wan dûbare ji dêûbavê xwe his bike û bi bîhîzê. Dema ku wê ji dêûbavê xwe re bihîst, wê hingî ew rehet bê. Wê zêdetir, dimejiyê wê de wê rûnihê.

Her wusa, bi teybetî rewşa keçzaroyan li vir teybet a. Wê bi teybetî laşê keçzaroyê wê di van deman de wê bidest amedekarîya xwe bike û dibê ku piştre di salên weke 13´an de ku wê destpê bike, wê adetên wê dest pê bike. Dema ku care pêşî adeta wê destpê kir û keçzaroyê xwûn dît ku ew ji wê tê, wê pirr bitirsihê û wê heta ku wê sendrûmê jî wê derbas bike. Dema ku ev rewşa keçzaroyê destpêkir, hertimî li rex wê bûna dêûbav û bi teybetî bi wê re axiftina dayikê li ser van rewşan ku ew tên çi wateyê, wê keçzaroyê ji pêvajoyên wê yên piştre jî wê bide amede kirin.

Keçzaro, dema ku ev rewş jîn kir, dibê ku xwe kêm hîs bike û her wusa pirr pêvajoyek zor derbas bike. Ev pêvajoya keçzaroyê, giringa ku ew di serî de berî ku ew were wê demê û wê bijî, di derbarê wê de ji dayikê gotinên di derbarê de wê de ên giring bibihîzê. Dayik, dikarê pêvajoyên xwe yên zarokatiyê ên di w temenê de ku wê jîya ya ji wê re werênina ser ziman. Zarok, di vê demê de dema ku ew di mejiyê xwe de fahm bike ku ew weke dayika xwe dijî û ev pêvajoya ku ew dijî dayika wê jî jîya ya, wê ev rehetîyê bike dil û mejiyê zarokê de. Zarok, di vê demêê de bo ku ew xwe xirab hîs nekê, divê ku di van pêvajoyan de baş were bitêgihiştin kirin.

Heman rewşên zor ku me bahse wan kir, wê bo kûrzaroyan jî wê bên jînkirin. Di vê demê de wê kûrzaro, bidest hîskirina hêstên zayendî bike. Lê wê kûrzaro, ji wî re zor bê ku ew wê werênê ser ziman. Heta ku ew carna dema ku ew li holê xwe mamosteyên wî, wî derxina li pêşîya hevalên wî û jê bixwezin ku ew bahse hêstên xwe bike, wê hêsta fihêtiyê bi zarokê re wê çê bibê. Carna ku ew li pêşîya keçzaroyan biaxifê, wê ev hêsta fihêtîyê wê zêdetir wê bi kûrzaro re wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa kûrzaro, wê di vê demê de wê pirr zêde ji aliyê hêstîyarî ve wê zorê bikişênê. Heta ku wê dem bi dem ji ber wê nikaribê xwe werênê ser ziman. Ev jî, wê bizarokê re bê temenê rûdana pirsgirêkên derûnî û hwd. Pirr giring a ku kûrzaro, di vê demê de ji pêvajoyên balixbûnê gotinan ji bavê xwe his bike û bihîzê. Bi wê re tişta ku ew dijî werênê ser ziman. Di

vê demê de wê kûrzaro, gelek hêstên ku ew fahm nekê û bi derûnî, wê didina zorê wê bi wî re rû bidin. Wê ev jî bi zarokê re bibê. Kûrzaro, dema ku ew digihê li dora sale xwe ya 13´an, wê hin bi hin laşê wî hinekî din zêdetir pêşbikeve. Wê êdî hormonên mêrentiyê wê pêşbixin û wê bidest afirandinê bikin.

Rewşa balixbûnê, wê weke rewşek teybet bê. Her wusa, ji aliyê fizyolojikî ve dema ku mirov rewşa balixbûnê şîrove dike, mirov dibînê ku wê mîreteya dêûbav jî di zû bûyîna wê de weyn û rol bileyizê. Gelek zarok, wê dema xwe zû pêş dixin. Minaq, keçzarok, wê di nava salên 11 û 12´an de wê balixbûn wê destpê bike. Bi kûrzaroyan jî wê wê di nava salên 12 û 13´an de wê destpê bike. Lê ev sal, wê ne salên stabîl bin. Her wusa, bi hinekan re zûtir wê destpê bike. Wê bi hinekan re derengtir dest pê bike.

Li vir, bo ku mirov rewşa rakendiyê û mîreteyê a ji aliyê fîzyolojikî ve ku zaro wê digirê fahm bike, mirov dikarê andamên din ên malbatê li berçav re derbas bike. Ew di salên xwe yên kîjanan de balixbûn bi wan destpêkirîya, bi wê re mirov wê fahm bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de ev rewşên balixbûnê, wê ji aliyê fîzyolojikî ve bi gûharînên di laş de wê xwe hin bi hin bide dîyarkirin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê balixbûn, bi rewşa fizyolojikî re wê rewşek gîyanî û derûnî jî bê. Her wusa, pêşveçûnên fizyolojikî ên balixbûnê, wê ancamên xwe wê li ser gîyanê û derûnîyê re bi şêwayên bandûrê û hwd re wê xwe bide dîyarkirin.

Zaroya gihayî, wê di vê demê de wê weke ku ew ji temen ve wê gûharînan bijî. Her wusa wê di xwestek, hêst, raman û pîvanên xwe de jî wê gûharînan bijî. Hizra ´xwe jîyankirinê´ wê bi zaroyê re di vê demê de wê bijî. Tiştên ku wê herina li xoşa zaroyê wê çi bin, di vê demê de wê zarok, li ser wan re binerê. Wê xwestekên xwe werênê ser ziman. Her wusa, di vê demê de wê êdî li gorî ast û pîvana zaroya berê ku ji yeksaliyê û heta dehsaliyê ku mirov weke dêûbav nêz dibû, mirov wê êdî nikaribê wusa nêzî zaroyê bibê. Dema ku mirov wusa nêzî zaroyê bû, wê bêgûman zarok bidest nîşandina bertekê li hemberê mazinên xwe bide û wê bibêjê ´ez êdî ne zaro me ku win weke zarokan li min dinerin û nêzî min dibin.´ Ev gotina zarokê, wê di aslê xwe de wê gelek tiştan vekirî raxê li berçav. Ev gotin, wê bide nîşandin ku mirov nikaribê êdî bi wan rewş, ast û pîvanên berê ên zarokatiyê nêzî wê bibê. Ev dema zarokê, wê demeka zaroya ciwan bê. Zaroya ciwan jî, wê êdî zaroya gihayî a balix

bê. Dema ciwaniyê, wê demeka teybet a zarokê bê. Ev dema zarokê a ciwaniyê, mirov dikarê weke demek bûhûrîner jî werênê ser ziman.

Dema ciwaniyê, her wusa, di mejiyê, herkesekî de weke dema ku zaroyê êdî ew dema xwe ya zarokatiyê dawî lê hanîya, wusa dihê nerîn li vê dema ciwaniyê. Lê li vir, mirov nikarê bi tememî vê yekê wusa bibêjê. Lê li vir, mirov nikarê bi tememî vê demê weke dema zarokatiyê jî werênê ser ziman. Divê çerçoveyê de ev dema ciwaniyê wê weke demek teybet a navber a bûhûrîner a jîyane mirov bê.

Miov divê ku vê yekê jî werênê ser ziman ku wê zarok, di dema ciwaniyê de wê xwe karibê werênê ser ziman. Wê hêst bi wê re biafirin. Wê hêstan fahm bike. Wê hêstan berî hertiştî wê bijî. Di vê çerçoveyê de wê zarok, demek xwe ya teybet a ciwaniyê bijî. Dema ciwaniyê ku mirov, bi laşê xwe jî ku mirov êdî ne zaroka. Lê mirov wekî din jî wê zaroya ciwan, wê bihişê xwe jî wê demek teybet bijî. Mejiyê zaroya ciwan, weke ya dema zarokatiyê, wê aktiv û afrîner bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê dema ciwaniyê bo zarokê, weke demek xwekifşkiirnê jî bê. Zaroya ciwan, di vê dema xwekifşkirinê de wê hem xwe kifş bike û hem jî li gorî wê rewş xwe ya ku ew di wê demê de di wê de ya, wê bixwezê ku ew dunya derve kifş bike. Zaroya ciwan, wê di sale xwe ya 12´an de wê êdî weke zaroyek ku ew bi tememî ciwan a. Di sale 11´an de ew, zaroya ku ew hê nû gavê diavêjê dema xwe ya ciwaniyê û wê di vê salê de wê dawîya dema berê û destpêka dema nû wê bihevdû re di nava hevdû de û di zikhevdû de wê bijî. Lê sale 12an a zaroyz ciwan, wê salek teybet a zaroyê bê ku ew êdî xwe zêde zaro hîs nakê. Wê di vê demê de wê zêdetirî wê bi pirsgirêkên pêşveçûnên nû ên ku vê demê ku wê bi wê re rû bidin wê bi wan ve mijul bibê. Wê di bin bandûra wan de bimênê. Di vê demê de êş, gûman, tirs û hwd, wê di zikhevdû de wê di vê pêvajoyê de wê bi zaroya ciwan re wê xwe bidina nîşandin. Lê zaroya ciwan, di vê dema xwe de êdî ew weke mirovek ciwan ê hêstîyar a. Wê bi tememî nikaribê rewşên ku ew dijî jî wê werênê ser ziman. Hêstên weke yên fihêtbûnê û hwd, wê bijî. Ev hêst, wê zarokê weke ku bikina nava lapên xwe de. Wê dem bi dem wê xwe weke dilgirtî wê hîs bike ji ber wan hêstên bi vî rengî ên ku ew dijî.

Zaroya ciwan a balixbûyî, wê ji aliyê pêşveçûna laş ve weke ku me li jor jî hanî ser ziman, wê pêşketinek mazin bi xwe re wê bide jîyankirin.Lê bi wê re jî, wê zaroya ciwan a balixbûyî, wê ji aliyê zêhnî ve wê xwediyê pêşketinek mazin bê. Zêhnê zaroya ciwan ji pêşketinê re vekirîya. Her wusa, di vê dema xwe ya 12 û 13´ salîya xwe de wê zaroya

ciwan, karibê vaca xwe û ankû mantiqê xwe bikarbênê û muhakemê bike. Ew dema ku bi dêûbavê xwe re diaxifê jî wê mantiqê xwe bikarbênê. Wê di nava baş û ne başîyê de wê daraza xwe ya têgînî û têgihiştnî bike. Ew dema ku bi dêûbavê xw re jî diaxifê wê bi mantiqê xwe wê biaxifê. Di vê demê de wê zarok, mantiqê xwe wê pirr zêde wê karibê bikarbênê. Her wusa, li ser rewş, tişt û jîyankirinên ku ew hena, wê mantiqê xwe karibê bikarbênê.

Ev dema zaroya ciwan, wê di aslê xwe de weke demek teybet a bihiş bê. Pêşketina zaroya ciwan, wê bidest pêşxistina tecrûbeyan jî wê bi xwe re bike. Her wusa, bi wê re jî, êdî wê bi wê re wê karibê tecrûbe û ancamên wan ezmûnan jî bikarbênê. Li ser wan re jî karibê, biafirênê.

Ev dema zaroya ciwan ku em weke dema gihayî û ankû dema balixbûyî ku em dihênina ser ziman, wê zaro, zêdetirî derkeve dervî malê. Wê têkilî û benên xwe yên bi malê re jî wê di wan de jî wê gûharînê çê bike. Wê têkiliyên xwe yên bi dêûbav re jî wê, wan kêm bike. Wê zêdetirî demê bi xwe bixwe re wê bixwezê ku ew derbas bike. Wê bixwezê ku ew bi xwe re bimênê. Her wusa, ev jî, wê destpêka hewldana zaroya ciwan a bidest xwe bixwe fahmkirinê jî bê. Zaroya ciwan, di serê xwe de wê dîmenekî di derbarê xwe de wê biafirênê. Wê bi wê, wê xwe mazin û gihayî û êdî mazin wê bihasibênê. Bo vê yekê ya ku ew dema ku dêûbavê zaroya ciwan, weke zaroya wan ya ku ew hê mazin nebûyî ku ew nêzîkatiyê li wê dikin, wê zaroya ciwan, wê bertekek mazin li hemberê wan bide nîşandin û wê bibêjê ´ez, êdî mazin im.´ Ev gotina ´ez, êdî mazim im´ ku zaroya ciwan, wê dike temenê berteke xwe de wê rastîya hizirkirina zaroya ciwan jî wê bi xwe re wê pirr baş werênê ser ziman.

Zaroya ciwan, pêşveçûna ku ew di vê demê de bi aqilê xwe û zêhnê xwe re çê dike, wê her wusa bike ku ew nerîna xwe ya li dûnyê biafirênê. Weke ciwanekê zaroya ciwan, wê êdî ew nerîna xwe ya li dunyê wê biafirênê. Her wusa, wê karibê êdî rewş, bûyar û tiştan weke ku ew li jîyanê hena, wan bibînê û şîrove bike. Di vê çerçoveyê de wê mantiqê xwe yê nerîna li jîyanê wê bide rûniştandin bi xwe re.

Em li vir, vê yekê jî divê ku werênina ser ziman ku weke ciwanekê zaroya ciwan, wê di van salên xwe yên nava 12 û 13´an de wê ji aliyê fizyolojikî, gîyanî û derûnî ve wê bigihê û balix bibê. Bi wê re jî wê, bidest jîyankirina wê bike. Di vê demê de wê ew êdî ciwanek bê ku ew bi ber mazinbûnê ve diçê ya. Ciwanbûn, wê gave wê ya piştre wê mazinbûn bê. Mazinbûn jî wê, pêvajoya ku bi keçzaroya ciwan re jinitîyê pêş dixe û

bi kûrzaroya ciwan re jî ku wê, zilemtiyê wê pêşbixe. Zilemtî, wê di hundurê xwe de bûna bavitiyê wê di hundurê xwe de bihawênê. Biheman rengî wê jinitî jî wê, dayiktiyê di hundurê xwe de bihawênê. Ev rewşên ku wê piştî vê dema zarokê a ciwan re ku wê were jinkirin bê. Ev dema zarokê, wê temenê zilemtiyê bi kûrzaroya ciwan re were avêtin. Bi heman rengî wê bi keçzaroya ciwan re jî, wê temenê jinitiyê û bi wê re jî yê dayiktiyê wê werê avêtin. Ev dema ciwaniya zaroyê ku ji sale wê ya 11´an û hwd re ku wê dest pê bike, wê heta li dora 19 û ankû 20an wê xwe bide jîyankirin. Di nava kurdan de ciwantî û dema wê, hertimî bi zewicandina ciwan re hatîya dawî lê hanîn. Bi vê rengê kurdan bawer kirîya ku ew dema zawacê a ciwan, wê destpêde dawîya dema wê ya ciwaniyê jî bê. Mirovê ku ew zewîcî, wê êdî weke ciwan lê newê nerîn. Ku ew jin bê, wê weke jinekê û ankû pîrekekê lê werê nerin. Ku ew kûr bê, wê weke zilemekî û ankû mêrekî lê were nerîn. Ev nerîn jî, wê nerîna ku ew êdî ne ciwan a, wê bi xwe re wê werênê ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê ev nerîn, temenê nerîna mazinbûnê bê. Nerîna mazinbûnê, wê li ser ya ciwaniyê û dawî lê hanîna wê re wê were pêşxistin û bê hanîn li ser ziman.

Wateya nerîna mazinbûnê çi ya? Wateya wê ew a ku mirov ji aliyê fizyolojîkî, gîyanî û derûnî ve wê ne ciwan mazin bê. Ew karibê, biahengtir û hûrgiltir binerê. Wê karibê, baştir çerçoveyê bi xwe re çê bike. Ew dikarê sehêtê dênê ser hêstên xwe. Ew bisehêttira. Her wusa ew zêdetir jî bi ezmûn, fêr û cerb a. Serborîyên mirovê mazin û gihayî zêdetir in ji yên ciwan. Bi wê re jî wê bi asta pêşketina hiş, têgihiştin û zanebûna xwe jî wê ew êdî ne ciwan bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê lê werê nerîn.

Dema ku bahse ciwaniyê dihê kirin, wê bahse hêz, hês û xwestekek jîyanê a jînkirinê jî wê werê kirin.Herwusa, di vê çerçoveyê de wê ciwan bi ast û pîvanekê wê werê ser ziman. Ciwanî, wê ji sale 12´an û pê de wê bi salên 13´, 14´ û 15´an re wê werê jîyankirin. Her wusa, di van salan de wê ciwan, wan pêşveçûnên fizyolojikî, gîyanî û derûnî ên bi laşê xwe re wê bijî û wê van salan weke salna fahmkirina wan gûharînên ku ew bi laşê xwe re dijî wê bikarbênê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku wê ev dem, wê fahmkirineka baş di derbarê jîyanê, laşê wê û her wusa pêşveçûna aqilî ya wê de bi ciwan re bide çêkirin. Ciwan, wê di vê demê de wê biaqilê xwe re mantiqê xwe pêşbixe. Wê bi mantiqê xwe, wê aqilê xwe weke ku bi fahmkirin û nerîna xwe re wê li ser lingên wê bide rûnandin.

Wê ciwan, bi aqilê xwe re wê li xwe, gûharîn û pêşveçûnên xwe yên fizyolojikî, gîyanî û derûnî û hwd, wê serdestîya xwe çê bike. Wê bi aqilê xwe re wê fahm bike. Lê ev demên ciwan, wê weke demna ku ew dikarê di wan de pirr bi stress bijî, bikeve sendrûman û her wusa tengezerî(´krîz´)yan bi xwe re û bi keseyetîya xwe re bijî. Wê ciwan, xwe ji jîyankirina van rewşan û hinek rewşên din ên weke nikaribê xwe xilas bike. Ev di jîyanekê de dijî û di wê jîyane ku ew di wê de dijî, wê hertimî pirsgirêkên ku ew bi mejiyê xwe ji wan diwastihê, wê bijî. Derûnîya ciwanîyê a van deman, wê pirr gûharînêr bê. Wê zû reng bigûharênê. Demekê xwe baş hîs bike. Lê demeke din ku ne zêde dirêj a, wê xwe xirab hîs bike. Wê xwe di bin giraniyan de hîs bike. Di vê demê de ew berpirsîyarîyên ku ciwan bidestkirina hildana ser milê xwe kirina, wê ciwan carna di bin wan berpirsîyarîyên wî de bihêlê. Minaq, ciwan diçê dibistanê û ew dema ku tê malê wê sipartekên wî yên ku ew li malê çêbike bo roja din a dibistanê, wê zarokê biwastênê. Wê jîyane xwe de wê, bi hêstîyarî ketin û rabûnê re wê derbas bike. Carna wê bikeve. Carna wê serê xwe hilde û bilind bibê. Ev dema zarokê, wê di salên wî yên 14 û 15´an de wê zêdetir bibê. Çendî ku ciwan bi hêstîyarî hatibê şîyarkirin û rakirin li serxwe, wê rabûyî û serlingên xwe bê. Lê dema ku xemgîn bû, bihêstîyarî şikeşt û ket, wê hingî bikeve û bikeve rewşek têkçûyî de. Çendî ku zaroya ciwan di vê dema xwe de bi mejiyê xwe xwediyê potansîyalek mazina jî, wê nikaribê di hemû rewşan de wê bikarbênê. Lê wê hin bi hin jî, wê bidest kifşkirina xwe û wê bike.

.

**Dema ciwanîyê a balixbûnê ya piştî saln 14 û 15´an, wê salên bi ber mazin ve ku mirov hin bi hin bi ezmûn dibê ya na**.

Pêvajoyên ku wê zarok ji salên 11 û 12 heta salên 13 û 14´an ku wan bijî, wê weke pêvajoyên gavavêtina li dema balixbûnê û bidest jîyankirina wê bin. Bi wê re wê jî wê pêvajoyên ku ciwan xwe bi ciwanî nas bike û bidest kifşkirina di xwe de bike weke ciwan bê. Ev rewşên ciwan, wê zêdetirî di vê demê wê ciwan bike nava gelek rewşan de. Ji aliyekî ve jî wê zaroya ciwan, di van demên xwe yên destpêkê de wê, bidest hevnasîna bi jîyanê re bike û wê li bersiva ´çawa jîyanê´ bigerihê. Hin bi hin, wê rengê jîyane ciwanîyê wê di mejiyê ciwan de wê reng bistênê. Wê pêwîstînîyên wê û pêdîvîyên wê ên ku ew bike û her wusa wê derkeve li pêşîya wê, wê kifş bike. Wê bi wan re hevnasînê bike. Di vê demê de zaroya ciwan, çendî amede ya û çendî di mejiyê xwe de xwe hanîya wê astê ku ew karibê bersivê bide vê demê ji aliyê xwe ve, wê

ciwan vê jî bi jîyankirinê re wê fêr bibê. Her wusa, ciwanî di vê demê de wê weke demek xwe ya teybet bê. Ev dem, wê gelek rengên pêşketin û pêşveçûnê ku wan di zikhevdû de bi zaroya ciwan dide jînkirin wê bijî. Rengê pêşketina pêşî, wê zarok dawîya zaroktiya xwe wê bijî. Wê hin bi hin di mejiyê xwe de û her wusa wê di jîyanê xwe de wê bidest birrîna têkilî û benên xwe yên bi wê re wê bike. Lê piştî ku zaroya ciwa têkilî birrî û benên xwe birrîn, wê piştre xwe di wê dema ciwaniyê bibînê. Ti zêde fêr û derbas û ezmûna wî ji vê demê de tûna ya Ya ku di serê wî de heya, ew jîyankirina wî ya heta wê demê ku wî jîyankiriya ya. Ew jî, ya demên bûhûrî a dema zarokatiyê ya. Zarok, wê ji ber ku vê yekê, ber ku ew bezûmûn a ji vê demê û jîyankirina wê re wê bîra demên berê jî bike. Bîrkirina dema zarokatîyê, wê ji gelek aliyan ve jî di mejiyê ciwan de wê aheng û belanse wî ya di vê demê de ku ew divê ku ew çê bike, wê pêşîya wê jî bide girtin û wê çêkirin wê jî derengtir bixe. Bo vê yekê, wê ciwan, bi pirsgirêkên ahengîyê û belansê re wê têbikoşê. Ji ber vê yekê ya ku wê ciwan, ji her rêya ku ew di wê re herê re wê di vê demê de wê vekirî bê. Tişta ku ew li berçavên xwe bi aheng û belans dibînê wê bela ciwan bikişênê li ser û wê ji wê re weke biafsûn wê were.

Ev dema ciwaniyê bo dîtina rêya xwe wê ciwan pirr zêde carna mihtacê alikariyê bê, lê wê ne ji xwe re û ne jî ji dora xwe wê wê werênê ser ziman. Her wusa, ev hêsta nekarîna xwe hanîna li ser ziman, her wusa ji wê tê ku ciwan nexwezê ku tu kesek wî weke têkçûyî û ne serkevtî ne hasibênê.

Di vê demê de dêûbavê ciwan, carna wê hewl bidin ku aqil bidinê de. Lê zaroya ciwan wê, red bike. Lê çendî ku ew wê red dike jî, wê di mejiyê xwe de wê ew wê çareserîya ku ew dibêjin wê bigirê weke çareserîyeka ku ew di mejiyê xwe de dênê koşeyekê ku kengî ji wî re pêwîst bû bikarbênê. Lê wê ew bixwe jî, wê bike ku ew kifş bike. Her wusa, ciwan, di mejiyê xwe de wê wê bê xwediyê wê hizrê ku ew dikarê bike. Hizra ku ew di serê xwe de çê dike, wê di vê çerçoveyê de wê hizrek bi wêre bê. Di mejiyê xwe de dema ku ciwan, derûnîya wê baş bê û ew li ser xwe bê, wê pirr serkevtî bê. Wê di mejiyê de karibê hertiştî ava bike û û çê bike. Kar û xabetên ku ew bi mirovên li dora xwe re ku ew dibînê ku ew dikin, wê ciwan li ser wan re di mejiyê xwe de û di xwe de ji xwe re bibêjê ´ez dikarim wê bikim.´ Wê bi vê rengê, wê bibêjê. Dema ku ew dişopênê ku ew kar û xabat çawa tê kirin, wê ew wê rewşê di mejiyê xwe de qayd bike. Ev wê weke ezmûnekê bê. Zarok, gihiştina

vê hizra ´ez jî, dikarim vê karê bikim´ di mejiyê xwe de, wê nîşanaka gihiştina ezminekê bê.

Ciwan, wê bi vê rengê wê hin bi hin wê ezmûnan jî di mejiyê xwe de çê bike. Jîyane ciwaniyê, wê di nava xwe de wê bi ciwan û ciwaniyê re wê hem serkevtinan jî wê bijî û hem jî wê carna bi gîyanî û derûnî û hwd, wê şikeştin û têkçûnan jî wê di xwe bijî. Lê dema ciwaniyê, wê ji destpêkekê ve ji xwe wê hinek ezmûnên bi wê re wê hebin. Ew jî, ên ji dema zarokatiyê û demên zarokatiya ciwanîyê ku ew jîya na. Ev wê di mejiyê ciwan de wê hizirna, hertimî wê bidina afirandin. Her dîtin, kirin û jîyankirin, wê di xêva mirov de bi wê şêwayê xwe re wê cih bigirê. Ev jî, wê, wê di dema ciwaniyê de wê bê hişek. Ev hiş, wê weke pêpelokek ku wê li ser wê re wê gav were avêtin bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ev dema ciwaniyê, wê li ser ancamên dema zarokatiyê û dema ciwaniya zarokatiyê re wê bijî. Her wusa, mirov çendî zarokatiyek baş bi xwe re derbas kir, wê ew weke pirtûka mirov a jîyanî bê ku mirov wê hertimî ji wê sûd bigirê û ancaman derxê bê. Gotina ´bêrîya li dema zarokatiyê´ ku bahse wê dihê kirin, wê her wusa di temenê wê de hinek tişt û rewş û pêvajoyên baş ên ku mirov di wê demê de ew jîya na, wê hebin. Ew bêrîya li wê demê, dide nîşandin ku mirov hinek tiştên baş di wê de jîyankirin. Ev jî, mirov bi berxwe dide kişandin. Mejiyê miirov bi ber xwe ve dide kişandin. Mirov jî, bi hêstîyarî û hişmendî, li wê dihizirê ê wê bi bîr dike.

Bêrîya li dema zarokatiyê ku ew dibê, ku em ji aliyê dema ciwaniyê ve jî li wê binerê, wê bi xwe re wê bide nîşandin ku mirov di vê demê de ne rehet a û ankû demek zor derbas dike. Her wusa, mirov jîyane xwe baş derbas nekê. Ev jî, di temenê wê bêrîya li dema zarokatiyê û bîrkirina wê de ya. Ya xweş ku mirov bixwe jî jîya bê di demên xwe yn bûhûrî de ku mirov piştre hinekî mazin bû ji wê derbas bû û gihişt dema xwe ya ciwaniyê û hinekî ew jîn kir û pê de, wê li ser wê re wê bêrîyê bibîr bike. Ciwan, di dema xwe de ew dema ku ew li hemberî rewşna ket zorê û di rewşek zor de bê, wê zêdetirî karibê li dema xwe ya li şûn xwe bihizirê. Mejî, wê wan deman bide berhevdû û mûqayaseya wan li hevdû bike. Her wusa, dema ku mirov rewşek zor jî bijî, wê mejî ji xêva mirov rewşna vajî wê li ser wê re kifş bike û mûqayaseya wan li hevdû bike. Di vê dema ciwaniyê de wê zêdetir ev bibin. Ber ku ciwan, hem di mejiyê xwe de bo wê demê û rewşên ku ew bi pirranî rastî wan tê ew bê ezmûn a û her wusa hêza wî carna weke ku ew di xwe de hîs dike têrê nakê.

Ezmûn, wê hertimî weke hêzek mazin ya ku mirov li ser lingan jî digirê bê.Herwusa ezmûn, wê ji kirin, jîyankirin û tevgerên mirov wê biafirê. Wê ancama wan bê. Tişta ku mirov bi wan jîyankirina fêrbûya, wê weke ezmûna mirov bê. Ciwan, wê li ser ezmûnên xwe re wê di vê dema xwe de wê hêza wî ya hizirkirinê a razber wê pêşbikeve. Wê karibê bi razberî bihizirê. Bi wê re jî, wê bi hêstîyarî, wê pêşbikeve. Ev dema zarokê, wê weke lêgerîneka ku ew li heyîna xwe digerihê jî bê. Wê di vê dema ciwaniyê de wê ji nû ve xwe kifş bike. Di vê demê de ew, lê hê jî di gelek rewşan de di mejiyê xwe de dijî. Ew, gelek rewşên ku ew di jîyanê û jîyankirina jîyanê de ku wê rastî wan werê û wê zorê bidinê û ankû wê zirerê jê re çê bikin, wê bi tememî ne di farqe wan de bê. Lê wê hin bi hin bikeve farqe wan de.

Ciwan, wê di vê dema xwe de wê bi hevalên xwe re bê. Her wusa, rewşa ku ew bi hevalên xwe re dijî, wê bandûrê lê jî bike. Ew hevalên wî yên ku ew yên dibistanê bin û ankû ne hevalên dibistanê bin, wê ciwan bi wan re bi hevaltî wê têkiliyê dênê. Di vê demê de wê bi zayendî hizir di serê ciwan de biafirin. Wê hêstên hêskirin û evînê wê biafirin. Heta ku dibê ku ew bixwezê têkiliyê jî bi yeka ku ew hêsê dike re dênê.

Ciwan, wê di vê demê de xwestekên wî yên ku ew di mejî de dixwezê wê di vê demê de zêdetirî wê mêylên wî bidina dîyarkirin. Ew jî, wê hin bi hin hizra fahmkirinê wê bidest pêşxistina di derbarê wan de wê pêşbixe. Lê xwestek, dem bi dem dibêt ku ew li pêşîya fahmkirinê jî bê ku ew pirr dixwezê ku wê bijî. Her wusa ancamên wê, wê zêde di vê demê de li wan nehizirê.

Di vê demê de ciwan, herî zêde mihtacê hevaltîyek rast a. Li vir, dêûbav jî, divê ku di vê çerçoveyê de ew xwe ji ciwan dûr negirin û di rewşên ku ew wan dijî de ew, bibaşî bin û ne bi başî bin, li cemê bin û jê re alikar bin. Her wusa, wê jîyankirinên mirov ên baş jî û ne baş jî wê ezmûnekê bidina mirov. Lê bo ku ew aliyê jîyankirinên ne baş ku wê zêde bandûrê li gîyanê, derûnî û jîyane ciwan bikê, ev divê ku mirov weke dêûbav hem bi fahmkirina ciwan re û hem jî alikarîya jê re wê pêwîst bê.

Zarok, di vê demê de ew, di serî de divê ku ew ji aliyê dêûbavê xwe ve bê piştgirî kirin û dêûbav li cemê bisekin in. Ciwan, divê ku vê yekê baş fahm bike. Dema ku ciwan, vê ji dêûbav baş fahm bike, wê hingî ew xwe bitenê hîs nekê û wê baştir û zêdetir serkevtî bê. Wê karibê kar û xabatên ku ciwan dana berxwe, wê di wan de û di kirin û hanîna wan li cih de wê serkevtî bê.

Ev jî, bi jîyane civatê re bûya weke kevneşopîyekê û tê gotin ku ´ew êdî ciwan a û divê ku ew li çareya serê xwe binerê.´ Carna jî, tê gotin ku ´ew ciwan a, wê bike.´ Yanî, weke yekî ku ew ne mihtacê alikariyê ya lê dihê nerîn û jê bahs dihê kirin. Di aslê xwe de herî zêde di vê demê de wê ciwan, di dema ciwaniya xwe wê pêwîstîya wê ya alikariyê bi aqlî û derûnî wê hebe. Zarok, di dema ciwaniya xwe de bi pirranî ji dêûbavê xwe dûr dikevin. Her wusa, bi heman rengî, dêûbav jî wê bi xwe re wê dûrketina ji zaroya ciwan wê bijîn. Wê di dema ciwaniya zarokên xwe de dêûbav, ne weke dêûbavê berê ku ew çawa nêzî wê zaroka xwe dibûn û bi her pirsgirêka wê re alaqadar dibûn bûn. Zarok jî, vê vê yekê bibînê. Dêûbav, wê di vê dema ciwaniya zaro de wê tenê bi sînorên ku ew didênina li pêşîya zaro, wê di mejiyê zaroya ciwan de wê derkevina li pêş. Di aslê xwe de ya ku dêûbav, divê ku nekin û bi wê rengê di mejiyê zaro de cih negirin jî wê ev bê. Wê ji zaro re bêjin ´odaya xwe bide hevdû´, ´êvarê zû were malê´, ´dema ku te tişt û kirinek kir, destûrê ji dêûûbav bixweze´ û hwd, wê bi vê rengê dêûbav wê bidina weke mirovna ku ew bi vê rengê di mejiyê ciwaniya zaro de. Lê di vê demê de tevî wê jî, wê têkiliya zaro û dêûbav, ya ji aliyê derûnî, dêûbavî û zaroyî û hwd ve wê kêm bibê. Lê di vê demê de bi awayekî bisazûmanî, wê zarok pêwîstîya wê bi axiftina bi dêûbav û mazinên xwe re wê hebe. Zaroya ciwan, çendî ku ew di vê demê de ew naxwezê ku ew were sehêt(´kontrol´)kirin jî, lê ji aliyekî din ve wê bixwezê ku wê çi kir jî ji aliyê dêûbavê wê ve were pejirendin û ew li cemê bin. Dema ku ew kirinekê bike, wê bi vê rengê bi nerîna xwe re wê ji aliyekî ve di mejiyê xwe de hey û nerîna wî li ser dêûbavê wê bê û ji aliyê wê ve jî wê bixwezê ku ew wê bijî weke ciwanekê.

Zarok, di vê demê de ew dikarê bikeve têgihekê wusa de ku ew bihizirê ku dêûbavê zarokê, hêskirina wan cihê xwe ji kontrolkirin û hertimî ciwan di bin cavde girtinê re hiştîya. Çendî ku ev ne rast jî bê, ku zarokê di mejiyê xwe de bidest hizirkirina bi vê rengê kir û pê de, wê êdî ew ji dêûbav bidest dûrketinê bike. Wê li gotinên wan nehisênê. Wê bertekê li hemberî wan bide nîşandin. Dema ku dêûûbavê got ´vê kirinê neke´ wê zarok, vajî wê wê herê û wê kirinê wê bike. Di vê demê de wê gelek kirinên zaroya ciwan, wê bertek jî bin. Ji aliyekî ve wê bertek bin ku ew dixwezê ku hey û bale dêûûbav hilde li ser xwe û xwe bênê berçavê wan ku ew wê bi kirinên wê yên ciwanî re bibînin. Ji aliyê din ê duyem ve jî wê bertekên zaroya ciwan, di ancama wê de bin ku ew li wan bihêrs dibê ku ew ji ber ku wê alaqaya ku zaroya ciwan pêwîsta ji wê re

nadina nîşandin û bi wê re li ser pirsgirêkên wê, bi wê re neaxifin. Vêca dema ku zarok, pirsgirêkên weke tengezerîyên keseyetî bijî û wê demê de ku ew ji aliyê dêûbavê wê ve newê kifşkirin, wê zarok, piştre wê hem pirr zêde biêşîhê, hem xamgin bibê, hem di xwe de hêrs bibê û ji aliyekî din ve jî wê hem li bendê bê ku dêûbav wê weke demên berê ku ew zaroya wan ya piçûk bû, wê kifş bikin û nêzîkatîyê lê bikin û hêskirin û evîna xwe ya ji dil ji wê re bidina nîşandin.

Zarok, wê di vê demê de pirr zêde hestîyar bê. Wê carna bi hêsta xwe tevbigerihê. Wê di kirina xwe de wê tenê li w xwesteke xwe bihizirê. Car bi car, berê hinekî mazinên kurdan di nava civatên xwe de rexne jî li ciwanan digirtin û digotin ku ´ew tenê li xwe dihizirin´ û ankû ´ew tenê ji xwe re dixwezin.´ Ev gotin, her wusa, li vê rewşa zaroya ciwan bû. De ne, dema ku zaro gihişt dema xwe ya ciwan, wê êdî ji wê hêvîya rast tevgerînê, kirina gotina baş û rast wê biheta kirin. Wê di vê çerçoveyê de wê hêvî bikiran. Dema ku zaroya ciwan, di van waran de kêm nêzîkatî bida nîşandin, wê êdî rexne lê biheta girtin. Bi wê re wê, weke zaroya ciwan, yan bêfahm, yan ya li gotinan nehisênê, yan jî hertimî biserê xwe ´bitir´ dijî, wê jî biheta bahs kirin. Gotina ´bitir´, gotinaka kurdî ya ku mazinên civatê, hertimî ji ciwanan re bikardihanîn bûn. Ji zarokên piçûk ên ku ew hê ne gihiştina dema ciwaniyê re û ku ew pirr ne disekinin, wê gotina ´har´ ji wan biheta bikarhanîn. Lê dema ku zarok bûhûrî li dema xwe ya ciwaniyê, wê di heman rewşa zarokê a pirr bi tevger û aktiv û ku li tu kesekî ne dihisand de jî wê gotina ´bitir´ biheta bikarhanîn.

Rewşek din jî hebû. Ew jî ew bû ku gelek dêûbav, hertimî bi zaroyên xwe re diketina nava maqarsiyê û bi wê re bi maqarsî diaxiftin. Wê her kirinên zaroya ciwan, ji wê kêmesîyekê kifş bikin û bidina rûyê zaroyê. Bi v rengê wê jîyane zaroya ciwan lê teng bikin. Wê zaroya ciwan, wê êdî wê bikeve rewşekê de ku ew nizanibê ku wê ew çi bike. Yan jî wê zaroya ciwan, wê bixwede bênê û wê êdî li gotinên dêûbav û mazinên xwe nehisênê û wê kirinên xwe bide kirin. Di vê rewşê de jî wê gotina ´bêar´ wê ji zarokê re biheta bikarhanîn. Zaroya ciwan, di vê rewşê de wê ew, hertimî bi wê bêrîya ku ew gotinek baş ji dêûbav bi bihîzê û nêzîkatîya xweş ku wê li xoşa wan herê dijîn.

Zarok, di vê demê de wê di rewşek bi vî rengî de wê bijî. Zaroya ciwan, wê xwe weke di rewşek xirab de wê hîs bike. Wê piştre întîbayên weke ´ez, çi baş jî û xirab jî bikim, wê nerîna dêûbavê min, wê heman nerîn bê.´ Piştî vê re wê xwe li nehisandinê dênê. Wê weke xwe bike.

Wê, ew jî weke zarokek aksî wê mazin bibê. Rewşên bi vî rengî, wê bandûra wan pirr zêde li ser qaraktерê zaroya ciwan wê hebe. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji bîrnekê ku wê qaraktерê zarokê, wê di dema ciwaniya wê de jî wê, xwe bi awa û şekl bike. Bo vê yekê, her kirinên ku ew bijî û li hember zarokê bi nêzîkatî bên nîşandin, wê li ser derûnîya zarokê û bi wê re li ser qaraktерê zarokê wê bandûra wê hebe. Rengê pêşveçûn û pêşketina zaroya ciwan, wê di vê demê de rengê xwe wê ji ancama van nêzîkatîyên li zarokê wê bide nîşandin ku ew wê baş pêşbikeve û ankû w ne baş pêşbikeve. Her dêûbav, dixwezin ku ew xwediyê zaroyna ciwan ên hem baş û hem jî serkevtî bin. Beremberê vê xwestina dêûbav, berpirsîyarîyên dêûbav ên li hemberî zaroya ciwan jî hena ku ew werênê li cih. Ew jî, ew in ku ew li cem zaroya ciwan bin, li ser kirinên zaroyê re şîroveyên baş û ne başîyê nekin, hertimî wê bi ya baş bi têgihiştin bikin û bi wê re biaxifin û bi wê re berê zaroya ciwan bidina bi aliyê pêşketineka hêrênî ve. Di aslê xwe de weke dêûbav, berpirsîyarîya wan ya li hemberê zaroyê, di vê dema ciwaniya wan de zêdetir û maztira. Zaroya ciwan, wê her kirin û nêzîkatîya ku ew dêûbav bin û ankû hinek mazinên wê yên din bin ku ew li wê didina nîşandin, wê bandûra wan nêzîkatîyên li hemberê zarokê wê di pêşketina wê de jî pirr zêde û bêhesab wê hebe. Zarok, di vê demê de bo ku ew karibê li ser pêşaroja xwe bi ponijê û ahengekê di hizirkirina xwe de ew bi wê re bixwe re çê bike û bi wê re dîsa bi aliya wan(´dêûbav´ û ankû ´mazinên xwe´) biserkeve, wê ev pirr zêde pêwîstîya zarokê bi nerînek hêrênî, nêzîkatîya baş û herênî û hertimî bi awayekî baş û zanebûn bi zarokê re tê axiftin û ya rast û baş ku çî ya û mirov wê şanî wê bide, wê bi wê re zaroya ciwan wê serkeve.

Ciwan, di vê dema xwe de wê di temenê xwe yê biolojikî, hişmendî û civak û civaknasî de wê pêşbixe. Her wusa, rewşên ku wê ciwan wan bijî, wê di vê çerçoveyê de wan bi xwe re bicih bike. Ciwan, ku em weke zaroya ciwan û ankû zaroya mazin jî dikarin wê binav bikin û werênina ser ziman, wê di vê dema xwe de wê ji aliyê temenê xwe yê biolojikî û derûnî ve wê mazin bibê. Her wusa, ji aliyê temenê zaroya ciwan a hişmendîyê ve jî wê zaroya ciwan wê xwe bi pêşketina xwe re wê bide dîyarkirin. Zaroya ciwan, wê di vê demê de wê temenê jîyankirina xwe wê bi xwe re bide pêşxistin. Li gorî jîyane ku heya di rastiyê de û temenê jîyane zaroya ciwan, wê ne weke hevdû bin. Her wusa, lê wê bi jîyankirinên xwe re wê zaroya ciwan, wê hin bi hin bike ku ew xwe bi wê jîyane ku heyî re û bi jîyankirinên ku di wê de na re wê zarok, bi

ezmûnan, wê xwe hin bi hin mazin bike. Wê temenê xwe mazin bike. Di vê demê de ciwaniya wê de wê ciwan, bi temenê xwe re bike ku ew têr bike.

Zaroya ciwan, wê di nava hewirdorekê de bijî. Wê li hewirdorê binerê. Wê çavdêrêyên xwe wê pêşbixe. Ev jî, wê ji wê re bina ezmûn. Di aslê xwe de jîyane ciwan a bi hewirdorê re wê bi jîyankirinên wî yên civaknasî re wê ji aliyê derûnî, hişmendî û keseyetîya wî ve wê bê weke terapiyekê jî. Ji aliyê derûnîyê ve wê xwe adilandinê wê bike. Wê fêrî hewirdorê bibê. Derûnî, di vê çerçoveyê de wê rengekî pêşketinên mirov ên bi ezmûnên mirov bê. Ji aliyê hişmendî ve ew hewirdora ku mejiyê ciwan dît, wê xwe bi wê re pêşbixe. Her dîtina ku ew dike, wê ezmûnek bê. Her ezmûn jî, wê fêr û ankû zanîneka ku mirov divê ku wê werênê ser ziman bê. Ev jî, wê keseyetîyê ve wê zaroyê bike ciwan. Wê ji aliyê qarakter ve wê gûharînan bide çêkirin. Wê xoslet û teybetîyên nû ji wê re bide qizinc kirin. Xoslet û teybetîyên nû, wê rengên keseyetîya ciwan jî bixwe re wê bidina derxistin li holê. Keseyet, di vê demê de wê nêvî bi nêvî bê. Her wusa, keseyetîya ciwaniyê, wê çendî ku ew dema xwe ya ciwaniyê derbas dike jî wê xûy û adetên wê demê bi xwe re wê bi wê kelecanê û zindîtîyê wê bijî. Lê wekî din jî ciwan, bi mejiyê xwe re gelek ezmûn jîyan dike. Wê ji aliyê fîzyolojikî ve wê mazin bibê û gûharînên temenî wê bi xwe re bide çêkirin. Hişmendiya xwe jî pêşxistîya. Hewirdorê biaqil û hiş dibînê. Her wusa, gotinan dikarê di aqilê xwe de bigirê. Bi wê re tişta ku wê di aqilê xwe de girt, wê ji bîr nekê.

Lê aqil, dîtin û ezmûna ciwan a li ser dunyê û jîyankirina wê, wê bi demê re hin bi hin pêşbikeve û lê zêde bibê. Ciwan, wê hin bi hin nerîn û dîtina xwe ya li dunyê a bi hişmendî wê biafirênê. Bi wê re jî wê, wê ciwan, di derbarê rewş, dîtin, û jîyankirinan de wê dîtina xwe werênê ser ziman. Dîtina ciwan ku em dikarin weke nerîna ciwaniyê jî werênina ser ziman, wê di vê demê de wê pêşbikeve. Nerîna ciwan, nerînek teze, zindî û ciwan a. Li gorî ku ciwan dixwezê ew bijî wê ciwan, mêl û xwestek xwe bide nîşandin. Ciwan, di aslê xwe de wê ji gelek aliyan ve wê, têr, dagirtî û gihayî bê. Lê ew civake ku ew di nav de dijî, wê ji gelek aliyan ve jî wê ne di dema ciwaniya xwe de û ne jî wê di demên piştre ên mazinahîya xwe de wê hevnasînê baş çênekê. Wê nikaribê xwe weke ku ew dixwezê bide jîyankirin û bide fahmkirin. Bo vê yekê ya ku ew, bi mejiyê xwe de bi têgîna hertimî jîyankirina ya nejîyayî, wê bixwezê ku bijî û wê bike ku ew xwe bigihênê wê. Ciwan, weke rastîyeka ku ew di dema ciwaniya xwe de wê, pirr zû karibê xwe bigûharênê li gorî rast û

pîvanên wê civake ku ew di nav de dijî. Bi şêwayekî wê ciwan, ji bişavitinîya civakî a xweza re hertimî wê vekirî bê, weke ku çawa ew di zarokatiyê çendî ku ew ji rengdayîna keseyetîyê re vekirîbû.

Ciwan, wê weke pro-tîp wê dê û ankû bavê xwe wê ji xwe re weke kopîya wê bigirê. Wê tevger, kirin û nêzîkatîyên wê bike malê keseyetîya xwe jî. Wê bi vê rengê jî wê ji dêûbavê xwe wê zaroya ciwan wê mîreteyekê hilde. Di vê demê de wê, weke ku ew çawa piçûk û zarok bû û dê û ankû bav lehenga û sitergeha zaroyê bû, wê di vê demê de bi şêwayna din ên ji ya berê cuda wê heman rewş xwe bi zaroyê re bide domandin. Keçzaro, wê pirr zêde wê dayika xwe ji xwe re weke minaq bigirê. Wê gelek tişt, rewş û hwd, ji wê mîrete hilde. Ev rewşa mîrete hildanê, wê bizarokê re biawayekî bêî lêpirsîn wê bê kirin. Bo vê yekê, minaq, dema ku kûrzaro li bavê xwe binerê ku ew araqê divexwe, wê ew jî bivexwe. Dema ku keçzaro, dayika wê hinekî feminist bê û ew di vê çerçoveyê de xwediyê hinek xosletên civaknasî bê, wê bandûra van li zarokê û xosletên keseyetîya wê jî wê bikin. Çawa dê û bav dijîn, wê bandûra wê bi başî û ne başîya wê re wê li ser zaroyan û piştre ciwanan jî wê hebe. Mirov, wê ne di dema zaroktiya xwe de û ne jî wê di dema ciwaniya xwe de wê zêde karibê tevger û xosletên dê û bav bike berlêpirsînê de. Lê di dema ciwaniyê de ev rewş wê hin bi hin pêşbikeve. Bi teybetî di demên dawî ên ciwaniyê de wê ev rewş biawayekî vekirî wê xwe bidina dîyarkirin û nîşandin bi ciwaniyê re.

Di dema ciwaniyê de ew bertekên ciwan ku em wan şîrove dikin, em dibînin ku wê bertek di şê şêwayan de wê xwe bidina dîyarkirin. Şêwayek, wê li ser hêrsbûnê bê. Ciwan, wê di dema xwe de pirr zîz û xesas bê. wê zû dilê xwe bigirê. Wê zû bikeve bin bandûrê de. Ciwan wê van rewşên xwe bixwezê ku ew çawa dixwez bijî. Lê ya ku wê zarok, nikaribê wê bijî jî wê ev bê. Derûnîya ciwan, wê hertimî weke cameka tenik ku ew her ku mirov destê xwe dayê de wê bişikihê û werê xwerê.

Her wusa şîwaya duyem jî wê li ser rewşa têkiliya dêûbav bê. Di vê demê de ew kêmbûna têkiliya dêûbav û ya zaroya ciwan ji hevdû, wê bê temenê wê ku ew alaqaya ku ew dixwezê wê ji wan nebînê. Dêûbav jî, wê xwe bi wê bidina bawer kirin ku ew zarok êdî mazin bûya û ew pêwîstîya wê bi wê alaqayê tûna ya. Carna dema ku wê ciwanna li bendê alaqayê bin ji dêûbavê xwe, wê ev bi gotinên weke ”me tû zaroyî”, ”ne tu mazinî, êdî” û hwd, wê ciwan were rexne kirin. Li ser van gotina û gotinên bi vî rengî wê ciwan xwe bi şûn ve bide kişandin. Wê êdî hewl bide ku ew tevger, kirin û xûyên mazinên xwe kopîya bike û bide

nîşandin. Ev rewşa kopîkirinê ku ew di ancama wê tewisendina li ser wê ku diafirê, wê ji gelek aliyan ve wê pêşîya gihabûn û balixbûna zaroyê jî wê bide girtin. Zaroya ciwan, dema ku tevger, kirin û her wusa xûyên dê û bav û an jî kû ên hinek mazinên xwe yên din kopî kirin, wê êdî wan weke tevger, kirin, û xûyên xwe bike malê keseyetîya xwe. Wê hertimî keseyetîyeka ku wê zêde bale zaroya ciwan bikişênê wê hebe. Ev keseyet, dibê ku ya dapîrê bê. Dibê ku ya bapîrê bê. Dibê ku ya dayik(´dê´)ê bê. Dibê ku ya bav bê. Dibê ku ya hinek mazinên wê yê din bin. Lê di asta zanebûna xwe de ku zaroya ciwan, wê zanebûna mazinên xwe li gorî xwe wê bipîvê. Mirovên ku ew ji xwe re weke minaq bigirê, wê mirovên ew xitebî hêstên ciwanê dikê û ji aliyekî din ve bi zanebûnî bi wê re diaxifê û têkiliyê didênê û dide nîşandin ku ew ciwan dihilde cidiyetê. Li vir, vê gotina cidiyetê, em divê ku wê bi awayekî pirr cidî wê hildina li dest. Ber ku wê tevgerên ciwan ev gotin pirr zêde bi bandûr bike. Zarok, kî wî di hilde cidiyetê û têkiliyê bi gotinên cidî bi wê re didênê, wê mêyla wê bi zêdeyî li ser wan bê. Her wusa, wê xwe nêzî wan bike. Nêzîkatîyek germ a bi hêstîyarî, ku ew di xwe de cidiyetê dihawênê û mirov wê di nerîn û mimîkên xwe re wê dide dîyarkirin, wê mejiyê zaroya ciwan wê pirr baş kifş bike û hilde. Wê xwe nêzî wê hêstê bike. Ber ku zaroya ciwan, ew nêzîkatîya cidî ku bi wê hêsta germ hatîya li hevdû pêçan, wê ew li zaroya ciwan pirr xweş wê were û wê li xoşa wê herê. Li wir, wê ew zaroya ciwan, bi wê hêsta ciwaniyê wê fahm bike ku ew hatîya hildan li cidiyetê. Ber ku ew ciwan, fahm bike ku nêzîkatîyeka bicidyetê li wê nêzîkatî kirin, ku ew ji cil bê wê di xwe de hêskirin û heta hêsta hûrmetê jî wê biparêzê. Ya ku wê ciwan xwe di wê de baş hîs bike jî wê ev bê. Dema ku vê nêzîkatîyê ciwan ji dêûbavê xwe nebînê û ji yekî din bibînê, wê li şûna dêûbavê xwe wê xwe nêzî wê yên din bike. Bo vê yekê, ev rewş jî, wê bo dêûbav weke dersekê bê ku ew hertimî bi cidiyetekê û ew cidiyet jî ku wê di xwe de hêskirinê û heta ku hûrmetê jî bihawênê ji zarokê re.

Zaroya ciwan, di vê dema xwe de dema ku ew bi serê ma û derfet ji xwe re dît ku ew xwe werênê ser ziman, wê di vê demê de pêvajoyna pêşketinê ên pirr zêde mazin wê karibê bi xwe re bide jînkirin. Di aslê xwe de temenê vê, bi zaroya ciwan re zêde jî heya. Lê li vir, ew temen û her potensîyale zaroya ciwan di jîyanê de ku ew werina gihandin li hevdû, wê hingî ciwan wê karibê xwe bi pêşketina xwe re bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku zaroya ciwan, ew şert û mercên ku ew di wê de dijî, ew komelî û civaknasiya ku

ew di wê de dijî wê ew jî, wê di pêşketina zaroya ciwan de wê xwediyê bandûrek mazin bê. Şert û mercên ku ew zaroya ciwan di nav de dijî, wê bi gotinên ku ew navend di nava xwe de bikardihênê wê, zaroya ciwan wê di xwe de bicih bike. Navend ku ew zaroya ciwan di wê de ew dijî, wê zaroya ciwan weke rastiyek wê jî bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ew navende k u zaroya ciwan di wê de dijî, ku ew çendî qilabalix bê û her wusa cihêrengî di wê de hebe, wê bandûra wê li ser zarokê û zimanê wê hebe. Ev yek weke rastiyekê hatîya piştrastkirin ku zaroyên ku di nava malbatek ji rêzê û di rewşa xwe(´halê xwe´) de ku ew dihê û dijî, wê di zimanê wan de tangbûn wê xwe bide dîyarkirin. Heta ku zimanê pertek ku ew dialiqê, gotin ji dev nikarin werina derxistin û hwd, wê pirsgirêkên bi vî rengî wê xwe bi re bidina dîyarkirin. Pêşketin û pêşveçûna zimanê zarokê, ji dema pitiktiyê û heta dema ciwaniyê, di wê de wê bandûra rewşa jîyanê, navenda komelî û civaknasî û hwd, wê bandûra wê li ser jîyane zaroyê û pêşketina wê hebe. Her wusa, bi şêwayê ezmûn, cerb û fêrbûnê fahmkirina dunyaya derve, wê tenê aliyekî ku ew di temenê pêşketin û pêşveçûna zaroyê û zaroya ciwan de bê. Lê aliyê din jî, wê aliyên rakendî bê.  Em li vir, dema kiu bahse rewşên rakendî bikin, divê ku em werênina ser ziman ku bi zarokê re wê ne tenê bi şêwayekê, wê rakendî wê bibe. Şêwayek ku ew ji aliyê biolojikî ve mirov li ser rewşên weke genetikê û hwd ve ku mirov dikarê werênê ser ziman a. Her wusa, şêwaya din a duyem jî, wê li ser rê û şêwayên weke derûnîyê re bê. Rê û şêwaya sêyem jî, wê her wusa li ser têgîn, têgihiştin, dîrok û kevneşopîya civatê re bê.

Ev şêwayên rakendîyê, wê ji dêûbav wê li zarokê xwe bidina domandin. Her wusa, ev rewşên ku em hanîna ser ziman, mirov dikarê bi demê re rewşên din jî li wê zêde bike. Her wusa, ev wê, xêva civakî û civaknasî, derûnî û her wusa biolojikî û hwd, wê xwe bi wê re bide pêşxistin. Xêva civaknasî, wê zarok, di vê demê de wê bi teybetî wê kifş bike. Wê bi teybetî, wê bixwezê ku ew li ser wê re bijî. Bo vê yekê, di vê demê de ku wê zaroya ciwan, ku xêva civaknasî di temenê wê de ya wê bi bidest kifşkirina jîyanê bike. Her tişta ku ew di wê dema xwe ya ciwanî de dibînê, wê weke tişta ku bi dîtina xêva civaknasî bê. Zarok, wê bi xêva civaknasî re wê, hertimî bixwezê ku ew bijî û bi tevger bê. Ew tevger û dînamikîya ciwanî, wê bi wê xêva ciwanî wê zêdetirî bi tevger û geş bibê.

Xêva civaknasî, her wusa, li vir, wê mejiyê zarokê jî wê bi bandûr bike. Wê rengên xewnên ku ew bibînê jî wê bi xwe re weke ku wê bide

kifşkirin. Her wusa, xêva civaknasî, wê bi xwe re xêva derûnî a zarokê jî wê biafirênê, bi reng bike û serdest bike. Li vir, wê piştî ku ciwan, xêva wê ya derûnî pêşket û xort bû, wê ev êdî di nava wê rewşa civaknasî ku ciwan wê dijî de wê bidest bandûrkirina li tevgerên ciwanê bike. Ciwan, wê di vê çerçoveyê de wê êdî wê bi derûnîyê jî wê, bidest jîyankirina xwe bike. Her wusa, li vir, rewşa derûnîyê a di nava rewşên derûnî de wê pirr balkêş bê. Ciwan, wê di vê çerçoveyê de wê, piştî jîyankirina xwe wê hin bi hin wê ji wan rewşên xwe yên civaknasî ku ew dijî wê derûnîyê jî biafirênê û ankû pêşbixe. Li vir, di aslê xwe de wê rewşek ku em dikarin bi rewşa derûnîya civaknasîyê re werênina ser ziman wê xwe hin bi hin w bi ciwaniyê re wê bide dîyarkirin. Her wusa, di vê rewşê de wê ciwan, bi xêva xwe ya civaknasî wê mejiyê xwe yê civaknasî wê biafirênê. Bi demê re wê ezmûnên wê jîyankirinê wê bi wê re zêde bibin. Li ser wê re jî wê ciwan, di hundurê xwe de wê bidest hizirkirinê wê bike. Li vir, piştî ku zaroyê rewş derxista têgihiştinê, wê êdî bi du alî wê êdî wê bijî. Wê hem bi aliyê derve ê dunya derve wê bihiş wê bijî. Lê wê bi aliyê dunya xwe ya hundûrînî jî wê bijî. Li vir, wê zêdetir aliyê dunya ciwan a hundûrînî wê bandûrê û zorê bidiyê de ku ew zêdetirî wê bijî. Li vir, wê ciwan, êdî di nava herdû aliyan de wê, herê û werê. Demna wê pirr zêde hundûrîna xwe bijî. Demna jî, wê pirr zêde dunya derve wê bijî. Di nava vê çûnûhatina di mejî de wê rewşên weke tengezeriyê ku mirov dikarê weke rewşên tengezerîyên ciwaniyê jî binav bike wê bijîn. Pirranî, tengezerî, wê ji wê bê ku ciwan, ya ku ew dixwezê nikaribê weke ku ew dixwezê wê bijî. An jî, ji rewşên hêstîyarî ên ku li ciwan serdest dibin, wê ji wan biafirê. Piştî pêşketina xêva derûnî, wê zêdetirî rewşên ne levkirina bi wê xêv û jîyane civaknasî a ku ciwan dijî re wê biafirênê. Li vir, pirsgirêkên weke tengezerîyên ciwaniyê ên weke sendrûmê û hwd, divê ku mirov ji aliyê têgîn û xêva civaknasî û ya derûnî ve nêzîk bibê. Ji herdû aliyan ve divê ku mirov bike wê baş fahm bike. Tengezerîyên ciwaniyê, wê wê di nava rewşên civaknasî de wê bi jîyanîya wê re wê xwe bidina dîyarkirin. Xêva derûnî, zêdetirî dibêt ku mêla ciwan li dunya wî ya hundurînî bide çêkirin. Her wusa, ciwan jî, dema ku wê bi xwe re kifş dike, wê êdî wê bijî. Bi jîyankirin û fêrbûna jîyankirina wê re wê, êdî ciwan zêdetirî di rewşek girtî de wê dîmenekî bide li berçav. Her wusa, pirsgirêkên ku ew di nava jîyanê de dijî û rastî wan tê, wê zêde bandûrê li ciwan bikin ku ew zêdetirî bi wê re li hundûrê xwe were girtin. Dema ku ciwan, hîs bike ku ew nayê fahmkirin ji aliyê mazinên xwe ve wê, ew hingî xwe li hundurê xwe bigirê. Di vê demê de wê pirr zêdeyî, dem bi

dem wê ev hêst bi ciwan re çê bibê ku ew hîs bike ku ew nayê fahm kirin. Bo vê yekê, ew carna xwe ji têkilî û axiftina jî bi şûn ve didê û axiftinê nakê. Nakeve nîqaşan de. Ciwan, di vê demê de zêdetirî dixwezê ku ew ji aliyê dêûbavê wê ve were fahmkirn. Lê dema ku ew hîs bike ku ew nabê, wê ev zêdetirî ciwan biêşênê û bişikênê di xwe de.

Ev dema zaroya ciwan, wê weke demek bikeseyetî a wê ya pirr zîz, tenik û xesas bê. Di vê demê de ev pirsgirêkên ku wê ciwan bijî, wê bandûrê li mêyla rengê jîyane ciwan jî bikin. Wê bixwezê xwe zêde di hundurê xwe de girtî bigirê û ankû wê xwe vekirî bihêlê û di nava têkiliyên civaknasî de bê. Her wusa ev rewşên jîyane wê di vê demê de wê zêdetirî xwe bidina dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî ji bîrnekê û bibêjê ku wê keseyetîya zaroya ciwan, wê heta salên 14, 15 û 16´an, wê ji nû ve xwe bireng bike. Ev pêvajoya ku zaroya ciwan dema xwe ya zaroktiyê a pitiktiyê derbas dike û dibê zarok, wê zarok wê temenê pêşketina keseyetîyê wê biafirênê. Di vê demê de wê zrok, fêrî axiftinê bike û biaxifê, wê fêrî nivîsandinê bibê û wê binivîsênê, wê bidest çûyîna li derve wê bike. Wê hevalan ji xwe re çê bike. Wê têgîna hevaltiyê wê bi wê re hevnasînê bike. Her wusa wê mejiyê zaroktiyê wê pêşbikeve. Bi wê re jî wê aqil zaroktiyê wê pêşbikeve. Pêvajoya zaroktiyê ji yek û ankû dusaliya xwe de heta dehsalîya xwe ya. Piştî wê re wê ji salên weke ên 11´an û hwd, wê dema zarokê a ciwanîyê wê dest pê bike. Bi vê demê re wê xwe êdî bi ciwanî bidest jîyankirinê bike. Dema ciwaniyê, wê weke demeka bûhûrîner a li ya mazinbûnê bê. Di dema ciwaniyê de wê zarok bigihê û balix bibê. Wê keseyetîya xwe ji nû ve bi qarakterê wê re wê ji nû ve biafirênê. Her wusa, weke ku çawa wê di dema zaroktiyê de wê zarok pêşketin û pêşveçûnên fizyolojikî, gîyanî û derûnî wê bixwe re ji temen ve wê bijî, bi heman rengî wê di dema ciwaniyê de wê zaroya ciwan bi pêşketin û pêşveçûnên fizyolojikî, gîyanî û derûnî wê ji temen ve wê bijî. Pêşketin û pêşveçûnên dema ciwaniyê, wê ji ya dema zaroktiyê hinekî cuda bin. Di vê dema ciwaniyê de wê ji gelek aliyan ve laşê mirov hundûrîn û derveyîya wê wê bigihê û balix bike. Di laşê mirov de wê gûharînên mazin wê bibin. Pêşveçûnên fizyolojikî ku zaroya ciwan bi xwe re dijî, wê hinekî bi derûnîyê re temenê hinek pirsgirêkên ku ew dijî jî bê. ´Ji derve çawa tême dîtin bi vê rewşa xwe ya gûharî re´ wê weke hizirna ku wê bi zarokê re çê bibin bê. Di vê demê de zaroya ciwan, wê zêdeyî bi laşê xwe ve wê alaqader bê. Carna jî, wê bi wan gûharînn ku ew dijîn re wê xwe neacibênin û bi kêmesî bibînin. Ev jî, wê temenê

hinek pirsgirêkên keseyeyîtê ên bi zarokê re bê. Bi wê rewşa xwe re ew çawa tê dîtin, wê zaroya ciwan serî pirr li ser wê biwastênê. Zaroya ciwan, wê pirsgirêkên derûnî ên ku zaroya ciwan dijî, li ser wan gûharînên fizyolojikî, gîyanî û derûnî ku ew baş hîs dike, wê bikeve wê hizra ´ez baş im û sipahî me´ û ankû ´na, ez ne baş im û ne sipahî me´ wê bi wê re çê bibê. Di vê çerçoveyê de xwe acibandin û ne acibandin, wê bi zaroya ciwan re çê bibe. Wê di nava van herdû aliyan de wê, dem bi dem herê û were jî.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî werênê ser ziman ku, weke ku me li jor hinekî hinekî hanî ser ziman wê di vê dema ciwaniyê a zaroktiyê de wê ji aliyê gîyanî derûnî, aqlî û zêhnî ve wê pêşketin û pêşveçûnên mazin wê xwe bidina dîyarkirin. Temenê ku mirov di dema zaroktiyê de jîya ya, wê ew temenê li ser wê re di dema ciwaniyê de wê pêşveçûnên mazin di mejiyê mirov de wê bibê. Her wusa, di dema ciwaniyê de mirov wê karibê baş zimanê xwe bikarbênê. Bi serdestbûna mirov a li ziman re mirov, wê xwe serdest hîs bike. Her wusa, wê zaroya ciwan, di dema xwe ya ciwaniyê de wê ew vê yekê bijî. Bi jînkirina wê re bi sînor namênê wê têj û tahma wê jî derxe. Her wusa, di vê demê de zaroya ciwan, li derveyîya xwe û jîyankirinên xwe dinerê û wan wan wê bi gotinkirina wan re wê wan di mejiyê xwe de bigirê. Mirov, hê di dema zaroktiya xwe de fêrî giritna ji derve û ji jîyane derve û ji axifitinên derve û dîtinên xwe digirê. Zarok, di vê demê de fêrî bipêşnûmakirina rewşan kirîya. Di mejiyê xwe de dikarê çerçoveya wan derxe û wê çerçoveya wan fahm bike. Vê yekê, mirov dikarê weke destpêka fahmkirina darêjkê bi têgîna wê re jî bi zarokê re werênê ser ziman. Her wusa, di vê demê de ku em demên ciwaniyê ên destpêkê jî di nav de bihasibênin, em divê ku werênin ser ziman ku wê dema zaroktiyê wê darêjkê bi hişmendiya wê re wê karibê fahm bike. Di vê çerçoveyê de wê zarok, biawayekî bi dîtinên xwe yên kirinî û ankû ´piretîkî´ re wê ew wê bijî. Zarok, di vê demê de wê temenê pêşketina xwe ya temenî wê bide çêkirin. Her wusa dema ciwaniyê wê di şêwayekî din de wê, wê pêşketina temenî wê bi xwe re wê bijî. Dema ciwaniyê, wê gelek rengên pêşveçûnê ên mirov re wê di zikhevdû de wê bi hevdû re wê bijîn. Her wusa, ciwan, wê hêstîyarî û xwesteka wî ya bi wê re ku ew bi xwe re derdixe li pêş, wê bi wê re wê bijî. Em li vir, divê ku vê yekê baş fahm bikin, ku ew demên zaroktiyê, wê temenekî mazin ê pêşketina zêhnê mirov jî bin. Bi wê re jî wê mirov di dema ciwaniya xwe de wê bidest kifşkirinan bi zêhnê xwe re li ser hişmendiya xwe re wê bike. Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser

ziman ku wê zarok piştî ku bûhûrî dema ciwaniya xwe wê, wê fêrî bikarhanîna aqilê xwe yê kirinî û ankû ´piretîkî´ wê bike. Bi wê re jî wê bi aqilê xwe yê li ser hêstîyarîya xwe re wê bijî. Ev jî, di rastiyê de wê, aqilê hîstîyarî bê. Aqilê hêstîyarî, wê di vê demê de wê bandûrê li rewşên civaknasî ên ku ciwan dijî wê bike. Ciwan, wê bi xwe re wê aqilê hêstîyar û û wê bi aktivîya xwe ya di jîyanê de wê bikirnîyekê re wê bike ku ew bikarbênê. Di vê demê de çendî ku ciwan, bi aqilê xwe yê hêstîyarî dijî, wê hem di hundurê xwe de û derveyîya xwe de wê şoreşan bi aqilê xwe bike. Zaroya ciwan, wê di vê demê de zêdetirî wê xwe di dunyaya xwe ya hundûrînî de wê rehet jî bike. Bo vê yekê, wê zêdetirî di wê dunya xwe de wê biafrînerîyekê wê bijî. Ev jî, wê bandûra wê wê aqilê hêstîyarî bê.

Zaroya ciwan, wê zêdetirî zêhnê wê vekirî bê. Ev jî, wê temenê yê zû û baştir fahmkirinê jî bê. Heta ku em dikarin bibêjin ku wê ev temenê aktivîya wê ya di jîyanê de jî bê. Wê ciwan, di vê çerçoveyê de wê bixwe re w baş bijî. Di vê çerçoveya vekirîya zêhnê a ciwan, wê di dewama pêşketina ciwan a zaroktiya wê de bê. Ji aliyê aqlî û zêhnî ve wê zaroya ciwan, wê demek ib dema zaroktiyê re li şûn xwe bihêlê û wê bikeve demek nû de. Wê bi jîyanê re wê ikeve farq û têgiha kirin, tişt û rewşên nû de. Tecrûbeya zaroya ciwan a hizirkirinê pêş dikeve. Aqilê civaknasî ê wê pêş dikeve. Hêza lêpirsînê û rexnekirinê bi hizirkirina wê re wê pêşbikeve. Ji aliyê tevger û xûyên xwe ve wê xwe biadilênê. Wê bikeve farqe wê de ku ew jîyane xwe biadilênê. Bo vê yekê, wê êdî razî nebê ku ew kesek mudaheleyê li jîyane wê bike. Di vê dema ciwaniyê de wê xîyalkirina asoyî wê pêşbikeve. Bo armancek û jîyanek baş, wê xwe ji nû ve bi sazûman bike. Bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ciwan, çendî ku weke ku ew ji rexneyan hildanê re girtîya jî, wê hertimî di çerçoveya mejiyê xwe yê civaknasî de wê henekan bike, wê laqirdiyan bi mirovên din bike û wê bi nerînên rexnegirî wê binerê û heta ku wê karibê gotina xwe jî bibêjê. Her wusa, wê ciwan di vê demê de wê rastîya xwe kifş bike û wê bi bike ku ew bijî. Her wusa wê bixwezê ku ew birastîya xwe bijî. Bo vê yekê, ew dema ku ew bikeve dijberî dêûbav û ankû mazinên xwe de jî, wê gotina xwe li ser wê rastîya xwe re wê werênê ser ziman. Ciwan, di vê demê de wê civaka ku ew di navê de dijî bidest kifşkirina wê dike û her wusa gelek alî û rengên pêşketina wê, dikarê kêm û ne têr jî bibînê û rexne jî bike. Di çerçoveya vê rengê nerîna ciwan de wê, di destpêkê de wê objektivîyek wê hebe. Çendî ku ciwan di farqe vê de ya û ankû ne di farqe wê de ya, ew jî wê

weke mijarek din bê. Lê ciwan, di vê çerçoveyê de wê weke hêzek ku ew karibê wê sazûmana civakî kêmesî û netêrîyên wê bibînê û rexne jî bike. Rengê jîyane ku ew di mejiyê xwe de tefkîr dike ku ew wê bijî, wê di vê çerçoveyê de wê binerê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê di sedsale me de bo rejimên ku ew didixwezin hertimî li ser civakê sehêtê çê bikin, wê ciwan, weke ´pirsgirêkê´ jî bê. Ber ku ew nikarin zêde ciwan di ciwaniya wê de zêde bisehêt bikin. Ev dema ciwaniyê ku ciwan bixwe di mejiyê xwe de li xwe pirsan dike û dibêjê ´ez kîm e´ û li bersivên wan digerihê, wê li ser salixkirinên keseyetî, wê pirr zêde tengezerî di vê rewşê de wê xwe bi ciwan û rewşa civakî a dema wê re wê derkevin. Bi bersivdayîna pirsên xwe re wê ciwan, hin bi cihê xwe yê di nava civakê de zelal û safî bike, wê nirx û pêdîvîyên jîyane di nava civakê de wê fêr bibê. Ji aliyê ramyarî, olî û zayendî ve jî wê, êdî tercîhên xwe zelal bike. Di vê demê de jî şert û mercên ku ciwan di wê de dijî û rewşa jîyane malbatê û hwd, wê bandûra wê mazin li ser zarokê wê hebe. Lêpirsînên bi vî rengî ên ciwan, wê cihê wê yê di nava civakê de wê bide çêkirin di mejiyê wê de. Wê ew bi wê re xwe weke yek ji wê civakê bibînê. Wê nasnemeya xwe ya keseyetî bi vî rengî wê êdî **biafirênê**. Wê zanibê ku ew kî ya. Her wusa, di vê demê de ew pirsên weke ´ez kîm me´ ku ew ji xwe dike, wê hin bi hin bersiva wan di mejiyê xwe de bide. Wê di vê demê de wê xwdiyê gîyan û derûnîyeka tenik û zirev bê. Wê, hin bi hin ast û pîvana xwe ya keseyetî wê biafirênê û wê li ser wan re binerê. Dema ku ew binerîn û pîvana xwe re levnekê, wê bikeve dijber de jî. Ji aliyê hêstî û derûnî ve ciwan, wê zû bişikihê. Wê hertimî mereq dîtin û kifşkirina cih, tişt û deverên nû wê pêre biafirê. Wê xwe rewş û bûyarên ku ew dibînê dûr negirê. Di vê demê de wê bi hêstîyarî û derûnî, xwediyê rewşekê ku hundûrê wî li hundûrê wî nabê. Wê zû bi biriqê. Pirr baborî ya. Wê hertimî bixwezê ku ew li gorî dilê wê bê.

Ciwan, dema ku ew bi ber mazinbûna xwe ve diçê, wê êdî zêdetirî bigihê. Wê hinek gûharînên gîyanî û derûnî wê derbas bike. Li ser wan gûharînan re wê aheng û belasê karibê bi sehêta hêstên xwe re çê bike. Wê karibê xwe bisehêt bike. Dema ku ew bihizirê, wê pirr bi hûrgilî bihizirê û w çareserîyan bibînê û wê wan çareserîyên ku wê dît, wan werênê li cih. Wê ew ciwanan binxwe re yanî ji xwe piçûktir bibînê. Wê biaqil xwe zêdetir karibê bihizirê bi razberî û çareserîyan bibînê. Wê zêdetirî bi ezmûn, fêr û cerb bê. Her wusa bi heman rengî wê bi zêdezanebûn jî bê. Wê bi zewicê û wê jîyane xwe wê li gorî ast û pîvanên

civakî wê ava bike û wê bike ku wê birêve bibê. Her wusa weke mazinekî wê zêdetirî bikeve farqe berpirsîyarî û pêwîstînîyên xwe de. Ji aliyê fîzyolojikî, gîyanî û derûnî ve wê êdî wê serbixwe bê. Wê ji aliyê hêst û hêstîyarîyê ve wê bê bi serê xwe. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman, dema ku ew mazin dibê û ji aliyê hêst û hêstîyarî ve qûtbûnê ji dêûbav û mazinên xwe dijî û zêdetîrî serbixwe dibê jî wê, ew ti carî wê qûtbûnê bi awayekî radîkalî wê nekê. Weke ku çawa ku wê di dema ciwaniya xwe ji aliyekî ve zarokatiyê û ji aliyê din ve wê ciwaniyê bijî, bi heman rengî dema ku ew mazin bû jî, wê ji aliyekî ve ciwaniyê û ji aliyê din ve mazinbûna xwe wê bijî. Lê wê bi hevdû re di ahengekê de wê wan bijî.

Em li vir, divê ku vê yekê baş werênina ser ziman ku wê dema zaroktiyê, weke demek pirr aktivî a ku zarok ji gelek aliyên xwe yên weke bilaşî, gîyanî, derûnî, zêhnî hwd, pirr zêde pêş dikeve ya. temenê pêşketina zarokê, pirr zêde heya. Zarok, bi aqilê xwe wê ne kêm bê. Lê weke ku mejiyê zaroktiyê wê hîs dike û dixwezê ku wê bijî, wê bixwezê ku ew bijî û bi jînkirinê re fêr bibê. Her wusa ezmûn, cerb weke bi dîtinan re, rewş çerçoveya wan, wê zarok bidest kifşkirina wan bike. Mirov, hê di dema zaroktiya xwe de bidest çêkirin û ankû naqşkirina wêneyan dike û bidest nivîsandinê dike. Tişta ku zarok dibînê, wê di xwe de bigirê. Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku mejiyê zarokê pirr zêde aktiv û zêhnê zarokê pirr zêde pêşketîya. Her ku ew mejiyê zarokê dijî û fêr û ezmûnan bidest dixê, wê êdî karibê zêdetirî zêhnê xwe de zêdetir bikarbênê.

Ji vê aliyê bi fêr û biezmûnbûna zêhnê ve wê dema ciwaniyê wê bixwezê ku ew demek xwe ya kifşkar bijî. Yanî, wê bixwezê ku ew kifş bike. Ji xwe wê, hertimî jî wê, di pêvejoya kifşkirinê û bi wê re di jîyankirinê de bê. Pêvajoya ciwaniyê wê her wusa vê yekê, bi aqilê xwe yê hêstîyarî wê zêdetirî bijî. Bi wê re wê hin bi hin aqilê kirinî û ankû aqilê piretîkî wê pêşbixe. Aqilê kirinî, di aslê xwe de nîşanaka hebûn û pêşketina zêhn û jîra mirov a. Mirovê biaqilê kirinî ku ew di her rewşê de dikarê di cih de lihevdû bênê û rewşê bi çareser bike, wê weke mirovê jîr jî were bi nav kirin. Kurdan, hertimî bo vê yekê li kirinên mirov nerîna û hewldana ku ew fahm bikin ku mirov ´çendî jîr a´ û ankû ´ne jîr a´. ´Nejîrbûn, wê weke ku pêşîyên kurdan dihanîna ser ziman, wê navê w şevekorî bê. Mirovê şevekorî, mirovê ku ji aliyê zêhnê ve weke mirovê girtî jî dihê bi navkirin. Wê ev rewş hemû di dema ciwaniyê de wê xwe bidina dîyarkirin û nîşankirin di dema ciwaniyê de. Her wusa, di dema

ciwaniya xwe de çawa ku wê hertimî bixwezê ku ew bibe xwe bixwe û serbixwe bi keseyetîya xwe re, wê bi heman rengî di dema mazinbûna xwe de jî wê bi heman rengî wê di nava civakê de wê bixwezê ku ew bibê bixwe, serbixwe û wê bê mirovekî ku ew xwediyê şîyanê ya di nava civate xwe de. Wê ji aliyê, hêst, raman û aqilî ve wê bê bi serê xwe û serbixwe û wê biryarên xwe wê bi serê xwe karibê bide. Di dema ciwaniyê de pirsgirêka ciwaniyê wê hertimî bi mazinên wê re di şêwaya serbixwebûn û dana biryara di derbarê de bûnê de bê. Di vê demê de ciwan, ne têr fêr, ezmûn û cerba jîyanê ya. Lê ew bûya xwediyê keseyetîyê. Weke pêwîstînî û pêdîvîya wê jî wê bixwezê, ku ew biryare xwe bide. Li vir, ya ku wê di temenê hatîna ciwan û dêûbav wî ya berhevdû de bê di vê warê de wê, di rastiyê de ev pêşketina keseyetîyê **bê**.

Di vê çerçoveyê de mirov dikarê werênê ser ziman ku dema ciwaniyê, wê demek pirr zêde giring bê. Her wusa, çendî ku weke dem navendî a bûhûrîner jî bê, ev dema ciwaniyê, wê xate jîyane mirov bi rengê re jî wê li pêşaroja wê bide dîyarkirin. Kirinên mirov ên ciwaniyê, wê di vê çerçoveyê de wê temenê pêşketina zêhnê mirov jî wê di jîyane mirov de bidina çêkirin. Di aslê xwe de ciwanî bixwe jî wê weke rewşek zêhnî a jîrî bê. Mirov dikarê wê bi vê rengê bi awayekî vekirî werênê ser ziman. Di vê deme ciwaniyê de rehetbûn û navenda jîyanî a civaknasî bi têkiliyên wê re wê temenê herî baş ê pêşketina wê bê. Li vir, em çawa dikarin ast û pîvana ciwaniyê ya serkevtî fahm bikin. Her wusa, bi têkiliyên wê yên civaknasî û di nava jîyane wê ya civaknasî de ew çendî dikarê bi aqilê xwe yê kirinî bihizirê û werênê ser ziman û ankû biafirênê, wê hinekî jî weke nîşanaka wê bê.

Di vê demê de derûnîya mirov a jîyanê, wê fahmkirina wê jî giring bê. Derûnî yan wê bendekê li pêşîya pêşketin û pêşveçûna mirov a vê demê dênê û yan jî wê mirov zûtirîn bi pêşketin û pêşveçûna wê demê re wê pêşve bibê û pêşbixe. Bo vê yekê di vê demê de wê derûnî pirr zêde giring bê. Hertimî xwe rehet hîskirin û baş hîskirin, wê aliyekî baş jî bê bo mejî û zêhnê mirov jî. Ez vê yekê jî divê ku werênima ser ziman ku ciwanî, wê di demê de wê, bi pêşketinên ku ew dijî re wê temenê mazinbûna xwe li ser wê gihabûn û balixbûna xwe re wê pêşbixe. Weke ku çawa ku mirov ji pitiktiyê bûhûrî li dema zaroktiyê û piştre li dema ciwaniyê, wê piştre jî ji dema ciwaniyê wê derbasî dema mirov a mazinbûnê. Dema mazinbûnê, wê mirov bi pêşveçûn û pêşketinên ku mirov di dema ciwaniya xwe de jîya ya, wê bi têrkirin û baştirkirina wan

re wê xwe bijî. Her wusa, gûharînên laşî ên ku di dema ciwaniyê de bûna, wê rengekî dema mazinbûnê a mirov jî bi xwe re biafirênin ku ew reng wê piştre jî mayinda bê. Minaq, weke bidest qûsandina mûyên rûyê xwe û hwd. Dema ciwaniyê, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de wê vê jî bie nîşandin ku mirov wê di dema mazinbûna xwe wê çawa bijî.

...

...

Nîşe: **Heta roja me, zimanê kurdî ji aliyê rejimên ku kurdistan di nava wan de hat beş kirin ên weke tirkiye ve hatîya qadaxa kirin. Zaroyên kurd, nikarin bi zimanê civate xwe perwerde bibînin. Zimanê wan yê dayikê, ji wan re qadaxaya ku ew bi wê mazin bibin û bixwênin.. Ez vê pirtûkê, atfî zarokên kurd ên ku zimanê wan qadaxaya dikim.** Û bi wê qadaxaya li ser zimanê kurdî re wê bişavtina li ser civate kurd jî şermazar dikim.

**Abdusamet Yigit, Cizîra bota, Kurdistan, sale 2016, heyva Pûşperê ..**

**.......**